


Bariyê Bala

***DÎLBERA MÎN***



# **DÎLBERA MÎN**

## **Bariyê Bala**

Dinê gişkî bidine min da,  
Ezê bikim hewar, qazî.  
Zimanê min mekin unda,  
Ezê hemûya bibim razî.

Bîşkêk – 2008

**Weşanên Zengezûr**

## PÊŞXEBER

Balayêv Baro kurê Elî – Barîyê Bala 1937-ê salê li Rêspûblîka Ermenîstanê, nehîya Massîsê, gundê Demirçiyê da malbeteke Kurde pir sadeye da hatiye dinê. Bavê wî Elîyê Paşayê Miho, dayka wî Qaza Evdoyê Bişoye. Ewana gundîyêd gelekî kedhez bûne. Tenê bi keda destê xwe jîne. Hevt law û keçeke wan hebûye.

Bavê wî 1943-salê şerê Cihanê duda da çawa şervanekî egîd şehîd dikeve. Dayîka wî 1982-ê sale dinya xwe diguheze. Barîyê piçûk bin tore û telîmê birayê xweyî mezin – Hecî Mehmedemîn da mezin dibe. Ew mirovekî pir dîndar bûye.

Barîyê Bala 1958-ê salê dibistana navîn xilaz dike û bajarê Yêrêvanê da qebûlî zanîngeha (înstîtût) dewletêye pêdagojîyayê ser navê Xaçatûr Abovyan dibe, para dîrok û filologîyayê bi zimanê Azerî.

1963-ê salê zanîngeh xilaz dike. Dibe xweyê xwendina bilind û dereca dersdarêd dibistana navîn distîne. Çend sala ew dibistanêd navînda karê xweyî pêdagojîyê dimeşîne.

1970-ê salê bajarê Yêrêvanê da zanîngeha dewletêye dersdar hazîrkirînda çawa mudurê kabînetê dîrokzanîyê kar dike.

1975-ê salê nehîya Massîsê da dîrêktorê dibistana navîn, paşwextîyê eynî nehyê da dîrêktorê Malhebûna gundîtîyê tê kivş kirinê. Ew salêd dirêj nehîya Masîsê da mufetîşê perwerdê dibistanê navîn şuxulîye.

Şerê Qerebaxa çîyara girêdayî 1989-ê sale ew jî tevî hemu Kurdêd musulman ji Rêspûblîka Ermenîstanê dertê û tê Rêspûblîka Azîrbêcanê. Bajarê Bakûyê da nehya ser nave Nerîman Nerîmanov da dîsa mufetîşê dibistanêd navîn dixebite. 1998-ê sale dertê kara edilî (tegawidê).

Ew wedê ku şagirtê dibistana navîn bû, helbestêd zaroka dinivîsî. Helbesta wîye ewilîn 1957-ê salê bi ser nivîsara “Dayîka min” rojname “Rîya Teze” da hatiye weşandinê. Ew paşê helbestêd xwe ser hîmê mijarêd (têma) cure-cure dinivîse.

Piranîya helbestên wî rojnameya «Rîya Teze», «Dengê Kurd» û «Jîyana Kurd» de hatine weşandinê. Radyoyên bi zimanê Kurdî, Ûrîsî, Azerî û Ermenîkî de hatine xwendinê. Her wiha kovar û rojnameyên van zimanan de hatine weşandinê.

Barîyê Bala xwedanê du pirtûkêd neşir bûyîye. Pirtûka wîye yekê 1974-ê salê Rêspûblîka Ermenîstanêda bi navê “Dinya min”, ya duda 1994-ê salê Rêspûblîka Azîrbêcanêda bi ser nivîsara “Kuda herim” hatine weşandinê.

Mijarê helbestên Barîyê Bala cuda-cuda ne, lê helbestvan piranîyê helbestêd xwe da niqitka hîmlî datîne ser welathezî û hub û hezîkirinê. Em vê îdêa wî helbesta “Kurdistan”êda gelekî ferih û zelal dibînin:

*Geh sêfîl bûm, geh kasil bûm boy huba te,*

*Bûme kizik, her gav helyam ez seba te.*

*Por sipî bû, ser zimîne tim navê te,*

*Roj bihata, min bidîta azaya te.*

Vê helbesta xwe da boy welatê xweyî koleyî, bindest dişewite, mîna kizîkê dihele, donê wî dipiqite. Lê azaya welatê xweyî tarîstanê da jîyî hela nabîne.

Helbesta “Ax Felek” da jî ew dîsa boy welatê xwe dinale, dikele, şev û rojêd wî dibîne ax û keser:

*Ax felek, wax felek, bê îtbar, felek,*

*Em sîyar, tu peya, te nagrin, felek,*

*Em hene, em dijîn, dizêrin, felek,*

*Carekê rûyê me bikene, felek.*

Ev ji Xwedê hîvî dike, wekî Feleka bê îtbar bide femkirinê bila carekê jî rûyê Kurdê belengaz bikene.

Helbesta “Bedewa Kurd” da ew bedewa Kurd ji avê paqîştir û gulê bîntir divîne û bejna xwe pêş wê ditewîne:

*Ez ji te ra av nabêjim,*

*Tu ji avê zelaltirî.*

*Ez ji te ra gul nabêjim,*

*Tu ji gulê zehf bîntirî.*

Helbesteke xwe da ew bi dilekî pir xeyîdî rica û îltîmasê xwe ber tew mirovêd dinêye edlayîhez dike, wekê bêjne neyara bila dest medîne zimanê wî:

*Dinê gişkî bidne minda,*

*Ezê bikim hewar, gazî.*

*Zimanê min mekin unda,*

*Ezê hemya bibim razî.*

Helbestvan parek helbestêd xwe ser janra (şaxa) rewakirinê nivîsîne. Çawa edebîyata hemû gelêd dinêye nivîsar da, usa jî edebîyata gelê Kurde nivîsare, him kevn da, him jî nûh da ev janra gelekî hatiye xebatê. Klassîkê edebîyata Kurda: Elîyê Herîrî, Melle Ahmedê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ahmedê Xanî û helbestvanêd nûh: Cegerxwîn, Hejar, Wezîrê Nadîrî,

Qaçaxê Mirad, Elîyê Evdilrehman, Seîdê Îbo û gelekêd mayîn vê rêçê da kar kirine. Barîyê Bala jî ser hîmê motîvê vê janrê qelema xwe ceribandîye û gihîştîye armanceke pir ber çav. Ez gumanim, xwendevanêd vê kara helbestvane pir zehmet wê baş qîmetkin. Helbesta ku rewayî dayîka xwe kirîye dibêje:

*Qasidê Xwedê, qîmetekî gelek mezin te ra daye,  
Tim gotîye: “Cinneta heq, binê pîyê dayka teye”.*

Ew vê helbestê da ji dayîkê mestir tenê Xwedê dibîne. Pêş tirba wê çok vedide û axa wê tewaf dike. Zîyareta here muqedes hesab dike.

Eyane, wekî edebîyata hemu gelêd Rojhilata navîne, him nivîsar da, him jî zargotî da janra beyta cîkî herî ferzî û berbiçav digre. Helbestvan bi vê janrê da zanebûna xweye gelekî kûre û kardar para ne hevşandîye. Beytêd ku ber qelema wîye pir behir derketine, paraveyî ser çend para dibin: beytêd sîyasî-welathezî, torevî, lîrîkî û hub hezkirinê û yêd mayîn:

*Delalê min, leke ma,  
Ser dilê me leke ma.  
Hemu welat bûn aza,  
Welatê me kêra ma.*

*Bêje, kurê, dubar bêje,  
Mitaleke, paşê bêje.  
Dinya milkê Silêmîne,  
Parê hilde, paşê bêje.*

Bi gilîkîva qelema Barîyê Bala pir dewlemende. Ewî nava van salan da gelek helbest, poêma, povêst, şano û helbestêd zaroka jî nivîsîne.

Poêmêd wî bi navê «Nado û Narê», «Gelê Qazax», «Gelto», «Şa bibin, Newroz hatye» û «Dîlbera min» in.

Şanoyên wî: «Salih û Gulistan», «Seyran» û «Paşa û Belgîzar» in.

Powêstên wî: «Dayka Werdek û kevirê reş», «Gundê meyi pir mezin bû» û «Hêsîrî» ne.

Helbestvan her wiha salêd dirêj ji nava gelê Kurd hezarî zêdetir meselên kal û bavan, metelok, têderxistinok, zûgotinok û pêkenok berav kirine. Ew heyânî niha li tu cîyê nehatine weşandinê. Ewî heya niha jî dest ji qelema xwe venekişandîye.

1996-ê sale qezyake pir girane, şewat li helbestvanê mihacir dest dide. Ew malxuya mala xweye pir hezkirî Dîlbera Bala unda dike. Ew qewmandina ser ruhê helbestvan rêçeke şewate gelekî kûr dihêle. Ew çawa bêjî ji Rebbê jorîn dixeyîde, dest ji nivîsarê dikşîne, wedê xwe tenê nav xem û xeyala da derbaz dike. Lê hogirêd wîye pir hezkirî Şamîlê Esker,

Knyazê Îbrêhîm, Huseynê Kurdoxlî û Ahmedê Hepo bi halekî pir giran ewî ji şînê derdixin. Ew bi dilekî kasilî, pir westîyayî, dîsa dest bi nivîsara xwe dike. Poêma «Dîlbera min» û çend helbestêd bi xem û keder rewayî Dîlbera xwe pir hezkiirî dike:

*Hey Dîlbera mine, canê,  
Me sond xar bû, bi “Quran”ê,  
Em tev herin Kurdistanê,  
Min ne qete, gelek zûye.*

Helbestvan niha teqawidê deye. Di Rêspûblîka Qazaxistanê de dijî. Dîsa jî xizmeta gelê xwe dike. Di Yêkitîyê Kurdên Qazaxistanê «Berbang» de serokê para cejn û weşandinêye. Ew li nav gelê xwe digere derheqa gewmandinên niha de elametî dide gel.

**Hejarê Şamil**  
Lêkolîner

# HUB Û HEZKIRIN

DÎLBERA MÎN



Barîyê Bala û Dîlbera Bala.

Xwedayê mezin qurna XIV Dîlbereke nazik bona helbestvan, hozanê mezin Feqîyê Teyran, lê qurna XX Dîlberek bona min xuluqand. Ewî mîna xewnekê nîşanî min da û zûtîrekê stend.

Feqîyê Teyran hetanî roja dinya xwe duguheze navê Dîlberê dikê behîrê qelema xwe, dike sîmê tenbûra xwe lêdide.

### **Miqamê sed salîya.**

Klassîkê hezkirî nîgar û miqamê derheqa Dîlbera xwe usa nîtirandîye ewa îro jî ser lêvê her Kurdekî da ye.

Belê, ezê jî hetanî sax bim nîgar, bejin-bala Dîlbera xwe binitrînim.

Lê ewê jî bejim, ez nizanim di bedewetîyê da, bejin-balê da, hildan-danînê da, rabûn-rûniştandinê da Dîlbera Feqîyê Teyran, bi bejin-bal, bi destemel, bi tore bû, yanê Dîlbera min, ewê yekê her tenê xwedêyê mezin dizane.

Lê ez fikîrekê dizanim. Dîlbera min du ewlad, du zilam – Elî û Anar da min çû.

Êy seydayê hizkirî, min bi dilêşî, bi destekî ricaf, lê bi culqet navê efrandarîya xwe danîye: “Dîlbera min”.

Hey Dîlbera mine bê zar,  
Boy te dikim ez zare-zar,  
Ez şa nabim bêy te tu car,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê îsaf bike,  
Ax-kesera min pir meke,  
Were xemê tu belake,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera nolî gula,  
Dinya ronik min bû vala,  
Te sêfîl kir Baryê Bala,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê misk, enperî,

Lelî, durrî, zêrê zerî,  
Sosin, rihan, gula perî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê bextê minî,  
Namûs, xîret, textê minî,  
Emir, jîne, heya minî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera hîva sabe,  
Ro derketîye, îdî rabe,  
Te bîr nakim hezar tobe,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine delal,  
Boy te bûme îdî qewal,  
Çilke avî, cîda zelal,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine nazik,  
Dîl-hinavêm bûne kizik,  
Ware barêm bike sivik,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê biska şeke,  
Zulfa berde, çeva kilke,  
Zûye karê çûne meke,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine çavreş,  
Carek pêş min dîsa bimeş,  
Dilê melûl tu bike geş,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine cindî,  
Şîrîn, şerbet, him jî qendî,

Rebbê jorîn min ra şandî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine horî,  
Qırqa qemer tijî morî,  
Bêy te xurê m bûye girî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê nişa xasî,  
Eslê xwe va zû da nasî,  
Tu koç dikî, min na pirsî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê gula bînî,  
Xecî, Eyşî, xatûn Zînî,  
Pir qîmetî, erzan nînî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê zef îtbarî,  
Av-kewserî, him enperî,  
Rojên seweq min bûn tarî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê eman, eman,  
Tav ketîye berê çeman,  
Çavê m rê ma, were mêvan  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê tarihanî,  
Hemaîla ser dilanî,  
Him tebîbî, him loxmanî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê te nabînim,  
Nolî berê dihebînim,  
Sewdeserim, him jî dînîm,

Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê hîvya te me,  
Bi kêlime, bendê te me,  
Bêy te îdî ez tuneme,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê usa, usa,  
Diçî, nakî ji min pirsê,  
Min dispêrî kîjan kesa,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê kanî, kanî,  
Qewl-qîrarê te dan kanî?  
Min sar bûne lihef, xanî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê tîra dilî,  
Pir bedewî, him aqilî,  
Kewa nexşî, rind bilbilî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê bahar hatiye,  
Gul vebûne, legleg hatiye,  
Nevsa jare boy te tîye,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine horî,  
Qelfe-qelfe diçin zerî,  
Tu tunenî halêm girî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê dev bahare,  
Newroz hatiye, nolî pare,  
Bixemile kaw, kubare,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê roj nîvîye,  
Ewir hatine, keraşîye,  
Hêsrê çavê bûn kanîye,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine taylan,  
Ezê bigrîm, Şûbat, Nîsan,  
Payîz, havîn, him zivistan,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê ez bi heyran,  
Ez sond duxum zûrya Sîpan,  
Dû te nabê kesîra can,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine bê çilk,  
Qelem helya, ko bû mûçilk,  
Te ruh biriye, maye qalik,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine, canê,  
Me sond xar bû, bi qoranê,  
Em tev herin Kurdistanê,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera xal û xetê,  
Xuluqîyî ji qudretê,  
Dîtina me çû qîyametê,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine cindî,  
Şivêta te min kes nedî,  
Te ez kirim rêwiyê nîvcî,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê dinya dore,  
Mirin emrê Rebbê jore,  
Bê dor diçî, min ra zore,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê sibe zûye,  
Şeva tarî îdî çûye,  
Mak dimeşe, lorik dûye,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine texbîr,  
Bahar hatiye, bike tivdîr,  
Pêş Ezraîl nebe feqîr,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine zane,  
Dil dihele ji kербane,  
Bey te lal bûn zar-zimane,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera mine pir naz,  
Poz xizêma, gerden wek gaz,  
Were xema bibim xelaz,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlberê hîvîdarim,  
Pir nexaşim, kûr dinalim,  
Min nehêle, birîndarim,  
Min ne qete, gelek zûye.

Hey Dîlbera gerdengazê,  
Sûret sora, dêm gevezê,  
Bey te bengî dil ranazê,  
Min ne qete, gelek zûye.

## ROJÊD MÎNE TEV DÎLBERÊ

Delala min, ez bi gorî, tu ne mûmî, ne fenerî,  
Dîlê temîz ez dibêjim, qet ne avî, ne kewserî.  
Tebîetê xuliqandî, boy min bûyî tu heqîqet,  
Ji bistanê xatûn Zînê te mêtîye kemal, qewat.  
Gelek rojên tele-şîrîn derbaz kirin me tevayî,  
Emekê me behra xwe da, em bûn xwedan mal-avayî.  
Te serê min pir bilindkir weke Agrî, weke Sîpan,  
Namûs, qîret, te zêde girt ji ronaya herdû çavan.  
Em bûn birçî, him jî tezî, te ji jiyan nekir gazin,  
Temam xwastin me qedandin, tev me şa bûn piçûk-mezin.  
Xêlê qenca, pir xirava, ji min pirsîn gelek cara,  
Min got: -Tenê dû Dîlberê bedew bûne li van erda.  
Yek Dîlbera mine eşqe, bexteware, him jî aza,  
Yeka dinê ew Dîlberê, Feqî dî bû xewna şeva.  
Ez naxwazim rewşa zêde, çî min ra ne dewleta pir,  
Emrê mine ewa huba teye geşe, her gave gur.  
Te daye min du gulê bîn, yek Elîye, ê din Anar,  
Ew nebînin gulle, barût, ji wan dûrbîn dijmin, neyar.  
Ez nizamim, ne eyane, emê bijîn çiqas salî,  
Tebîyetê dikim rica, tev min neçî qebra tarî.

## ÎŞEV BİBE MÊVANA MÎN

Îşev bibe mêvana min, ez bibînim têr bejna te.  
Dîsa bibe hogira min, ez ramûsim reş çavên te.  
Jan-êşên xwe te ra bêjim, bikewgirî halê minda,  
Bê te rojê vala diçin, nanihêrim bedew-rinda.

Îşev bibe mêvana min, ez xemleke teze tekim,  
Derê malam here-werê, bejin-bala te mêzekim.  
Destê nevyâ em bigirin, dîlan, cejna tev bigerin,  
Xaliq-alem rica bikin, ji vê dinê dereng herin.

Îşev bibe mêvana min, em bigerin Kurdistanê,  
Doza gelê xwe mêzekin, şev bimînin li zozanê.  
Hêsrên çava bikin melhem, şefê bidin birîndara,  
Rebbê jorîn bikin hîvî, zû qut bike qelpa, hara.

Îşev bibe mêvana min, em bibînin êla giran,  
Tev tewafkin em merzelê Herîr, Xanî, Feqyê Teyran.  
Tase ava welêt vexun, kevaca me vepesire,  
Sîngê Sîpan me definkin, em ji hevdu nebin dûre.

Îşev bibe mêvana min, em kulîlka biçirpînin,  
Baq-baq bikin, ser merzelê şêr-şenbaza bireşînin.  
Bilindbin ser Agrîya kal, ji Xwedayê bikin rica,  
Heq-rusqeta me bistîne, şa be dilê dosta-qenca.

Îşev bibe mêvana min, em serokê xwe bibînin,  
Der-dîwarê Îmralîyê kafkûn bikin, bihedmînin.  
Tevî serok Amed, Wanê bikin taştê, firavîne,  
Dunya-alem pîrozbayê min û te ra tew bişîne.

Îşev bibe mêvana min, cejna gelê xwe pîrozkin,  
Libasekî kesk-sor-sipî me ra bînin, em li xwekin,

Ser govendê tu bikşînî, bejna zirav temaşekin,  
Xewna şîrîn xilaz nebe, çavê kasil ez venekim.

Hemû rojêd xweye bê te hesav dikim sar û vala,  
Tev min naçî, tev min nayî, em dîrketin ji hevala.  
Xwedê ew roj kir para min, ez çi bikim jîyan waye,  
Heta dawyê em tev nejîn, emir-ferman dest Xudaye.

## TE DİGERİM, TU TUNENÎ

Gav, sehet,  
Roj, meh,  
Sal, heyam,  
Dibuhurin,  
Te nabînim,  
Tu tunenî.

Zerî, domam,  
Bi ken, henek,  
Qelfe-qelfe,  
Dibuhurin,  
Te nabînim,  
Tu tunenî.

Şayî, şîna,  
Dîlan, cejna,  
Nav meclîsa,  
Dinihêrim,  
Te nabînim,  
Tu tunenî.

Devra, hundur,  
Nav xasbaxça,  
Seyran, geştâ,  
Dinihêrim,  
Te nabînim,  
Tu tunenî.

Na, Na!  
Ezî şaşim,  
Tu heyî,  
Heyî,  
Heyî.

Nava dilê min da,  
Ruhê min da,  
Hişê min da,  
Tu heyî.

Nava zarên min da,  
Lêvên min da,  
Çavên min da,  
Tu heyî.

Nava şevên min da,  
Rojên min da,  
Xewên min da,  
Tu heyî.

Nava emrê min da,  
Mala min da,  
Şêwra min da,  
Tu heyî.

Nava helbestên min da,  
Kelmêd min da,  
Gotinêd minda,  
Tu heyî.

Nava sebra min da,  
Rengên min da,  
Şayên min da,  
Tu heyî.

Kuda herim,  
Ku bigerim,  
Pêş çavên min,  
Tenê tuyî.  
Te digerim,

Te dibînim,  
Vê dinê da,  
Heta hebim.  
Boynet min,  
Tu heyî,  
Heyî,  
Heyî.

## WERE, WERE, HÎVYA TE ME, EZ HÎVYA TE

Xasbaxçên ter quloz dibe misk û ember,  
Qelfe-qelfe dibuhurin dotên esmer,  
Te nabînim, şîv, paşîvêm bûne keser,  
Were, were, hîvya te me, ez hîvya te.

Bilbil, quling tew hatine îdî ji dûr,  
Qaz û werdek dişûlşilin nav avên kûr,  
Bê te halêm pir xirabe, çavêm bê nûr,  
Were, were, hîvya teme, ez hîvya te.

Guhê minda dengê te tê, çavêm rêda,  
Wek te bedew ez nabînim li tu erda,  
Mêvan ware, min xilaske xema, derda,  
Were, were, hîvya teme, ez hîvya te.

Bahar hatye, xemilîne deşt û beyar,  
Sosin, rihan sîngê çîya bûne cînar,  
Te navînim, dil-hinavêm îdî helyan,  
Were, were, hîvya teme, ez hîvya te.

Ez bigorî, heta hebim rûyê dinê,  
Rind navê te ser zarên min nayê kirnê,  
Ezê bêjim, bilûvînim, te gazî kim,  
Çavên belek, him valakim, him tijîkim.

Barê xema ezê timê bikişînim,  
Ji te pêştir, tu nazika nahebînim,  
Felek mera xayîn derket, hev qetîyan,  
Elî, Anar mane bê dê, zeryan, giryan.

Merzelê te ezê daynim xam beyara,  
Çarhewardor biniqînim kûlîlk, dara,  
Ez sond duxum te bîrnakim emrê xuda,

Bê te îdî kasil bûye ewa dila.

Xwezil carkê bihatayî kaw, binbarek,  
Ser dilê min te bihîştî dîsa rêçek,  
Mirazê me hasil bûya nolî berê,  
Rebbê jorîn me vekira dergê xêrê,  
Were, were, hîvya teme...  
Hîvya teme, ez hîvya te...

## **DÎLBER CANÊ** **(kilam)**

Mala danî, kon vegirtin,  
Bûka çîr û perde girtin,  
Dîlber xwekir al, geveze,  
Kilê subhan danî teze.

### **Negaret**

Dîlber, Dîlber, Dîlber canê,  
Tu kulîlka Kurdistanê.  
Carek bibe min mêvanê,  
Rabe, rûne, ez heyranê.

Tav zeriqî, berf helîya,  
Keçik çûne ser kanîya,  
Dîlber rûnişt ber neynûkê,  
Zêr rêzkerin ser netikê.

### **Negaret**

Dîlber, Dîlber, Dîlber canê,  
Tu kulîlka Kurdistanê.  
Carek bibe min mêvanê,  
Rabe, rûne, ez heyranê.

Zerî-domam ketin rêzê,  
Dîlber meşya xwe da fêzê,  
Govend gerya nava zomê,  
Dîlbera min rewş da komê.

### **Negaret**

Dîlber, Dîlber, Dîlber canê,  
Carek ware min mêvanê,  
Hub kal nabe hemû sala,  
Te bîrnake Barîyê Bala.

## ÎDÎ RABE

Rabe, ezîza min, biweklîne vêxistina tu şemdanê,  
Emir aza, em bextewar, bi tevayî mêze bikin Kurdistanê.  
Rabe, sosina min, nefis dudune, lê qelbê me tev lêdide,  
Deme, ji xasbaxçê Mem û Zînê baqê gulê al tu hilde.  
Rabe, tamam qurna hevtangê min û te hemû zeryan,  
Bestê Mîksê gul çilmisîn ji av û hêsrê Feqîyê Teyran.  
Rabe, kevotka min, emir diçe, kuta dibe halê pejmûr,  
Heta kengê ji çavê reş berjêr bibin tim hêsrên hûr.  
Rabe, bese razêy, were em cîkî li Kerkûkê bikin mêze,  
Çîya û banîyê Kurdistanê topkin baqê gulên teze.  
Rabe, rabe mizgîn heye, min û te pîroz dike tamam dinê,  
Em jî herin, bi tevayî pîroz bikin azayîhez Kurdistanê.

## ÎŞEV DÎSA TU KETIYÎ BÎRA MÎN DA

Şevê dirêj, xew nakeve çavê min da,  
Dişewitîm nav mitalê kûr-agirda.  
Te digirim nav bajara, hemû gunda,  
Te nabînim, tu tunenî, bûyî unda.

Nav govenda, li dîlana te digirim,  
Xasbaxçê ter, qûmistana te digirim,  
Koşk û sehra, dibistana te digirim,  
Te nabînim, tu tunenî, kuda herim.

Ser kanîya, dora çema, terrazuna,  
Cem domama, bal bedewa, zend bazina,  
Seyrangeha, li cem dayka, pîre jina,  
Te nabînim, te pirs dikim çûk-mezina.

Şaxêd gelya, daristana te pirs dikim,  
Zer-zinara, gulistana te pirs dikim,  
Keç û xorta, qelfê zerya te pirs dikim,  
Te nabînim, dîtî tune, ez çi bikim.

Lihef bûze, nivîn derzî, balgê kevir,  
Halêm digrîn hîva sê şev, stêrk û ewir,  
Dest nîyêd min bûne çoçil, bûne tevir,  
Însaf bike, nêzîk dibe sîba gewir,  
Heta hebim, ezê time te bigirim,  
Ez tu cara, tu bedewê te naguherim.

## DELALA MÎN, BESE RAZÊY, ÎDÎ RABE

Şeva dirêj xilaz bûye,  
Royê îdî penc vedaye,  
Zerya xemla xwe hildaye,  
Dilê bengî hîvya teye.  
Rabe, rabe, delal rabe,  
Biska şeke, çeva kilke,  
Min heyrana, huba xwe ke,  
Min heyrana, huba xwe ke.

Kew-bilbila nav mêrganî,  
Al sorgula xasbaxçanî,  
Dil û hinav, ruhî, canî,  
Xwedê şandî, para minî.  
Rabe, rabe, delal rabe,  
Biska şeke, çeva kilke,  
Min heyrana, huba xwe ke,  
Min heyrana, huba xwe ke.

Tarihana dev gelyanî,  
Sosin gula baxê minî,  
Tîr şerbeta ser lêvanî,  
Temî, lemî, zar-zimanî.  
Rabe, rabe, delal rabe,  
Biska şeke, çeva kilke,  
Min heyrana, huba xwe ke,  
Min heyrana, huba xwe ke.

## TE DİGERİM, EZ HEYRAN

Gav, sehet û her dem,  
Sal, zeman û pir xem,  
Roj, meh, her dewran,  
Dilekî kilî-kovan,  
Te digirim, ez heyran.

Nergîz, sosin û rihan,  
Çîya, banî, deşt, zozan,  
Şihedin ba û baran,  
Serê rîya û dirban,  
Te digirim, ez heyran.

Zer û zinar, tew orman,  
Kevir, kuçik, merg, çîman,  
Şihedin ewir, ezman,  
Ser kanîyan, nav baxçan,  
Te digirim, ez heyran.

Li cem keçan û xortan,  
Nava gelî û kortan,  
Sîngê çîya, nav zaxan  
Şihedin şivan, berxvan,  
Te digirim, ez heyran.

Ji mesîyê nav avan,  
Bal şivanê li çîyan,  
Nav pêşmerge, gêrîlan,  
Cem şêra û pilingan,  
Te digirim, ez heyran.

Li cem hîvê û sêrkan,  
Bal çivîkên hêlînan,  
Hemû teyrik û tûyan,

Nava baxçê gulistan,  
Te digirim, ez heyran.

Nava çîla-bedewan,  
Hemû bajar û gundan,  
Bahar, payîz, zivistan,  
Şihedin çol-çolistan,  
Te digirim, ez heyran.

Xwezil, ova û zoman,  
Nava çîya, banyan,  
Tevî sîyar û peyan,  
Li ser axa kal-bavan,  
Tu bidîtayî, ez heyran.

## RINDÏKA MÏN, BÊY TE BAHAR ÇI MÏN RA NE

Rihan mêrga bûne bengî,  
Tev xemilîn hezar rengî,  
Bahar hatye, kirin dengî,  
Bêy te bahar çi min ra ne.

Bila vebin belgên dara,  
Xemil dayne best, beyara,  
Xew şîrînbin paxlê yara,  
Bêy te paxl çi min ra ne.

Avên zelal bikin guş-guş,  
Govend bigrin her qal û qirş,  
Sosin gula bikin alqîş,  
Bêy te sosin çi min ra ne.

Xezal û kar tev bimikin,  
Kewêd lingsor hêlîn çêkin,  
Hemû ruhber libas xwekin,  
Bêy te libas çi min ra ne.

Bila şênbin pir milk û war,  
Bixemilin zer û zinar,  
Hevdu şabin maşoq û yar,  
Bêy te şabûn çi min ra ne.

Quling daynin terazuna,  
Keskesor bide ser zozana,  
Xort gazîkin zend bazina,  
Bêy te zozan çi min ra ne.

Keçik herin bin darûka,  
Xêlya daynin serê bûka,  
Şayî têkev nava çûka,

Bêy te şayî çî min ra ne.

Sazbend pêçya bilivtînin,  
Têlê tembûr bileqînin,  
Dilê bengî bihelînin,  
Bêy te tembûr çî min ra ne.

Mal tijî bin wek xeznêd kûr,  
Dinya bibe tew gul û nûr,  
Hevdu maçkin nêzîk û dûr,  
Bêy te xezne çî min ra ne.

Sosin, rihan bibin cînar,  
Ji xew rabin merx û çînar,  
Dar fêkîya têkin hewar,  
Bêy te fêkî çî min ra ne.

Tew bişxulin boy xêrane,  
Xeydî bibin xûşk, birane,  
Li min nebî tu mêvane,  
Bêy te mêvan çî min ra ne.

Ser kevira kolîlk vebin,  
Xem û keder hemû rabin.  
Tew hezkirî hevdu şabin,  
Bêy te kolîlk çî min ra ne.

Zîvger dîsa çêkin kenber,  
Ji dêma bên misk û enber,  
Keç bimeşin, him zo, him fer,  
Bêy te lel-dur çî min ra ne.

Hev hezkirî cot bimeşin,  
Xilaz bibin rojêd reşin,  
Zozan bibin eşq û geşin,  
Eşqa bey te çî min ra ne.

Jiyan ketye roja zalê,  
Qamet eynê resmê dalê,  
Ez nexwaşê hub, kemalê,  
Huba bêy te çi min ra ne.

Hîvya te me her gav, her dem,  
Barên minin keder û xem,  
Eger nekî li min kerem,  
Bêy te jîne çi min ra ne.

Heta dergê min venekî,  
Xemê dilê me bela mekî,  
Muhbeta me pêroz mekin,  
Bêy te bahar çi min ra ne.

## DÎL-MÎTHEYRÊ HUBA TE ME

Bahar hatye, best-beyara vebûne gul,  
Ji xasbaxça bilind dibê dengê bilbil.  
Te nabînim, dil-hinavê tew bûne kul,  
Sebir nema, te digirim, her gav, ez te.  
Dîl-mitheyreê huba te me, ez huba te.

Bahar hatye, mak çê dîkin nûh hêlîna,  
Hemû bînber hişyar bûne ji xewistana,  
Te nabînim, tev zerîya, nav dîlana,  
Te digirim, te digirim, her gav li te,  
Were, ezî hîvya te me, tim hîvya te.

Bahar hatye, xemilîye rewşa dinê,  
Derê veke, tê bibînim te xanimê,  
Min xilazke ji ezabê dûrketinê,  
Te digirim, te digirim, her gav li te,  
Dîl-mitheyreê huba te me, ez huba te.

Bahar hatye, rojê bûne tel û sare,  
Destê nagrin şuxul, emel, ne jî kare,  
Berîya gotîye: “Hub kal nabe, qet namire”.  
Were, ezî hîvya te me, tim hîvya te.  
Dîl-mitheyreê huba te me, ez huba te.

## DÎLBERA XWE DÎGERÎM

Zozanêd rewş, banêd bilind, we Dîlberam ne dîtîye?  
Geliyêd xemil, şaxêd bin av, we Dîlberam ne dîtîye?  
Çavêd min rêqerimîne, dikewgire dil bê wêye,  
Rica dikim, we dîtîne, bêjin bila îdî bêye.

Daristanêd fêkîye-rez, mêrg-zîmanêd mexmer-etlez,  
Necîrvanêd dû nêcîra xwe digerin gelekî lez.  
Karxezalêd save, şîrmij, we Dîlbera min dîtîne,  
Bêjin bila îdî were, em tev herine Kurdistanê.

Kanîyêd zelal, cemêd gorav, hûn demekê min sihbikin,  
Şkevted tarî, zerêd guve, bê rica min qebûl bikin.  
Sosin, rihan, nergîz, sorgul, qaçek hevra hûn qal bikin,  
We Dîlbera min gîtîne, hemêza xwe berwê vekin.

Kevir, kukik, tehtêt bê ruh, ruhber bibin, ji xew rabin,  
Dûmana car, ewrêd tijî, cî bileqin, hinek ba bin.  
Royê tu roj, hîvê tu şev, ser stêrkno pîr nefîrin,  
Rica dikim, mesekinin, tew Dîlbera min bigerin.

Behrêd bê bin, cemêd revok, gul, cewikêd tenîşke, kûr,  
Deştêd fire, berwar, beroj, çep-kortîne nêzîke-dûr.  
Rê-dirbikêd raste, xare, miraz heza pîr bi îtbar,  
Hûn Dîlbera min bibînin, pêş we ezê xwe bikim xar.

Teyrêd baze mêrxasê şax, hinek jor da mêze bikin,  
Bilbilêd geş, kewêd nexşîn, li ezmana perwaz bikin.  
Teyrik-tûyêd serhelîna, îdî rabin, baska vekin,  
Hûn Dîlbera min bigerin, dilê hejar poşman mekin.

Şivanê eşq, mêy-bilûra hinekî zîz, bilind lêxin,  
Berxvanêd şa, berx û kara ji dor zoma hinek dûrxin.  
Daykêd kedhez, keç-xanima berqeloka bilez rêxin,

Hûn Dîlbera min bibînin, jan û êşa dilêm derxin.

Gezgezk, sîrik, pêçok, goştbek, peckêd ruvî, himenî, gereng,  
Cetrî, siping, tırşo, merwend, neqasina virnî, kewren,  
Tel tûzika dor kanîya, zîlê jê ra belekîya,  
Tew Dîlbra min bigerin, li min mekin, tun menîya.

Tebîeta xedare hur, em ji hevdu kirine dûre,  
Sal tîn, diçin, ez kal dibim, emir şîrîn dibuhure.  
Ez dinalim, hûn şa dibin, çima tev min nakêlimin?  
Bê rica min qebûl nakin, halê min da na elimin.

Dinya fire tim wa nabe, deme gelek mitalekin,  
Hene gavêd tele-şîrîn, çav, guhêd xwe piçek vekin.  
Rica dikim, kasil nebin, tim Dîlbera min bigerin  
Bibî dost û hogirêd min, rîya xwe ser min ne guherin.

Ez nizanim, kê bide min, bersiveke eşq-şîrîne,  
Gelo kîyê bê hesretê sefîl dilê min derîne.  
Kuda herim, ku bigerim, îtîmasê ji kê bikim,  
Çara ewe, dileka xwe tenê rebbê jorîn bikim.

## DAYÎK, TU TENÊ JÎ XWEDÊ PIÇÛKTIRÎ

*Rewayî dayka xweye pir emekdar û ewledhez Qaza Evdoyê Bişo dikim.*

Qasidê Xwedê, qîmetekî gelek mezin te ra daye,  
Tim gotîye: “Cinneta heq, binê pîyê dayka teye”.  
Gelek zana, pir maqûla, kî bûna te nas kirine,  
Pêş te timê duqat bûne, pesin, metih rêz kirine.  
Dûhatîkî ewan kesa, roja îro yek jî ezim,  
Boy huba te qelema xwe dimeşînim, qet ne lezim.  
Heta niha şerefa te çi gotine, ne hindikin,  
Nêtam ewe hinekî jî li ser wana zêde bikim.  
Dilê paqîş, culqetê şêr, te nav dikim, dinya-alem.  
Bawer nakim, gotnên min ra razî nebin dost û qelem.  
Himberî te zehf tenîskin çem, okêan, tew derîya,  
Pir bilindî, ji gûzika te nizimtirin hemû çîya.  
Zanê dinê tew bibin yek, tu ji wana zanetirî,  
Xeznê dinê hemû kombin, tu ji wana zengîntirî.  
Hemêza te ji dinyayê mezintire, him germtire,  
Boy eşqa te, him ro, him hîv, tîrêjên xwe didin dere.  
Xwedê ji te muqedestir ne xuluqand tu zyaret,  
Ewlîyayî, bê lekeyî, despê dibe ji te heyat.  
Ruh û canî, qewet-sebrî, nûra çeva, ziman-zarî,  
Kana emir, bext-mirazî, rastî hezî, ne çep-xarî.  
Tore hezî, emekdarî, egîtayî rewşa teye,  
Her ewladek dil û hinav, gir parçekî canê teye.  
Ewa dinya te xuluqand, tu tunenî, ew tunene,  
Tu ku heyî, boy mervayê çi pêvîstin, hemû hene.  
Lel-cewahir pêş te çine, tu ji wana gîmettirî,  
Weke royê şemal didî, hîva hilî tu rintirî.  
Kes nikare wek te bibe, qet ne bûne, wê nebin jî,  
Rebbê jorîn daye te da ev xezina tîre-tijî.  
Tu - welatî, welat - tuyî, hûn ji hevdu nabin cuda,  
Qîret, namûs cî-war bûne, time nava şîrê te da.

Dayka delal, şame, wekî tamareke dilê te me,  
Ku bimînim, kuda herim, te bîrnakim, lawê te me.  
Sed heyf, sed heyf, hinek şîrê te dimêjin, dibin dîn-har,  
Dinya fire li wan teng tê, kafkûn dikin, dibin xwînxwar.  
Paşê, roja wana dibe hepsên tarî, zindanê sar,  
Rezîl dibin, wek zilekî, ji vê dine dikin firar.  
Pêş tirba te duqat dibim, tewaf dikim ax-kevrên te,  
Heta hebim – dîlê te me, pêpez nakim ez şîrê te.

## DAYÎK

Behra kûrî boy ewleda,  
Kanya emir berê-berda.  
Xemil-rewşî, heya minî,  
Dev û lêvî, zar-zimanî.  
Wek te mezin kes tunene,  
Wek te şîrîn tişt tunene,  
Bînber hemû te xulqandin,  
Şîrê sipî te mêjandin.  
Xewêd şîrîn te nedîtin,  
Êşêd giran te pir dîtin.  
Pêş tu kesa netewyayî,  
Ça xuliqî, usa mayî.  
Namûs, xîret, bûn tacê te,  
Welat, lorik, bûn heya te.  
Tu egîtî, emekdarî,  
Zaneyî, terbyedarî.  
Sazbend, dengbêj, helbestvanî,  
Maqûl, hakim, dinya zanî.  
Tu hebûnî, dayka delal,  
Bê te tune, aqîl, kemal.  
Qulba minî, dil-hinavî,  
Tu rindikî, pir bedewî.  
Wek huba te derman tune,  
Wek sîngê te hêlîn tune,  
Ji bo welat tu qalkêşî,  
Sî û sitar, mertalkêşî.  
Qinyat-sebrî, timê lêva,  
Şewq-şemalî boy herd çeva.  
Te naguherim temam dinê,  
Heta hebim ez vê dinê.  
Ezê emrê xwe bidim boy te,  
Duqat bibim timê ber te.

## DİLÊ DÊ

Tim dikelî nolî ava germe zelal,  
Tu reş dibî, dixitimî, ça ewrêd lal,  
Zû şa dibî, firnaq dibî, tev rast-helal,  
Tenê ji min gelek dûrî, tu, dilê dê...

Kûr-mezinî, xwastinêd te tim bê hûde,  
Tu bê qamî, bê delavî, him bê qayde,  
Dilûvînî, diqalînî, kêra fayde,  
Geh agirî, geh jî nûrî, tu, dilê dê...

Geh dibî şêr, geh xezalî, geh jî piling,  
Him gezgezkî, him rihanî, him jî gereng,  
Geh egîtî, ser sînora mil da tifing,  
Çemê gurî, behra kûrî, tu, dilê dê...

Bîn û sebre, qinyat-emre, te ra ewlad,  
Him loxmanî, şêwirdarî, him jî hedad,  
Şewq-şemalî, nûr-kemalî, didî heyat,  
Kan-xezneyî, gul-sosinî, tu, dilê dê...

**DAYKA MÎNE PÎR KEDHEZRA**  
*(bi curê motîva pê şabûn û pir jê hezkirinê)*

Bijî, bijî, dayka min,  
Têr-tijîbî, dayka min.  
Xarina me zû çêke,  
Ez birçîme, dayka min.

Kuçka dayne lez û bez,  
Bîne hinek darêd gez.  
Binav bavêj beroşê,  
Deyax nakim, îdî ez.

Hatî malda hêçka, nû,  
Agrê te qet nake dû.  
Ev xeysetê teyî “baş”,  
Em kirine nîk û mû.

Pir hezdikin cînar te,  
Bilind digrin qedrê te.  
Boy xizmetêd teye qenc,  
Me dibin jor seva te.

Bavê minî zor hemde,  
Runîştîye tim cem te.  
Xeysetê xwe neguhezî,  
Ezê bêjim te berde.

## TE HEZDİKİM, KEÇA DELAL

Tu ne Şamî, ez ne Pervan,  
Bişewitim ber agirê te.  
Tu ne gulî, ez ne gulvan,  
Fitol bidim tim dora te.

Tu ne zerî, ez ne zinar,  
Rewşê bidim hebûna te.  
Tu ne sêvî, ne jî hinar,  
Bax-bostana bigerim te...

Tu dayîkî, pir emekdar,  
Egît-şêrî, him xunedar.  
Alim, loxman, dinê zanî,  
Şaîr, dengbêj, palewanî.

Te hezdikim, keça delal,  
Silava min şirîn vegre.  
Çavê belek bê kil rindin,  
Dê mê bedew pêş min negre...

Ez mêzekim xal û xeta,  
Te nazika, gerden berfîn.  
Dilê bengî bila şa be,  
Ji eşqa te têke îskîn...

## HÊY BÊ ÎTBAR!..

Min tu dîtî, xemê m bûne kulûr û kan,  
Dil ricifî, çok lerizîn, hejya ziman,  
Beden sist bû, çav şêlû bûn, şıdyan diran,  
Xeberê sar, awirê tûj seba çi ne?  
Min nikarî bavê m gavek, seba çi ne?

Zar şirînî, dil kevirî, tim bê îtbar,  
Hub firoşî, bê wefayî, him jî xedar,  
Bêje çima, te bîrkin qewl-qırar?  
Gunekarî, efû ne xastin seba çîye?  
Efû ne xastin bo carek seba çîye?

Min tu dîtî, xast bikevim ken-heneka,  
Dîsa herim ser kanîya, nav kulîlka,  
Maçkim lêva, pozê xizê m û şirika,  
Guhastina çavê belek seba çine?

## PÎR BEDEWA EZ HELANDÎM

Pir bedewa ez helandim, lê te dilê m kire kere,  
Zor bedewî, bejin-bala te heykelê sîm û zere.  
Huslê Xecê li cem teye, sewdeserim ji hêwetê,  
Burû qeytan, çavê belek, fîno, qotik bedew te tê.  
Lêve zirav, pozî pîjîn, ez mitheyrê dev-dirana,  
Min himberî te kê m gul dît, xemlê bide gulistana.  
Enya kever, dêmê alav, ew xal û xet kê danîne?  
Gerden sema, keç sûretê te hêjîrê şengalîne.  
Reş kezyên te berjêr bûne, ça şivêta tîre mera,  
Wek te nazik, him nazenîn, min nedîtin li tu dera.  
Zarê şîrîn, meşa cindî, te ji rinda dîkin cuda,  
Xaliq-alem neqîşandî, nazil kirî boy min jor da.  
Memê Alan, şêr Sîyabend, boy huba te bûne feda,  
Gelek ser te bûne bengî, helyan, maşyan te caw neda.  
Tu paqîşî, bê lekeyî, ava zelal zelaltirî,  
Hurya qesra cînnetêyî, hemû rinda tu rindtirî.  
Heta nika kole bûyî, gelê dine tu nedîtî,  
Şikir îdî bûyî aza, bextewarî, fireqetî.  
Ew kulîlke gelek bîhne, axa xwe da reh avîtye.  
Ew bedewe pir bedewe, şîrê dayka egît mêteye.  
Ew kanîya av tê dizê, time dibe tijî ave,  
Pêşiya gotîye: “Av kirinva, bîr tu cara tijî nabe”.  
Ez ji te ra Leyl nabêjim, esil Eysî, yan jî Zînî,  
Tu ewlada Medya kalî, resimkêşê teye Xanî.  
Herîr pêş te temenne bû, qelem hilda zor da pesna,  
Tu bû sebeb, zer û zinar giryan tevî Feqîyê Teyra.  
Tu boy Melle heqîqet bûy, lê dewranê kirî mecaz,  
Resmê bedew quloz kirye ji pir dila zarî, awaz.  
Kanî tembûr, zûbke bîne, ez têlê wî bihejînim,  
Şewq-şemala te mêzekim, ji dilê kal bilîlînim.  
Eşqa hubê, zêr qelemê ser kaxeta bibim-bînim,  
Huslê bedew li ser dilê xweyî ahil bineqşînim.

## HA WER-WERE

(Bi curê gel)

Delal, canê, xema meke, xem ne xweşe,  
Dilê bengî şaşî-faşe,  
Felek xayîne, bextî reşe,  
Ha wer-were, dînam were,  
Ca wer-were, delal were.

Delal, canê, min gul heband baxê weda,  
Germ havînê şextê lêda,  
Dil şewitî pêda-pêda,  
Ha wer-were, dînam were,  
Ca wer-were, delal were.

Delal, canê, tu kevotka per hêşînî,  
Maşoq dila dihelînî,  
Min feqîrî gund-bajara digerînî.  
Ha wer-were, dînam were,  
Ca wer-were, delal were.

## AXÎR EZ TE HEZ DİKÎM

Biska timê tu şe bike,  
Buryê qeytan tim kil bike,  
Dilê bengî tim tu şake,  
Axir ez te, hez dikim...

Hûrik-hûrik tu bimeşe,  
Dêmî bedew, bengî xweşe,  
Dil mitheyrê çavê reşe,  
Axir ez te, hez dikim...

Cot hinara veneşêre,  
Lêvêd şekir dûr nexêre,  
Bikirçîme, ne buhure,  
Axir ez te, hez dikim...

## KÎLAMA LÎRÎKÎ

Keça rindê, bejn bilindê,  
Te hez dikim, zerya gundê.  
Hûrik-hûrik tu bimeşe,  
Dilê bengî bike xaşe.  
Gulya rêz ke, berde jêre,  
Hezkiryê te Kurdê şêre.

Keça metê, dilêm ketê,  
Te hez dikim, şerîetê.  
Bejna tîtal mehejîne,  
Dil-hinavêm nehelîne.  
Ji huba te nabim têre,  
Hezkiryê te hafat mêre.

Keça başê, birî reşê,  
Te hez dikim, nebê paşê.  
Tor-xizêma cî war bike,  
Fîno dayne, biska şeke.  
Pê-parê te bînin xêre,  
Hezkiryê te egît-şêre.

## DOMAMA KURD

Domama Kurd, dilê min da hinberê te tune ne,  
Tu sosina xasbaxçanî, bey te bahar tune ne.  
Rebbê jorîn ji xezna xwe pir bedewî daye te,  
Dilê te da boy min dîlî hub-hezkirin tune ne.

Dêmê nazik, nefsa min ra pêşkêş anî keder-xem,  
Bûme bengî, çikarene pêş huba min behr û çem.  
Gelo çima min direvî, min dûr diçî tu her dem?  
Ruh û canî, axir bêy te, sebir boy min tune ne.

Hezkirina min paqîşe, tê da leke tunene,  
Şev-rojêd min bûne tel-sar, xewa şirîn tune ne,  
Pêş huba me kaş û kerîş, zer û zinar ne mane,  
Însaf bike, sebir-tawet îdî boy min ne mane.

Rica dikim, nav emir da qet nebe tu carekê,  
Bi sidqê sax, ji destê min bigre tenê gulekê.  
Bila roja dil-xatira ez nenalim pir xedar,  
Dilê rihet, êwir bigrim ser êwira qebra sar.

## TU LEL, DURRÎ, KEÇA KURD

Tu lel, durrî,  
Agrê gurî,  
Gerden gazî,  
Sedef sazî,  
Timê boy min...

Xec û Zînî,  
Eyş xatûnî,  
Hêjîr, merxî,  
Xezal, berxî,  
Timê boy min...

Sûret sorî,  
Xeyset horî,  
Dêm alavî,  
Tew gulavî,  
Timê boy min...

Hinar, sêvî,  
Ro û hîvî,  
Nevat lêvî,  
Şîrîn devî,  
Timê boy min...

## BÎLBÎL

Diqalînî, dilûvînî, min dihelin dil û ceger,  
Pir wedeye nazik yarê min ra nayên caw û xeber.  
Bahar jî hat, deştê vala, darên tezî girtin rewşe,  
Kewa bedew dor zinara qibe-qibe lewzê xwaşe.

Bilbilê rind, miskanê te xasbaxçê ter, pir gulêd al,  
Qismetê min huba erzan, bi hezara xem û xeyal.  
Emir diçe, por sipî bû, dilê bengî qet naweste,  
Xwezil îcar seva yarê bifiryama ez jî tev te...

Bilbil, îdî, tu azayî, ez hejarim, him tengezar,  
Qamet xar bû, qudûm nema, dil ji hubê ne bû bêzar.  
Ezî bengî, ew bê însaf, param ne bû huba helal,  
Îdî bese, tu jî tev min, timê bikî wa qale-qal...

Tu dizêrî, ezî zû da birîndarim, him jî bengî,  
Ezî lalim, tu nawestî, li alemê dikî dengî.  
Beden helya, çav şêlû bûn, derbaz dibin pir roj û sal,  
Bêje yarê, ser tirba min bila bike tim nale-nal...

## HUBA ME

Min û te,  
Ser kanîyê,  
Bin dara merxê,  
Dîsa hevdu dî.  
Dar hişyar bû,  
Gulte, gulte,  
Ser meda daxist sî,  
Ji huba me,  
Şelên bûzê,  
Ew dem helîyan,  
Avên zelal kirin hewar,  
Bilbil şa bûn terazuna,  
Pir xemilîn best û beyar.  
Sorgul rabûn ketin rêzê,  
Qaz-qulinga xwe dan fêzê,  
Xezal mêrga bûne bengî,  
Kewa kakand hezar rengî,  
Şewqê danî taristana,  
Karger derket bax-bostana,  
Şivîn kerî dîsa berda,  
Li berxvana kire qîrîn.  
Leglegê baskê xwe lêda,  
Çem û kanya kirin xûşîn.  
Me helalî,  
Da hevdu da,  
Qewl, qîrar,  
Huba me ra xastî şa bûn,  
Pejmûrde bûn edû-neyar.  
Sebeb çi bû, kîjan qelsî,  
Tu ji hubê kirî bêzar?  
Ez bûm bengî, tu bê îtbar,  
Dilê minda te tim danî,  
Agirekî gurî, xedar...

## DÎNYA, TU ÇÎQAS ŞÎRÎNÎ

Mêrg û çîman, deşt û zozan eger bibin cîwarên min,  
Xasbaxçê ter, qesrê fire bibin war û diyarên min,  
Emir bikim hezar salî, timê bijîm bi dilê şa,  
Ji resmê te ez têr nabim, tu şîrînî her gav, Dinya.

Zor Îskender, Guhderz, Rustem hemû bêne temenna min,  
Mem tev Zînê, Xec tev Eysê mêvan bêne meclîsa min,  
Erşê bilind kursî daynim, wira bikim kêf û şaya,  
Ji huba te ez têr nabim, tu ji min ra dêyî, Dinya.

Feqyê delal ji goristîn tenbûra xwe boy min bîne,  
Xanyê mezin çend zimana şîrîn-şîrîn biqalîne,  
Xêynî benda, qulix bikin, wekî pêş min mesyê behra,  
Dayîna te ez têr nabim, bûka rewşî her tim, Dinya.

Bi kulûra şêr û şembaz cî bûne nav paxîla te,  
Hemû bînber cem te yekin, tu ji wan ra dêyî, Dinya,  
Ez jî ruhber, ewladê te, ji min meke tu gazina,  
Ka kê evdî got îdî bes, hemêza te zû çû, Dinya?

## DÎNYA

Alîk şîne, alîk şayî,  
Alîk tarî, yek ronayî,  
Alîk baye, alîk baran,  
Alîk berfe, alîk tofan.  
Alîk baxe, sosin navda,  
Alîk şere, qetil têda.  
Alîk koşkin, birçên belek,  
Alîk çerxe, alîk felek.  
Hinek têne rûyê dinê,  
Hinek diçin ber mirinê.  
Hinek têt-têt direqisin,  
Hinek zû-zû diçilmisin.  
Waye hukmê tebîyetê,  
Însan dilê heqîqetê.  
Timê waye eva dinya,  
Zindî diçin rîya mirya.  
Emrê çûyî venagere,  
Bext ku raza, jê vegere.  
Ewled nes bû, dû bigere,  
Jin xirab bû, ber negere.  
Xwînreja ra nebe perde,  
Bê welatî kul û derde.  
Kê ku heye aqil-kemal,  
Dibe xwedan dewlet û mal.  
Kê ku tune hiş-feraset,  
Timê dibe ew elawet.  
Geh batile, geh qatile,  
Geh zahire, geh cahile.  
Sêr-xezneye, tev da dinya,  
Sêr-xezneye, tev da dinya.

## EWLED

Behra kûre, çemê gure, kana zengîn,  
Dara reze, alîk tele, alîk şîrîn.  
Tacê zêre, fexra dine, gula bîne,  
Fesla nûhe, geh bahare, geh havîne.

Tem û leme, taqet-rewşa dê-bavane,  
Him kubarî, him ronaya herd çavane.  
Tawet-sebre, xemil-debre, emrê şaye,  
Per û baske, qam-qinyatê mil-çokaye.

Şewa bêxew, kêra tûje, derdê giran,  
Mereza dil, agir, alav, him jî tofan.  
Gêdûka sar, tavya hare, êşa diran,  
Edû nevse, tev da jehre, nabî xudan.

Xeber piçûk, li boy zana gelek baha,  
Êşa ewled pire, ji êşa hemû eza.  
Sî salyê da min undakir yek ewledek,  
Por sipî bû, dilêm qetya yek tamarek.

Bavim, hemû bava dikim hîvî, reca,  
Sulhê hizkin, neyê dengê top û gulla,  
Bila ewled qet nemînin bê bav, bê dê,  
Ezman negrî, xwîn hilnede rûyê dinê...

## REBBÊ JORÎN

Kê dişînî paşda nayên, tu car, tu wext,  
Ware rehmê, me maya ra tu bide bext.  
Me neşîne ber dergayê qet tu kesî,  
Meke hewcê parî nanê hişkî, tisî.  
Esilzada meke dîlê tu bedesla,  
Berf-teyrokê nebarîne hemû fesla.  
Dê û dota suxar meke, mezêrîne,  
Tew mirazê mirazheza biqedîne.  
Kûr gelîya nehedmîne, nebin çelik,  
Berxa şîrmij meke xurê gurê gewrik.  
Behrên bê bin tu car meke golegenî,  
Cewik bila çema mekin tinaz, şenî.  
Peya sîyar, sîyar tu car nebin peya,  
Rûyê erdê bila hebe abûr-heya.  
Law dê-bava navêjin nav kolan, besta.  
Bûk xesûya mekutin pê dara, desta.  
Piçûk timê rêzdar bibin pêş mezina,  
Bimrin mêrê ser gotina «eslan» jina.  
Dot xweyîkin erf-edetê bav û kala,  
Xort lezkevin, wedê xwe da bibin zava.  
Beranê kol, beranê kel heyîfê hilde.  
Her gunekar boy gunê xwe bersîv bide.  
Bêşerefa pir har meke, nebe jorê,  
Maqûl-zana hejar meke, nebe jêrê.  
Zer-zinara cî raneke, nebin piçik,  
Koşk û sehra kafkûn meke, nebin quncik.  
Şêr-şêpala meke dîlê delkbaz rûvya,  
Mele, dûpişk emir nekin li ser zîya.  
Risq-ruzayê kê çiqase, ewî bide,  
Halê bende hîn be, paşê kolê lêde.  
Hêlîn-wara bê wext meke tu tûrtevez,  
Xwînreja pir mehez meke, nebêjin ez.  
Keda evda tenê têke qismetê wan,

Were rehmê, bila şa bin pîr, kal û can.  
Hev hezkîrya hev dîr meke, mekin zêrîn,  
Hişka terke, boy behra xwe mekin zûkîn.  
Sêfîl-sêwya bê par, bê war qet mehêle,  
Boy hemûya merhemetê wek bihêle.  
Erş û kursî te xuluqand, bê şert, şîrût,  
Bînbera ra te anîye av, hewa, qût.  
Axê hilde zelûlîyê, qetil, xwînê,  
Xwîn xwar qutke, bixemile tamam dinê.

## REBBÊ JORÎN, YA TU ZANÎ, KES NÎZANE

Roja, meha tu dikî sal, sal qut dibin şayî, girîn,  
Dikî xwelî baş-bedewê him nazike, him nazenîn.  
Berf, teyrokê dibarînî, bahar dibin sar zivistan,  
Bi hukmê te tofan dibe, dilerize erd û ezman.  
Xirab dikî, ava dikî, ya tu zanî, kes nizane.

Berên bê bin dimiçqînî, dewşê dikî gelî, gepor,  
Qûmistana dixulqînî hezar-hezar kulîlkên sor.  
Qijikê ra sêsid salî emir didî, dibe bêzar,  
Karxezala cindî, save dikî xurê tu gorê har.  
Dixulqînî, dixenqînî, ya tu zanî, kes nizane.

Geh hêrs dibî, ber agirê te dişewitin deşt û zozan,  
Geh tê rehmê, dergê xêrê tu vedikî hemû deran.  
Hine benda mehez dikî, bilind dikî, wek asîman,  
Hineka jî dikî merûm, dibin hewcê parîke nan.  
Risq û ruza dest te da ne, ya tu zanî, kes nizane.

Bext-miraza tu cot dikî, xeleqa hev hildikşînî,  
Qenc-xirav ra, xirav-qenc ra dinîvîsî, tu dişînî.  
Rojên şîrîn tu dikî tel, gav-roj dibin mewt û merez,  
Hine benda dikî rovet, hineka jî hildidî lez.  
Emir, ferman dest te da ne, ya tu zanî, kes nizane.

Cinnet, cehnem, malê te ne, tijî dikî, vala dikî,  
Xêr û guna tu dikşînî, tu dipîvî, tu heq dikî,  
Yûsîf bîrê, Yûnîs zikê mesyê rût da xweyî dikî,  
Bext-rozgara dîl bendê xwe, ça dixwazî, usa dikî.  
Tew misilet dest te da ne, ya tu zanî, kes nizane.

Daristana didî ruvî, şêr ra didî besteke rût,  
Rojê sê car ji xezna xwe bûmê kor ra dişînî qût.

Kew-bilbila dixemlînî, feqîr me ra didî jehrê,  
Kevir-kuçka rûdkî erdê, lel dişînî binê berê.  
Kêr-kirnên te ne eyanin, ya tu zanî, kes nizane.

Cîyayên mezin dikî girik, hûr girika mezin dikî,  
Bilbil digrî seva gulê, gulê vedikî, nîşan nakî,  
Qewet, bejnê tu didî fîl, devek biçûk dikî qismet,  
Alîkî da pir şa dikî, alyê din da didî zehmet,  
Cefa, sefa dest te da ne, ya tu zanî, kes nizane.

Minafîra tu dikî şêr, gef-gur dibin, dihur mijin,  
Te bîr dîkin, cîlo-cepo, mewt û jehra xwe dirêjin.  
Bendê salih merûm dikî, dûmeka da dizêrînî,  
Jan û êşa lê pir dikî, ber derîya digêrînî,  
Gaz û meqes dest te da ne, ya tu zanî, kes nizane.

## LÛRÎ, LÛRÎ, LAWÊM LÛRÎ

Razê, rabî bin sîya gula,  
Me ra bînî eşqa dila,  
Esmanê şîn lihêfa te,  
Dayîk germke bedena te.

Lûrî, lûrî, lawêm lûrî,  
Jan û eşa bibî dûrî,  
Ax-kesera nekişînî,  
Tengî, telya qet nebînî.

Welat bibe hêlîna te,  
Tifing neyê ser milê te,  
Nekevî nav tawî, zaxa,  
Neyar qut be îdî cî da.

Lûrî, lûrî, lawêm lûrî,  
Jan û eşa bibî dûrî,  
Ax-kesera nekişînî,  
Tengî, telya qet nebînî.

Amed, Bîngol, Silêmanî,  
Te ra bibin mal û xanî,  
Mûşê bigrî tu şirranî,  
Wanê bikî xaş mêvanî.

Lûrî, lûrî, lawêm lûrî,  
Jan û eşa bibî dûrî,  
Ax-kesera nekişînî,  
Tengî, telya qet nebînî.

## ÎRO MÎN RA APO, XALO GOTÎN

Pejmûr bibe, melûl bibe, tu dilê min,  
Baş-bedewa rû guhestin îro ji min.  
Apo gotin, xalo gotin, dûr meşîyan,  
Min nihêrîn, çev qirpandin, nerm kenîyan.  
Ber çavên min bû mij-dûman, ça zû pîr bûm?  
Kûr mitalê tele, melûl, li min pir bûn.  
Paş fetilîm, rîya emir min mêzekir,  
Kêlekdera xwe nihêrî, kes naznekir.  
Jan û êşa ez hingavtim, dil kir îskîn,  
Beden li min bû telte bûz, dest ricifîn.  
Rojên çûyî yeko-yeko min anîn zar,  
Lêvêm hejyan, hêsrêm xuber berjêr bûn xar.  
Qudûm nema, hizî bikim, bûme hêzing,  
Dinya dor min zexm fetilî, kir zinge-zing.  
Baş-bedewên hêna min da bûbûn sipî,  
Li dor wana dileyîstin gir, hûr, nevî.  
Qermûçeka peçinî bû ser xal, xeta,  
Bahar bûbû sar zivistan, boy wan zû da.  
Min dît, îdî sala, meha, hukum daye,  
Rîya emir kin-kurt bûye, hindik maye.

## ÇAVREŞA MÎN

Çavên te ra heban tirya ez nabêjim,  
Emrê tirya, gelek kine, zev hindike.  
Ez ji wan ra şebên tarî qet nabêjim,  
Nav şeva da şer gelekin, xêr hindike.

Çavên te ra kanya kelyayî ez nabêjim,  
Avên kanya, him şor dibin, him jî şîrîn.  
Ez ji wan ra behrên bê bin qet nabêjim,  
Behra da jî baran, tofan dibin yeqîn.

Çavên te ra çavê Zînê ez nabêjim,  
Eys û Xecê min biêşin, bikewgirin.  
Ez ji wan ra gulên welêt qet nabêjim,  
Gulên welêt bin pîya da dihecirin.

Çavên te ra tebîb, loxman ez nabêjim,  
Tebîb, loxman, şefa didin, emir didin.  
Ez ji wan ra neyar, cellad qet nabêjim,  
Neyar, cellad tim qut dikin, ferman didin.

Çavên te ra ruhsîn tu car ez nabêjim,  
Ruhsîn emrê Rebbê jorîn diqedîne,  
Ez ji wan ra şûrê du dev qet nabêjim,  
Şûr jê dike, ruh bedenê diqetîne.

Çavên te ra heval, hogir ez nabêjim,  
Heval, hogir, bi hezkirin, bi rehm dibin.  
Ez ji wan ra melhem dayî qet nabêjim,  
Melhem dayî ewqas bê rehm tu car nabin.

Yeqîn wedê nebîrana, xewnistanê,  
Tev dayka xwe tu jî çûyî Kurdistanê.

Ew çavên te leman bûne ewqas reşe,  
Reng hildane Kurdistanê pir bextreşe.

Ji çavên te reştîr tu çav min ne dîtine,  
Ji huba te şewat tu hub min ne dîtine,  
Min ne reve, min dûr meçe, mêvan werê,  
Te mêzekim agir, alav dilê min derê.

Reş hez nakim, ewa bextê gelên min,  
Ser çavên te bûme bengî, gunê min tune.  
Xwezil rokê Kurdistanê xweya aza,  
Min çavên te bidana ber maç, meheza.

## BEDEWA KURD

Gelek bedew min dîtine bajar, gunda,  
Wek te bedew qet ne bune tu car dê da.  
Çavê belek, burû, bijang cî bi cîne,  
Keç, sûretê te sorgulê sibe zû ne.

Dêmê alav, lêvên nevat para te ne,  
Zulfê dirêj, bisk û tûncik rewşa te ne.  
Gaz gerdena çîle bedew dikim mêze,  
Te horîyê ez dibînim cara teze.

Rebbê jorîn qelema xwe rast lêdaye,  
Ji resmê te qilî, qaçî tew hildaye.  
Lema usa pir bedewî, hingiv, qendî,  
Welleh, billeh nav rinda da tu zef rindî.

Feqî, Xanî pesin, methen te pir dane,  
Ez welatê xwe ne bûme qet mêvane.  
Min tu dîtî, dilêm tîr da, derdêm kûr bûn  
Ji heweta herdû çavê tenê zûr bûn.

Xwezîl, rokê bibûyayî mêvana min,  
Ruhe xwe va te can kira ev ruhe min,  
Min bidîta loxmana min têye derda,  
Dûr ketama, xem-kedera, hemû derda.

## KEÇKA DELAL, WERE CEM MİN

Keçka delal, were cem min,  
Ez ramûsim herd çavên te.  
Bişewitim bin meze te  
Wekî bibî hogira min,  
Ezê hildim tew nazê te.

Huba dilê mine pire,  
Nadme kesî, ez xêynî te.  
Hemêza min baxçê tere,  
Bila bibe miskanê te.

Porê sipî – kaltî nîne,  
Dilî eşqî, himî qence.  
Çîyayê bilind berf datîne,  
Qismet her dem nabe gence.

Ew kanîya av tê dizê,  
Gelekî zû namiçiqe.  
Nazya meke, were razê,  
Deq dimîne timê deqe.

**TÊLLÎ Û MIHO**  
**Dûêt – kilam**  
*(ser hîmê motîva folklor a gel)*

- Miho cano, min li diyarê wana rengîn, xave sore,  
Qîz û bûkê êla giran ser kanîya nadin dorê.  
Sekinîme, têr mêzekim, bejna zirav, simêla reş,  
Hogirê min dîsa bûne darî devî, zinarê reş.
  
- Têllî canê, Rebbê jorîn pir mezine, xema meke,  
Bixemile, çava kilke, biska bade, zulfa şeke.  
Heta hebim ez vê dinê, zewacê naynim zarê xune,  
Xêynî te nazikê nahebînîm tu car, tu wext ez yeke dinê.
  
- Miho cano, ezê nîfirekê bikim îdî dil û cane,  
Heçî kesê têkeve nava du dila, du mirazane,  
Desta qube, unda bike ronaya herd çavane,  
Loxmanê wî peyda nebe, bikşîne êşa ewladane.
  
- Têllî canê, vayîsêd me, xêrê-wayê qet nebînî,  
Dû ewledê xwe bizêrin, çelamçûka mehejînî.  
Dergê xêrê wan venebe, şîv-paşîva şînê vekin,  
Nava gel da bibin rovet, cil-kirasa li xwe mekin.
  
- Miho cano, dûakê bike, kotî mêrê min bimire,  
Dû kerîyê te bikujim, pîyê mî kul kin pîj, kevirê.  
Xwe bavêjme hemêza te, cînetê bibînîm çavê xune,  
Bila bêjin Têllî gihîştîye mirazê xune.
  
- Têllî canê, ewa dûa-xastina min û te zêdeye,  
Pejmûr nebe, gotin, kirin, emir-ferman, dest Xudaye.  
Xwedê, wekî dinya ronik dergê xêrê me veneke,  
Emê hevdu têr bibînî li axretê dinya heqe.

## BEDEWA BÊ ÎTBAR

Îdî bese, dûrîm here, ji huba te kasil bûme,  
Gul-sosinê min çandine, çilmisîne, bê per bûne,  
Îro şûnda tev kê diçî, ne wekîlê nefsa te me,  
Cefakêşim, mezêrîne, dizêrînî, tu dizanî.

Bendawarê huba te me, ji min dûrin fend û fêlaz,  
Pêş neyara min girtîyê, tim serê xwe bilind, evraz,  
Huba xwe da biîtbarim, ne delkbazim, ne jî kolaz,  
Hejarhalim, meêşîne, diêşînî, tu dizanî.

Qelpa xastin derbên giran ser min gurkin, bi destî te,  
Reh-rîçalê hîlqetînin, min bin axkin, bi destî te,  
Lawê Kurdîm, şert-şurûtê min eyanî zûda li te,  
Qewl-qirara pêpez meke, pêpez dikî, tu dizanî.

Kal Barî me, dûr welatî bû para min, çi bikim ez?  
Por sipî bû, dil westîya, hêsr kişyan, çi bikim ez?  
Wedê naza, ken-heneka buhurîne, çi bikim ez?  
Tel û niça min mexêre, min dixêrî, tu dizanî.

## KEÇKA RINDİK

Nav gula da yek gulekî,  
Nav rinda da tenê yekî.  
Karxezala nav mêrganî,  
Hemayîla ser dilanî.

Rind kevotka per hêşînî,  
Kew-gozela çev nexşînî.  
Hingiv, şerbet, zev şirînî,  
Lelî, durrî, ruh û canî.

Bibî dayîk ser axa dê,  
Tim ser te be sîya Xwedê.  
Bextewar bî, bi risq, ruza,  
Dûrbîn, dûrbîn, ji te qezya.

Qismetê te yek keç, heft kur,  
Qet nebînî neyarê hur.  
Bihebînî welêt, dosta,  
Hev bijbêrî qesta, rasta.

## HEVPEYVANDÎNA KEÇ Û XORTÊ BENÎ

### **Xort:**

Hewar-hewar, dota Kurdê,  
Dêm bedewê, bejn bilindê.  
Gulî reşê mîna şeva,  
Hîva sê şev buryê çava.  
Ez dût ketime ji hevala,  
Tenê dijîm huba te ra.

### **Keç:**

Hub şîrîne, xortê bengî,  
Muhbeta me meke dengî.  
Eger gul bim, gula te me,  
Ez bilbila baxê te me.  
Dût mekeve ji hevala,  
Ez jî dijîm huba te ra.

### **Xort:**

Delala min, ez bê sebrim,  
Cem te ezî ne bê qedrim.  
Tîrsam heye ji dê-bavê,  
Ne qismetbin em vê dinê.  
Ez çê derêm nav hevala,  
Çê şûn bigrim koşka, mala.

### **Keç:**

Gede lawko, zozan şîne,  
Ser çîyayêd me belekîne,  
Were min hilde birevîne,  
Bila kesek me nebîne.  
Qîrar bidin em hevala,  
Şê bin, şê bin, huba xwe ra.

## ÎRO

Xasbaxçê ter, ser kanîyê, nav sorgulêd gerden tezî,  
Dota Kurda kubar-kubar dimeşîya, dikir nazî.  
Bejna tîtal xemiland bû kesk, sor û zer sed yek rengî,  
Hiş û sewda serê mîrîya, keç xatûnê bûme bengî.  
Çav û burî kilkirî bûn, wê nolanî Xatûn Zînê,  
Mîna royê şemal dida, tirê hîvê dihat xanê.  
Bisk û tûncik şekirî bûn, kezî dabûn tîre mila,  
Misk û enper jê dibarî, agir, alav dikir dila.  
Enya kever, lêvên nevat, xwedê xelat dabûne wê,  
Sûrete sor, pozî pîjîn, cî bi cî bûn xal-xetên wê.  
Dikêlimî, diaxivî, firnaq-firnaq dikir lîlîn,  
Qîbe-qîb bû, çawa bilbil li dor gula dike îşkîn.  
Buryên qeytan, bijangên reş, rewşek didan dêmê nazik,  
Pêş horîyê çokê mîrîya, helyam, helyam, bûme kizik.  
Mîr xast jê ra hubê vekim, kenya, kenya dûrîm revî,  
Ser dilê mîrî agir danî, rewş û kenê kewa kuvî.

## DOTA QAZAX

Bedew pirin, bedewyê da şivêta te kesek tune,  
Tu ne gulî, nav gula da bîn-empera cem te tune.  
Zar-zimanê te şerbete, toyê yekşev levên tene,  
Sîngê sedef, gerdena zer, bejna tîtal rewşa tene.  
Namla fire, reş kezîya rêz girtine, şûn danîne,  
Kî carekê te dibîne, hişmetkarê te dimîne.  
Dêmê xal-xet, çavên belek, hiş û sewda direvînin,  
Nava pir-pir bedewa da tu kivş dibî, te dibînin.  
Cî-welatê te cinnete, xezaloka xasbaxçanî,  
Dê-bavê te nişa xasin, tu bedewa bedewanî.  
Bavpîrên te dîrokê da rêçên gir-hûr pir hiştine,  
Xêynî-xêynî dota Qazax, ew qameta kesî tune.  
Sed sal bijî, ne çilmisî, tim bimînî ter û teze,  
Zêrê zerî, zêr axê da zeng nagire, qet narize.  
Kêm wedeye, welatê te qesidîme, bûme mêvan,  
Te min birye, sewq û sefa, ken û henek, xewnên şevan.  
Boy huba te têlê tembûr şeva-roja dihejînim,  
Nolî Memê dilekî jar diqalînim, dilîlînim.  
Mal qirêca herd destane, dişoy diçe, hub dimîne,  
Dara hubê du çiqile, alîk tele, yek şîrîne.  
Lawê Kurdîm, esil xasîm, were tu min neêşîne,  
Bibe hogir vî agirê minî şewat weyîşîne.

## DOTMAMA KURD, BESE RAZÊY

Razan emra nîvî dike, delala min,  
Emrê çûyî bike ji bîr, sorgula min.  
Rojêd eşq-şa dest pê dibin, tev min şabe,  
Hîvya te me, nazya meke, îdî rabe.

Huba min-te bila bibe agirê gur,  
Her deqîqêd me bahabin, weke lel-durr.  
Roj-meh diçin, îtbar tune qet zemîne,  
Rîya jiyan gelek tele, kêr şirîne.

Xewê rabe, bixemile, nolî berê,  
Tew xastinê biqedîne, bejê “erê”.  
Rebbê jorîn îro me ra rusqet daye,  
Şeva tarî kuta dibe, hindik maye.

Kubar, kubar, bixemile, bi te şa bim,  
Bejin-bala te bibînim, te ra can bim.  
Hub kal nabe, qusur nîne porê sipî,  
Ew, her gav, boy huba paqîş dimîne tî.

Xaliq-Alem em kirine qismetê hev,  
Bila şirîn bibihure wedê me tev.  
Nexastîya min şa meke, bihêvşîne,  
Vî emrî da, were tu min, meêşîne.

## **EZ JÎ TE RA AV NABÊJÎM**

Ez ji te ra av nabêjim,  
Tu ji avê zelaltirî.  
Ez ji te ra gul nabêjim,  
Tu ji gulê zev bîntirî.

Tu ne kewa nukul nexşî,  
Wekî bême nêçîra te.  
Ne xezala baxçê rewşî,  
Tim bigerim pey rêça te.

Keça Kurdî, bê fit, reca,  
Sêva sorî, hatî hucra.  
Haveynê te nûra temîz,  
Dûrin ji te tew rêç û îz.

Birya kilke tirê her car,  
Gulya şeke tim bîne xar.  
Ez ramûsim dêmê alav,  
Tu bedewî bê misk, gulav.

## HÊY BÊ ÎTBAR

*Rewayî hezkirya xweye ewil dikim*

Ez û tu bûn, kanya merge, sorgulêd al,  
Pêş huba te bûbûme dîl, horya delal.  
Qalçîçeka li dora me girtibûn rêz,  
Xasbaxçê ter da bû meda\_sîng û hemêz.  
Hogirêd me darêd fêkî, çînar û merx,  
Minminîka dora şama dikirin çerx.  
Kew-bilbila şîrîn-şîrîn diqalandin,  
Bakî zirav bisk-tûncka te dihejandin.  
Dengê tembûr şeva vala tijî kiribû,  
Keç û xorta dest û milê hev girtibû.  
Daristanê bibû şayî, kêf û seyran,  
Li her qulçî digerîya govend, dîlan.  
Hatina me eşq kiribû orman, mêrga,  
Hîvê jî me mêze dikir tevî sêrga.  
Bejna min-te eks dikir avêd zelal,  
Xal û xeta ez kiribûm bengî, qewal.  
Hube pir bû, dêmê nazik misk dibarî,  
Gerdena zer xemiland bû çend rêz morî.  
Çavêd belek, enya kever, gahar, qulna,  
Ez kiribûm bextewarê her çar qulba.  
Me bi huba “Mem û Zîn” ê sond xar yek car,  
Bi sidqê sax da hevdu da bext û qîrar.  
Heta hebin, em ji hevdu nebin dûre,  
Mîyaserkin tew armancêd gir û hûre.  
Bilînd bigrin qedir, navê huba paqîş,  
Xastinêd xwe biqedînin mejû, bi hiş.  
Tev bimeşin, tev bişxulin, bikin karê,  
Kes me hevdu meqetîne destê zorê.  
Em nebihên tu gotinê neyar, hara,  
Nekevîne bin bandore qelpa, xara.  
Bibin xweyî mal û dewlet, ewledê pir,

Ewledê me boy gel bibin tim lel û durr.  
Mal qirêja herd destine, dişoy, diçe,  
Lê derb hene, êşana wana ji dil naçe.  
Ez sondê xwe bûme xudî, heya îro,  
Te qewl-qirar pêpêz kirin her dem, her ro.  
Gelo çima te bîr kirin ew çaved geş?  
Nav emir da ez mame ez, tu bûy rû reş.  
Îro bûme xweyî qedir, ewled û mal,  
Dûmeka da dubar dikî tu nale-nal.

## BEDEW

Were, îdî, were cem min,  
Bela bike tu xemêd min.  
Jiyan kinin, gav bê îtbar,  
Çûyî paşda nayên tu car.

Carek têy dinya fire,  
Her deqîqe lele, durre.  
Demê destê xwe bernede,  
Dinya kêfe, dinya derde.

Por sipîye, dil cahile,  
Hub, hezkirin timê bale.  
Ba lêxe jî çiqas care,  
Çîya tu car nabe xare.

Were cem min bê mitale,  
Lok tu cara nabin kale.  
Cot hatine şer û xêre,  
Aşê kevn jî den dihêre.

Îdî were, fikra meke,  
Dergê xêrê li min veke.  
Ew kotîkê cîda gire,  
Hezar çirpî ser tîn hûre.

Bahar neyê venabin gul,  
Bê gul digrî timê bilbil.  
Esman nabe, erd nave şil,  
Rya hubê da naweste dil.

Were cem min, şekirziman,  
Ez ramûsim herd çavên te.  
Timê awa naçe dewran,

Qasek bibim mêvanê te.

Hene gavêd tarî, şeweq,  
Hene xêrxaz, hene neheq,  
Jiyan pûçe bê naz, henek,  
Zirav dibe, lê namre heq.

Em tew bendê Rebbê jorin,  
Hinek rast in, hinek xar in,  
Hinek hejar, hinek har in,  
Hinek şerbet, hinek jehr in.

Ber xar diçî, te direve,  
Hebûna wî şere, dewe.  
Xêynî xirav tişt dest nayê  
Xwedê tenê ewa dayê.

Sê xelatê Xwedê hene,  
Hersêk jî boy bendê wî ne.  
Aqîl, awaz, bedewîye,  
Ew nedane her kesîye.

Bîr nekiryê, ez û tu jî,  
Hinek dane min û teyê.  
Pir sert nebe, dereng be jî,  
Ez kirime para teyê.

Were tu min meêşîne,  
Hub-kevotka per hêşîne,  
Ji dest firî, nayê deste,  
Rewşa hubê qewlê raste.

Were em bikin kêf, sewqê,  
Kê çî birye ji vê dinê.  
Tune feyde malê dewrê,  
Kefenekî diçin qebrê.

## BÊ DÎL, DÎBARÎNÎM EZ HÊSRA

Şev nîvîye, bînber xewa hingorê da,  
Ji min dûrî, dikewgirim halê xwe da.  
Derêm veke, tarîstanam bike ronik,  
Bê te tu car, xem-xeyalêmin nabin sivik.

Şev nîvîye, bûme rêwyê hundur, devra,  
Baran lêdke, birq davêjin nava ewra.  
Te hez dikim, ne dilekî, ez hevt dila,  
Bê dil, were, dibarînim ez hêsa.

Şev nîvîye, te pirs dikim keça, xorta,  
Te nabînim, nav xasbaxça, çela, korta.  
Rica dikim, mede kesî qîrar, qewla,  
Bese, were, şake dilê minî vala.

Şev nîvîye, ji êş-jana dikim hewar,  
Hogirêd min îdî bûne zer û zinar.  
Baqe kulîlk te ra anîye bi ruh û can,  
Hilde, hilde, dibuhurin sal û zeman.

## HELBESTÊN MÎN

Gelek şevên bê xew-tarî, hûn bûn heval, hogirêd min,  
Cî-nivînê bûne sirîn, we undakir tew xewa min.  
Dil ricifî, kaxet reş bûn, qelem maşya, hûn xuluqîn,  
Bê welatî, bê rusqetî, we pî megirt, hûn xeniqîn.  
Min kir zarîn, erş lerizî, kevir helyan, hol bûn devî,  
Av sekinîn, kûlîlk weşyan, xezal girya, mêl bû zevî.  
Ba ne lîland, behr qerisîn, ewra hevra kirin gazî,  
Kewa hêlîn vala hîştin, kirine çivtîn cûckên tezî.  
Hirçên xewar ne firfitîn, gura nêçîr paşda xistin,  
Şêr-şepala kirin qîrîn, teyrik, tûya bask daxistin.  
Rîyê dirêj pêş min kurt bûn, dehrên gurav bûne delav,  
Çîya, banî ji cî hejyan, deşt û zozan bûne xirav.  
Bavê kuştin, xûşk û birê nav xwînê da tim perpitîn,  
Dîroka me kirin yasax, erf-edetê me lewitîn.  
Çavê rêtin, milkê birin, zimanê me cî-cî birîn,  
Ser axa me bazar kirin, him firotin, him jî kirîn.  
Ax-keserê nerm nekirin neyarê har, nefsê qirêj,  
Heyam birin, bûme kole, derd û kula ez kirim gêj.  
Xwezil carkê ez biçûma nav gêrîla, cem lehengan.  
Pêş neyara min şerkira, tê bidîta tew Kurdistan.  
Mêzekira meşa Kurda, cejna Newroz, ala cindî,  
Pêş şehîda bitewyama, pîroz bikra lawên zendî.  
Tasa ava sar vexara, tewavkira tê axa dê,  
Serê neyar hilqetanda, qut bikira rehêd zulmê.

# WELATHEZÎ

## KURDÎSTAN

Geh sêfîl bûm, geh kasil bûm boy huba te,  
Bûme kizik, her gav helyam ez seba te.  
Por sipî bû, ser zimîne tim navê te,  
Roj bihata, min bidîta azaya te.

Dîl westîya, pîr bedhalim, dûrim ji te,  
Dermanên min gerek bînin tenê ji te.  
Tu Zîyaretî, ez koçekim, koçekê te,  
Heta kengê, ezê nebim mêvanê te?

Hogirên baş, bikewgîrin, hûn jî tev min.  
Ava şêlû, mîsken danî nav çavêd min,  
Welat, xwezîl, min maçkîra her qulçên te,  
Kuta bûna rojên mine xeme bêy te.

Çavêd min rê, hesretkêşim, feqet dûrî,  
Boy tew Kurda emîr, jîne, gul û nûrî,  
Wedê bimrim, bila domam bilûvînî,  
Çenge axa te, ser tirba min bireşînî.

### (para duda)

Şikir, şikir, aza bûye pareke te,  
Yeqîn ezê îdî bibim mêvanê te.

Ezê maçkim, kevir-kuçik, zinarên te,  
Hemêz bikim, çîya, banya, berwarên te.

Kulm-kulm vexum, avêd kanyê teye sare,  
Gund, bajara, mêze bikim kaw-kubare.  
Hewlêra rind, bikim taştê, êvarîyê,  
Can-cesedê xwe xilazkim xerîvîyê.

Biêwirim li Helebca dil-birîne,  
Hêsrên xwe va bişom axa mewt-jehrîne.  
Şêr-şehîda tewaf bikim yeko-yeke,  
Xaliq-alem bikim hîvî, tew xwînêja,  
Nolî Seddam, ezab bide, paşê rêke.

Ewledê xwe dikim rica, îltîmase,  
Weysêta min, gelê min ra bêjin ese.  
Wedê bimrim, gotnêm bînin ser zimane,  
Defin bikin min binlinga kek Berzane.

Bila bêjin helbestvanê welêt dere,  
Mêvan hatye ji mikanê gelek dûre.  
Gulê welêt ser min daynin baq û baqe,  
Ruhêmin sih ke, îdî hatye mala heqe.

## ALA KURDISTANÊ

Gelek qurne, pir dewranêd tele-şewat hatin û çûn,  
Gav-rojêd wan bûne qetil, nav xwînê da tim gevez bûn.  
Gelek şênî, gund û bajar, rûyê erdê bûne unda,  
Hinekê nûh zû xuluqîn, nav derxistin, bûn peyda.  
Gelek millet nav zulmê da helyan, zêryan, tamam red bûn,  
Xêlek nava şer-dewa da pir çerçirîn, nav û deng bûn.  
Rebbe jorîn her gelî ra namûs, xîret par şandîye,  
Hebûna gel, namûsa gel, berê-berê da ala wîye.  
Gelê bê al belengaze, tim koleye, him bindeste,  
Sêfîl-jare, kesek wî ra qet danayne kevrê raste.  
Al – dîroke, al – şerefê, al – xîreta gelê xune,  
Mêrxasa ew xweyî kirye, yekî daye yekî dine.  
Bextewarim, ala min jî tevî ala dimilmile,  
Welatê min îdî dertên şîn û girî, derd û kule.  
Min dipirsîn: - Ala Kurda çima bûye ro, sê renge,  
Bersîv didim: - Dinya fire zû da bûbû Kurda tenge.  
Ro – nîşana nav gela da, pir kevnare gelê meye,  
Rengê sipî – edîlayê, ew armanca me Kurdaye.  
Rengê sipsor: - Xwîna gelê, boy azayê tim kişyaye,  
Kesk – nîşana pêxembere, rengê ala Îslamêye.  
Zerdeştîya ji me stendin, em jî kirin musulmane,  
Me welatê xwe unda kir, man bê rusqet, bê zimane.  
Ser piştî me agir dadan, erş û kursî tev me zîvyan,  
Kal-bav kuştin, hebûn birin, dê-xûşkêd me şev-roj giryan.  
Gund-bajarêd meye ava, kaf-kûn kirin, hedimandin,  
Mewt-jehr kirin nav axa me, mêrxasêd me xeniqandin.  
Dutîretî kirin nav me, em zêrandin, em ker kirin,  
Kurda Kurd kuşt, wan birca da kêf û sefa derbaz kirin.  
Hemû dinê ker bûn, lal bûn, ne bihîstin, ne axivîn,  
Tev me giryan, payîz, bahar, sar zivistan, him jî havîn.  
Dilekî êş, hemû Kurda dikim hîvî, dikim rica,  
Kevn bavêjin, tew bibin yek, kom bin dora egît, qenca.

Şikir îdî fîrsend hatye, kêr-kirnêd xwe medin bade.  
Tim hişyarbin, fitê medin, neyar îdî emir bide.  
Dîrokê da dayna Xwedê boy her gelî tek careke,  
Hefadêd Kurd, wede hatye, herçar parça bikin yeke.  
Me azakin, em jî bibin xweyî cejn, xweyî welat,  
Bila îdî me nas bike, him Rojava, him Rojhilat.  
Ala meye kesk, sor, sipî, nav ala da bimilmile,  
Şeveqa wê neyar korke, wî biteqe kezev, dile.

## SEDDAM RABÛ

Bextê Kurda reş hatiye dewr û bila,  
Hewirdorên me girtine gurên çila.  
Hovî-hara wan ra anî telî, zarî,  
Seddami rabû, ser Kurda da agir barî.

Nift boy Kurda bû bextreşî, zû da, berê,  
Rind Helebce karkûn kirin bombên jehrê.  
Rojên şeweq li me bûne tofan, tarî,  
Seddami rabû, ser Kurda da agir barî.

Tew Şerqa kal ji xaçgera me kir aza,  
Welatê me bû meydana dew û doza.  
Qismetê me bû rev, bû bez, tim bêwarî,  
Seddami rabû, ser Kurda da agir barî.

Dicle hêrs bû, Fîrat hejya, kire gazî,  
Xwînrêj milk bir, zarok mane birçî, tezî.  
Bûk heznî man, dê-bav kuştin, hat şîn-girî,  
Seddami rabû, ser Kurda da agir barî.

## GELÊ KURD, ÇAVÊ TE RONİK BE

*Gelê Kurd, çavê te ronik be, xwînxwarekî teyî zorî, zexmî, pir hovî, şikir îdî sekitî. Xwedê heye, xem tu nîne, dora wanî dinê jî îdî nêzîk dibe. Bapîra wa gotîye: “Kî çi dike, bi xwe dike, xwelîyê ser xwe da elek dike”.*

Gelek fîron, şah û qiral hatin û çûn,  
Dû xwe hîştin dozêd giran, pir rêçêd xwîn.  
Dêm-sifetêd wan melqûma agir barî,  
Boy însanan anîn rojêd tele, tarî.  
Pêşeroja xwe ne anîn wan ber çava,  
Of negotin, kaf-kûn kirin dinya ava.  
Ulm nehîştin, egît kuştin, zane girtin,  
Boy mafêd xwe dîn û mezheb tew avîtin.  
Rê-dirb birîn, qetil kirin, xwîn bû behr-çem,  
Bûne cellad, dinê hilda keder û xem.  
Erd wan teng hat, top avîtin erşê-ezman,  
Sêwî pir bûn, tim zêde bû zulma giran.  
Behr zevt kirin, xezne hildan, nebûne têr,  
Hêykelê xwe bilind kirin jî zîv û zêr.  
Aqûbeta wan xwînêja tim bû rovet,  
Kesî wan ra nekir qedir, ne kir qîymet.  
Seddâm jî hat, kîrnêd wîya me tew dîtin,  
Êl hejîya, jî text û tac ew avîtin.  
Ji dinê çû, rût û tezî, kapek suda,  
Bû elêwet, kes ne çû ser laşê wî da.  
Nisla wîya xilaz kirin rûyê dinê,  
Koşk-serêd wî dêriz kirin, top avîtnê.  
Tew heya wî bû qismetê rût, sexîra,  
Axxê sêwiya, Xwedê ne hîşt îdî wî ra.  
Ew kesê ku tim gelê xwe bilind dike,  
Gel wîya pir dihebîne, jê hez dike.  
Merzelê wî boy tew nisla dibe zyaret,  
Mezin û çûk pêş wî dikin secde, hurmet.  
Dîrokê da ew dimîne nemir serkar,  
Navê wîya bi herfê zêr tê nivîsar.

## BÊ TE NAJÎM, ZIMANÊ DÊ

Kana emrî, ava zelal,  
Qudûm-qamî, aqil, kemal.  
Temî, lemî, rastî, helal,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Xîret, culet, nav-namûsî,  
Şemal didî, venaêsî.  
Reh davêjî, naçilmisî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Melhem, loxman, kûr birînî,  
Kulîlk, gezgezk, tûj, sirînî.  
Telî, tîrşî, him şîrînî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Dîrok, dewran, ax û milkî,  
Dewî, dozî, nermî, hişkî.  
Nav qurnada namehikî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Mêrxas, egîd, zorî, zexmî,  
Rindî, rewşî, qapûd, kexmî,  
Dilovanî, gelek rehmî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Şûrî, kêrî, boy xwînxwara,  
Avkewserî boynet yara.  
Per û baskî her gav min ra ,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Behra kûrî, namiçiqî,  
Pir mezinî, ne piçûkî.  
Tu nahelî, naperçiqî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Sêva sorî, şîlan-şengî,  
Metî, zivrî, him çelengî.  
Hogir, heval, gula dengî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Nîşa xasî, miskî enper,  
Cî da qespî, tu nabî ker.  
Pêpez dibî, bê cî, heder,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Gazî, medet, ra, tivdîrî,  
Ruhî, dilî, cewahirî.  
Fisq-fesada timê dûrî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Gula bînî, zozan deştî,  
Xasbaxçê ter, seyran geştî.  
Kale bava me ra hîştî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Hebûn, rûmet, sebir, sewtî,  
Rozgar, xemil, qewet bextî,  
Boy neyara jehrî, mewtî,  
Bê te najîm, zimanê dê.

Merg û çîman, deşt, zozanî,  
Erş û kursî, asîmanî,  
Xasbaxçê ter, gulistanî,  
Lel û durrî, zimanê dê.

Kanya zelal, behra kûrî,  
Şefa, melhem, gul û nûrî,  
Dewlemendî, gelek kûrî,  
Nexş, nîgarî, zimanê dê.

Sûra hesin, pola xasî,  
Dîrokê da gişka nasî,  
Hovî, hara tu natirsî,  
Gurz, kemendî, zimanê dê.

Miqerimî, him qedîmî,  
Xezna tijî, pir zengînî,  
Nav zara da zef şîrînî,  
Tacê zêrî, zimanê dê.

Ferih, paqîş, qespî, tûjî,  
Bê lekeyî, bê qirêjî,  
Esnaf, pîspor, rastî bêjî,  
Şewq, şemalî, zimanê dê.

Keskî, sorî, him jî zerî,  
Kînî, rikî, av kewserî,  
Zikmakî da zexmî, zorî,  
Zelûl nabî, zimanê dê.

Erf û edet, ruhê minî,  
Dîlan, govend, şaya minî,  
Dil û hinav, emrê minî,  
Tu qut nabî, zimanê dê.

Em tev giryan, em tev nalyan,  
Em tev şa bûn, em tev kenyan,  
Em zelûl bûn, em tev zûryan,  
Hiş, mêjûyî, zimanê dê.

Emir, rusqet, seyasetî,  
Qedir, qîmet, him hurmetî,  
Dîn û îman, bereketî,  
Stûna zêrî, zimanê dê.

Maqûl, hakim, destûr zanî,

Aqil, mezin, dinê zanî,  
Hozan, dengbêj, helbestvanî,  
Bext, mirazî, zimanê dê.

Dayka hundur sînge xwe da,  
Nava şîrê berê xwe da,  
Tu gîhandî rojêd meda,  
Zelûl nabî, zimanê dê.

Agrî, Zagros, sar Sîpanî,  
Tema devê tew Kurdanî,  
Avêsta kal, “Mem û Zîn”-î,  
Serî-binî Kurdistanî.  
Qend, nevatî, zimanê dê.

Barî bê te lale, jare,  
Hîro, gîro, tengezare,  
Timê bi te bexteware,  
Bê te najî, zimanê dê.

## ZÎMANÊ MÎN

Hemû qurna nav êgir da tu pijyayî,  
Heciqîyî, herişîyî, him zêryayî,  
Yasax bûyî, pêpez bûyî, ne helyayî,  
Ne rizyayî, lal ne bûyî, zimanê min.

Beyanîya, merivkuja tu veçirîn,  
Ser te bîngêr tim gerandin, tu hincirîn,  
Qels ne bûyî, bend ne bûyî, te kir hurmîn,  
Tu palyayî, tu meyayî, zimanê min.

Bi te kenyan, tu lomandin, ne tirsyayî,  
Dilop, dilop bûyî gorav, tim kişyayî,  
Neyar xast te bimiçqîne, tu kelyayî,  
Ne maşyayî, ne weşyayî, zimanê min.

Te xemiland teht Bîsitûn, dinya zane,  
Te xuluqand kal «Avêsta», ev eyane,  
Ji xaçgera te xilazkir dîn-îmane,  
Hûrxwaş bûyî, ricim bûyî, zimanê min.

Feqî lîland, Xanî qaland, Barzan qîrya,  
Goran lûvand, Şêxmûs hêrs bû, Hejar kelya,  
Xayîn mirin, te nas dike îro dinya,  
Nûr-nederî, tu namirî, zimanê min.

Qam-qinyatî, şûr-mertalî, cî da helal,  
Gula bînî, hilçinîye ava zelal,  
Qema tûjî, te kul kirye dilê dijmin,  
Tew zimana şirîntirî, zimanê min.

Tu Soranî, tu Goranî, him Kurmancî,  
Zîyaretî, qubla minî, him jî tacî,  
Geh şirînî, geh engalî, geh jî bacî,  
Xezna kûrî, lel û durrî, zimanê min.

## AGRÎ

Agrî, kanî zimanê min, him Xanîyê zefî kebîr?  
Heta kîngê, para Kurd be, zindanêd sar, qeyd û zincîr?  
Axir çima, talan dîkin, tew medenên mine zengîn,  
Hîvî dikim, cawê bide, tu şiheda tim ewilîn?

Agrî, ewil, dilê daykam çima kirin gelo çar ker?  
Ew tim bû dîl, jêra anîn bi hezara xem û keder.  
Sebeb çîye, piçûk bimrin, dayîk û pîr bikin lûvîn?  
Bikêlime, bihurmiye, tu şiheda tim ewilîn?

Agrî, zû da, bextê Kurda tamam dinê bû beyane,  
Kurd bextreşin, bê rusqetî timê bûye para wane.  
Felek me ra nadûmîne, em girtine nifrên zemîn,  
Xwîna Kurdan bû çem-kanî, axir çima nakî hurmîn?

Agrî, bêje, ev qîlêrî kê derxist, kê kire lecê,  
Sîpana sar, zulfê dirêj, wexta dikir werîs Xecê,  
Ne tirk hebûn, ne Tirkîya, ne Osmanê sorî ewan,  
Xwezil jê bûya ew zimana Kurda ra got «Tirkên çîyan».

Agrî, berê, hê qedîmî, bapîra da ma meselek,  
Bê qurbana qet ne bûne, ne azayî, ne zeferek.  
Qurna bîsta xilaz dibe, paşda naçe çerxa zemîn,  
Zulma giran derbaz dibe, têne rojên eşqe-rengîn...

## EZ KURDÎM

Xatûn Qazê mêjandime,  
Werdê zû-zû hejandime,  
Fatê timê ez şûştîme,  
Sûtê tim ez veşûştîme.  
Sîsê şîrîn maçkirime,  
Kewê hêdî eç kirime,  
Qaso mêrga gerandime,  
Naso ez pîr hejandime.  
Şêxmûs Egît ez hîmkirim,  
Hejar min ra şîret kirin.  
Got: - Tu Kurdî, qet bîr meke,  
Pêş dijmina xwe mel meke.  
Tu Hejar be, tu Şêxmûs be,  
Zef xîretî, pîr namûs be.  
Bigre qedrê heqîqetê,  
Nebe dîlê mal dewletê.  
Ulim hîn be, bibe zane,  
Veke sêrê pîr girane.  
Fîrîqî neke nav milleta,  
Bihebîne erf-edeta.  
Nebê ezim piling û şêr,  
Vê dinê da tek ezim mêr.  
Dewran rûyê me nekenîya,  
Daykam helya, daykam zêrya.  
Dijmina got: - Bê zimanî,  
Ne merivê van erdanî.  
Hişmetkar bûm vê ecêbê,  
Teng bû min ra temam dinê.  
Dinya pêş min bû tarîstan,  
Li min hejyan lêv û ziman.  
Min got: - Kurdîm, eslê min xas,  
Daykam dane egît mêrxas.  
Kubarim bi Feqî, Xanî,

Guhderz, Rustem hîmêm danî.  
Rewşa minin Qazî, Barzan,  
Kan-xezneye tew Kurdistan.  
Ruh û qelbê min welate,  
Mirin, jînam min welate.  
Rojên şîrîn min tel meke,  
Bese, bese, tena minxî,  
Îdî nadim, keday buxî...

## ALA MEYE KESK, SOR Û ZER

Tim bilind bî, bimilmilî, her gav, her dem,  
Bê qezya bî, ji te dûrbin keder û xem.  
Şûrê tûj bî, qetkî dilê qetilkara,  
Serkevtîyê têxî hemû qulca, wara.

Kurdistanê bixemlîne hebûna te,  
Şewqê têxe gund-bajara tîrejên te.  
Şerqa navîn daynî hîmê aşîtîyê,  
Navê Kurda eyan bikî tew dinyayê.

Virha şûnda, pejmûr nebî, neçilmisî,  
Bin pîya da pêpez nebî, nebinisî.  
Serfinyaz bî, bimilmilî bê qal, bê ceng,  
Pêş neyara zexm û zor bî, bibî liheng.

## XEWNÊ DA

Îşev dîsa min xewnê da seyran dikir Kurdistanê,  
Halî sêfîl, rastî min hat keça Kurde teke-tenê.  
Ça qayde bû, min silav da, ewê vegirt silav Kurdî,  
Dewsa eşqê min vê carê pêş çavên xwe zor ecêb dî.  
Baqê gula destê wê da, dimeşîya ber guristan,  
Bîna xwîne gula dihat, dikewgirîn ewir-esman.  
Rewşe heznî, ceve hêsir, bisk û tûncik bibûn xirav,  
Bijang-buryê bê kil-kilçîk, çilmisî bû dêmê alav.  
Fîno-qotik ne li sêrî, reş kezî wê komkiri bûn,  
Kîskê dermîn milê wê da, çek-sîlahê herbê lêbûn.  
Beden li min bû telte bûz, xuydanekê ser min danî,  
Dil tevizî, qelb şewitî, civyan ser min deşt û banî.  
Mil-çoka da qudûm nema, ez lerizîm ewê demê,  
Dinya pêş min bû hebsa sar, dilêk kete keder-xemê.  
Beden hejya, ziman zêrya, lêva kirin gazî-hewar,  
Ka koşk-sera, xasbaxçê ter, kê hedimand, kê da qîrar?  
Ka def-zurne, zîlamêd geş, çît û perdê, êla Kurdan,  
Emir îro wan naxaze, kîne bi derd, mîna Kurdan?  
Dîroka te pir qedîme, kulê dilan kûr zêde ne,  
Dicle, Firat, Musûl, Kerkûk, ew kubarî rewşa te ne.  
Dayka te da Şêxmûs, Qazî, him Barzanê dinê meşûr,  
Şêr Sulheddîn Erebian tew azakir bi zora şûr.  
Feqî, Xanî tacên zêrin, birê tene Apo, Goran,  
Gelo çima tew Şerqa kal hîşt Kurdistan bibe wêran?..

## TU ŞEREFA MİNÎ, WELAT

Tu hurmet, syanet, kubra minî,  
Ruhî, canî, xwîna minî,  
Serkevtin û jîna minî,  
Tawet, taqet, sebra minî.  
Bê te jarim, welatê dê.

Bext û miraz, eşqa minî,  
Mal û milkî, rengê minî,  
Zar û ziman, dengê minî,  
Agir, alav, cengê minî.  
Bê te najîm, welatê dê.

Şeref, namûs, haya minî,  
Nexş û nîgar, xemla minî,  
Gav û sihet, roja minî,  
Dîlan, dewet, şaya minî.  
Ez fedayê teme, welat.

Seyran û geşt, kêfa minî,  
Av û hewa, nanê minî,  
Qedir, qîmet, tirba minî,  
Bilindaya serê minî. “kef”,  
Tu rûmeta minî, welat.

Erf û edet, mafê minî,  
Kevn dîroka gelê minî.  
Dîn û îman, qubla minî,  
Şefq-şemala rûyê minî,  
Tu dayîka minî, welat.

Bê te ezî fekîr, jarim,  
Bê hêlînim, bê sitarim.  
Dîn û harim, sergerdanim,

Bê piştovan, bê xudanim.  
Tu şerefa minî, welat.

Bê milk, bê şûn, him bê warim,  
Dûmeka da tim suxarim.  
Bê si, bê reh, bê rîçalim,  
Bê rûmetim, bê pergalim.  
Tu hêlîna minî, welat.

Pêkenîyê tew gela me,  
Belengazê serê riya me,  
Dinya ronik ez kor mame,  
Ne xweda nê heqê xume,  
Bîn-nefesa minî, welat.

Sirgûn, girtî, belengazim,  
Pê sirûkî, him kolazim,  
Sêfî, êswîl, bê perbazim,  
Hemû para ez xilazim,  
Hesretkêşê te me, welat.

Wekî ruyê xwe te xar kim,  
Ji vê dinê zû firar kim.  
Bibim xurê mişk û mera,  
Şûn megirim li tu dera.  
Rojêm bibin ax û keser,  
Av, hewa min bibin meft-jehr.  
Teyrên sîmir çavêm derxin,  
Neyarê har goştêm vexin.  
Mereza min qet qenc nebe,  
Loxmanêd min peyda nebe.  
Ker bim, lal bim, bibim ewter,  
Dilê min da çiqbin xençer.  
Desta merûm, çoka topal,  
Pî navêjim ez be gopal.  
Berf-teyrok min biqermînin,

Erd û ezman ne temlînin.  
Şîrê daykê min heram be,  
Bayê same li min rabe,  
Hesret bibim nanê tisî,  
Xwedê ser min danexe sî,  
Merûm bibim herdu çavan.  
Bibim xurê teyr û tevan.

Bê welatî – mezlûmîye,  
Bê rusqetî, xulamîye,  
Bê nav, bê deng, naqisîye,  
Heqaretî, sêfîlîye.  
Boy kê heye, şûn û welat,  
Wî ra heye jîne, heyat.  
Xwezil welat min bidîta,  
Êş-merezê xwe bavîta.  
Bigeryama ser axa heq,  
Wir biçûyama ez mala heq.

## EZ ŞA NABÎM

Hezar bahar bîn, hezar carî vebin gul,  
Hezar çem rabin, kanî bikin xule-xul.  
Hezar best şînbin, bixemilin gelî, del,  
Hezar neçar bîn, destêm nagrin kar-emel.  
Hezar rind werên, tev min bikin henek-naz,  
Hezar saz lêdin, sazêm nayê tu awaz.  
Heta sêfil-jar, gazin bikin ji zemîn,  
Heta xerîb hebin ez nakim qet qalîn.  
Hezar maşoq-yar min ra bînin mizgîn-caw,  
Hezar timtêşî bireqisin bedew-kaw.  
Hezar dengbêj bîn, biniçrînin pir dengî,  
Hezar reng hebin, ez hilnadim tu rengî.  
Heta daykam rind Kurdistan nebe aza,  
Heta kur û keç şa nebin bext miraza.  
Heta pêşmerge derneyên ji zaxên sar,  
Heta dê û bav boy xwe nekin qazanc-kar.  
Heta kal û pîr rehet nebin ser wara,  
Heta Şivan zîz neqîre gund-bajara.  
Heta piçûk-hûr ne civin li dibistîn,  
Heta «Nûbaram» bilind nebe wek Yasîn.  
Heta edlayî nebe para her yek Kurd,  
Heta hebûnam nasnekin tew dîn û xurt.  
Heta welêt da ez neçinim fekî-rez,  
Heta boy welêt cawê nedim îdî ez.  
Heta ala min nemilmile nav hewê,  
Heta hudûdêm elam nebin li dinê.  
Heta heykelê Feqî, Xanî daneynim,  
Heta heyfa xwe ji sek Seddam nestînim.  
Heta rast nebin tew planên faşe-xar,  
Heta ji gêdûka berjêr nebin dê û zar.  
Heta «Zor» dijmin neqifilin pêş Qazî,  
Heta hemû Kurd nebin ji emir razî.  
Heta dot û bûk derneyên ji zulm-qetlê,

Eger şa bibin, helal nabe min şîrê dê!  
Ez şa nabim, ez şa nabim tu car, tu wext,  
Heta ji neyar, ez nestînim tac û text.

## YA XUDANÊ, BÊ XUDANA!..

Erş û kursî te xuluqand, nav kir dinya,  
Ruhber rabûn, te kîsî xwe para wan da.  
Hinek geryan, hinek firyan, pak şiqitî,  
Hinek hur bûn, fetisandin heqîqetî.  
Parek lez ket, zû-zû çêkir jehr û alav,  
Parek rûnişt li hev anî delk û dolav.  
Hineka ra te da rusqet, bextewarî,  
Me Kurda ra te timê şand tel, hejarî.  
Hinek şa bûn, xemilandin koşk û sera,  
Hinek revyan, tim qerisîn serê rîya.  
Parekê ax timê kola, gotnê karger,  
Parek geryan nava çîya, ew bûn rênçber.  
Gotin: - Wê bê ew xudanê bê xudana,  
Wê melhem ke kul û derda, him jî jana.  
Tu nehatî, em helandin, kemitandin,  
Kirin kizik, rûn-donê me nuqumandin.  
Kî bû xwînrej, te destê xwe pêşda wan da,  
Te carkêva em bîr kirin nizam çima?  
Em bûn hêsîr, zêwrê birçî xwîna me mêt,  
Welat zêrya, me neqedand merem û nêt.  
Nift me derxist, neyar bûn toq, kêf wan ajot,  
Ked-heda me wana kirî, wana firot.  
Qelsa sar da em zêrandin, em rizandin,  
Wê wa bûya, te çima em xuluqandin?!

## XWEZİL, ROKÊ, BÎÇÛYAMA CEM OCALAN

Ez carekê biçûyama nav gêrîla, cem Ocalan,  
Pêş neyara, min şerkira, derbaz bûya zû zivistan.  
Bi çavê xwe têr bidîta mirina neyar, ala cindî,  
Axa dayê hemêzkira, tewafkira hemû qulc, cî.  
Bibihîsta qibe-qiba zarokê Kurd dibistana,  
Keç û xorta hev hezkira nav xasbaxça, li dîlana.  
Dengê defê, sewta zurnê, tijîkira koşk û xanî,  
Xwîna neheq nerijîya, zelal bûya çem û kanî.  
Qeyd û zincîr bihelyana, kaf-kûn bûna hepsên tarî,  
Ji welatê me derketa him sêfîlî, him hejarî.  
Gundî rehet erd şûvkira, şivan kerî bibra çîya,  
Pale zêrê reş û sipî hasilkira boy hemûya.  
Şoreşgera çek biavîta, hukm bida tim edlayî,  
Xwezil, îcar bigotana, îdî Kurda stend azayî.  
Minê ruhêx mizgîn bida, ne fikir axîn, ne jî ofîn,  
Dost şa bûna, bizêryana, melûl bûna qelp û xayîn.  
Minê hilda gulê teze, bimeşyama kubar-kubar,  
Li dinyayê elamkira, Kurd jî bûne xwayî extyar.  
Xêrxaz kom-kom bihatana, pîroz kirina Roj-eyda min,  
Dinya geş da bimilmilya tevî ala tim ala min.

## GOTİN, ŞAÎR, EV Çİ HALE

Behra dîtîm, cî leqîyan,  
Erd û esman tev hejîyan,  
Deşt-zozana hevra dengdan,  
Dehrên gorav qerisîn, man.  
Ji min kirin pirs-hewale,  
Gotin, şaîr, ev çi hale.

Terewula kirin zêwîn,  
Kew-bilbila nekir kakîn,  
Zer-zinara kir hêwurze,  
Orman avît xemla teze.  
Ji min kirin pirs-hewale,  
Gotin, şaîr, ev çi hale.

Şivîn bilûr da ser lêva,  
Berxvan barand hêsrên çeva,  
Bû kalîna berx û mîya,  
Keskesorê da ser çîya.  
Ji min kirin pirs-hewale,  
Gotin, şaîr, ev çi hale.

Pîra, kala hêsr rêtin,  
Dayka zelûl kilam gotin,  
Dota qetand torê mircan,  
Bûka avît koffî-kitan.  
Ji min kirin pirs-hewale,  
Gotin, şaîr, ev çi hale.

Teyrik, leqlek min sekinîn,  
Qaz-qulinga nekir qîrîn,  
Sosin, rihan cî binisîn,  
Sorgul, mendik zû çilmisîn.  
Ji min kirin pirs-hewale,

Gotin, şaîr, ev çi hale.

Ketim nava mitalê kûr,  
Xema birim heyamên dûr,  
Dinya fire min mêze kir,  
Hal-hewalê xwe qise kir...

Lêvêm hejyan, devêm tel bû,  
Dil tevzî da, serêm mêl bû,  
Kelexûya dane ser min,  
Sebir, tawet ne ma li min.

Welatê xwe min anî bîr,  
Gundê vala, zarên hêsîr,  
Qetla neheq, xûşkên ser reş,  
Gêrîlayên mêrxas-keleş.

Zaxên tarî, zindanên sar,  
Bore-bora neyarên har,  
Dêrêzbûna zoma, wara,  
Kaf-kûn kirina gund-bajara.

Jan êşê xwe min rêz kirin,  
Ji bextê xwe gazin kirin:  
- Gelo çima mezin Xuda,  
Ev zulma pir boy Kurda da?

Bedesla em bê war kirin,  
Dîroka me înkâr kirin.  
Kirin çar par tew axa me,  
Talan dikin mal-milkêd me.  
Heta kengê halê wa be,  
Hejar Barî bi çi şa be?

## XWEZİL, DÎNÊ AŞÎTÎ BE

Xwezil dinê aşîtî be, top, tifinga derneyên deng,  
Hilşên sûrê tew sînora, erş û kursî qet nebin ceng.  
Teyarê xof bihelînin, keştî atom mekin behra,  
Xasbaxçê ter, dibistana çêkin dewsa bombêd jehra.  
Leşkerê şêr bê çek bikin, wekî şênbin deşt û zozan,  
Bila îdî gund û bajar nebin xeza, nebin wêran.  
Bên sivrekê Erebb, Yûnan, Îspan, Frank, Pak û Hindî,  
Kurdistan min aza be, lêxe hîmnê xweyî cindî.  
Dest bidine hev Macar, Polan, Rûmin, Bolgar, Tirk û Hebeş.  
Qawa miskîn hasil bike, boy dostêd xwe tim zengê reş.  
Gelêd Kûbê deştê şekir bêcer bikin bê xof, bê tirs,  
Vyêtnam şên be, bibe sayî asîmanê Çîn û Êris.  
Bibin pismam Fars û Alman, Cihûd, Korya, Fîn, Îngilîs,  
Edilayê, him dostayê bînin ziman hemû meclîs.  
Qazax, Qırqız, Tacîk, Turkmen, Azer, File nolî berê,  
Pişt bidine hev, tev kar bikin, kîn û qudret nav van derê.  
Gurc, Êkraîn, Êzbêk, Êston, Moldavanê pir emek hez,  
Lîtov, Latîş, Tatar, Başkurd bibin dostê hev bê qerez.  
Felestînî xudan ax be, Efqan mal da rihet rûnê,  
Xwînaxarê har jehr û mewtê bernedine nava hewê.  
Gelê kole aza bibin, tu car nebin qetlêd giran,  
Her milletek welatê xwe, bibe xwayî, bibe xwedan.  
Afrîqa şîn, Amerka şên, bibin dostê heve hurmet,  
Tew mezhebê, dinê heyî, hevra bikin qedir, qîmet.  
Celladê har zelûl bibin, pêş heqîyê bidin cawê,  
Her çar qolba xwîn merêje, sivik bibe barê dinê.  
Hemû millet bibin bira, mêvan werên welatê min,  
Pêş şehîdê temenne bin, pîroz bikin azaya min.

## DÎNÊ ÎSLAM

Bavpîrêd me bizan bûna wê me kor ke dînê Îslam,  
Wê wede da şûr hildana, ne dikirin em musulman.  
Qet nedibûn dîlê mêjê, mêl nedibûn pêş mizgevt,  
Roja îro me ne dikir dew û doza war-rusqeta.  
Ezim, ezim ne gotana, bimeşyana tevî zemîn,  
Dinya fire teng nedibû, pêşya Kurda îro yeqîn.  
Hesret û êş, jan û keser, me ra nedibûn barên giran,  
Neyarê har destê zorê, mal-milkê me nedkir talan.  
Nolî teva bijiyana emê hetev, tim bextewar,  
Serê rîya, nava çîya, em nedibûn sêfîl, suxar.  
Ked-heda me qet nedibû para hovya, gurê gewir,  
Wê rûyê me bikenîya dinya, alem, him jî dewr.

## WELAT DİÇE, GELÎ BİRA ÎDÎ RABÎN!

*Rewayî şerê Qerebaxa çiya dikim, kîjan ku 1988 salê nava Azerî û  
Ermenîya da despê bûye.*

Kanî Şûşe, Xankenda şên, mizgevtên rind,  
Laçîna sar, kal Xocelî, hezara gund?  
Tîrên neyar dil-hinavêm dihelînin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Ka Kelbecer, ormanêd rewş, avên şerbet,  
Tirba Vagîf, Çidir dûzî, koşkêd rehet?  
Ka Eskeran? Neyar îdî tew zevt kirin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Kanî Qemze – dota Kurda, zîlamên xurt,  
Xosrovê şêr, Çîngîzê mêr, Sultanê Kurd,  
Mêrxas Nebî, xatûn Hecer – esil da Kurd,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Ka Axdaban, mala Şemşîr, Berşada gur,  
Axdera têr, rind Xocevend, medenêd durr?  
Kerkîcahan, Malibeylî kaf-kûn kirin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Ka Fîzûlî, ka Cebraîl, gundê Zîlan?  
Bûne rijî him Kûbadli, him Zengîlan.  
Pêş neyara mêr natewin, mêr narevin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Xêlê wexte Hekara gur xûn dikişe,  
Bûkê xêlî xwe kirine xemla reşe.  
Kur-keçên me miraz dil da hêsîr birin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Cînarîya sal-zemana zû bîr kirin,  
Nan-xoya me tev xaribû, pêpez kirin.  
Sîlva, Sêro, Vazgên, Zorî şer rakirin,  
Xîret diçe, gelî bira, îdî rabin!

Rabin, rabin, zerpa lêxin, bikin gazî,  
Welathezbin nolî Barzan, mîna Qazî!  
Neyar delke, wan ji welêt bikin dere,  
Dilê van da binikînin kêr-xençe!

Rabin, rabin, gelê Azer, Kurdên kebîr,  
Bibin kulmek lezgî, taliş, tatên tivdîr!  
Rabin, bila peyhatî me nelomînin,  
Çawa tirsek, me cêr mekin, neniqlînin!

Welat dêye, qam-qinyate, him jî hêlîn,  
Nav-namûse, gerek bigrî destda qewîn.  
Kesê bê ax şîv-şekire boy wî mirin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

Îro roja xîretêye, xwe medin paş,  
Azer, Kurda kişandine tevayî êş.  
Hildin heyfa şêr-şembaza, pêşda herin,  
Namûs diçe, gelî bira, îdî rabin!

Ez dixazim kûlîlkên ter dîsa bînkim,  
Laçîna xwe têr hemêz kim, him jî maçkim.  
Kanya Îsa bingeh daynim, lêxim hebin,  
Hebûn diçe, gelî bira, îdî rabin!

Rabin, rabin, warê neyar bikin tar-mar,  
Fitê medin îdî bijî gurê xedar.  
Ala sê reng bilind bigrin pêşda herin,  
Welat diçe, gelî bira, îdî rabin!

## DÎN Û WELAT BÎRANE

Rîya xwedê rast-heqîye,  
Mezhebê min şafîqîye.  
Bê mezhebî dîna dere,  
Berê-berda xwelî sere.

Dînê efzel – Îslame,  
Pirtûka wî – Qurane.  
Lel-cewahir wê daye,  
Kilyameta Xwedaye.

Dîn û welat birane,  
Bê welatî girane.  
Bê welatî – bê ware,  
Hejare, tengezare.

Welat ruhe, hêlîn, cane,  
Ew ronaya herd çavane.  
Ewa kesê bê welate,  
Zulum ser wî tim du qate.

Welat mêje, him taete,  
Dîn û îman, merîfete.  
Kal û bava rast gotîye,  
“Dinya ronik ew cinnete.”

## ÇAWA NEGERÎM

Pismamê qenc, dil kul meke,  
Kedera wî weke dinya.  
Hesreta min Kurdistane,  
Dijmin kiriye çar kerîya.

Dotê cindî, bûkê nazik,  
Bavê cahal, dayka rindik,  
Xortê bi eşq, zarê sivik,  
Qirbûn, qirbûn, jê man hindik.

Bajarê geş, kanê zengîn,  
Gundê mezin, koşkêd rengîn,  
Tew şewitîn, tew hedimîn,  
Ça ne girîm, nekim axîn?..

Çemên zelal, him berên kûr,  
Erş û kursî, ezmanê dûr.  
Eger hildin gişk derdên min,  
Wê belabin bi sero-bin.

## EZ EW KESİM

Ewa kesê balgê kevir,  
Lihêfa ser tenê ewir,  
Doşaka wî tim erdê sar,  
Surê, sermê beden lê xar,  
Zaxe kire koşka xemil,  
Tifingê xar timê sermil,  
Ez ew kesim, deng û besim,  
Şîrê helal mêtî kesim...

Ew egîtê hogir baran,  
Berf daqurçand tim dewsa nan,  
Qet têr nedît xewa şîrîn,  
Tevî gura kire zûkîn,  
Êwir danî ban-xubara,  
Bû mêvanê zêr-zinara,  
Ez ew kesim, deng û besim,  
Şîrê helal mêtî kesim...

Ez Kardûxim, bavêm Rustem,  
Para min bûn kulûra xem,  
Avêstaye zimanê min,  
Bîsitûne şa bûna min,  
Tacê zêrîn Xanî, Goran,  
Feqî anî «Şêxê Senan».  
Ez ew kesim, deng û besim,  
Şîrê helal mêtî kesim...

Mûsil, Kerkûk, geliyê Zîlan,  
Behra Wanê, Qers, Qaqizman,  
Dehok, Zexok, parek Îran,  
Sîpana sar, deşta Barzan,  
Hemû milk û warên minin,  
Niha ah û zarêd minin,

Ez ew kesim, deng û besim,  
Şîrê helal mêtî kesim...

Niftam diçe ça çemên gur,  
Axa mine tew lel û dur,  
Ez kargerim, birçî ezim,  
Hepsê sarda mirî ezim,  
Dîl birînî, pîr kul-derdim,  
Destûr tune welêt berdim,  
Ez ew kesim, deng û besim,  
Şîrê helal mêtî kesim...

## ÇEMÊ FIRAT

Tu min sih ke, bisekine, bilûvîne, meke xuşîn,  
Rica dikim were tev min basûd bike hespê zemîn.  
Çargav bajo dinya fire, deşt-zozana derê geştê,  
Kurdistana mine rewşe, libasê nûh li wê xweş tê...

Çemê Fîrat, bûka teze reş xemilî, gelo çima?  
Bav şehîd ket, dayîk birin, lorik birçî hîvya kê ma?  
Gund û bajar kirin wêran, ser zinara xwîna me ma,  
Hemû Kurdan, Kurdistanê aza bike em bibine şa.

Çemê Fîrat, qurne-qurne tev te kişyan hêsrên Kurdan,  
Wate çîye dayîka min xîlaz nabe kul û derdan?  
Îdî bese, bikêlime, li alemê bike hewar,  
Belkî îcar qencê dinê hemû Kurdan bikin sitar.

## CELLAD ERDOXAN

Ji ku hatî, hetanî ku,  
Pêş dîrokê rû reşî tu.  
Çê bûyî ji qetlê, xwînê,  
Dixapînî tamam dinê.

Şûn nagirî îdî vira,  
Gurê gewrik nabe bira.  
Te şîn kiriye nav welate,  
Hebûna te jehre, mewte.

Ew dayîka ku tu anî,  
Xwezil ewa ne xulqîya.  
Sek bavê te ku hat dinê,  
Hewzê dê da bixenqya.

Îdî bese, zulmê bikî,  
Zar-zimana qutkî, jêkî.  
Dewir gilyê xwe dibêje,  
Darda dike ew xwînêrêje.

Bê şerefî, ew eyane,  
Bê murvetî, dinê zane.  
Serokê me bê guneye,  
Kurdistane hîviya wîye.

Rê berê me meêşîne,  
Mewt-jehra xwe mereşîne.  
Destê xwe jê bikişîne.  
Hemû Kurde benda wî ne.

## ÎDÎ BESE

Ewrên tarî, ne hurmijîn, ne gurujin, îdî bese,  
Gul-sosina ne rencînîn, ne zêrînîn, îdî bese,  
Tavî, teyrok, mekin girmîn, nekin ringîn, derbazbin zû,  
Kurdistane birîndare, ne êşînîn, îdî bese.

Bayê şamê, hêdî-hêdî, neke gazî, hewar, dengî,  
Dotê Kurdan unda kirine bi hezaran xortêd bengî,  
Dicle, Firat, bikewgirin, bilûvînîn hezar rengî,  
Kurdistane şînê da ye, pejmûr nekin, îdî bese.

Berfa sipî, zef nebare, neke tofan, pîr hewirze,  
Kurdên mine bê sitarin dîsa neyne xemên teze,  
Bombên jehrê, hîvî dikim, nav Helebcê peya nebin,  
Kurdistana min cinnete, ne şewtînîn, îdî bese.

Tanqê giran, teyarê xof, nekin gurîn, him teqe-req,  
Bahar hatiye, gul vebûne, hûn nerêjin xwîna neheq,  
Gur Seddamê îcar hişk be, wê eyan be, kîye neheq,  
Kurdistana min egîte, feqîr nekin, îdî bese.

## HESRETKÊŞE TE ME, WELAT

Dinalim, dizêrim, bê te, welat,  
Bê piştîm, bê çarîm, dûrim, welat.  
Sêfîlim, sêwîme, bê par, bê war,  
Dêyî, ez ewledê te me, welat.

Xîret, şeref, zarê minî, welat,  
Sî û sitar, edla minî, welat.  
Wek te bilind tu erş tune,  
Gulî, ez gulvanê te me, welat.

Hêlîna germ, qubla minî, welat,  
Şeref, xemil, rewşa minî, welat,  
Zemzemî, teverikî, boy tew Kurda,  
Timê hesretkêşê te me, welat.

Rewîme, digirim, nawînîm te,  
Direvim, dibezim, naghîjim te,  
Xalî nabin çavê av û hêsa,  
Dîlim, dilêşim, tengezarê te.

Xwezîl min bask weda esmanê te,  
Aza bimeşyama ser axa te.  
Xwînşwar hemêza te zû derketa,  
Ewîl pêrozkira min cejna te.

## RİCA DİKİM

Tijî dibî, vala dibî, tim bê qîrar,  
Geh dîkenî, geh digrîy, tu bê îtbar.  
Xezna kûrî, pêş te çine behr-okêan,  
Hemêza te tew cinnete, em lê mêvan.  
Gelek kesa xwastin ji te bistînin bac,  
Feqet, ew man him bê sitar, him bê îlac.  
Lawê te me, ne agirim, ne jî tofan,  
Ne pirîskim, ne şipûkim, ne jî baran.  
Xuluqandim, ne da min ra rusqet, ziman,  
Navêm bû Kurd, him bûm sêfîl, him bûm dêran.  
Reca dikim, îcar were tu min rehmê,  
Destûr bide, ez jî derêm keder, zulmê.  
Belkî şa bin, piçûk, mezin, qelbên wêran,  
Neyar korbin, aza bibe tew Kurdistan.

## XWEZİL ROKÊ BIANIYANA MÎN RA MÎZGÎN

Xwezil rokê bianiyana min ra mizgîn,  
Bigotana: - Aza bûye Kurdistanê teye rengîn.  
Dê û dota êxistine cilê şînê,  
Melle nadin îdî terqîn û yasînê.

Neyarê hur teyax nekir, revî paşda,  
Zindanê sar, qersên tarî neman wir da.  
Ax seqirî, çû hejarî, belengazî,  
Esman vebû, xemilîne bestê tezî.

Direqisin pîrê sed sal, keçên heznî,  
Dengê Şivîn hingavtiye çîya-banî.  
Sêfîl-sexîr kom-kom diçin dibistana,  
Kurd jî bûye xweyê dîrok û dîwana.

Kalê xîret, xortê cindî, bavê lawhez,  
Gund-bajara tew çêdikin bi xar û bez.  
Destê cotkar dîsa çûye ser maça cot,  
Xwîn vereşîya kesê welat boy zik firot.

Min bikira eyda mezin bi dilê şa,  
Mêvanê min bihatana hemû qulba.  
Evdê xêrxaz bicivyana holika min,  
Binbar, pîroz, bikirana eyd roja min.

A hê minê bizanbûya ez merîme,  
Ezî bi reh, ezî bi war ne mirîme.  
Kesê bê ax dara pûçe nagre bin erd,  
Emrê şirîn boy wî dibe keser û derd.

## AX FELEK!..

Ax felek, wax felek, bê îtbar, felek,  
Tu sîyar, em peya, te nagrin, felek,  
Em hene, em dijîn, dizêrin, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Neyar hat, hebûn bir, şa bûyî, felek,  
Em kaliyan, naliyan, seqirîy, felek,  
Zar maşyan, dê giryan, ne hatî, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Kasil bûn, rêncîyan dûmeka, felek,  
Afrîkê zengê reş aza bûn, felek,  
Netirse xemêd me sivike, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Tew millet, bûn xweyî mal-rusqet, felek,  
Erd yê me, em mane bê welat, felek,  
Em dimrin, tu dîsa kivş nabî, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Mirî çûn, em zindî hûrxwaş bûn, felek,  
Tirbên me bin tanga pêpez bûn, felek,  
Kanên me neyara kişandin, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Mergên me, deştên me, bedewin, felek,  
Mal ya me, em têda firarin, felek,  
Avên me dikişin, em tîne, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Me Rustem da, Sulheddîn da, ingirîy, felek,  
Me Feqî da, me Xanî da, xeriqîy, felek,  
Em binisîn, em çilmisîn, nehatî, felek,

Carekê rûyê me bikene, felek.

Helebce tew bû jehr, geş bûyî, felek,  
Çûk helyan, em nalyan, te xwaş hat, felek,  
Mêr mirin, keç zeryan, tu ku bûyî, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Qasim hat, Seddam hat, doş bûyî, felek,  
Kemal hat, Cemal hat, geş bûyî, felek,  
Teyara em kuştin, te fêz da, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Pir dergûş, ser berfa qerisîn, felek,  
Hêleçan vala man, te xwaş hat, felek,  
Xortê qenc, dotê baş, qir-qut bûn, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Şewlê dûr, gelyê kûr, betilîn, felek,  
Çemê gur, ser me da miçiqîn, felek,  
Bextê me tim reş bû, tu kuyî, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Xwedê em dergê xwe avîtin, felek,  
Ser erdê em rehet qet nebûn, felek,  
Birîn me axivîn, te kew neda, felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

Em Kurdin, qels nabin, bîr meke, felek,  
Pêş dijmin, ber zûlmê narevin, felek,  
Yan mirin, yan Welat, dew eve , felek,  
Carekê rûyê me bikene, felek.

## EZ KÎME?

Ne xwînêjim, ne pir bêjim, ne jî dêran,  
Ne durûme, ne xayînim, ne jî filan,  
Ne rê birim, ne ked xurim berê-berda,  
Xuluqîme, xalî nabim kul û derda.

Ez ne dizim, ne qaçaxim, ne derewbêj,  
Ne revekim, ne dîn-harim, ne ker û gêj,  
Ez kargerim, xûydan rêjim berê-berda,  
Ez hîrome, ez gîrome nav emir da.

Ne feqîrim, ne bedeslim, ne bê tivdîr,  
Ne acizim, ne kasilim, ne bê texbîr,  
Welathezim, bok-beranim berê-berda,  
Simêl palim, tirsam tune zincîr-qeyda.

Ne kevirim, ne gedûkim, ne şewla xar,  
Ne kanîme, ne gelîme, ne çemê har,  
Gula bînim, bê av mamê bere-berda,  
Bê rusqetim, tengezarim Şerqa kalda.

Ez Mûsilim, şên Kerkûkim, Cizîra rewş,  
Mehabadim, Erdehanim, Serdeşt xweş,  
Gul Sînenim, geş Bidlîsim, Sîpanê rind,  
Ez Batmanim, ez Çewlikim, hezara gund.

Dîyarbekir, Dêrsim, Hîzan, him jî Zexok,  
Ez Dicleme, ez Firatim, him jî Dihok,  
Deşt a Wanê, gelyê Zîlan, cot Agrî me,  
Kosedaxim, Eledaxim, zar cindî me.

Ûrfa rewşim, mêr Şirnaxim, him jî Merdîn,  
Gur Erezim, Hekarîme, Mûrada dîn,  
Rewandûzim, Ûrmîyame berê-berda,

Ser bilindim, zûda xasim eslê xwe da.

Ez Bîsitûn, «Kevrê sondê», Helebceme,  
Erfîna rêz, «Çîyayê bêxêr», lawê çême,  
Erzûrûmim, Qaqizmanim berê-berda,  
Ez ne kenyam, ez şa nebûm vê dinê da.

Ez Guhderzim, Rustem Zalim, şêr Sulheddîn,  
Ez Qazîme, ez Barzanim bikin yeqîn,  
Şêx Sehîdim, Ocalanim berê-berda,  
Xêynî welêt tawet nakim ez tu erda.

Ez Feqîme, ez Xanîme, him Cizîrî,  
Cegerxwînim, sert Bateme, kal Herîrî,  
Merd Goranim, mêr Hejarim berê-berda,  
Bextê min reş, dişewitim nav zulmê da.

Sîyabendim, Xeca zêrim, dilêm wêran,  
Sîtya alim, Zîna jarim, Memim, heyran,  
Bengî Eyşim, pîr namûsim berê-berda,  
Dilovanim, bê hucetim ruhê xweva.

Leyla Qasim, Zekîya şewat, rind Binevşim,  
Eyşeşanim, Gulistanim, awaz xwaşim,  
Gêrîlame, Pêşmergema berê-berda,  
Bê sûç-gune tim dizerim hepsê sar da.

Ez ne Tirkim, ne Erebin, ne jî Fariz,  
Ne Qazaxim, ne Êzbêkim, ne jî Qirgiz,  
Mêdya kalim, Şedaddîme berê-berda,  
Bê zimanim, bê miskanim mala xwe da.

Rîya min heq, eslê min Kurd, musulmanim,  
Kanê min pîr, axa min dur, lê mêvanim,  
Ez birçîme, ez tezîme berê-berda,  
Kaliyam, naliyam, tim peritîm xerîbyê da.

## **DÎLO, LEZ NEKEVE, HELA ZÛYE !..**

Rîya te tim dirne-dirne, xaro-marô, kuç-pel bûne,  
Hesreta te axa welêt, paxila dê, kur-keç bûne.  
Kanî, orman, zer-zinarê welêt hele te nedîne,  
Bestê fire, zozanê berf, çemê fûr-fûr te nedîne.  
Kendalê xar, xinçîkê reş, şewlê bin av te nedîne,  
Mêrg û çîman, xasbaxçê ter, sorgulê bîn te nedîne.  
Givîc, tirşik, şîlanê tem gelîyê meda werixîne,  
Zeytûn, hêjîr gihîştine, were tev min biçîrpîne.  
Sêv, hinara, hurmê welêt tem ke têr-têr, bike nûbar,  
Terazuna tu mêzeke, ser êlê da em bêne xar.  
Rind bibîne bûkê xêlî, zavê şermok, keçên bikir,  
Berbûyê naz, daykê kedhez, kal û pîrê dikin zikir.  
Kila bidin nehêra dar, wexun tasek dewê meşkê,  
Bikursînin klora dê, bereketê têxin testê.  
Bila şivan boy te dîsa bilûra xwe binicrîne,  
Berxvan seba bêrîvanê berbi zomê bilezîne.  
Swarbin kihêl, menekê çê, bajon çargav, bibin mêrxas,  
Axa welêt em hemez kin, tew qulçara em bibin nas.  
Reva neyar em bibînin, maçkin enya egît-şêra,  
Helebca jehr xema derxin, Seddam bikin nifir, cera.  
Kulîlkêd ter biçîrpînin pêşkêş bidin keç û zerya,  
Kurdistanê têr bigerin, wexun avêd belekîya.  
Cizîra rewş bibine mêvan, tewaf bikin tirba Xanî,  
Vekin derê dibistana, bixemilin mal û xanî.  
Bihecqînin serê Seddam, bihedmînin qersê tarî,  
Gund-bajara ava bikin, welêt derê sew-hejarî.  
Em zû bibin Kurdê aza, xweyî rusqet, him wekîl nevs,  
Dinya-alem me pîroz ke, me nas bikin, neyar û qels.  
A wê hingê ezê bêjim, dîlo, deme, îzin teye,  
Ezî îdî bextewarim, mirin îcar seva meye.

## CAWA XÊRÊ

*Rewayî daçêkirina dewleta Kurdistanê Fêdêral (Îraq) dikim.*

Îro cawek dane min da, cawa xêrê,  
Mizgînvana bandikirin li her derê.  
Destê wan da ala sê reng dimilmilî,  
Direqisîn, bîr kiribûn şîn û girî.  
Ket bîra min weysêt, gotinên kalên zemîn,  
«Dergûş megrî, dayîk nade wîra bistîn».  
Pêş yekbûnê çok wedidin neyarêd har,  
«Beraz zevyê dernakeve, lê nexî dar».  
Şabûm, hilda kaxet, qelem, berçavka xwe,  
Çend gilyava, rêş şabûna kal dilê xwe.  
Rebbê jorîn îdî hatye li me rehmê,  
Lawên Kurda qutkirine rehên zulmê.  
Kurd – mêrxase, Kurd – hafade, Kurd – nagirî,  
Ser bilinde, nolî Sîpan, wek Agrî.  
Pir zaneye, nav-namûse, tim xîrete,  
Lawê Zale, pêş neyara ne duqate.  
Şikir, şikir, kaf-kûn dibin hepsên tarî,  
Neyarê me çok vedidin, dikin zarî.  
Rîya me heq, yekbûn rewşa gelê mine,  
Kurd jî dibin îdî xweyê axa xwene.

## DAYKA MÎN KURDISTAN

Dîroka te ez vedikim belg û belg,  
Wek te kesî qet nedane şêr, leheng.  
Îro dîsa ser te bûne qal û ceng,  
Îdî bese, bibî kole, Kurdistan,  
Dora teye, neyar qut ke, ez heyran.

Mêzopotam axa teye, kubar be,  
Akkad, Kardûk gelê tene, kubar be,  
Agir, alav, rewşa tene, kubar be,  
Îdî bese, bibî çar par, Kurdistan,  
Dora teye, neyar redke, ez heyran.

Kawe, Guhderz, Rustemê Zal te da ne,  
«Kal Avêsta», «Cejna Newroz» te da ne,  
«Mem û Zîn»ê, «Zembîlfroş» te da ne,  
Îdî bese, bibî bêzar, Kurdistan,  
Dora teye, neyar alt ke, ez heyran.

Feqî, Xanî, tacê zêrin, şa bibe,  
Şer Sulheddîn lawê teye, şa bibe,  
Xwedê Apo te ra daye, şa bibe,  
Îdî bese, par-par bibî, Kurdistan,  
Dora teye, neyar ker ke, ez heyran.

Nav gelan da, gelê mêrxas gelê te,  
Nav zaran da zarê şîrîn zarê te,  
Vê dunê da zulma giran para te,  
Îdî bese, pêpez bibî, Kurdistan,  
Dora teye, neyar xinc ke, ez heyran.

Xêynî neyar, te naz dike tew alem,  
Zîyaretî, tiverikî, nolî «Zem-Zem»,  
Heta kengê nav gelada bihelin em,

Îdî bese, sêfl bibî, Kurdistan,  
Dora teye, neyar qetke, ez heyran.

Dem hatiye, zindan, hepsa bihedmîne,  
Qeyd-zincîra hûrxaş bike, biqetîne,  
Bi zor, xaşî azaya xwe tu bistîne,  
Îdî bese, tîş-tîş bibî, Kurdistan,  
Dora teye, neyar hûr ke, ez heyran.

## CELLAD CÎLLER

Dûr, dûr here, nezêrîne, em lal nabin,  
Lawê Zal in, pêş te tu car em xar nabin.  
Elba sebrê tijî bûye, meleqîne,  
Rastî namre, dîrok dijî, ev yeqîne.  
Ser vê axê şêr digerin, kaf-kûn meke,  
Xwîna neheq ber dergê me vala meke.  
Em birane, cîkî jîne, nav qurna da,  
Pêş neyara me şer kiriye, cîkî, hevra.  
Çerxa zemîn pašta mede, bisekine,  
Dêlegûrî, namûs, şeref boy te tune.  
Behr dikele, pêl rabûne, pêşîyê derê,  
Ba nikare bileqîne ji cî zerê.  
Xwezil kezav, sek bavê te nexuliqya,  
Zikê dayka te wede zûtir biqelişya.  
Te werkirye welatê me libasê sor,  
Nav renga da pîr bedewe tim rengê sor.  
Sor – azayî; sor – mêranî, serkevtîye,  
Kurd aqile, Kurd mêrxase, ne kotîye.  
Haveynê te zikirmewte, nişa zûlmê,  
Îdî bese bixapînî tu vê dinê.  
Ser lêvên te «demokrasî», tim «biratî»,  
Kêr-kirinen te xeza, qetl, mixenetî.  
Qurna bîsta xilaz dibe, me vegere,  
Xaliq îcar em dîtine, me dûr here.  
Îro deme, em natirsîn, hatiye firset,  
Heta kengê dilê me da wê bijî hesret.

## KURDÎM

Berê Zerdeşt, paşê bûme musulmane,  
Ez bûm kole, min unda kir zar-zimane.  
Dinya, alem, halê zane, tişt nabêje,  
Musulmanî nav êgir da min dipêje.

Musulmanî min alîya, bûme hîro,  
Ezabê wê dikişînim, heta îro.  
Ez kor kirim, avîtime qulça, dera,  
Welatê min kirin çar par, hovî-hara.

Bê tifaqî kir nava me, li me şa bû,  
Birakuji me ra anî, nav me cî bu.  
Ez bûm Îslam, birê Êzdî, rê me firq kir,  
Pêş neyara tev şerkirin, ji me dûr kir.

Ser sicadê em bûne dîl, boy cinnetê,  
Welatê me bû goristan, girî ketê.  
Daka, xûşka reş girêdan, law zû mirin.  
Bav-dê kuştin, hebûna me hemû birin.

Hecî hatin, ayet xandin, awaz-awaz,  
Gel pêş wana timê mêl bû, kire pêşwaz.  
Dînya Îslam, Mekk, Medîne wan pesinî,  
Me veşartin qeyd-zincîrê sar-hesinî.

Melle rabûn nolî kariyê pey baranê,  
Şêxa gotin tiverikin em vê dunê.  
Kêr-kirinê musulmanîyê boy me bûn ev,  
Rojên şeveq, pêş me kirin wê tarî, şev.

## ÇEMÊ MÊDÊOYÊ

Guşe-guşî, xuşe-xuşî, zev bê qîrar,  
Dimilmilî, dixulxulî pir bextewar.  
Geh kef didî, geh jî dikî qal, hêwurze,  
Car-carana diaxivî lewzê teze.  
Çîya, banî, zer û zinar hogirên te,  
Darên merxê, sosîn, rihan tew rewşa te.  
Li dora te naz-bedewa danîne war,  
Dengê defê hingavtîye banî, beyar.  
Rewş birê te, Mûrada min zare-zare,  
Xwîna gelêm nolî çema tev tê xare.  
Neyar wê jî yasax kirye zar û ziman,  
Naxulxule, namilmile, dewran, dewran.  
Delîl Asê, Hesenîkê, bengî, hejar,  
Çend qurnene hêsrên şevat tînine xar.  
Xûşk û birêm naxemilin, nareqisin,  
Bê sûç-gune hepsên sar da diçilmisin.  
Dicle, Fîrat xeyîdîne, nalîlînin,  
Zûlma giran, ew jî îdî natemlînin.  
Hîvî dikim, carekê jî bihurmiye,  
Bibe gulle, neyarê me tu bukuje.

## AX BÊ WELATÎ, BÊ WELATÎ

Jana welêt, êşa welêt ez helandim, kirime rijî,  
Xerîbyê da ez keribîm, hêsa çavê kirine tijî.  
Dîsa îro ser min kenîyan, min ra gotin, tu ku hatî,  
Hineka jî tinaz kirin, em nizanin çi milletî?  
Hişmetkar bûm ve ecêbê, ketim nava mitalê kûr,  
Him kewgirîm, him ricîfîm, xema birin heyamê dûr.  
Min got: - Kurdim, xuluqîme ser vê axê, bendê xwedê,  
Nolî gişka min jî mêtîye, şîrê sipî bistanê dê.  
Welatê min Kurdîstane, parek aran, parek zozan,  
Dicle, Firat rewşa minin, bahar-bahar dîkin tofan.  
«Mem û Zîn»ê, «Xec û Sîyabend», «Zembîlfroş» fexra minin,  
Kawe, Guhderz, Rustemê Zal tacê zêrin serê minin.  
Dîrokê da rêçam heye, li cahanê ew eyane,  
Dew û dozen min kirine, her çar qulbên dinê zane.  
Bextê meş hat, rozgar rûyê me nekenîya, ji min dûr çû,  
Ra û roşet ji min stendin, zirav kirim nolanî mû.  
Tew şerqa kal min aza kir, îro mame ez bê hêlîn,  
Ewladê min sêwî mane, birçî, tezî, dîkin zêrîn.  
Him bin, him ser, axam kane, berê-berî da zane dinê,  
Neyar dilê me kiriye çar par, dişewitîm nav vê zulmê.  
Tew heya min hemû birin, ser piştê min agir dadan,  
Dil-hinavê min peritîn, bûne cîyê kulan, derdan.  
Qetilkara li welatê min kirine libasê sor,  
Bav û birê min kirine, hepsê tarî bi destê zor.  
Xasbaxçên min bûn goristan, kal û pîrê min dizêrin,  
Bûkê xemle ser bi xêlî, ber perda da hîvya mêrin.  
Dê û xûşkê me dilûvînin, ji çar qulpa nayê îmdad,  
Heta îro kesek tune xwînê ra bêje cellad.  
Murvên dinê, reca dikim, werên halê me bikin mêze,  
Xwînê ra îdî bêjin, kîye kevin, kîye teze.  
Dem hatiye, emê heqê xwe bistînin bê şik, ese,  
Kurdîstana min cînetê, zûlmê derxin îdî bese.

## MÎROVÊD DÎNÊ, WERÎN REHMÊ, HEQÎQETÊ EŞKEREKÎN

Hemû gotina rast bibêhin, halê Kurda baş mêzekin,  
Bextê gelêm dest we daye, vê rêzîlyê qebûl mekin.  
Welatê min, him ser, him bin lel û durre, berê-berî da,  
Bok-beranê daykam dane, nexulqîne li tu erda.

Zerdeşt, Kawe, Rustemê Zal, ser vê axê dê da bûne,  
«Ker û Kulik», «Mem û Zîn»ê, «Xec û Sîyabend» li vir jîne.  
Herîr, Bate, Feqî, Xanî, Hejar, Goran lawê vir in,  
Lawê dayka mine mêrxas, serê Dehok vir jêkirin.

Em Manna ne, em Şûmêr in, Şeddadî ne, Mîdya kal in  
Gav, rojêd me qet neçûne hêsa, rihet, bê dew-qal in.  
Em Arî ne, Kesranî ne, egît tu car nayên mirnê,  
Çanda gelê mine zêrîn xemil daye çanda dinê.

Em Kardûx in, dîrokê da rêçêd gir-hûr me hîştîye,  
Kevn «Avêsta», Cejna Newroz, «Tet Bîsûtûn» xezna me ne.  
Mûyê hespa, ser darika me girêda, çê bû mûzîk,  
Gelê dinê ji me hînbûn, veçêkirin boy xwe mûzîk.

Em, ne kedxur in, ne xwînêrêj in, aşîtiye av, hewa me,  
Em karger in, cihan zû da midheyr maye ser keda me.  
Têrrorîsta bînin holê, heqîqetê eşkerakin,  
Werin rehmê, qetil-zulmê, koletiyê me xilazkin.

## XEWNÊ DA ÇÛBÛME KURDISTANÊ

Soqaqa ra dibuhurîm nav mitalê kûre, dûr da,  
Nizanî bûm çi yê bibe, çi yê bêye îro jor da.  
Dilikijîm, dixuldirîm, geh beşer xaş, geh posîde,  
Ewrê tarî tijî bûbûn, dihurmişîm zev bêhûde.  
Kûr mitala ez hişyar bûm, welatê xwe min mêze kir,  
Axa Xaliq boy me daye, dilekî şa min hemêz kir.  
Min xast hêdî pî bavêjim, nedît cîkî bê telp, bê xwîn,  
Çar hewirdor quloz dibû, şîn û girî, qîrîn, qûjîn.  
Rûyê erdê şewitî bû, qizirî bû, dixast îmdad,  
Birîndara nale-nal bûn, vediêsiya li van heyat.  
Dayîk û xûşk, zarê sêwî, zelûl-zelûl dikewgirîn,  
Kalên, pîrên birçî, tezî, hejaryê da divemirîn.  
Çûm goristîn, kit, zo bûbûn tirb, ser kêlkê şêr gêrîla,  
Nav êgir da bûbûn rijî, gund, bajarê vike-vala.  
Ji tirs-xofê, teyrik, tûjî melisî bûn ser hêlîna,  
Tew terewil ketibûne kevta, zaxa, binê lana.  
Çem û kanî gevez bûbûn, daristana dikir hewar,  
Gul, gulistan çilmisî bûn, hêsrên şewat danîne xar.  
Çîya, banî dilerizîn, behra Wanê dikir îskîn,  
Agrî, Sîpan xeyîdî bûn, gazin dikir wan ji zemîn.  
Dilêm tîr da, çokê mî sist bûn, min kişandin ax û keser,  
Ber çavên min yekcar reş bûn, gelek bende, him jî beşer.  
Min got: -Xaliq, wedê hebû destê te da îlac, mimkûn,  
Çima mirov te xuluqand, nîgara te dike kaf-kûn.

## REBBÊ JORÎN, RÎCA DÎKÎM, VÊ DUA MÎN QEBÛL BÎKE

Xwezil, xwezil, zû bihata ewa roja,  
Welatê min derkata ji dewa-doza.  
Neyarêd me bişewitya, bibiya rijî,  
Dost-aşîtîyê axa daykam têkra tijî.  
Dê û dota bixistana cilê tarî,  
Kurdistanam bixemiliya bê hejarî.  
Ezmanê mij îdî bibuya çîk û sayî  
Gelêm axa kal û bava bibuya xayî.  
Çem û kanî ji xwîna sor paqîş bûna,  
Rêwyê rîya êwira da ne zeryana.  
Sosin, rihan, kulîlkêd al, nergîzêd bîn,  
Xasbaxçara bişandana bersîv, mizgîn.  
Hemû bînber têketana xewa şîrîn,  
Bilbil şabûya, biqalanda reng û rengîn.  
Xort tev keça bigeryana daristana,  
Şa bibyana gund-bajara, deşt-zozana.  
Zagros, Nemrûd, Agrîya kal, Sîpanê sar  
Çavronkayî bidana hev kubar-kubar.  
Amed, Bitlîs, Makû, Bîngol, Qers, Qaqizman,  
Cizîr, Mereş, Mardîn, Ruha, Wan, Erdehan.  
Dihok, Zexo, Mehabada dîrok zêrîn,  
Kerkûk, Hewlêr, him Helebce dil kul-birîn.  
Dêrsim, Serdeşt, Silêmanî, her çar parçe,  
Nav êgir da nebûyana parçe-parçe.  
Dibistana biaxivya zimanê dê,  
Zulm-zelûlî îdî biçûya ji vê dinê.  
Min jî hilda kaxet, qelem, pirtûkêd xwe,  
Gelê xwe ra têr bixanda helbestêd xwe.

## CELLAD

Zimanê te boynet teye,  
Ew ji min ra pêwîst nîne.  
Zimanê min heya mine,  
Destê xwe jê vekişîne.

Te Dardanêl kir milkê xun,  
Ser wê tune qet çavê min.  
Behra Wanê ruhê mine,  
Destê xwe jê vekişîne.

Konstantînopol bû Îstanbûl,  
Cahan lal bû, ne axivî.  
Amed, dîrok, rewşa mine,  
Destê xwe jê vekişîne.

Tu nûh hatî ser vê axê,  
Şûn, milkê te li vir tune.  
Dicle, Firat çavên minin,  
Destê xwe jê vekişîne.

Ayasofya te kir mizgevt,  
Min jî tev te li vir mêj kir,  
Çevlikamin ne Bîngole,  
Destê xwe jê vekişîne.

Ji ku hatî, hetanî ku,  
Pêş dîrokê rû reşî tu.  
Qetilkarî, him jî kedxur,  
Nabe bira, tu cara gur.

Agrî, Sîpan tacê minin,  
Mûrad, Erez hêsrên minin,  
Qazî, Barzan kalên minin,

Dest ji axam vekişîne.

Te sedava gel helandin,  
Reh-rîçalên wan rizandin,  
Ez kardûxim, ez nahelim,  
Dest pêşîra min vekişîne.

Erf, edetêm pêpez meke,  
Qeyd-zincîrê milêm veke,  
Aşîtîyê bide gela,  
Dostî bibe xemla dila.  
Dest ji zûlmê vekişîne.  
Dest ji zarêm vekişîne.

## WEKÎ WABE, WÊ ÇA BIBE HALÊ MÎN ?

*13 meha Tebaxêye. Li peytextê dewleta Yewnanistanê bajarê Atînayê da meşa olîmpîyada havînê tê derbaz kirinê. Spîkêr navê dewletên ku bûne beşdarvanên olîmpîyadayê bi dengekî gelekî zîz elam dike. Ez nav wan nava da rastî navê gelê xwe û welatê xwe nayêm. Nav xemên pir giran da, vê helbesta xwe dinivîsim.*

Nav nava da çima tune navê me?  
Nav ala da namilmile ala me?  
Bû çem, kanî, kişya, kişya, xwîna me,  
Dinya kere, ew nabihê dengê me.  
Wekî wa be, wê ça bibe halê me?

Me mêrxas dan, nehat holê navê me,  
Parek cihan xemilî bi ulmê me.  
Koşk û sera bilind bûn bi keda me,  
Sêfîl, sêwî dîsa mane lawên me.  
Wekî wa be, wê ça bibe halê me?

Rebbê jorîn qebûl nake dîleka me,  
Nişa rehmê nake dilê neyarêd me.  
Zulma giran timê dike ew para me,  
Berf, teyrokê dibarîne her gav ser me,  
Wekî wabe, wê ça bibe halê me?

Kesên xêrxaz, werin rehmê hûn li me,  
Kesek nema kole, bêzar, xêynî me.  
Bêjin bila xwînrêj bidin heqê me.  
Wekî medin, yasax bikin heyra me,  
Emê wana bixenqînin destê xwe,  
Em nahêlin, wa bimîne halê me,  
Em nahêlin, wa bimîne rewşa me.

## SORGULA TENGEZAR

Hêy, sorgula, sitûxare tengezar,  
Te jî nolîm unda kiriye welat, war.  
Leman usan mirûz telî, pir xedar,  
Bese îdî ewan hêsrên bînî xar.  
Mala Xwedê li ser sebrê bû ava,  
Ro derneyê, tav germ nake tu dera.  
Dû şevên reş tim tî sibên geş-şeweq,  
Pêş heqîyê bersîv dide tim neheq.  
Wê xezabî tew xûnrêjên gire-hûr,  
Ev cahanê îdî bibe cînet, nûr.  
Axa xwe da emê daynî reh-rîçal,  
Emê bibî xwedan welat, xwedan mal.

## AX, HELEBCE!

*Ez vê helbesta xwe, rewayî pênc hezar şehîd û panzdeh hezar  
birîndarê bajarê Helebçêye bê gunê dikim, kîjan ku 16 meha adarê  
1988 - salê bi emrê Seddam Huseynê faşîst pê bombê jehrava hatine  
kuştinê û birîndar bûn. Ew birîndar heta roja îro jî nolî birîndarê  
Xêrosîma û Nagasakîyê dizêrin.*

Ro şa dibû, ro dikenîya, ro direvî,  
Hulm ra dibu, feliqî bûn av û herî.  
Xewa şîrîn hişyar bûbûn hemû bînber,  
Keti bûne lec-hucetê dîsa xêr-şer.  
Teyrik, tûya bask lêdîdan xar û beze,  
Dûmeqeska çê dikirin hêlîn teze.  
Kew û bilbil melisî bûn ser hêlîna,  
Hîrçên xewar derketi bûn dora lana.  
Kerî bir-bir ketibûne berek besta,  
Qaz-qolinga perwaz dikir nava deşta.  
Berfegula rinde kewrek dikir nazî,  
Sur-seqemê xilas dibûn darên tezî.  
Bahar dihat, dixemilîn berroj, beyar,  
Koçervana kivş dikirin îdî şûn, war.  
Kevanîya raxistibûn rijde, firdik,  
Lez dipetin kade, bişî, him jî totik.  
Pîredêya derxistibûn kakil, kuncî,  
Kalebava ji şa bûna ne digirtin cî.  
Bir, gasêtek, dileyîstin, zîlam bê xem,  
Êxisti bûn cilên zirav, him cilên germ.  
Dotên esmer bindarûka dikir qelok,  
Zara eşq-şa çêdikirin bûkik, malok.  
Bistan dêv da dihênicîn dergûş bê tirs,  
Bûk-xatûna ji emrên xwe dikirin qis.  
Bayê nermik ji baharê dianî mizgîn,  
Xorta dişand mala keça îdî xazgîn.  
Evê demê Seddamê har kire civîn,

Fermanek da, nolî kelba kire hurmîn.  
 Gilêz dêvket, lêv lê hejyan, kire gazî,  
 Dêm pirpişî ji tew Kurda bû nerazî.  
 Çev pelijîn, dêm lê reş bû, hejiya, leqiya,  
 Got: - Ewil Helebcê bînin xeza Kurda.  
 Jehr reşandin, tofan rabû, bû hêwurze,  
 Kafûkûn bûn, tev şewitîn kevn û teze.  
 Alav, dûman quloz bûne erşê-ezmîn,  
 Xêrosîma, Nagasakî bûne mizgîn.  
 Xûn bû dehr, kişya, kete çela, korta,  
 Qîrîn, qûjîn kete nava keça, xorta.  
 Dayîk şaş man, pîra lûvand, kirin gazî,  
 Bînber helyan, bûne alav, bûne kozî.  
 Pênc hezar kes şehîd ketin ewê demê,  
 Panzdeh hezar bûne dextsû, ketin xemê.  
 Ro girîya, zer leqîyan, gul çilmisîn,  
 Behrên bêbin ketin şînê, tew qerisîn.  
 Çîya, banya kirin hewar, bû virtonîk,  
 Axê jehr mêt, reş xemilîn derî, şêmîk.  
 Laş bûne part, kî bûna wan ne hat xanê,  
 Hovî Seddam bersîv neda li pêş dinê.  
 Ax! Ax! Ax Helebce!  
 Ax Helebce, wax Helebce,  
 Daxa dilê me Helebce.  
 Nav xûnê da xeniqîyî,  
 Nav jehrê da mehiqîyî.  
 Cejna Newroz boy te reş hat,  
 Bê heyf naçî, tu Helebce.  
 Kurd «tirseke», ev nebûye,  
 Kurd «mexmûne», kê gotîye?  
 Kurd mêrxase, ev eyane,  
 Kurd bedbexte, ev beyane.  
 Ax Helebce, wax Helebce,  
 Birîna dilê me Helebce,  
 Bê heyf naçî, tu Helebce!

## BÊFEMO, ÎDÎ BESE!!!

*Doktor-profêssorê tirk Tûncel Gulensoy rojnama «Yênî Gorûş»-ê, hejmara 650-da ya 15.VI.1994-sale da derheqa ferhenga Saîme Îpal Savîne «Osmanca-Kurdçe suzluk», yê ku sala 1894-da li bajarê Îstanbûlê da hatiye weşandinê wa dibêje:*

*- Me zimanzanê tirka 1993 salê ser vê ferhengê lêkolîna zimîn bir, û em hatine ser wê nêtê, wekî gilîyên ku vê ferhengê da hatine amadekirinê pareke wana yê tirkî ne, parek erebî ne û parek jî farisî ne. Bî gilîkî kurt: Ne gelê Kurd, ne jî zimanê wî heye. Ser hîmê van zimanê jorgotî wana – Kurda xwe ra zimanekî nûh hev anîne û pê diaxivin. Bî îzbatî ewana pareke tirka ne, ku li çîya bi hovîti dijîn.*

*Evan gilîyên derew nola bobeletekê ser min hukim kir, û min qelem hilda ev helbesta nivîsî.*

Oro, efendî, dest pêşîram bikişîne, îdî bese,  
Bavpîrê min meke tirk, ereb, him jî faris, îdî bese.  
Ez Kûtîme, Lûlûbeyim, mêr Akkadîm, him jî Kardûk,  
Kurdim, warê Mezopotam, alîk germe, alîk gêdûk.  
Eslêm xase, zû da min nas dîkin Mexrîb, him jî Meşrîq,  
Kar-kirinê min bîr nakin dîroka kal, ne jî tirîq.  
Dinya Îslam deyîndare, min xilaz kir ew ji zulmê,  
Pêş neyara ezê şer kim heta hebim ez vê dinê.  
Şûmêr, Medya, Atropatan, Êrmîya rewş axa minin,  
Herfê Mîxî, pirtûkê gîl, lel û durrê xezna minin.  
«Mem û Zîn», «Ker û Kulîk», «Xec û Sîyabend» bextê minin,  
Binevşa rind, Leyla Zane, Zekîya Alkan xûşkên minin.  
Huba nemir berî gişka bilewzê xwe min rast weşand,  
Fitla erdê cara ewil ser kevira min neqîşand.  
Min Guhderz da, Rustem Zal da, textê Xosrov, şêr Sulheddîn,  
«Tet Bîsitûn», kal «Avêsta» min xuluqand, min nivîsîn.  
Tîr-kevana min pir şerkir, gurz-rîma min dinya hejand,  
Daykam çîya tim welidî, zaxê sar da lorik mêjand.  
Wedê vir bûm, tu ne vir bûy, hêlîna min hilneşîne,  
Axa zêre, pêpez meke, kar-hebûnam nekişîne.

Bese qirkî pîr û kala, dergûş-lawe, zerî-dota,  
Heta kengê best-beyara wê gevezke xwîna Kurda.  
Elba sebram tijî bûye, dûrîm here, neleqîne,  
Darîne da par-laka xwe ça dixazî biçelqîne.  
Çavê dinê girênede, hemû zanin kî ku hatiye,  
Gel û ziman yasax kirin, qetla giran, rezîlîye.  
Zimanê te dihebînim, zimanê min yasax meke,  
Zimanê te ez hez dikim, zimanê min tu jê meke.  
Qet bîr meke, behr rabûnê pêl-kendala hildişîne,  
Fîl hêrs bûnê, daristana reh-rîçala hildiqetîne.  
Lêya gurav zer-zinara cî radike, dileqîne,  
Şêr hêrs bûnê, neyarê xwe hûrxwaş dike, dipelxîne.  
Gunê m çîye, welatê min ser erd, bin erd defîneye,  
Cînarê min gurê gewre, kurk-qepûtê zulmê lêye.  
Bese tu min bizêrînî, biteyîse, nav min derê,  
Ezê îcar te bişînim war-hêlîna te ye berê.  
Tuyê femkî ev erd-esman boyneta kê xuluqîne,  
Kî bi esle, kî bedesle, kî ku hatiye, ez tu kîne!!!

## TEL ÇÎYE, ŞİRÎN ÇÎYE?

Meclîseke kimkimîye pir giran da,  
Zilamekî kasil-kasil pirs da min da.  
Got: -Mamo can, rica dikim, bibexşîne,  
Cî nînbe jî, efû bike, nelomîne.  
Du pirs zû da rûniştine dilê min da,  
Ez sotime, ez kirime bê hiş, sewda.  
Reh-rîçalên xwe danîne nav xwîna min,  
Şev û roja birandine tew xewa min.  
Eşq û şaya min birine, nehîştine,  
Ax û keser, êşên giran dane mine.  
Tev min diçin, tev min dijîn, min naqetin,  
Pêş wan kerim, himî lalim, bê taqetim.  
Ji wan pirs zû da zanim, yek şîrîne,  
Ji me dûre, ew hetevî boy me nîne.  
Ya din tele, xwedê kirye para meye,  
Hîvî dikim, min ra bêje, bê tel çîye.

\*\*\*

Bejin bala wî zilamê sêfil-hejar, min mêzekir,  
Ser birînên mine şewat, ewî îro dîsa vekir.  
Dilê min jan da, çokê min sist bûn, hêsrê min xuber hatin xare,  
Ez helandim, feqîrîya ewî xortê sêfil, jare.  
Min got: - Lawo, erş û kursî ku xuluqîn, hatin bîner,  
Behra lêp dan, kanî kelyan, çem şûşilîn bûne kenber.  
Li ser axê zera cî girt, kulur-kulur çêbûn zinar,  
Çîya, banya pişt dane hev, hevra bûne hogir-cînar.  
Sîngê deşta bûn daristan, mêrg û çîman, gul, gulistan,  
Gelî, gepor, şewil-newal, cîyê xwe da bûn sindîyan.  
Tew bînera xwe firikand, kişyan, maşyan, him jî bezyan,  
Hinek wana bûne tirsek, bin axê da velezîyan.  
Qismek revyan, pak şûşilîn, hinek firyan bûne goştur,  
Hinek noq bûn binê avê, hasil kirin tim lel û durr.  
Hineka jî bistan mêtin boy mervayê bûn qetilkar,  
Parek nava tirs-xofê da tim qîfilîn bûne hejar.

Wede gihîşt, hemû bînber pareve bûn ser du para,  
 Qismek bû xweyî hiş û ziman, qismek kete çola, dera.  
 Gişk jî hevdu tim dûrketin, hevra bûne xwînreş, neyar,  
 Boy jîna xwe çava xastin, usa kirin xwe ra sitar.  
 Awê demê bende rabûn, bûne xwayê evê dinê,  
 Ew hemûye bêbawer bûn, nizanibûn çîye Xwedê.  
 Paşê wana boy nefê xwe, Xwedê û dîn anîn holê,  
 Hinek şa bûn, bûn xudan milk, parek ketin nava zulmê.  
 Murovayî pêşda meşya, qewet hilda nisla zorê,  
 Wî çaxî da tel û şîrîn bûn mêvanê evê dinê.  
 Xaliq alem parevekir ruza, rusqet, bextewarî,  
 Em bîrê çûn, para me bû pir zelûlî, tengezarî.  
 Delalê min, dem hatiye, ez tu kesî fedî nakim,  
 Derheq tel da, him şîrîn da ezê te ra şirovekim.  
 Tel gelekî: telek heye, wî qenc nake destê loxman,  
 Boy me Kurda wek wî tune birîna kûr, êşa giran.  
 Ew – bê welatî, koletîye, mirin başe ji wî halî,  
 Ba lêdixe nolî zila te hol dike valî, walî.  
 Ew bê tvaqî, dutîretî, bê şerefî, bê karîye,  
 Ezim-ezim tim gotine, bê xîretî, bê şermîye.  
 Lawê min, tu, bê welatî, tim bê parî, tengezarî,  
 Bê rusqetî, bê zimanî, bê hêlînî, bê şûn-warî.  
 Tim bê qedrî, bê qîmetî, sêwî, sexîr, jan giranî,  
 Nav zulmê da tim dizêrî, mîl qeydê da, mal wêranî.  
 Kurêmin, sihke, boy me Kurda rizgarîyê kesek nayne,  
 Heta tew Kurd nabin kulmek, hovî neyar nadin deyne.  
 Boy vê yekê em dizêrin, em dirêjin xwîna xune,  
 Bê tivaqî tim nahêle, em bistînin heqê xune.  
 Pêşya gotîye: «Ewa kesê najî li ser axa xune,  
 Nolî dara bê rîçale, sîyê nade binê xune».  
 Delalê min, tu dipirsî, mamo, bêje şîrîn çîye?  
 Êşkê teme, guhdarîke, te ra bejim şîrîn çîye.  
 Lawo, şîrîn: - Edilayî, bextewarî, serkevtîye,  
 Zar û ziman, emrê dirêj, nûra çava, mêrxasîye.  
 Dinya fire, cinneta rewş, per û baske, bedewîye,  
 Bext-miraze, şeref, namûs, hêlîna germ, hetevîye.

## BEHRA WANÊ, DELALA MÎN

Pêl venede, ewan pêla pir qurna da seda daye,  
Nav çîyayên bilinde rewş, te ji xwe ra merh vedaye.  
Sal ku hene, danzdeh mehin, xalî nabî mij-dûmanê,  
Bûka xemlî, bedewiya te mitheyr kiriye tamam dinê.  
Xêlya tene sorgul, nergîz, merg û zevî, darêd merxê,  
Ser sîngê te qaz û quling timê dîkin geşt û çerxê.  
Hogirên te Wan, Tatwane – dîrokê da rêç hîştine,  
Ew birc-kelên li dora te kevn – pirtûkê terîqîne.  
Mûrada hêrs, Agrîya kal, Sîpanê sar – birê tene,  
Gelek-gelek hozanê Kurd pesin-methê te vedane.  
Xasbaxçên te şev û roja xalî nabin naz-bedewa,  
Şewq û sefê derbaz dîkin, dikakînin nolî kewa.  
Tu şiheda tel dewranî, qira gelêm te dîtîye,  
Xwîna Kurda, tev çem-kanya hewzê te da mehikîye.  
Hesreta te ez sotime, xewêd şeva min biryane,  
Herd çavêd min time boy te, şêlû bûne, him giriyane.  
Xwezil carkê vî emrî da bibûyama mêvanê te,  
Kulm û çenga têr vexara şor û şîrîn ew ava te.  
Hêsa bûma, bizanbûya gihîştîme mirazê xwe,  
Ça tiverik, tase ava te rûkira ser çavêd xwe.  
Dengekî zîz biqîryama, elamkira tamam dinê,  
Zexm bigota, lawê Kurda neyarê har tînin rayê.  
Delala min, gelek sal in, neyar em hev qetandine,  
Hemêza xwe fire veke, îdî ez mêvanê te me.

## NEYARÊ HAR!

Bese, bese, îdî axam pêpez meke,  
Gul-sosinêm meheçqîne, îsaf bike.  
Koşk-bircêd min cî raneke, mehedmîne,  
Çem û kanyêm bê xov meke, memiçqîne.  
Ewa axa tew şerefa dayka mine,  
Her yek gulek şehîdekî gelê mine.  
Ew koşk û birc, kevn dîroka gelê minin,  
Ew çem-kanî, herd bistanê dayka minin.  
Ji dest-pîyêd serokêd min qeyda veke,  
Kan û xezne milkê minin, talan meke.  
Lawê Kurda tew mêrxas in, pê nikarî,  
Tu xayînî, xapxapokî, bê îtbarî.  
Namûs, xîret boy te tune, îdî here,  
Tew axa min tiverike, lê megere.  
Tu xwînrêjî, qetilkarê gelê minî,  
Bê kok-eslî, deyndarê heqê minî.  
Xewa giran îdî zû da ez rabûme,  
Min heqê xwe naskirîye, serwext bûme.  
Zef dijware, îdî tu min bixapînî,  
Bikî kole, ber derê xwe bigerînî.  
Îdî here, ez te vira qet nebînim,  
Cara îcar ezê ruhê te bistînim.  
Bê şerefo, ji ku hatî, hetanî ku,  
Dinya zane, pêş dîrokê rûreşî tu.  
Biteyîse, zû dûrkeve, here ji vira,  
Pêşiya gotîye: “Gurê gerik, nabe bira”.

## WELAT

Him dinalim, him dizêrim, dûrî, Welat,  
Dîl hejarim, tengezarim, nûrî, Welat,  
Tîrs û xofim, sirûk pême, tune bawer,  
Jan giranim, tu melhema minî, Welat...

Xerîb warim, hêlîn sarim, Kurdîm, Welat,  
Hesretkêşim, te nabînim, derim, Welat,  
Zelûl xemim, xalî nabin çav ji hêsa,  
Stûna dilî, bext-mirazê minî, Welat...

Per û baskî, xemil-rewşî, timê, Welat,  
Qudûm-qamî, şewq û şamî, min ra, Welat,  
Bêy te îdî ez bedhalim, nema tawet,  
Zîyaretî, tîverîkî, boy min, Welat...

## SEYDA CEGERXWÎN, JÎ XEW RABE

*Rewayî azabûna Kurdistanê Îraqêye federal dikim.*

Seydayê min, ji xew rabe, mizgîn heye,  
Qurna bîstûyekê – qurna me Kurdaye.  
Başûrê kal ro derketîye, naçe ava,  
Bûz helyaye, beşer ketîye dev û lêva.  
Hîva hilî naxwaze ji cî bileqe,  
Stêrkên şeveq eşqa bûne rêz-xeleqe.  
Zindanên sar, hepsên tarî hedimîne,  
Xasbaxçên ter, dibistana hîm danîne.  
Qeyd û zincîr hûrxaş bûne, tev helyane,  
Sêfîl-sêwî bûne xweyê mal-milkane.  
Çem û kanî zelal bûne dixulxulin,  
Dayîk-xûşka avîtine jan û kulin.  
Gul-sosîna xemil daye sînge çîya,  
Qîrîn-qûjîn îdî nayê ji deşt-gelîya.  
Mûsîqayê parek welat hingavtîye,  
Xêr û xeznê ser axa me per vedaye.  
Lawê Kurda komkar bûne bê şert, şîrût,  
Her çar para bikine yek, hildin hidûd.  
Îdî şa be, dinya kevin merûm bûye,  
Xwedê îcar bûye dostê me Kurdaye.  
Xwînêrêjêd me îdî zanin ku kîne em,  
Lawê Qazî, lawê Berzan, kardûxin em.  
Misto, Seddam, hêsrên şewat dibarînin,  
Pêş cihanê rezîl bûne, cî nabînin.  
Lawên Kurda avîtine xewa giran,  
Xwînêrêja ra îdî nadin fîrsed, eman.  
Seyda, dinya pêpelîke, jor û jêre,  
Bok-berana timê hîştîye şuxlê xêre.  
Seydayê min, bese razêy, ji xew rabe,  
Cejna gelê xwe pîroz ke, tev me şa be.  
Kal û bava berê-berda wa gotîye,  
«Her şevêkê, sibeke wê ronik heye».

## REBBÊ JORÎN, ŞİKÎR, ÎDÎ TU HATÎYÎ LÎ ME REHMÊ

Lomekarim, gunekarim ber dergê te,  
Bendewarim, dîl û jarim ber heya te.  
Lavekarim, ricadarim, bendê teme,  
Tengezarim, hîvîdarê rehma teme.  
Bê pergalim, bê qirarim, pîr gazinim,  
Pêş te ezî feqîr, fiqar, ne mezinim.  
Nolî gişka te em Kurd jî xuliqandin,  
Kîrin merûm, ber derîya em gerandin.  
Zarê şîrîn te da me da, em kîrin lal,  
Axa zêrîn kir para me, ser bû ceng, qal.  
Me xwîdan rê, hebûn birin, em man birçî,  
Me rusqet xast, me ra gotin, êy deweçî.  
Bi keda me ava kîrin bircêd sipî,  
Neyar nehîşt em li wira qet daynin pî.  
Em zêrandin, tu nehatî hewara me,  
Em qirkirin, deng-sedê me negihîşt te.  
Kur-keçêd me birin, kuştin, em man bê law,  
Dîroka me tew veşartin, em bûn bê nav.  
Çem û kanî micîqandin, hîştin bê av,  
Esmânê me xitimandin, em man bê tav.  
Me ra gotin ereb û fars, tirkê çîya,  
Kîrin sêwî, tim gerandin ber derîya.  
Welatê me jî me stendin, em man bê war,  
Qeyd-zincîra pî-milêd me vejend û xar.  
Zulm gihîşte asîmanê çîkî, sayî,  
Em zerîyan, tu nebûyî li me xayî.  
Xwînêj dada ser pişta me agirê gur,  
Jehr da me da, wî dewsê bir tew lel û durr.  
«Quran» anîn, pê sond xarin, em xapandin,  
Egîted me bê sûç-gune xeniqandin.  
Me deyax kir, her gav kişand rind navê te,  
Aciz nebûn, tim sekinîn ber rehma te.  
Kal û bava gelek pêşda wa gotine,

«Tew destpêka kutasîyêd wana hene».  
Şikir, îdî tu hatîyî li me rehmê,  
Welatê me derdixêrî tu ji zulmê.  
Rica dikim, sîyê daxe time ser me,  
Lawê tene, qet bîr meke tu car tu me.  
Ser axa me, peya nebin bombêd jehrê,  
Eşq û şayî hemêz bikin hemû derê.  
Gul, gulistan bixemlînin singê çîya,  
Zulm, zelûlî, qet nemînin li tu cîya,  
Erş safî be, şêlû nebin avêd zelal,  
Gav-rojêd me bibihurin bê dew, bê qal.  
Tevî ala bimilmile ala mejî,  
Welatê me bibe zeynet, bibe tijî.  
Sêfîl, sêwî bibin xwedan rusqet û war,  
Nav gela da em nemînin îdî bê par.  
Dengê topa neveciqîne lorkê şîrmij,  
Asîmanê me vekişin teyrok û mij.  
Bi hukmê te xwînxar pêş me dibin duqat,  
Wekî şa bin him koçervan, hem jî rîqat.  
Dayîna te îcar serê me zêdeye,  
Serkevtina welatê me rehma teye.

## SAL KAL DÎBÎN, EZ KAL NABÎM

Ê çî firqî, sal ser sala tîn û diçin, dibuhurin,  
Geh leng dibin, geh direvin, diqulibin, nazivirin.  
Nolî ava kanyêd zelal dimilmilin hêdî û lez,  
Sal kal dibin, huba welêt qet nahêle kal bibim ez.

Dibin çivîk, bask vedidin, asîmanê çîkî sayî,  
Tijî dibin, vala dibin, nolî ewrêd reşe mayî.  
Ser dilê min pir dihêlin rêçêd gir-hûr, bi xar û bez,  
Ew kal dibin, huba welêt qet nahêle kal bibim ez.

Geh dibin mer, min vedidin, dişûşilin çep, rast û xar,  
Carna dibin şîrîn, şerbet, geh jî dibin ew gurêd har.  
Dibin melhem, min şa dîkin, nişkêva jî mewt û merez,  
Ew kal dibin, huba welêt qet nahêle kal bibim ez.

Carna dibin, lel, cewahir, eşq û şayî, xezna tijî,  
Carna dibin ax û keser, ez dihelim, dibim rijî.  
Dûmeka da bê sûç-gune dirizim ez, dizêrim ez,  
Huba welêt pir şîrîne, ew nahêle kal bibim ez.

## KNYAZ, XARZIYÊ MÎN PÎR QEDÎR

*Min îro pirtûka weye nûh, kîjan ku we nav kiriye «Malaya Ênsîklopêdîya kûrdov» – («Ênsîklopêdîya Kurdaye piçûk») stend.*

Nûh pirtûka we weşandî dane min da,  
Belg-belg vekir, pêş min vebû emrê Kurda.  
Sed eferim, zanayê kûr, necarê xas,  
Îro dubar, Kurd li dinê we kirin nas.  
Keda weye pîr mezine, naçe ji bîr,  
Pêş neyara Kurd nebûne tu car feqîr.  
Ulmê xwe da leheng, lewend, stêrka geşî,  
Boy gelê me seyda, rêzan, him jî rewşî.  
Êşkê te me, «Xarzî diçin timê xala,  
Ewladê çê bilind dîkin serê gela».  
Xwezil, xwezil em biçyana Kurdistanê,  
Tew gêrîla şev bimana li zozanê.  
Sar kanîya av vexara kulma, çenga,  
Me bidîta dew û dozê şêr, lehenga.  
Dicle, Firat bişûştana tew hêsrên me,  
Agrî, Sîpan bibûyana text, tacê me.  
Ser axa dê mêzekira me Şerqa kal,  
Tewafkîra tirba Kawe, Rustemê Zal.  
Bitewyana pêş merzelê Feqî, Xanî,  
Biaxvîyana, him Kurmancî, him Goranî.  
Li Helebçê melhem danya birînê kûr,  
Ax-keserê Mehabadê ne mana dûr.  
Hûr-xaşkîra der-dîwarên Îmralîyê,  
Serokê xwe derxista ji zelûlîyê.  
Eşq û şayê tijîkîra tew Kurdistan,  
Dinya, alem welatê me bibûya mêvan.  
Bimilmîlya ala meye kesk, sor û zer,  
Aşîtîyê tijîkîra hemû qulç-der.  
Tew gelê me Rebbê jorîn bibûya razî,  
Ez û tujî bigîhîştina wî mirazî.

## ZÎMANHEZ BE, LAWÊ MÎN

Kanî maka dehran e,  
Xemla gelya orman e,  
Hebûna gel ziman e,  
Ziman hez be, lawê min.

Ziman xemil, rewşa teye,  
Bext û miraz, jîna teye,  
Ziman tune, tu tunenî,  
Sêfîl, sêwî, sergerdanî.

Ziman nişa gelê teye,  
Ruh û şîrê dayka teye,  
Ew tew dinê te dike nas,  
Bi kemala wî tu dibê xas,  
Ziman hez ke, lawê min.

Zozan nabin bê berf, baran,  
Ordî nabin bê serokvan,  
Hene rojêd sivik, giran,  
Welat hez be, lawê min.

Baran nûra Xwedêye,  
Tav zeyneta dineye,  
Rastî şertê mêraye,  
Rastî hez be, lawê min.

## EZ Û TENBÛRÊ MÎN

Tenbûrê min, xwezil merya boy kîrnêd xwe caw bidana,  
Bê murvetî, bê şerefî, ewqas hevra nekirana.  
Kî kêderê xuluqî bû, wir bijîya, wira bima,  
Destê zorê, navîtana nav kedera, nava xema.  
Xwezil xwedê axa benda, cîkî hilda paqîşkîra,  
Qalibekî weke hev da bimeyanda, valakîra.  
Reş, sipî, zer nekra holê, rengê bida tew hemûya,  
Xwînêj, xwînêxar, nexulqanda, boy bendê xwe neanîya.  
Usa bibya, ne ez, ne tu, ji axa xwe nediqetyan,  
Nedibûn kole, bê sûç-gune nav zulmê da nedihelyan.  
Ezê bimam ser axa xwe, tu nediçûyî ji daristan,  
Nesîbê me nedibû ev roj, ne diketin em bin destan.  
Bê însafa, heyf negotin, te ji welatê te qetandin,  
Geh jêkirin, geh verotin, nav êgir da peritandin.  
Tew têlên te lewzê cuda, diqalînin, dilfîlînin,  
Boy halê te, him digirîn, him dizêrin, dilûvînin.  
Ew ezabê tu dikşînî, zû da bûye para mine,  
Welatê min kirine çar par, çem û kanyê bûne xwîne.  
Hogirê min, ez jî ça tu, welatê xwe qetandime,  
Gelek salin, pir qurne ne, bê hêlînî, serê rîyame.  
Xwezil hemya hev hezkîra, bijîyana nolî bîra,  
Ez axa me, tu xulamî, negotana tu car hevra.  
Zor, neheqî hev nekîra, ne meşyana çep û xare,  
Hinek meriv boy mervayê, nebûyana gurêd hare.  
Her kesekî kar bikîra, tenê boynê nefsa xune,  
Rihet bijîya, nezêrîya, bibûya xudan para xune.  
Xwezil, xwezil, aşîtyê per bavîta hemû dera,  
Merivayî par nebûya, qenc û xirav ser du para.  
Bê zar-ziman, bê rusqetim, dengê naçe qet tu kesa,  
Hemû millet bûn xudan par, para min bû qismetê sa.  
Te dibirin, dimehkînin, jan-êşên te kes sih nake,  
Tu digirîy, ev dikenin, kok-eslê te kes naz nake.  
Bext, taliqê min te yekin, lema em bûn hevalêd hev,

Şev û roja boy axa xwe, zelûl digrîn em herdu tev.  
Were em tev, Rebbê jorîn bikin dîlek, îltîmasê,  
Me bê rehmê, pêşme hilde kaş-kerîşa, dergê asê.  
Nehêle kes te ziyake, aza bike welatê min,  
Vî emir da em jî şa bin, tev nas bikin kî bûna xun.

## HEWAR-HEWAR!

*Rewayî ruhê şehîdên pîroz, şehîdên cejna qurbanê dikim,  
yêd ku yekê şubatê bajarê Hewlerê da bi destî têrroştî  
şehîd bûn.*

Ev çi qetle, ser axa min dixulqînin?  
Çi şirîte, gelê min pê dixeniqînin?  
Ev çi qeyde, zendê gelêm dişidînin?  
Ev çi daxe, ser dilê wî dikişînin?

Ev çi zulme, xwînêrêj dîsa min dikuje?  
Ev çi ewre, teyroka sar jê dirije?  
Ev çi qeyse, bejna gelêm dipîvînin?  
Çi beroşe, gelêm tê da dihelînin?

Dicle digrî, Firat melûl dilûvîne,  
Erez naçe, Mûrad hêsa dibarîne.  
Agrîya kal girêdaye reşê tarî,  
Sîpan, Zagros cî leqyane, tên hewarî.

Silêmanî, Mehabada dil kul-birîn,  
Dêrsim, Batman, Şirnex û Mûş, him jî Efrîn,  
Kerkûk, Çewlik, Bitlîs, Zaxo, çîyayê qulpê,  
Bûne kulmek, qebûl nakin evê qetlê.

Qers, Qaqizman, Amed, Îgdîr, Sêrta zêrîn,  
War-miskenê kal û bava Wana rengîn.  
Deşta Berzan, Gelyê Zîlan, reş Helebce,  
Sondê dixun, neyar bikin parçe-parçe.

Mûsil, Cizîr, Şengal, Xarpût, Ruha ezîz,  
Mereş, Mêrdîn, Malatîya, him jî Elezîz.  
Agrî, Serdeşt, şêr Êrmîya, gola Wanê,  
Ricim dikin, hovî-hara vê devranê.

Îro boy we şînê daye, tew Kurdistan,  
Êy şehîdê, gelê xwe yê derdê giran.  
Heykelê we wê bilind be, her qulçekê,  
Heyfa weyê bê sendinê, zûtirekê.

### **Para duda**

Xaliq, çima, dergayê xwe em avîtin?  
Ser tew gela te kir sitar, em nedîtin.  
Hovî-hara hebûna me kişand, firot,  
Welatê me kirin çar par, te tişt ne got!

Heta kengê, neyarê me bizêrîn?  
Kan-xeznê me, wê talankin, bikişîn?!  
Ber sur-berfa, ewrê bibin lihêfa me,  
Çek-sîlahê bikin birîn sermilkêd me.

Sêwî-jarê tim bimînin, birçî, tezî,  
Welatê me wê derneyê belengazî.  
Deşt, zozana wê pir bibin goristane,  
Dayîk, xûşkê bigrîn bahar, zivistane.

Yekbûna gel, bextewarî, serkevtîye,  
Per û baske, xêr û xezne, aşîtiye.  
Nav û denge, zar-zimane, kubarîye,  
Hêlîna germ, sûra zêrîn, biratîye.

Dehrên gurav, ew gem dike, dixeniqîne,  
Qûmistan da gul-sosina dixulqîne.  
Şûrê dudev, mivta dergêd girêdaye,  
Cinneta xas, koşk-sera, rihetîye.

Tîrêjên wê tarîstana dihelînin,  
Qetilkara hûrxaş dikin, dihecqînin.  
Ew, dikare gelêm derxe ji vê zulmê,  
Rusqeta wî bistîne ji تمام dinê.

## RAZA BÛM

*Mameste Hejar, rehma xwedê li we be. Ji bo berdewamîya rêya we  
hevildana me tim û daîme.*

Ketibûme nava xewa hingorê da,  
Nelînîke zelûl hate guhê min da.  
Hişîyar bûm, min unda kir xewa xune,  
Ber serê min rûnişti bû dayka mine.  
Wê dilûvand, hêsrên şewat dianîn xare,  
Kasil, kasil, min jê kire pirs, pirsyare.  
- Çi qewimiye, dayka mine emekdarê?  
Çima dîsa ewan hêstra tînî xarê?  
Dîroka te pir qedîm e, kûr nenal e,  
Rabe, hêstra paqîş bike, ev çi hale.  
Pir egîta ji bistanê te mêtin şîr,  
Daka Kurdî, kî bûna xwe meke ji bîr.  
Mezopotam – nav du çema warê teye,  
Mêdya kal – tacê zêre serê teye.  
Cejna Newroz, textê Xosrov te xuluqand,  
Serê Dihok pê çagûça te heçiqand.  
Kevn «Avêsta», «Tet Bîsutun» te dan dinê,  
Dinya Îslam te xilaz kir ji mirinê.  
Musil, Kerkûk, Dihok, Zexok milkê tene,  
Dicle, Firat herd tamarê dilê tene.  
Batman, Bitlîs, Amed, Serdeşt, Silêmanî,  
Wana rengîn, bi hezara çem û kanî.  
Mûş, Erdehan, Sêrt, Beyazîd, Efrîna rewş,  
Sîpanê sar, Agriya kal, Zagrosê nexş.  
Başûr, Bakûr heta Erez pêda-pêda,  
Rebbê jorîn kan û xezne dane te da.  
Lawê tene, Kawe, Guhderz, Rustemê Zal,  
Nemrûdê mêr, Êsivê rind, Yaqûbê kal.  
Feqî, Xanî, eqîte xas – şêr Sulheddîn,  
Qazî, Berzan, serok Apo – şêrê zemîn.

Memê Alan – pir maqûlê Muxurzemîn,  
 Kaw Sîyabend, neçîrvanê çîyayê rengîn.  
 Zîna çav reş, Xeca bext reş, Eyşa zarî,  
 Evîn, Alkan, Bêrîtana gerden morî.  
 Feqî bêtirs mîr ricimkir bi qelemê,  
 Xanî lûvand boy mirazê «Mem û Zîn»ê.  
 Serok Apo navê Kurda kire dinê,  
 Bese bigrî, bese bigrî, dayka minê,  
 Dil û hinav te li min kir teltê xwînê.  
 - Çawa megrîm, lawê minî xunedaro,  
 Dil dihele, nolî mûmê têye xaro.  
 Deşt-zozanê kaf-kûn dîkin zome-ware,  
 Ser sîngê min tolan girtiye gurê hare.  
 Qetilkara yasax kirin zimanê min,  
 Şev û rojan talan dîkin mal-milkên min.  
 Ez şa nabim, jan û êşê mane dil da,  
 Ji hepsê sar tê nalîna lawên Kurda.  
 Hêsrêm çem in, reş hatiye boy min dewran,  
 Neyar axam difiroşin baha, erzan.  
 Dewlemendim, bedena min maye tezî,  
 Dergûş milê mîrî sewiqîne, dîkin gazî.  
 Kê dîtîye, meriv mala xwe da dîl be,  
 Çav bi hêşir, mîl qeydê da, ziman lal be.  
 Birîndarim, loxman nayê ser min hêsa,  
 Dilê lawê mîrî çima bibin qismetê sa?  
 Başûr, Bakûr, ser erd, bin erd, tew kanên min,  
 Ez kole me, bê rusqet in kur-keçên min.  
 Ji hemêza min dikişê zêrê reşe,  
 Erş-ezmanê mîrî dihurmişin ewrên reşe.  
 Sîpan, Agrî rewşa minin, ser başên çîya,  
 Hêsrên xweva ez av didim mêrg-zevîya.  
 Birçî ezim, tezî ezim, gelo çima?  
 Rebbê jorîn ewa zulma daye min da!  
 Welatê min xalî nabe dozên giran,  
 Heta kengê mal-milkên min bibin wêran?  
 Delalê min, ez negirîm, kî bigrî wan zûrîya,

Li dayka te dîl kirine çar kêrîya.  
- Daka delal, îdî rabe, bixemile, biska şeke,  
Kubar-kubar tu bimeşe, kofyê dayne, çavan kilke.  
Pêş enîyê zêran rêz ke, serokê me bike mêze,  
Emrê çûyî îdî bîrke, boy me hatiye rojên teze.  
Ewladên te tew bûne yek, bextewarî, meke xema,  
«Rastî çiqas zirav bibe, ew naqete» – gotîye peşya.  
Dem hatiye, aza dibe koletîyê welatê te,  
Ala meyê bimilmile, wê pîrozkin eyd-rojên te.  
Serê teyê bilind bibe wek Agrî, Zagros, Sîpan,  
Pir xêrxasê tev me şa bin, vê gul wede tew Kurdistan.

## SEROK APO

Nolî Kawê hesinger be, kolosê Kurda têke al,  
Neyar qut ke, şayê têxe, gund-bajara, hemû mal.  
Hilde heyfa Mazlûm Dogan, Mahsûm Korxmaz, şehîdên pir,  
Eşkê te me, mêr natirsîn ne ji avê, ne agirên gur.  
Xwedê îcar nisret daye, xwînêra ra nede fita,  
Rîya te heqe, heq namire, zûlmê derxe hemû Kurda.  
Li dora xwe bicivîne zana, mêrxas, merda, başa,  
Lana neyar tûr-tevez ke, kewê bide jana-êşa.  
Bavkujên me, dêkujên me, îdî bîne ber mirinê,  
Bicedîne heqê Kurda, bila naske îcar dinê.  
Şake dilê dê û bava, bixemilin dotên xilfîn,  
Pîr-kal bijîn, sêfil nebin, pêşta here çerxa zemîn.  
Serok, seyaset kişike, mitaleke, we mede der,  
Daka Esmâ efû nake, neyar welêt tu nexî der.  
Dem hatiye, kedxurên me, xwînêrêjen me bîne çoka,  
Tu ewladê şêr Kurdanî, bok dikevin tim ji boka.  
Felek me ra xayîn derket, em veçirîn dîza, qelpa,  
Gurê gevrik cara îcar, tu bistîne deyna, heqa.  
Ez bi qorba, welêt dûrim, destûr, îznên min hindikin,  
Boy azayê keribîme, kêr-xastinên min gelekî.  
Ez ne wurim, dew û dozên şêr gerîla min ne dîne,  
Qurna bîsta xilaz dibe, hemû Kurde hîvya tene.  
Xwezil carkê tev gêrîla zaxên sar da ez bimama,  
Boy azaya welatê xwe, xwîn birêta, şehîd bûma.  
Bi destê xwe melhem danya ser birînê şêr-şembaza,  
Bitewyama pêş merzelê tew şehîda, welatheza.  
Min deynê xwe biqedanda, ewê demê şehîd bûma,  
Mirazê min hasil bûya, Sîpanê sar kefin bûma.

### Serokê me,

Tawet, sebra Kurda tuyî,  
Qinyat, bextê Kurda tuyî,  
Xemil, rewşa Kurda tuyî,  
Mizgîn, şaya Kurda tuyî.

Xwedê bila te ra yar be,  
Welat bi te kaw kubar be.  
Sûra zulmê bihedmîne,  
Rîçalên wê hilqetîne.  
Gel ra bîne serkevtîyê,  
Kurd azabin zelûlîyê.  
Kî bûna me bike eyan,  
Me pîrozke bila cahan.

## GELÎ KURDA, HEMÛ HEVRA BÊJÎN WELAT

Îro dîsa, xwînxeş me pir dir bûne,  
Diranêd xwe tûj kirine, komkar bûne.  
Kîn û buhza nava xwe da avîtine,  
Dest dane hev, ser simteka sekinîne.  
Şeref, namûs, bîr kirine nolî her car,  
Quta gelê me kirine armanc, qîrar.  
Firsend îcar ji alê meye, wê bernedin,  
Sist bûna me, boy gelê me êş û derdin.  
Neyarêd me bê îtbarin, him bi zîrar,  
Bê murvetin, bê însafin, pir bi qîrar.  
Wekî ev dem, ji destê me bê berdanê,  
Navê Kurdê rûyê dinê bê hildanê.  
Wede hatye, hemû yekbin, pişt bidine hev,  
Pêş neyarê xwe bisekinin, îdî hûn tev.  
Gişk bi hevra, bi dengekî, bêjin «WELAT»,  
Ahil, cahil, hemû gir-hûr, bêjin «WELAT».  
Dayîk û xûşk, bav û bira, bêjin «WELAT»,  
Dapîr, bapîr, dua bikin, bêjin «WELAT».  
Zilam û dot, çekê hildin, bêjin «WELAT»,  
Zarêd şîrmêj, megrîn, megrîn, bêjin «WELAT».  
Hemû hevra, hemû hevra, bêjin «WELAT»,  
Şev û roja, gav-siheta, bêjin «WELAT».  
Bê welatî – bê rusqete û bê ware,  
Ji dayîna Rebbê jorîn ew bê pare.  
Ew bê şûne, bê hêlîne, bê piştovan,  
Hemû fesla sergerdane sere rîyan.  
Şikir, şikir, îdî dinê hemû zane,  
Eva qurna bîst û yekê yê Kurdane.  
Kulmê sere har neyar da hûn zexm lêxin,  
Dest bidine hev, beraz zevya xwe zû derxin.  
Dem hatiye, hîvya kesî hûn nemînin,  
Azaya xwe destê zorê hûn bistînin.

## NEHEQ BÊNE ŞÛRÊ HEQE

Hewar, hewar, agir, alav, dîsa ketye Şerqa kale,  
Çîya-baniyê welatê me, dîsa diçin dew û qale.  
Neyarê har, hemû hevra, êriş dikin ser axa me,  
Tew dixwazin ji dîrokê, yek car hildin, nav rêçêd me.  
Mêrxasêd me, kêr hatiye îdî hestu bûye asê,  
Firsed medin, xwînxwarêd har ser axa me bigrin dewşê.  
Rabin, rabin, nolî Guhderz, mîna Rustem, bikin qîrîn,  
Li meydanê bibin leheng, wek Xanoyê mey çeng zêrîn.  
Bibin Qazî, bibin Berzan, nebetilin dozêd giran,  
Pêş neyara bisekinin, weke şêra, wek bok-beran.  
Şeref, namûs-tacê zêrin, qîreta xas boy mêrane,  
Vî welatê meyî lel-durr, derxin destê gur-hirçane.  
Xwedê gotîye: “Du cinnetê mine baqî timê hene,  
Min herdu jî xuluqandin tenê seva bendê xune”.  
Ya yekemîn, berê ewil, axa daykê, mala weye,  
Ya din mala Rebbê jore – ewa boynet we hemyaye.  
Îdî bese, dê-xûşkêd me bêkêr bikin ah û zare,  
Ser merzela, goristana, hêsrên şewat bînin xare.  
Sexîrê Kurd tamam dinê bigrîn boynet parî nane.  
Serê rîya, nav berf-bûza tim bimînin bê xudane.  
Agrê Kawe, li ser qotê Zagrosa kal dîsa vêxin,  
Welatê xwe aza bikin, neyar altkin, revê pêxin.  
Êşkê we me, sekê tolav, rodir dibe, tirsê şevê,  
Êvar ku tê, xwe vedşêre, berî gişka diçe xewê.  
Dinya îdî pê hesyaye, kî paqîşe, kî qirêje,  
Mişk hêlînê ku kûr dike, axê ser xwe pir dirêje.  
Dest şimitî, pê şimitî, xwe dikare xilaz bike.  
Dev şimitî, nav êgir da dibe rijî, xwe red dike.  
Rabin, rabin, îro dema xîretêye, xwe medin paş,  
Pêş zerpêd we, neyar bila zende bigrin, bimînin faş.

## GURÊD GEVRİK, ÇI ME KİRİN, ÇI NEKİRİN

Nava qurnêd dirêje dûr,  
Neyarêd gir, neyarêd hûr.  
Bi fend, fêlêd xapoke kûr,  
Çi me kirin, çi nekirin.

Gelek xistin bîrêd bê bin,  
Ser wan tijî kils, ax kirin.  
Firsend nedan bijîn yêd din,  
Gir-hûr hemû xeza kirin.

Em bûne berx, ew bûne gur,  
Em bûn hejar, ew bûne hur,  
Şûr kişandin, ket ber kirin,  
Mê zêrandin, nêr qutkirin.

Dê û ewled hev qetandin,  
Birayek kuştin, yek helandin.  
Kara me va xwe têr kirin,  
Şev û roja qetil kirin.

Dewsa sipî, reş nivîsîn,  
Bûne bela, neteyîsîn.  
Ew mane ter, em qerisîn,  
Wan gul veda, em binisîn.

Namûs, şeref, unda kirin,  
Mewt-jehr anîn, lel-durr birin.  
Bomb-gulêd xwe vala kirin,  
Erd û esman xirav kirin.

Sûr, sînorêd me hil kirin,  
Dayîk hîştin, lorik birin.  
Koşkêd me da kêf-eşq kirin,

Van bêbexta çi nekirin.

Gotin: - Lawê Adem em in,  
Esil da xas tenê em in,  
Zelalyê da wek Zem-zemin,  
Nîvê dinê îdî em in.

Çav dane me, beysûs nedan,  
Mal-milkêd me bûne xudan.  
Em bûn revok, ew mane cî,  
Em bûn xwînrej, ew bûn hecî.

Ji şûna me, em rakirin,  
Dîroka me tew reş kirin.  
Axa me, em bê par kirin,  
Çi me kirin, çi nekirin.

Bira dane rûyê birê,  
Ro mizgevtê, şev çûn dêrê.  
Ber me girtin dergê xêrê,  
Çi me kirin, çi nekirin.

Em bê car bûn, ew bi car bûn,  
Em xebitîn, ew bi par bûn.  
Ew beridîn, ew tim jar bûn,  
Ew xudan war, em bê war bûn.

Nehîştin em çeva vekin,  
Rewşa dinê mêze bikin.  
Welatê xwe teze bikin,  
Hêlînekê boy xwe çêkin.

Derge-dîwan me girêdan,  
Em şuxulîn, wan kar hildan.  
Em birçî man, wan tim xar nan,  
Welatê me kirin wêran.

Min wan pirsî, çendik, çend car,  
Kê da weda, bav gurêd har?  
Kê hûn kirin wa bê îtbar,  
Wek wî tune bînber xedar.

Min ra caw dan gişka hevra,  
Gotin: - Zû-zû derê devra.  
Xwedê boy we em şandine,  
Wek me torin kesek tune.

Hûnê bikin, emê buxun,  
Emê jêkin, emê vexin.  
Emê we ji vira rêxin.  
Emê hildin, emê derxin.

Hişmetkar mam, ber vê cawê,  
Rind mêze kir rewşa dinê.  
Min got: - Sihkin, gelî gura,  
Şûn tunene boy we vira.

Deme, îdî, çava vekin,  
Dor hatiye, em we rêkin.  
Kî zû here, poşman nabe,  
Bin pîya da pêpez nabe.

## SEKÎNÎNE EM HÎVYA TE

Şikir, şikir, hezar şikir,  
Eme şane, hebûna te.  
Risq û ruza te me bol kir,  
Em gişk dijîn, bi seya te.

Nan, av, hewa, her tem, zikir,  
Ev erş-kursî me ra da te,  
Hemu bînber, paqîş, bikir,  
Kom bûne bin per-baskêd te.

Tew xêr û şer, qenc û mekir,  
Dixuliqîn bi emrê te.  
Te hemuya ra hêlîn çêkir,  
Qet çênekir hêlîna me.

Derdê gişka te derman kir,  
Bê derman hîşt te derdê me,  
Pêş tew gela derge vekir,  
Gitî maye tim dergê me.

Heya xwe te pareve kir,  
Para gişka gîhandê te,  
Nehatya ra te xweyî kir,  
Kêra daye te para me.

Emrekî tel te da me da,  
Em tu dema pê şa nebûn.  
Xeza kire para me da,  
Şîn-girî em xalî nebûn.

Xwînxarêd me mehez dikî,  
Em dizêrin, nabînî tu.  
Me qut dikin, mêze dikî,

Fermana wan naşînî tu.

Te çima em xuliqandin,  
Derdê dinê te tew da me.  
Hemûya ra kêf-ken şandin,  
Dîl, koletî kir para me.

Minafiqa tu har dikî,  
Dev davêjine ew para me,  
Zor-zexm dibin, qet deng nakî,  
Înkar dikin hebûna me.

Destê xwînêj îdî jêke,  
Bila sihke hebûna te.  
Pîya merûm, çava korke,  
Wekî bibe tim hewcî te.

Ezab bidê, zû bin axke,  
Paqîş bibe erş-kursîyê te,  
Were rehmê, ser me sîke,  
Sekinîne em hîvya te.

## **BERFA SİPÎ, ÎDÎ BESE, SER QENDÎLA MÎN DA LÊKÎ**

Geh lêdikî, geh vedikî, berfa sipî,  
Dîborzînî, basû dikî, geh jî tîpî.  
Hemû renga tenê dikî tu rengê xwe,  
Qenc û xirav derbaz dikî dewrana xwe.  
Rebbê jorîn ev rusqeta daye te da,  
Weke hevdu tu lênakî hemû dera.  
Cîkî hindik, cîkî gelek tu lêdikî,  
Geh dikenî, geh digirî, geh vedikî.  
Dema ku tu digihîjî ser axa min,  
Pir hêrs dibî, tu datînî tew barê xun.  
Rica dikim, Qendîla min kêr hemêzke,  
Barê giran cîkî dinê vala bike.  
Şêr gêrîla nav zaxa da meqîflîne,  
Zû derbaz be, li wir hindik tu bimîne.  
Dinya tu car awa naçe, dûmek heye,  
Gelê mine aza bibe, ev eseye.  
Ewê demê ser axa min dubar lêke,  
Bîborzîne, basû bike, him jî kêfke.

## EZÊ HEMÛYA BÎBÎM RAZÎ

Dinê gişkî bidine min da,  
Ezê bikim hewar, gazî.  
Zimanê min mekin unda,  
Ezê hemûya bibim razî.

Nasname min înkâr mekin,  
Kan, xeznêd min talan mekin,  
Dergê xêrê li min vekin,  
Ezê hemûya bibim razî.

Zindan, hepsa kilît bikin,  
Çek-sîlaha hûrxaş bikin,  
Azaya min pîroz bikin,  
Ezê hemûya bibim razî.

Sînorê kevn teze bikin,  
Navê gelêm qebûl bikin,  
Dost-bratîyê min ra bikin,  
Ezê hemûya bibim razî.

Dilê minî kirine çar par,  
Bizelqînî, bikin yek par.  
Ezê hemûya bibim razî.  
Ji vê dinê bikim firar.

## XWEZÎL GULÎSTAN BE

Bixemile, hemû qulçêd welatê min,  
Xwîn-xozavê paqîş bibin çem-kanyêd min.  
Amed, Wanê, Şivan lêxe tembûr şa-geş,  
Kuta bibin hemû rojêd dew, doze reş.  
Keçik herin bin darûka boy qepokê,  
Xort boy hubê hevra bikin mencêneqê.  
Ber bistana lorik têrbîn, mekin zarîn,  
Dayîk û xûşk boy bira, lawa mekin zêrîn.  
Esman vebe, kulîlk bidin çiqlê dara,  
Dûvmeqesk lez mizgîn bînîn ji bahara.  
Dapîr, bavpîr ser sicadê rûnên rihet,  
Gelêm yek be, ji yekbûnê hilde qewet.  
Bendav lêxe, bigre pêşya çemêd har, gur,  
Îdî bibe xwedan axa xweye lel-durr.  
Welêt derê bîn-nefese neyarê har,  
Cot bimeşin keç û xortêd kawê-kubar.  
Yek ala me bimilmile tevî ala,  
Dil-hinavêd xwîn-xarêd me bibin bela.  
Zêrêd meye reş, zer, sipî bibe yêd me,  
Pîyêd qirêj nekevîne nav axa me.  
Tirba Xanî, Qazî, Berzan bibin zyaret,  
Mirovêd dinê wan tewafkin bê tirs, rihet.  
Kevn bê holê, neteribe helalîye,  
Bêye kivşê kî ku hatye û kî bûye.  
Her kes rûnê ser axa xwe, nebin qut-qîr,  
Edilayî penc bavêje, redbin qelp-hur.  
Başûr, Bakûr, tew Rojava, him Rojhilat,  
Dest bidin hev, tevî hevdu bikin xebat.  
Kurd komkarbin, kulmê lêxin hemû cîkî,  
Nolî çema gişk bimeşin li alîkî.  
Dinya rihetbûnê hilde, nebin tofan,  
Gund-bajarên şên bimînîn, nebin wêran.  
Şîn tune be, ken têkeve dev û lêva,

Dîlan bibin, hevdu şabin bûk û zava.  
Dibistana biaxive zimanê dê,  
Vî emrî da ez bibînim ewê demê.  
Guhê min da bê nalîna qelp-neheqe,  
Dinya ronik rihet herim mala heqe.

## HEYŞTÊ ADARÊYE

Îro heyştê Adarêye,  
Ew roj rojeke Xwedêye.  
Dayka aniye ewa holê,  
Wekî şabin daykêd dinê.

Xemilîne gund û bajar,  
Gul vebûne hezar-hezar.  
Bav, law, dayka pîroz dikin,  
Baqê gula pêşkêş dikin.

Mûsîq bûye mêvan her cî,  
Sivre bûne têr û tijî.  
Sazbend hûr-hûr dinicrînin,  
Dengbêj şîrîn diqalînin.

Esman bûye çîk û sayî,  
Axê hildaye germayî.  
Keç, xort diçin nav dîlana,  
Direqisin tev ter, cana.

Mêvan pirin meclîs, mala,  
Şabûn ketiye hemû dila.  
Bilbil gula bûne mêvan,  
Îdî tune sar-zivistan.

Berfegul çava diqirpînin,  
Nergîz baharê mizgîn tînin.  
Sosin, rihan ketine lecê,  
Her yek dibêje: - Ezim, rind, çê.

Xwezil timê wa şayî be,  
Temam dinê azayî be.  
Xwîn xwar bêne red kirinê,  
Qet megirîn daykêd dinê.

## MIN RA DIBÊN, MESEKINE, BINIVÎSE

Hesretkêşê aşîtiyê me berê-berî da,  
Wê digirim, hemu qulça, hemu erda.  
Heta qelem hebe nava pêçyê min da,  
Ezê bankim, rexne bikim, tew nemerda.

Reşê serê dê û xûşkêd sûret bi xwîn,  
Ax-ofînêd bav û birêd heznîye, şîn,  
Lûve-lûva kal û pîrêd dil kul-birîn,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Koletîya gelê minî bê sî, sitar,  
Zelûlîya me ra aniye neyarêd har,  
Rind welatê minî bûye çar tîş, çar par,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Xwîn û rêça mêrxasêd ser ax, kevira,  
Dergûşêd sewiqîne ber bistan-bera,  
Sexîr-sêwîyê tî-birçîyê serê rîya,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Bûkêd xêlye, ber perda da, bê mêr mayî,  
Dotêd bikre bê hezkirî, dîlan mayî,  
Zozanêd bê bêrîvan, şivan, berxvan mayî,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Goristanêd him gêrîla, him pêşmerga,  
Şêr û şenbaz, qehremanêd êla Kurda,  
Tew bê gunêd boy azayê xwe dan feda,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Erf-edetê meyî zû da teribandî,  
Veşartina dîlan, cejnêd meye cindî,  
Kesêd neman heta îro bibiyan zindî,

Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Gulistanêd çilmisîye ne ter-teze,  
Deşt-beyarêd xemilîne, xwîn geveze,  
Daristanêd hilşandine fêkî-reze,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Qîre-qîra qaz-qulingêd asîmana,  
Zêre-zêra karxezalêd mêrg-çîmana,  
Kew-bilbilêd melisîne ser hêlîna,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Seyrangehêd zû da mane vik û vala,  
Eşq dilokêd nayên zarê qenc cahila,  
Belg weşîna sosin, rihan, him sorgula,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Teyrik-tûyêd bask venakin nav esmana,  
Terewilêd der nakevin dora lana,  
Koçervanêd venagirin çadir, kona,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Emrêm îdî gelek çûye, maye hindik,  
Min nagerin çîl-bedewed naze, rindik,  
Kur û keçêd gelê mine taylan, tenik,  
Min ra dibên, mesekine, binivîse.

Ezê bankim, dinya bila pêbihese,  
Pêşya qetla bila bigrin, îdî bese,  
Kesên xêrxaz deng bidin boy azaya me,  
Şîn-koletî belkî derê welatê me.

Xwedê xwînxar kunê-kunê bike yek car,  
Ewladêd wî bike xurê tim gurêd har,  
Malê da şîn, hêsrêd xwînê ew bîne xar,  
Laşêd wîra peyda nebe çeleke sar.

## HÎN BE, LAWÔ

Bi derewa, qewlê vala,  
Nabî xweyê mal û hala.  
Bixebite ça palevan,  
Bibe tacê dê û bavan.

Nebe dîlê nevs û tirsê,  
Ne hebîne çek û hepsê.  
Jiyan rêke raste, xare,  
Bende jêre, him li jore.

Jîyan şere, lawê delal,  
Alim-şêre evdê kemal.  
Derbaz neke roja vala,  
Bigre qedrê pîr û kala.

Dest emel be, meriv hez be,  
Dil temîz be, bê qerez be.  
Zanîn behre, nebe nezan,  
Welat hez ke bi ruh û can.

Zîyareta te - heqîqet,  
Her gav dijî, namre senet.  
Hîm be, hîm ke, tu lawo, can,  
Millet, welêt, meke poşman.

## KÛRÊ MÎN

Hespê zemîn sîyar bibe, kar û bar be,  
Rast mêzeke, tim mêrxas û xunedar be.  
Tu bibîne behrên mezin, him çemên kûr,  
Merivhez be, qewmandina nemîne dûr.  
Bihebîne axa welêt, sosinên ter,  
Rastîbêj be, nebe dîlê tu zîv û zêr.  
Emir delke, hene gavên tele û geş,  
Bijî boy war, çi te ra ne xemil û rewş.  
Kemala te nefê bide dinya kebîr,  
Lawo, Kurdî, Kurdistanê neke ji bîr.  
Tim pîspor be, her gav naske xirav, qenca,  
Tirseka dûr, pêpez bike xirav, qelsa.  
Bihebîne erş û kursî, tew milleta,  
Dayîkhez be, bigre qedrê keç-hermeta.  
Pardilêmin, tu nebînî xem-kedera,  
Xizmethiz be, bixemlîne qulç û dera.  
Ez kubarbim, pêş alemê, cem hevala,  
Egît-şêr be, cî bigire nav hevala.

## LAWÊ MÎN

Lawê minî delalo,  
Hilde pirtûk, kemalo,  
Sibê wedê dersa te,  
Dê û bav kefîla te.

Lawê minî ezîzo,  
Dêm zelalî, sewt zîzo,  
Bixwîn, hîn be, lawo can,  
Dê-bavê meke poşman.

Lawê minî giştiko,  
Hilde pirtûk kîsiko,  
Bigîhîje hevalan,  
Ji wan nemîn tu caran.

Lawê minî egîto,  
Pisporo, tîto, vîto,  
Qal be nava ulim da,  
Şake dilê tew Kurda

Lawê minî qendiko,  
Aqilbendo, rindiko,  
Karê bide gelê xwe,  
Qet bîr meke eslê xwe.

Lawê minî şîrîno,  
Por zero, çev hêşîno,  
Şer û dewa tim dûr be,  
Kedhezî, şuxulkar be.

Lawê minî piçûko,  
Bi xirxalî, xişmişko,  
Nebe hogirê qelp, hara,

Ji wan dûr be, her cara.

Lawê minî bêzaro,  
Rabe, bike hewaro,  
Bila Xwedê te sih ke,  
Neyarê te ew qut ke.

Lawo, hebûn welate,  
Bext û miraz welate,  
Bê welat jiyan tune,  
Ji dêrok serberate,  
Bê welatî, bê malî,  
Zilî, bê reh, rîçalî.

Kurdistana te çêbe,  
Dibistana te vebe,  
Kalik, pîrik eşq û şa,  
Te ra bikin xêr-dûa.

# REWAKIRIN

SEYDA XANÎ

*Rewayî 300-salîya helbestvan u fîlosofê Kurda  
Ehmedê Xanîyê nemir dikim*

Seyda Xanî, ez ji te ra çîya nabêjim,  
Çîya nizmin, tu ji wana bilintirî.  
Ez ji te ra behrên bê bin qet nabêjim,  
Behr tenîskin, tu ji wana zehf kûrtirî.

Xuliqîyî ji qudreta Rebbê jorîn,  
Nişa xasî, lawê Zalî, Kurdî yeqîn.  
Nav qurna da ne helyayî, mayî êgin,  
Tim dikelî, tim dikişî bê ser û bin.

Lel û durrî, ji te dûrin qilî, qaçî,  
Te kir nemir ev zaravê me Kurmancî.  
«Mem-Zîn»-a te tacê zêre boy tew Kurda,  
Wek te zane min kêr dîtî li van erda.

Gelek qurne wê bîn-herin, tu namirî,  
Kana tijî, şîrîn, şerbet, cewahirî.  
Kurdistana me yê bibe îdî aza,  
Heykelê te emê daynin cem şenbaza.

## REWAYÎ MEHMED QAZÎ DİKİM

Rabe, qelbê mezin, bahare, li her alî bike mêze,  
Mêrg û çîman, deşt û zozan dîsa digrin rewşa teze.  
Gul û sosin quluz dibin, xemilîne baxên tezî,  
Xortê tûnsiz diqalînin, şayê dikin keçên kezî.  
Rabe, parçe-parçe bike îro tu libasê xem-kederê,  
Bilbil gûla bûye mêvan, tim şayîye li vê derê.  
Hev hezkirî pir şadîman, li xasbaxçê dikin geştê,  
Tebîyet bûke, libasê ter tim lê xweş tê.  
Rabe, Cizîra me mêvanheze, em li wîra bibin mêvan,  
Ser merzelê Mem û Zînê hedyê daynin baqe gulan.  
Were, em dîsa bêkavî dil zîyaret bikin Sîpanê sar,  
Bi zelûlî matem bigrin, bilûvînin tev Xeca zar.  
Bese razan, hîvya mene Feqî, Xanî, Bateyê kal,  
Ewledê te saz kirine dîsa cehat li Şerqa kal.  
Rabe, em jî, em jî herin, pêş neyara bikin dew-doz,  
Baqe gula bibarînin, Kurdistanê bikin pîroz.

## REWAYÎ 75 - SALÎYA SERHÎLDANA ŞÊX SEHÎD DÎKÎM

Şêxê, rabe, dinya îro bike mêze,  
Nê-meremên teye nîvcî dibin teze.  
Amed, Bitlîs bûne dilê Kurdistanê,  
Kurd rabûne îdî xewê, xewnistanê.  
Xwînrejên me pêş alemê bûne sosret,  
Kurd yekbûna xwe hildidin îro qewet.  
Başûr, Bakûr hinirên me diaxvîne,  
Ser axa te egît, mêrxas xuluqîne.  
Ewladê te dikin meşa serkevtîyê,  
Xeza dikin reh-rîçalê koletîyê.  
Hevtê penç sal boy dîrokê gelek nîne,  
Lê me pir dît rû-astarê dewr-zemîne.  
Serê neyar emê qutkin, îdî bese,  
Gurê gewrik welêt derxin, îcar ese.  
Seyda, serok heye, em bextewarin,  
Şikir, şikir, eme xayî welat, warin.  
Hindik maye ji axa me derên doz-qal,  
Heykelê te emê daynin Bitlîsa kal.

## KEK ŞEHRÎYAR

*Rewayî helbestvanê Başûra Azerbaycanêyî pir eyanî û  
azadîhez Şehrîyarê nemir dikim*

Xwedê zane, neheq kêye, sebir bike,  
Hîvî dikim, demekê kurt tu min sihke.  
Jan û eşed min-te yekin, ev eyane,  
Virnîtî da ez û tu tev zêrîyane.  
Tu du parî, ez çar parim, heya îro,  
Neyarêd har em kirine hîro, gîro.  
Gelek hatin, bûn “birêd” me, em xapandin,  
Belengazî me ra anîn, em helandin.  
Bajar û gund me çêkirin, me şên kirin,  
Heps û zindan tenê bi me tijî kirin.  
Çem û kanî miçiqandin, em hîştin tî,  
Hebûna me hemû birin, em man birçî.  
Me hasil kir, etlez, qumaş, him gulavtûn,  
Ew xemilîn, em bê kiras, em bê cil bûn.  
Hêsrêd xwe va me tim av dan zevî, orman,  
Wana kêf kir, me têr nexar zikekî nan.  
Mêrxasêd me hemû kuştin, darda kirin,  
Keç-bûkêd me koşk-sera da xweyî kirin.  
Rusqet û heq ji me stendin, ser me kenyan,  
Dê-xûşkêd me bûne heznî, reş girêdan.  
Zimanê me ji me stendin, ne kirin xof,  
Ser pişta me agir dadan, ne gotin “of”  
Zulma giran erd û esman tev hilçinî,  
Gura, hırça hevdu girtin, bûn peranî.  
Me deyax kir, meriv qespe, ne ku kevir,  
Em çi bikin, xayîn derket me ra dewir.  
Seyda, heqî zirav dibe, lê namire,  
Dem hatiye, zulmê îdî xwe vemire.  
Emrekî ferz cem Xwedaye, kes nizane,  
Nav jîyan da qet nade der, mirovê zane.

Hemû parê bibine yek, ev eyane,  
Dîroka kevn timê dijî, dewr-zemane.  
Îdî rabe, bike gazî, tu gelêd xwe,  
Tev gelêd min neyar hildin hûn heyfa xwe.  
Kurd û Azer bila bijîn bê derd, kule,  
Ala me-we nav ala da bimilmile.

## HEJAR RA

Seyda Hejar, ax kesera nekişîne tu hûre-hûr,  
Dinya behre, em kelikvan, boy me Kurda delave kûr.  
Ba alîkî nake lîlîn, ewa hukmê dewr-zemîne,  
Çira kesî naşuxule, heta gava xût paşîne...

Em çi bikin, qet tebîyet rûyê Kurda nekenîya,  
Dayîka me lawo lûvand, şeva, roja ew girîya.  
Dijminê me, xwînêrê me, hidûd li me kirin wêran,  
Timê xastin yasax bikin ew xebera nav – Kurdistan.

Dil kevira şewitandin, hedimandin koşk û bajar,  
Bok û beran xeniqandin, pîr û kala kir zare-zar.  
Ka xezna me, kuda birin, kîjan qulçî kirin cî-war?  
Dutîretî me bû bela, muftexura keda me xar...

Dinya fire me ra anî him bextreşî, him jî agir,  
Dîroka me dijmin veşart, qurne, qurne nekir zahir.  
Talan kirin deşt û zozan, miskenêd me bûn zaxêd sar,  
Xwîna Kurdan bû çem-kanî ser Dicle da ew hate xar...

Seyda, Seyda, emrê zulmê îdî gelek nakişîne,  
Heqîqetê xirav-qelpa agirê xwe da bişewtîne.  
Qurna bîsta kuta dibe, Kurdistanê bibe aza,  
Werê, tev min, gula dayne, ser merzelê şêr-şenbaza...

## KEK MESÛD BERZANÎ RA

Serokê me, li meydanê bihurmuje, nolî şêra,  
Tu ewladê kek Berzanî, mêr dikevin tim ji mêra.  
Tang, teyara qet metirse, merûm bike îdî dijamin,  
Şev û roja ne betile, biqedîne xastinêd xun.  
Zor zerpêd te neyara ra bila bînin axir dewran,  
Rîya te heqe, bilezîne, Seddam altke, ez bi heyran.  
Heta kengê dê-xûşkêd me meqes bikin zulfêd qayde?  
Îdî bese, kan-xeznêd me neyar hildin kar û fayde.  
Boy çi? Çima zimanêd me yasax bikin dibistana?  
Kurd bê xwedî, sêfîl-sêwî, sergerdanbin qûmistana?  
Dozê sazke, Başûr, Bakûr bixemilin kesk-sor-sipî,  
Zindanêd sar îdî derxe keç û xurtêd tûnsiz, cindî.  
Neyar redke, zulmê hilde, mede xwînêrêj firsend, îmkan,  
Tirba bavo bibe zîyaret, zewar bênê her çar qulban.  
Çîya-banyêd Kurdistanê baq-baq bikim gulêd teze,  
Ser merzelê nemir Berzan wana daynim eşq û leze.  
Pêş çok vedim, ax, kevrêd wî tewaf bikim dubar-dubar,  
Ji şabûna, cara dawiyê, hêsrêd gir-hûr berjêrkim xar.

## GELÊ QAZAX RA

Te xîreta min pir kişand,  
Minetdarê eslê te me,  
Tu Qazaxî, ez jî Kurdîm,  
Ez midheyî zarê te me.

Ser dilê me bûye birîn,  
Bê welatî, bê germ hêlîn,  
Êş-xemên me te hîlanîn,  
Pîrozbarên şayê te me.

Herîr, Bate, Feqî, Xanî,  
Em hînbûne wî zimanî,  
Abay, Cambûl, xezne, kanî,  
Hişmetkarê xezna te me.

Sed eferim birê Qazax,  
Pir hurmetî, giran-deyax,  
Tev te bûne em xweyî ax,  
Em kefîlê heqê te ne.

Em vir dijîn şa, bextewar,  
Ser axa te me daniye war,  
Ûris, Teter, Yûnan hevra,  
Eşq-azane îro vîra.

Dilê Barî xema tijî,  
Bê Kurdistan dibe rijî,  
Mêrxasin herd gelên me jî,  
Ez xêrxazê gelê te me.

## BÎRÊ QAZAX

Dil-dergên te vekirîne berê-beri da, her gav, her dem,  
Dêmê te geş, zarê te qend, ji te dûrbîn keder û xem.  
Parek Kurdê hêsîr, revok, te cî kirin nav dilê xwe,  
Navê Qazax herfê zêrva Kurda kirye dîroka xwe.

Dîroka te pîr qedîme, te hîştine rêçên gir-hûr,  
Hecirîyî, heciqîyî dew û doza nemayî dûr.  
Dewr-bila da Qazax miriye boy namûsê, boy xîretê,  
Egîtayî, merivhezî navê te ra bedew hev tê.

Abay, Cambûl xezna kûrin, tacê zêrin, kubar bibe,  
Dîn Muhamed, şêr Nûrsûltan lawên tene, tu şa bibe.  
Îro aza, serfînyazî, pîroz dikim vî emrê te,  
Pîyê neyar tu car, tu car qet nekeve nav axa te.

## KEK NADÎR

*Rewayî 75 -salîya akadêmîkê Kurdayî eyan Nadirê Keremê Hecî  
Nadir dikim.*

Zarotî da bûyî sêwî, sêfîl, suxar,  
Hezkirina bavê delal mayî bê par.  
Dil da keser hîro, gîro, birçî, tezî,  
Boynet Kurda ulm yasax bû, we xand dizî.  
Ber tel-nîça we deyax kir, xwe neda paş,  
Rîya emrê we bû rastî, ne bûne şaş.  
Fedî mekir tirsê, xofê, qelpa, hara,  
We got: - Kurdîm, Kurd hilnadin minnet, qara.  
Şevêd bê xew bûn hogrêd we, we rêt xûydan,  
Îro bi we kubar dibe tew Kurdistan.  
Berê-berî da tim gotîye pîra, kala,  
«Ewladên baş bilind dîkin serê gela».  
«Çiqas salan nav axê da bimîne zêr,  
Qîmetê xwe unda nake, ew tîye kêr».  
-Welathezî, rewşenbîrî, maqûl, delal,  
Tim bê telpî, nolî çilke ava zelal.  
Xezna kûrî, ulmê we da tune qusûr,  
Dinya-alem we nas dike egît, cesûr.  
Zane pirin, timtêşa we hindik hene,  
Rastî bêjî, qelsî, xarî cem we tune.  
Ne nîvcîyî, xweyê qîrar, şertê xunî,  
Merdemêrî, cevahirî, tijî kanî.  
Behra wene pir rewşenbîr, maqûl, zane,  
Hûn bûn sîya gelek sêwî, bê kesane.  
We vekirye gelek sêrên ulme tarî,  
Zehmetê we bilind digre tew mervayî.  
Nolî royê şewqê didin her çar parça,  
Tîrajê we ronik dîkin hemû qulça.

### **Xwezil:**

Me bidîta Kurdîstana xweye aza,

Welatê me derketa ji dewa, doza.  
Ser axa dê kûlîlk, fêkî, binikanda,  
Dibistan da zimanê dê biniçranda.  
Me bavîta kuç-kevîrê xerîbîyê,  
Tew gelêd me derketa ji zelûlîyê.  
Vir ha şûnda em bijyana li axa dê,  
Sed saliya we derbazkira li Amedê.  
Dost-aşîtî tijîkira dinya fire,  
Fisq, fesada hûn bimana timê dûre.  
Ji dêmê we nûr dibare, zanê eyan,  
Sed salyê da we bibînim dîsa wa can.

## KNYAZ, BÎRÊ DELAL!

*Rewayî zane û rewşenbîrê Kurdayî navdar, Knyazê Îbrêhîm dikim.*

Tew keda we pêş çavane, emekdarî,  
Nava gel da qedir, qîmet, pir navdarî.  
Kurdê xasî, şeref, namûs tacê teye,  
Pêş neyara duqat nebûn rewşa teye.  
Gel û welêt dihebînî wek ruhê xwe,  
Cî hatinê, nahêvşînî hebûna xwe.  
Dil paqijî, zar şîrînî, merdî her dem,  
Welêt dûrî, te pir bûn tim keder û xem.  
Maqûl, zane, merifhezî, merîfetî,  
Nav ulim da nav û dengî, bi syanetî.  
Çanda me da kar-kedê te pir gelege,  
Boy gelê xwe, çi jî bikî, ew hindike...

Êşkê teme, fikra neke...

Mêrê kotî quncika da xwe vedişêre,  
Xwedê meke, ruvî rûnê dewsa şêre.  
Daristanê bişewite, têke qîrîn,  
Zer-zinarê cî bileqin, têkin zingîn.  
Kew-bilbilê meqalînin, hêstra xarkin.  
Gul-sosinê biçilmisin, orman barkin.  
Wê pêpezbin mêrg û çîman, him terrazin,  
Çem û kaniyê bisekinin, bikin gazin.  
Teyrik-tûyê bimelisin ser hêlîna,  
Karxezalê dernekevin çolistana.  
Şêr-şepalê bilûvînin, bikin îskîn,  
Nêçîrvanê tu nêçîra mekin yeqîn.  
Tu sazbandê mey-bilûra neynin lêva,  
Keç û xortê bibarînin hêsrên çeva.  
Bêrîvanê rûnanêne ber bêrîya,  
Şivan îdî wê neçine nav kerîya.  
Eşq berxvanê sûnê kona mekin unda,  
Şînê têkev nav bajara, hemû gunda.

Kundê rabin, bihutmijin, bidin ferman,  
 Wê çîlo-çen bifitile çerxa zeman.  
 Pêçermûkê zexm bikenin li ser zîya,  
 Kûsyê bêjin: - Me çêkirye eva dinya.  
 Deşt-zozanê biqimilin, bikin hewar,  
 Erş-esmanê bireşînin tim berfa sar.  
 Tew bînberê kombin, bikin şîna giran,  
 Ro û hîve îdî hevdu nebin mêvan.  
 Axê hers be, bilerize, bibe şewlik,  
 Çîya-baniyê bihedimin bibin girmik.  
 Lokê sistbin, pêş meşkê sêfil, sêwî,  
 Wê zabibin ter û hişk, him dar-devî.  
 Qetlê bibin him roj, him şev, sibê, êvar,  
 Kesê-kesî nebe xweyî, neke îtbar.  
 Emrê telbin, çûkê rûnên su mezina,  
 Sî û sewê bê hildanê nav kêç-jina.  
 Ji mejûya wê derkevin dê û welat,  
 Wek zilekî wê qîmetbin bende, heyat.  
 Zaniyê kûr, boy qenc mêra pesin etve,  
 Çimku ewa nişa xase, helal lutve.  
 Beriya gotîye, “Mêr dikevin tim ji mêra”,  
 Qet bîr meke, “Şêr dikevin tim ji şêra”.  
 Xwîna keda çi ku hebe dide dere,  
 Eqara xwe naguhêre zêrê zere.  
 Mêrê mêrxas qal-cenga da nabin hejar,  
 Esilzade kelimata zêr tînin zar.  
 Birê delal, meriv bimore, daha başe,  
 Ne ku bijî, emrê pîroz, bike feşe.  
 Gelê me da mêr rabûne, yek jî tuyî,  
 Eme şane piştovanê me hemyayî.  
 Bextewar bî, qet nebînî jan û êşa,  
 Fêl-fesada timê dûrbî, bimînî şa.  
 Birê delal, şêst sal boy te pir hindike,  
 Rebbê jorîn çil salî jî lê zêdeke.  
 Ji aliyê min boy nefsa te duam eve,  
 Bira welat bi navê te hertim şa bê!

## REWAYÎ 60 SALÎYA KNYAZÊ ÎBRAHÎM DÎKÎM

*Knyaz, birê delal, keda bê çilk, xemil û rewşa xweyane.*

Zû mexape, tim serwext be, him jî hişyar,  
Sêr-kirnêd xwe her kesî ra meke dîyar.  
Zarê şîrîn mêra jî zû dixapîne,  
Dostê îtbar hêsyar-rihet kes nabîne.  
Paşe rojê qet bîr meke, tim wa nabe,  
Êlê hezkî, êlê time pêş te rabe.  
Kurda hevdu hez nekîrîye pêşda, berê,  
Bawer nakim, ev mereza nav wan derê.  
Felqe dilê te bahare, ya din havîn,  
Zimanê te pir şîrîne, wek gula bîn.  
Boy gelê xwe te çi kiriye, gel wê zane,  
Xizmetêd te wê bimînînin dewr-zemane.  
Sed eferim, te girtîye rîya heqe,  
Halê xwe da bila pûçbin qelp, neheqe.  
Xwedê pêş te timê vêxe ronaya şîn,  
Nav jîyan da xêynî şayê nebînî şîn.  
Êşkê te me, şêst sal boy te pir hindike,  
Xwedê virha çil salî jî lê zêdeke.

## HUSEYNÊ HEMÎD, 70 SALÎYA WE PÎROZ BE

Bê bav, sêwî, sêfîl, hejar,  
Hêsrên şewat te anîn xar.  
Bû hewcê tu parîkî nan,  
Li te zuwabûn zar û ziman.

Sal buhurîn bi şîn-girîn,  
Ser dilê te kûr bûn birîn.  
Hêsîrîyê hukme xwe da,  
Mala mezin tiştek nema.

Pêşiya maye gilîkî wa,  
«Tamara qenc nabe unda.  
Agir, alav bişxule ser,  
Kutasîyê da xwe dide der».

Netirsayî zehmet, xofê,  
Ketî rêça ulmê dinê.  
Cefa kişand, cefakî pir,  
Bûyî zane, zane kî gir.

### ZANE

Hiş û mejû, aqil-kemal, ruh-hebûna gelê xune,  
Telî, zûrya, berî gişka ew dibîne, ew dizane.  
Xezna tijî, erf û edet, zar-zimanê gelê xwe ne,  
Ne durûye, ne vireke, gelfiroşî cem wî tune.  
Namûs, xîret, qudûm û qam, xemil-rewşa gelê xwe ne,  
Xêynî kaxet û qelemê mal-dewleta wîya tune.  
Mertalgêre, tim şerdike, pêş neyarê gelê xwe ne,  
Çilke zêrê palandîye, qusûr, qelsî tê da tune.  
Nûra çava, dil û hinav, şewq-şemala gelê xwe ne,  
Welat pêştir zîyareta miqîm, efzel boy wî tune.  
Ji bistanê dayka egît te mêtîye şîrê helal,  
Hêleşana te kildane Zîna bextreş, Xeca delal.

Nişa xasî, bê tirs, bê xof, te ra dibê m teyrê bazî,  
Ev mêranî te hildaye Kawe, Rustem, Berzan, Qazî.  
Dîrok kevnî, tacê tene Herîr, Bate, Feqî, Xanî,  
Aqilbendî, serbilindî, hej û meşa dinê zanî.  
Nêt-meremên te gelekî, ez çî bikim meydan tengî,  
Welat dûrî, per û baskên te weşyane, pejmûr rengî.  
Rojbûna te pîroz dikim, ev xastina min jî dile,  
Lawê Kurda emrê xwe da ked û hedê nabetile.  
Êşkê te me, dinya behre, zane nav da gula bîne,  
Bextewarê ewa kesa, dû wî navê baş dimîne.

## EZÎZÊ BÎRA, ESÎL HEWE, ESÎL EVE

*Rewayî endamê malbeta Bedirxanîyayî pir comert Ezîzê Zîyoyê  
Bedirxan dikim.*

***Mirovêd şeref û paqîş, dixuliqin gelek hindik,  
Cem her kesî nayê dîtînê, dilê mezin, zarê rindik.***

### **Ezîzê bira:**

Bedesila tîmar dikî, emekê te diçe bade,  
Toxumê wî direşînî, têne meftêh-jehrê dide.  
Wedê rûte, heyfe, başe, serikê xwe bilind nake,  
Hevikekî pûrt ku lê tê, têlmaş kesî begem nake.  
Dibê:- Vira axa ezim, li Bexdayê xelîfê kor,  
Dewran ketiye destê min da. Dinya dore, ne ku bi zor.  
Sê-çar kapêk diçin cêvê, bin pîyê xwe ew nabîne,  
Kîbûna xwe zû bîr dike, bok û beran xwe dibîne.  
Çermê xwe da cî-war nabe, hemya jor da dinihêre,  
Dibe eslan, fil nikare pêşya wîra bibihure.  
Hûr dimeşe, gir dimeşe, gava davê gelek fire,  
Libasê xwe diguhere, li dimîne dîsa kere.  
Laf-bera da diqelişe, pesin-metha zêde dike.  
Sûç-îtrafa, derev-qelfa, lihêv tîne, pir rêz dike.  
Cîyê tirsê nayê xanê, çiva dide nolî ruviya,  
Rojê sed car fitva dide, wekî bibe qetla meriya.  
Dinê hemû bişêwite, ew şa dibe, direqise,  
Hêla revê para wîye, dilî tijî xof û tirse.  
Boy çîçike kar-nefa xwe, dost-hogira zû davêje,  
Merivayê gelek dûre, bîn-nefesa wî qirêje.  
Qebûl nake îltimasa der-cînara, çûk-mezina,  
Geh hêrs dibe, geh nerm dibe, vedbişire nolî jina.  
Ber çavêd wî dibe dûman, nas û dosta qet nasnake,  
Sexîr-sêwya dizêrîne, çawa meriv wan nas nake.  
Gava zerpa, zexim-zora ku dibîne, dibe melhem,  
Dibêje min efû bikin, birê hevin ne zû da em.

Diricife, dibe lolep, xwe sero-bin unda dike,  
 Pêş hemûya dibe duqat, dilerize, rica dike.  
 Dêl-bijî lê dirûçikin, dîsa diçe warê bavo,  
 Nava gel da dibe rovet, jê ra dibên pelo, tewlo.  
 Bahar ku tê, ajero yî per davêje, gur şîn dibe,  
 Lê bê rehe, gelekî zû diçilmise, zû hişk dibe.  
 Kesê bê reh ew çêreye, ku şîn dibe, dihurmiye,  
 Dibe cellad, çîlo-çepo mewt û jehra xwe dirêje.  
 Beriya gotîye “Bedeslara sînge xwe meke sî û sitar,  
 Axir, oxir, poşmanîye, jê nabînî bext û îtbar”.  
 Esilzade çiqasî jî bihecîqe, bibe hejar,  
 Kîbûna xwe nake ji bîr, lel-cewahir ew tîne zar.  
 Şer û dewa ditemrîne, aşîtyê tînê dinê,  
 Merivayê dixemlîne, boy welêt xwe dike finê.  
 Rûsipîya dişewire, çûk û hûra dihebîne,  
 Xêynî qencî, merîfetê, hevsûdîyê ew nabîne.  
 Sêwî-jara dibe xudî, birçî-teziya cil-nan dike,  
 Rîya Xwedê da boy her kesî sî-sitara xwe kê nake.  
 Kî derîyê wî vedike, bê par paşda qet naşîne,  
 Barê ketiya tim rast dike, xwe qunca da nahêvşîne.  
 Piştâ êlê, dost-hogira mîna çîya disekine,  
 Qezîyê giran ku dest didin, naedile, nasekine.  
 Mal-ocaxê nûh çêdike, heya tu car xirav nake,  
 Tew mirazê keç û xorta bi dilê wan hasil dike.  
 Xwîna kêda çi ku hebe, zû û dereng dide dere,  
 Çiqas hûr be, eqara xwe naguhêre zêrê zere.  
 Erf-edeta diparêze, xwe gelê xwe naqetîne,  
 Nav gela da gelê xwe ra, nav û dengê bilind tîne.  
 Qelbê mezin, dilê paqîş gelek kê nake tîne dinê,  
 Tew weda da, hemu ciya da lel-cewahir nayê dîtîne.  
 Mirov dû xwe tim dihêlin du xeberêd ne qenc, hêca,  
 Yek neleye, yek rehmaye, rehmê tînin timê qenca.  
 Pêşîya qenca vekirîne hemu derge, her dîwane,  
 Ezîzê şêr, lawê Zîyo, kîrnêd xwe va yek ji wane.  
 Ew çîyakî pir bilinde, sîyê dide çar aliya da,  
 Ji Xwedê xwe em razîne, ew esnafa daye me da.

## BER TÎRBA WEZÎRÊ NADÎRÎ

Gelo çima dîsa îro dikewgire dilê min jar?  
Pêşberî evê tîrbê xuber hêsrêm têne, têne xar.  
Bi dilê kul, bi çavê şil, mêze dikim ez vê tîrbê,  
Gelek herfê xêlê bedew nivîsîne ser kevrê wê.  
Zef giranî diweklînim ez xwendina heman herfa,  
Nivîsîne, bêwedeye vir paldane lawê Kurda.  
Heman demê, dinya bedew ber çavê min dibe tarî,  
Çok vedidim, tewaf dikim ez merzelê Kek Nadîrî.  
Rabe, qelbê saf, dengbêjê dila, aqilbendê kûr,  
Dinya bedew bûye edlayî, jê dibare gul û nûr.  
Rabe, rabe, mêze bike li Afrîqê zengê reş,  
Wekîlnevse, baxê xwe da ew diçîne gulê geş.  
Rabe, rabe, xwestinê te îdî temam têne serî,  
Gulîzera dilşewitî li dû Nado îdî nagrî.  
Rabe, rabe ji qebra sar, li Şerqa kal bike mêze,  
Çîya-baniyê Kurdistanê berev bike gulê teze.  
Ewan gula bîne raxe ser merzelê şêr-şenbaza,  
Bi serkarîya Berzanîyê me Kurd-Kurdistan dibin aza.

## BÎRANÎN DERHEQA WEZÎRÊ NADÎRÎ DA

*Min mamê xwe, Wezîrê Nadîrî cara yekê kengê û çawa difîye...*

1944- salê bû. Şerê cihanêyî dûda dewra xweye here cawdar derbas dikir.

Kasivayê û xelayê çawa pareke mirovêd dinê, usa jî mirovêd ova me gelekî feqîr û belengaz kiribû.

Rind tê bîra min. Ezî hevt salî bûm. Fesla payîzê bû. Êl ji zozanê berbijêr dibû. Ova me perê bajarê Yêrêvanê, rex Sarîtaxê danîbû (Sarîtax pareke bajarê Yêrêvanêye). Ova meye ne ewqasî mezin bû. Heta 20-25 mala bû.

Berî nîvro bû. Erebeke reşe pir birqonek, hate nav ova me. Jê sê mêrêd cilêd paqîşe, bedew lê jê peya bûn. Nava wan da mêrekî

gelekî bilindî berbi çav hebû. Me zaroka hemûya li wî mirovê nihêrî. Serê wîyî vekirî bû. Şal û bilûzê zere lê bûn. Pîyê wî da gîzmeyê xurome (pêlavên dev dirêj) reş hebû. Qayîşeke sore, pene pişta wî bû. Mirovêd ovê hemû çûne çem erebê. Em zarok jî dora erebê û wana civîyan. Çawa tişteki nûhî, neditî, me li wana û erebê dinihêrî. Ecêbgirtî diman.

Dema kalemêr û pêrejinêd ovê gihîştine bal erebê, min dît ku ewana rûyê ewî mirovêd bilindî berbiçav maç dikin. Ew jî destêd wana maç dike. Mirovêd ovêye emir da piçûk destê wîya maç dikirin. Ewî jî netika wana maç dikir.

Dayka min, destê min girt. Ez birime çem wî û got:

-Kurê min, ev mamê teyî Wezîre. Tu jî were destê wî.

Min destê wîya maç kir. Ew vebişirî. Destê xwe da ser serê min. Xareve hat û herdû rûyêd min maç kirin.

Ew tevî cimaetê xêleke xurt axivî. Paşê berê xwe apê minî Rizgo da (ew û apê min kur mamêd herduye helal bûn) kir û jê pirsî:

-Apê Rizgo, qet halê weyî çawane? Hûn vî wedê xirav da çawa derbazîya xwe dikin?

Mamê min got:

-Wezir, ez qurbana te me, hal, îdî hala derbaz bûye. Hemînê yê ku bimrana îdî mirine. Lê, em nizanin, emê van nemirîya vê zivistanê ku derê û çawa xweyîkin, wekî silamet derxine baharê. Zivistan îdî nêzîk dibe. Tu sitara me tunene. Eme bê cîye, bê sitarin. Nizanin, çi bikin. Emê ber van sur û serîyêd zivistanê kîderê û çawa ebûra xwe bikin, wekî vî hêsîrê birçî û tezî çawa ber qirê û qutê silamet xilas bikin, nizanin...

Pistî vê gotina apê minî Rizgo, mirovêd ovê tevî wî gelekî axivîn. Her yekî gilîyek xwe got.

Ewî hemdeke gelekî fire, ew hemû bihîstin. Bi medekî ji dewrêyî nerazî got:

-Gelî qewma, ez, loma jî îro hatime cem we. Halê we ra bibime nas. Bê wê jî min halê we zanibû. Çend roja berê, ez boynet vî halêd weyî giran çûbûme çem mirovêd dewletêye here bilind. Min derheqa halê we wana ra qise kir. Ewana jî dilsaxîke here başva min ra razî bûn. Du roja berî hatina vira, ez çûbûme nav cimaeta Devexerave. Min çawa lazime bi sipartina dewletê alîkarî da wana jî. A, îro jî,

dewletê ev herdû camêra tevî min şandne cem we. Heval Pêtrosyan, lap jorê kar dike. Ev jî hevalê Tigrane. Ew serkarê taxa Sarîtaxêye. Dewletê sipartîye wî, wekî ew we van çend mehêd girane sar, Sarîtaxê da cî û war bike. Heta baharê alîkarîyê bide we. Paşwextîyê hûn çawa dixazin, usa jî bikin.

Wê şûnda, apê Wezîr tevê mirovêd ovê xêleke jî axivî, paşê xatirê xwe ji wana xast û çû.

Wê qewimandinê heya roja îro jî nava ruh û mejîyê min da picexe gelekî kûr hiştîye. Min çî tiştê bilind didît û tafilkê digot: Yeqîn, mamê minî Wezîr destê xwe bilind bike, destêd wîyê ji wana gişka derbaz bibe. Her wext wa difikirim.

Bejn û bala wîye bedewe, taylan heta roja îro jî ji ber çavêd min neçûye.

Tê bîra min, bavê min timê tevî pîre diya min derheqa wî da xeber dida û car-caran jî digot:

-Şîkir, şîkir, rebbê jorîn, xweyê me heye, emê pîs-pak bijîn. Bila xwedê تمام mirovêd sexîre, bê sitar bê rehmê. Xwedê ew nevsa ne tenê boynet pismam û gelê Kurd xuliqandiye, ew usa jî, boynet hemû gele xuliqandiye.

Ez wede ku nivîsarêd wîra dibime nas, tafilkê tême ser wê fikrê: Ew ne tenê ewledê gelê Kurd bûye, ew usa jî ewled û alîgirê hemû gele, hemû mirovêd bêsitare, merûm bûye.

Xanimê wî, Nûrê Poladbêkovê qise dikir, wedê defna Wezîr, zimanzanê Ermenîyayî eyan Acaryan bi kêlmeke gelekî şewate û nebîrkiri pêşda hatiye. Piştî defnê, ewî xanima Wezîr û keça wî şaş meha mala xwe da xweyî kirine.

Şeveke fesla 1946-salêye payîzê bû. Min nişkêva dengê girî bîhîst. Veciniqîm. Hişyar bûm. Dît ku, dîsa pîredayka min û dîya min digirînin, şewat-şewat digirîn. Ewana gelek cara dizê me seva bavê min digirîyan. (Bavê min Elîyê Paşê şerê cihanêyî duda da şehît ketiye). Min tirse-tirs li wana nihêrî.

Vê carê dayîka min hîrêd xwe paqîş kirin. Ez kirime hemêza xwe û bi dengê şewatva got:

-Lawo, qet nebêje xwedê dîsa li me hate xezevê. Em dîsa bê xweyî û bê xwedan hiştin. Tu kor bû, ne apê teyî Wezîr çûye rehmeta xwedê.

Min ev gilîyêd dayka xwe, çawa bejî nebihîstin. Ricifîm. Bê hemdî xwe, gelekî bilind qîrîyam. Kire îske-îsk. Hêsrêd min nolî tavîya fesla baharêye gorav xweberê berjêr bûn.

Wedê ez 1958-ê qebûlî zanîngeha komara Ermenîstanêye dewletêye ser navê Xaçatûr Abovyan (bi zimanê Azerî, beşê filolojî) bûm. Dêkanê beşê profêsor Artasakê Poxosyan rojekê gazî min kir û ji min pirsî:

-Kurê min, tu çi miletî?

Min got:

-Hevalê Poxosyan, ez Kurdîm.

De wekî Kurdî, ezê derheqa dostekî xweyî Kurd ji te pîrskim. Bê te ew mirova dîtibû, yanî na? Kurê min, te Vezîr Nadîrov dîtî bû?

Min bersiv da:

-Hevalê Poxosyan, Wezîrê Nadîrî mamê mine.

Ewî kesereke kûr kişand, xêleke xurt netixa xwe mizda. Bi dengekî xemgînva got:

-Heyf, sed heyf. Ew însanê ewqasî pîr zane ji dinê zû çû. Xwedê ew çawa xezneke lel-cewahire têre-tijî xuliqandibû. Lê îmkan neda, wekî ew wan lel û cewahirê pîr qîmet bigihîne gelê xwe û usa jî gelê tamam dinyayê.

## MAMOSTE ELÎ ÎDÎ TUNE

*Rewayî helbestvan û nivîskarê Kurdayî eyan, dersdarê xweyî  
poêzîyayê Elîyê Evdilrehman dikim.*

Hesreta te Kurdistan bû, lê te welat îdî ne dît,  
Axa Azer te ra bû war, miskanê xwe te vira dît.  
Rehet razê, bahar-bahar kûlîlkên nûh tim şîn dibin,  
Kurd nexazê zû û dereng pêş rastîyê bersîv bidin.  
Ewê demê tabûta te emê ji cîyê nerm hilînin,  
Bibin welêt, li axa dê cîkî fire damezînin.  
Wir mêzeke orman-deşta, fêkî-rezê welatê xwe,  
Tevî Feqî, Xanî, Hejar lêxe têtê tembûra xwe.  
Vexwe ava kaniyê zelal, pîroz bike êla rengîn,  
Tev me hûr-hûr tu bimeşe, bixemile rengê zemîn.  
Me laşê te vir binax kir, şêr ruhê te firî welat,  
«Xatê Xanim», «Gundê mêrxas» te ji me ra hîştin xelat.  
Şêwirdarê girî-mezin, çima ji me zû qetyayî?  
Erş-ezmanê Kurdistanê, çima tu zû veêsyayî?  
Gelî Kurda, bikewgirin, bilûvînin, ne Elî çû,  
Zanê mezin, nevsî maqûl, hezkiryê me Kurda çû.  
Hezar heyîf, Kurdîstana delal nedît, temarî çû,  
Dil tijî xem, birînê kûr lê axivîn, bê derman çû.  
Em bîr nakin eniya fire, çavên belek, wî demê nûr,  
Sûretê xal, bejna tîtal, porê sipî, him kenê hûr.  
Bahar nedît, payîz nedît, lez çilmisî, bê wede çû,  
Hesret dil da, seba welêt kaliya, naliya, pir maşya çû.

## SEYDA ŞAMÎL

*Rewayî 70 - salîya mamostê, pir nav û deng Şamîl Eskerov dikim.*

Mamosteyê mamostayî, Şamîl Esker,  
Zimanê te pir şirîne, ava kewser.  
Tu yî kana ulim, kemal, merîfetê,  
Nişa xasî, xuluqîyî jî qudretê.  
Nav-dengê te bela bûye tamam dinê,  
Kêr-kirinên te, welatê me kiriye xinê.  
Te av wexar behra Xanî, dehra Hejar,  
Duxulxulî nolî Dicle, Firat, Hekar.  
Şêx Nîzamî, kan Fîzûlî mamestê te,  
Vagîf, Vûrgûn mihikîne nav xûna te.  
Şev û roja şer dikî boy heqîqetê,  
Tim qutdikî reh-rîçalên kîn-qudretê.  
Lawê Zalî, neyarê har tu natirsî,  
Hebûna te namûs, xîret, him bê qelsî.  
Ez ji te ra kanî, behr qet nabêjim,  
Himberî te kanî, behr pir tenîskin.  
Ez ji te ra çîyayê bilind qet nabêjim,  
Himberî te çîya nizmin, pir piçûkin.  
Rebbê jorîn dikim hîvî, him jî reca,  
Me bê rehmê, welatê me bibe aza.  
Sed salîya te derbazkin li Ameda kal,  
Bê xof bibe zimanê meyî qurna da lal.  
Bimilmile ala meye kesk, sor û zer,  
Tarî herin, ronik bibe, her qulç û der.  
Em tevayî rûnên sîngê Zagros, Sîpan,  
Axa welêt têr-têr maçkin, bibin qurban.

## ŞAMÎLÊ BÎRA RA

*Rewayî Şamîl Eskerov - zanyar, dîroknas, Kurdzan û  
nivîskarê Kurde bi nav û deng dikim.*

Alim Şemîl, şaîr Şemîl, tu negirî pir hûre-hûr,  
Dinya behre, em keştêvan, lê digerin, delave dûr.  
Ba alîkî nake lîlîn, eva hukmê dewir-zemîne,  
Çira kesî vênakeve, heta gave xût paşîne.

Bira, em çi bikin, tebyet rûyêd me qet nekenyaye,  
Dayîkê, ewled gotîye, şev û roja ew giryaye.  
Milk birine, xûn rêtine, war û hudûd kirine wêran,  
Tim xastine yasax bikin, ew xebera nav Kurdistan.

Bê însafa şewitandin, hedimandin koşk û bajar,  
Bok û beran şehîd ketin, pîr û kala kir zare-zar.  
Gelo, xezna me, kuda birin, kîjan qulçî kirin cî-war?  
Dutîretî me bû bela, pir zalima keda me xar.

Dinya Îslam me ra anî him bextreşî, him jî agir,  
Hebûna me dijmin veşart, qurne, qurne nekir zahir.  
Peritandin êl û obe, miskenêd me bû zaxêd sar,  
Xûna Kurda ser Diclê da, ser Firat da tim hate xar.

Dîroka me înkâr kirin, xastin ku em bibin sêfîl,  
Qîz û lela reş girêda, xort zulmê ra nebûn qaîl.  
Şêr û şenbaz ne seqirîn, dijmin xistin derbêd giran,  
Şabe, îro, zingîn dike ew xebera nav Kurdistan.

## MAMOSTE ÛSÎV

*Rewayî ruhê Ûsivê Feqî Evdile dikim.*

Korayî, korayî, sed korayî roja îro,  
Em nabînin ken-henekê teyî her ro.  
Bejna tîtal nava me da nayê xanê,  
Pêşiya gotîye, «bê îtbare timê dinê».  
Hineka ra emrê dirêj dike qismet,  
Hineka jî zû hildide, nade firsent.  
Emrê teyî telî keder hate pêş min,  
Keliya, zêriya dîsa îcar jar dilê min.  
Boy gelê xwe te hîşt gelek lel û durre,  
Her gîlyê te serî-binî tevda zêre.  
Şev û roja te pesinî zarê Kurdî,  
Neyar pelax, te deyax nekir li wî derdî.  
Te gelek zû hîşt ev dinya xar û maro,  
Gel bîr nake te gav, sehet, him şev, him ro.

## SEYDA EGÎT

*Rewayî ruhê şehîdê şerê Qerebaxê Wezîrê Egît, lawê mamesteyî nav  
û deng Egîtê Qadrî dikim.*

Seyda Egît, bese bikî mitalê kûr,  
Berf danayne li ser çîyayê piçûke, hûr.  
Qezyê giran Xaliq dide merdemêra,  
Bistanê dê me mêtîye şîrê şêra.

Emir boy me bû zukur-mewt, behra zulmê,  
Heq dizêre, neheq bûye xwayê dinê.  
Dû şevên reş tim tîn rojên eşqe-ava,  
Teyrok dide timê cîyê rewşe ava.

Emê bijîn, meriv qespe, ne ku kevir,  
Me dikene, me şa dibe îro dewr.  
Te undakir mêrxas Wezîr, lela lawa,  
Tu dihelî, ez hol dikim hêsrên çava.

Sebra Xwedê gelek pire, bibe leheng,  
Qelpê cezê xwe bikşînin zû û dereng.  
Kurdistanê aza bibe îcar miqîn,  
Berî gişka ezê bînim te ra mizgîn.

## MAMOSTE AHMEDÊ HEPO

Hinberê te ez nabînim li van erda,  
Çilke zêrî, Rebbê jorîn şandî jor da.  
Kêr-kirnên te dixemlînin ulmê Kurdî,  
Zimanê te him ferîhe, him jî cindî.  
Aqil-kemal, mal-dewleta teye her gav,  
Bêkêra ra dibî bira, him dibî bav.  
Pêş tu kesa tu mêl nabî, şêr-lehengî,  
Zanê kûrî, tu hilnadî qet tu rengî.  
Birê delal, qismetê te emrê dirêj,  
Xas neynûkî, tu hilnadî telp û qirêj.  
Şûrê qelpa te nebire, tu wext, tu car,  
Nolî Sîpan tim bilind bî, bikî sitar.

## BİSEKİNİN, ŞIVAN PERWER DİSTİRÊ

Kawayê kal, çagûçê xwe zexm lêmexe,  
Rostemê zal, gurz-kemendê xwe dernexe,  
Lawê Zeynê, têlê tembûr hevdu mexe,  
Bisekinin, Şivanê Perwer distirê.

Guhderz, Ûbêyd, şêr Sulheddîn, Şêx Berzencî,  
Seyîd Rza, Mehmed Qazî, kek Berzanî.  
Xanê lepzêr, Şêx Seyîdê pir nûranî,  
Bok serokê riya azayê boy me anî.  
Rica dikim, çeka daynin, hêsa bibin,  
Bisekinin, Şivan Perwerê we bistirê.

Seyda Herîr, Melê Miksê, Şêxê Batê,  
Xanyê mezin, dernekevin ji qudretê.  
Şêxmûs, Hejar, hûn bimînin Mehabadê,  
Goran, Koyî îdî mekin tu hucretê,  
Qelemê daynin, hinek hêsa, rihet bibin,  
Bila Şivan xem-kederê we bistirê.

Memê Alan – xas torinê Muxurzemîn,  
Ker û Kulik – herdu lawêd kal Silêmin.  
Zembîlfiroş – salih bendê Rebbê jorîn,  
Qenc Sîyabend – şêr-şehîdê çîyayê Sîpîn,  
Êşa hubê ez jî dikim nalîn, îskîn,  
Mêze bikin, bila Şivan gur bistirê.

Sazbendê şa, mey-bilûra medin lêvan,  
Dengbêjêd eşq, mekevin nav leca giran,  
Nazya mekin, çîl-bedewêd êla Kurdan,  
Bisekinin, Şivanê Perwer distirê.

Teyrêd sîmir, bask venekin, mekin qîrîn,  
Bilbilêd al, awaz-awaz mekin qalîn,

Kewêd nexşîn, neleyîzin, mekin qipîn,  
Bisekinin, Şivanê Perwer distirê.

Ewrên tarî, sebir bikin, mekin girmîn,  
Lêpên behra, lez mekevin, mekin şilpîn,  
Tavî, teyrok, îdî bese, mekin guşîn,  
Bisekinin, Şivanê Perwer distirê.

Bayê samê, melîlîne, meke gujîn,  
Kaniyêd zelal, dehrêd gur av, mekin xuşîn,  
Bombêd jehrê, peya nebin, mekin teqîn,  
Bisekinin, Şivanê Perwer distirê.

Sosin, rihan, sorgulêd al, mekin dengî,  
Kombin, rêzbin, bixemilin hezar rengî,  
Keç û xortê eşqe, şaye, doste, bengî,  
Bisekinin, ne Şivanê we distirê.

Meşûşilin, sûlavêlkêd nava ava,  
Karêd xezal, dernekevin berê tava,  
Melipitin, mexişikin hemû teva,  
Bisekinin, Şivan Perwerê me distirê.

Teyarêd hur, tangêd xofgir, mekin tofan,  
Gund-bajara îdî bese bikin wêran,  
Topên dev xwîn, bese bikin heşir mîzan,  
Bisekinin, Şivan bila eşq bistirê.

Xwînêrêjê har, bese hepsê tarî çêkî,  
Bê sûç, gune, zar-zimana timê jêkî,  
Pêş heqîyê tu nikarî xwe xilaz kî,  
Bisekine, bila Şivan zîz bistirê.

Xwezil, xwezil, ewa roja zû bihata,  
Nolî teyra min bask veda ji hêweta,  
Derbaz bûma ji bajara, pîr dewleta,

Ser axa dê, min bigota hemû Kurda,  
Şa bin, şa bin, bireqisin,  
Şikir, delalê me distirê.

## **GULÎSTANA PERWER – DOTA KURDE QEDÎR BİLÎND**

Min hûn dîtîn, ji şabûna dil-hinavêm kirin îşkîn,  
Wek we bedew kê-m-kêm hene, pir nazîkî, him nazenîn.  
Sorgula al, nergîza bîn, tarihana dev gelyanî,  
Karxezala çîyayê Zagros, Agrîya kal, sar Sîpanî.

Rebbê jorîn çavên belek, buryêd qeytan par dane we,  
Zarê şîrîn, bejna tîtal, tenê kiriye qismetê we.  
Av vexarye ji kanîya Eyyûşanê, Meyremxanê,  
Sîtya rewşî, timê nûhî, nolî sosin û rihanê.

Xwezil-xwezil, em tevayî bimeşyana ser axa dê,  
Te welatê me bistira, min helbesta ser navê dê.  
Neyarên me qut bûbyana, aza bûya tew Kurdistan,  
Nefîtîyê vegeryana Çîçek, Canê, him Şehrîban.

Mirazê me hasil bûya, em demekê şabûyana,  
Lawê Kurda nav gela da bêkavî dil nehelyana.  
Nav dewleta dewleteke qedîm, mêrxas zêde bûya,  
Nav ala da ala meye kesk, sor û zer bilind bûya.

Me tevayî ji xasbaxça baq-baq sorgul beravkira,  
Ser merzelê şêr gerîla zo-zo danya, tewafkira.  
Ûrfa bedew, Wana rengîn kubar-kubar ewirryana,  
Dê û xûşka, “bavo..., bira...”, ne gotana, ne giryana.

## QADRÎ ZANE – DENG BÊJÊ EYAN

Birê delal, bilbilê rewş, êşkê te me, gur bikake,  
Têlê tembûr bihejîne, kûr razaya, xewê rake.  
Qale-qalke, zîz dengê te bigîhîje Kurdistanê,  
Mirazê me hasil bibe, em pîrozkin nûh dewranê.  
Serokê me aza bibe, keda sala meçe bade,  
Neyar kor be, menzîla wî ji du gava nebe zêde.  
Şêrê Kurda em pîrozkin, tew bimeşin ser axa dê,  
Ez helbesta, «hezar, hezar, qeda li we» tu bistirê.  
Avên zelal kulm-kulm vexun, kûlîlkên al biçirpînin,  
Pêş merzelê şêr gêrîla em bejna xwe bitewînin.  
Cejna welêt pîroz bikin, bireqisin bi ruh û can,  
Axa dayê têr-têr maçkin, can-cesed va bibin qurban.

## BÎLBÎLÊ KURDISTANÊ, KAZOYÊ DELAL

Tu xêr hatî, tu xêr hatî, kew-bilbilê Kurdistanê,  
Xwezil me ra te bianîya, tasek ava gola Wanê.  
Kulmê axa dêye zêrin, bianîya ji Mûşa rindik,  
Me maçkira, malê xwe da, xayîkira ça tiverik.  
Ji xasbaxça beravkira baqe gulê tere-nazik,  
Bianîya, me bînkira, em nebiyana rijî-kizik.  
Qalînê te dil-hinava dihelînin cî bi cî da,  
Rebbê jorîn ev xelata nazilkiriye boy te jor da.  
Ew şewata tel qurnane, lema usa dilûvînî,  
Kewaca xwe, zarê şîrîn, tu ji me ra digihînî.  
Xwezil ew roj me bidîta, welatê me bûye serbest,  
Hepsên tarî hedimîne, bûye cinnet her çol û best.  
Min helbesta xwe bixanda, te zîz, bê xov biqalanda,  
Sîngê Sîpan, Agrîya kal hespê Rostem bibezanda.  
Serokê xwe me bidîta li ser textê aşîtiyê,  
Mirazê me hasil bûya, reh bavîta biratiyê.  
Me bigota, neyarê har, em dest nadin zimanê te,  
Bê şerefo, îdî bese, yasax bikî zimanê me.  
Em însanin, pêpez nakin, nahecqînin sorgulên te,  
Îsaf bike, pêpez meke, mehecqîne sorgulên me.  
Çûnê welêt, lêvê meva têr-têr maçke axa me – xwe,  
Bêje rica xerîbane, diqedînim ez deynê xwe.

## DOTA QAZAX, ROZA XANİM RİNBAYÊVAYÊ RA

Ez zimanê te nizanim, tu zarê min,  
Ez dilikê te naxunim, tu dilê min.  
Dêm-sifetê te dibare huba şewat,  
Bende yekin, çi Rojava, çi Rojhilat.  
Ez dîroka te pîr zanim, berê-berî da  
Gelek mêrxas xuluqîne li van erda.  
Te mêtye şîrê Aîşa Bîbî canê,  
Te tê bîna misk û emper, gul-rihanê.  
Hêleşana te kil dane Abay, Cambûl,  
Abilay xan ne hîşt bibî tu hejar, qûl.  
Roja îro aza, serbest, bextewarî,  
Xwedan welat, xwayî rusqet, hêlîn warî.  
Hîvî dikim, dîroka min mêze bike,  
Medya kalim, Şeddadîme, tu min naske.  
Ez ewladê Kawe, Guhderz, Rustem Zalim,  
Lawê Feqî, şex Xanîyê pîr kemalim.  
Sihke-sihke, deng-xastinê jar dilê min,  
Bakûr, Başûr qîse bike tu halê min.  
Heta kengê dew û dozê para min bin,  
Hepsê tarî, sar zindanê mala min bin.  
Mal-dewleta min vê bibin, talan bikin,  
Kîrasekî reşî bê mil bejna min kin.  
Dil-hinavê alav bigrin bişevitin,  
Erf-edetê minê pûçbin, bilewitin.  
Jan û êşê, kul-birînê li min kûrbin,  
Har neyarê bersîv nedin, ser min dirbin.  
Kî nepakî ev nifira li me kirin,  
Eva bara ser piştê me pêya kirin.  
Rebbê jorîn em jî bende xuluqandin,  
Ser vê axê cî da meda, sekinandin.  
Xûşka delal, çima ewqas sêfîl, jar bim?  
Banke, xwînê heqa bidin, em jî şa bim.

## ZEKÎYA ALKAN

*Rewayî keça Kurde mêrxas, Zekîye Alkan dikim.*

Welatê xwe te pir hez kir, wek ronaya herdû çava,  
Boy xîreta dê-dergûşa şev û rojan mayî çola.  
Fedî nekir tirs û xofê, ketî nava zer-zinara,  
Him heliyayî, him naliyayî, bona gunda û bajara.  
Te got: - Zarok dê-bav bijîn, bextewarbin, nebin sêwî,  
Serê rîya, nav gedûka, neqerisin tu car rêwî.  
Edilayî pence vede, hemû qulça, rûyê dinê,  
Heqî bijî, dijminê har, bila bibe kunê-kunê.  
Her miletek rehet bijî, çav nekute para cînar,  
Ser sivrekê timê rûnên nolî berê karger, hejar.  
- Xûşka delal, emir boy te nekenîya, nekir lûrîn,  
Qetilkara, beyanîya ser êwra te kirin zûkîn.  
Sîngê mermer, gerdena xal, wan «xemiland sor û gevez»,  
Destê neyar çima neşkest, te ra anî qest û qerez?  
Ewê demê av sekinî, orman zerya, kire hewar,  
Kevir hejiyan, esman giriyan, reş xemilîn best û beyar.  
Kew ricifîn ser hêlîna, xezal revîn binê gêlî,  
Bilbil qîriyan, gul çilmisîn, avêd zelal bûne şêlî.  
Dinya Kurda dikewgire, şînê dike îro boy te,  
Mala heqda rihet razê, dijmin dertê welatê te.  
Pêş tirba te ez sond dixum, hêsrêd şewat hol dikim xar,  
Ez heyfa te zêde hildim tevî Kurdê Sîpana sar.

## LEYLA ZANE

Xûşka delal, wedê ku tu hatî dinê,  
Dê-bavê te gelek şa bûn vê hatinê.  
Der-cînara cevronkayî pir da wana,  
Gotin: - Xaliq nûrek jî da mala Zana.  
Zarotîya te buhurî, bê kêr, vala,  
Ser dilê te kûr reç hîştin hemû sala.  
Buyî nasdar qirê, qutê, zelûlîyê,  
Te dît halê gelê xweyî nefîtîyê.  
Misto Kemal te yasax kir zimanê dê,  
Got: - Kurd tune, parek Tirkin dijîn çîyê.  
Boy kirinê neyarê har bûyî şervan,  
Te got: - Gerek gelêm derê halê giran.  
Ji bavpîran zû da mane meselên zêr,  
Wan gotîye: «Şêr ku şêre, va çi jin, çi mêr».  
Te fedî mekir, zulmê, zorê, him mirinê,  
Xaliq mirov carkê tîne ruyê dinê.  
Meclîs, wezîr pêş te bûne kere-kere,  
Te bir hundur, ala meye kesk, sor, zere.  
Bê tirs, bê xof, te elam kir halê Kurda,  
Zimanê dê tu axivî, te xeberda.  
Roj a îro tu merxasî, egît, şêrî,  
Boy gelê xwe pir şîrînî, merdemerî.  
Îro tenê ne dayîka lawên xunî,  
Lelî, durrî, dayîk-xûşka tew Kurdanî.  
Nişa xasî, tu hilnadî telpa, qara,  
Dotê Kurda namûs mane hemû cara.  
Tu ewlada Kawe, Guhderz, Rustem Zalî,  
Felqe dilê Herîr, Feqî, Batê kalî.  
Xuluqîyî tu ji axa Ehmed Xanî,  
Delal xûşka serok Apo Ocelanî.  
Meyremxanî, Eyşesanî, Gulistanî,  
Ew bilbilin, tu merxasa tew Kurdanî.  
Qeyd û zincîr, zindanê sar, hepsên tarî,

Te mêt nakin, keç domama esl horî.  
Xûşk-birê te tewandine neyarê har,  
Qevz kirine îdî ruhê gurê xwînxar.  
Şa be, şa be, welatê me dibe aza,  
Kedê te qet bade neçû, şêra Kurda.  
Wê bilind be, dengê defê, sewta zurnê,  
Kurdê derên îdî ji nav herbê, zulmê.  
Gelê bike nuh dîlana teye zîv, zer,  
Ser te werke ala meye kesk, sor û zer.

## ŞERVANA KURD ÊLMÎRA ELÎ

Kanî fîno, qotika te,  
Morî, mircan, xizêmên te,  
Kembera zîv, guharên te,  
Çima nebû, dîlana te?

Kanî gulî, tûncika te,  
Kilê burî, bijangên te,  
Qol-qol zêrên ber enya te,  
Çima nebû, dîlana te?

Kanî berbû, sîyarên te,  
Birazava, cihêzê te,  
Kofî, kitan, al xêlya te,  
Çima nebû, dîlana te?

Kanî hene, hezkiryê te,  
Neynûk, gulav, hogirên te,  
Sazbend, dengbêj, qewalên te,  
Çima nebû, dîlana te?

Kanî kenê ser lêvên te,  
Rêz-rêz zulfên namila te,  
Kavtî, qeytan, devmilkên te,  
Çima nebû, dîlana te?

Kanî bazin, gustîl, çarbiskên te,  
Dêre, mêzer, bend, pişta te,  
Teşî, kûlî, berkavka te,  
Çima nebû, dîlana te?

- Helbestvanê pir nerehet,  
Min pirs meke erf û edet.  
Koletîya tew gelê min,  
Tifing danî ser milên min.

Boy azayê bûme şervan,  
Bibim xwayî welat, ziman.  
Gure-gura ewr-esmana,  
Gul, sosinê, terazûna,  
Xuşe-xuşa çem-kanîya,  
Belekîyê sîngê çîya,  
Bayên germe, sare, sivik,  
Cetrî, merwend, soy û siping.  
Berf-baranê gure, dirêj,  
Min ra bûne qewal, dengbêj.  
Hêmu kûlîlk, sorgul, rihan,  
Boy min bûne kilê subhan,  
Kew-bilbilê ser hêlîna,  
Karxezalê mêrg-çîmana,  
Keskesora berek, besta,  
Kaw şivanê bilûr dêst da,  
Qîre-qîra qaz-qolinga,  
Pîrevokê devê zanga,  
Min ra bûne heval, hogir,  
Dîroka min xwîn û agir.  
Serkevtîye boy min edet,  
Xêynî welat tune cinnet,  
Heta nebe axê min aza,  
Min pirs meke bext, miraza.  
Lema nebû dîlana min,  
Lema nebû dîlana min.

## DAYKA ÛVÊYŞ, REHMA XWEDÊ LÎ WEBE

Wedê bûyî, dê-bavê te pir şa nebûn,  
Keç gelek bûn, ewe qet ne hîvya te bûn.  
Gotin, dayîn ya Xwedaye, em çi bikin,  
Risq û ruza dest wî daye, em kêr bikin.  
Nizanibûn ne dê-bavê, ne cînara,  
Xaliq nûrek tev te şandye me Kurda ra.  
Hatin û çûn gelek salêd giran, sivik,  
Mezin bûyî, te perweda, bûyî dayîk.  
Nolî gişka, te jî anîn ewledê pir,  
Yek ji wana bû serokê meyî lel-durr.  
Pêş ruhê te, em bejna xwe ditewînin,  
Ser tirba te, gul-sosina direşînin.  
Tewaf dîkin em kevirê serkêlka te,  
Şêr Ocalan te daye me, rehme li te.  
Îdî tenê ne dayîka Ocalanî,  
Tu ziyaretî, tu dayîka tew Kurdanî.

## LOXMAN BAXIŞ

*Ez vê helbesta xwe rewayî 60-salîya loxmanê Kurd, Baxişê Huseyn dikim.*

Tu loxmanê-loxmananî, pîroz dikim rojbûna te,  
Rebbê jorîn per û baskên xwe raxêre timê ser te.  
Zarêm nagre, ez nixazim te ra bêjim bijî sed sal,  
Loxmanê Kurd, êşkên teme, boy te kême hezar yek sal.

Xwezil, xwezil, em tevayî mêvan bûna Kurdistanê,  
Axa dayê tewafkîra, şev bimana li zozanê.  
Çavê xwe va me bidîta dew û doza mêrxas-mêra,  
Kulîlkên ter danîyana ser merzerê egît-şêra.

Te pêçîyê marmûtîva melhem danîya birînê kûr,  
Guhê xwe va me sihkîra nêt-meremê mezine-hûr.  
Heq û neheq hev bijbarta, nele bida neyarê hur,  
Serkevtîya welatê xwe me bixasta dengê gur.

Em dilekî, xem û keder bihatana Qûbadlîyê,  
Kulme ava sar wexara, gundê şêra Êyvazlîyê.  
War-war kozê kal û bava me şênkîra xar û beze,  
Dotên xilfîn xwekirana, cilê Kurdî, xemla teze.

## ŞEQÎYÊ BÎRA 70-SALYA WE PÎROZ BE

Bila hebin, pir zêdebin,  
Nava gel da tim mervêd baş.  
Xwedê hilde ewan kesa,  
Rojêd pîroz ew dikin faş.

Pirtûka kes gel vedike,  
Rind dixwîne, wî nas dike.  
Pirtûka we paqîş, kûre,  
Telp-qirêjê gelek dûre.

Şuxlê xwe da bûyî helal,  
Şêlû nebû, mayî zelal.  
Ber tu kesî ne tewyayî,  
Duqat nebû, ne hejyayî.

Nolî Sîpan ser bilindî,  
Eslê xwe va hêca, rindî.  
Çav ne kuta keda kesî,  
Qaîl bûyî nanê tisî.

Xwezil, xwezil, hezar xwezil,  
Ewa roja bibe nasil,  
Qut be emrê xerîbistanê,  
Em herin tew Kurdistanê.

Tev bigerin nav Batmanê,  
Hewlêr, Mardîn, Elbîstanê.  
Amed, Serdeşt, Dihok, Wanê,  
Pîroz bikin nûh dewranê.

## REWAYÎ RUHÊ MAM ZÎYOYÊ BEDÎRXAN DÎKÎM

Êla dûr ax, bikewgire dîsa îro,  
Îdî tune, çû mala heq maqûl Zîyo.  
Ji me qetiya, esnaf, rêzan, şêrê-mêra,  
Zarê şîrîn, ken û henek birin xwe ra.  
Şîretên wî rêç danîbûn nav dilê me,  
Kana aqil, xezna zêr bû, boy êla me.  
Rojên teng da tew fiqara fikir sitar,  
Zû rast fikir, barê kesa ku dibû xar.  
Dilovaniya wî bîr naçe, tu wext, tu car,  
Nan-risqê xwe dida sêwya, xwe nedixar.  
Welatparêz, pir kedhez bû berê-berda,  
Mitheyr dimayî, wedê ewî hewal dida.  
Tew gotnêd wî lel û durr bûn, baş û heca,  
Rîya pak-qenc timê dida pêşya genca.  
Nedhîşt bibe nav êlê da tu telayî,  
Pir bilind bû, cem wî dostî û edlayî.  
Ezet, hurmet, av û hewa jîna wî bûn,  
Namûs, xîret, şeref, îtbar para wî bûn.  
Rehme we be, rehme we be, mamo Zîyo,  
Em bîr nakin, we gav-saet, him jî her ro.  
Îro boy we êl digirî, êl dimeşe,  
Gel dikare qîmet bide lawê başe.

## KEK EZÎZ – DERSDARÊ EMEKDAR

*Kek Ezîz, dersdarê emekdar, 80-ya we pêroz dîkîm.*

Gelek pêşda bihîstibû nav dengê we,  
Çûk mezina pir vedida tim methê we.  
Xwedê min ra kire qismet, min hûn dîtin,  
Ji eşqa we xem û xeyal tew avîtin.  
Pêş xwe min dî çîyakî ser kidûke berf,  
Tew gotnêd wî boy gel bûne edet û erf.  
Ket bîra min “Çavê êlê terazûye,  
Qîmetê xwe nade kesî bê cî, zûye”.  
Tore, telîm, perwerde bû tew heya we,  
Gelek bûne xweyî aqil bi seya we.  
Beriya gotîye: “Baxvan şaye baxê xwe ra,  
Dersdar timê firnaq dibe behra xwe ra”.  
Her xwendevan tamareke dilê we bû,  
Emir, jîne, xemil û rewş ruhê we bû.  
Lema îro pêş gel hûne serbilindin,  
Pir hurmetin, pir şerefîn, nav bilindin.  
Gelek rojêd tele-şîrîn we dîtine,  
Baran, tofan, tavî-teyrok we dîtine.  
Gelek hatin, cep-rast lêdan, bûne hîro,  
Keda helal hûn gîhandin roja îro.  
Sed sal bijî rûsipîyê êla giran,  
Nava gel da we bibînin timê wa can.

## BÎRÊ DELAL, ME NE QETE, GELEK ZÛYE

*Rewayî hevalê xweyî pir welatparêz, jûrnalîstê eyan, Barîyê  
Mehmûdê Nado dikim, kîjan ku gelekî zû dinya xwe guhest*

Birê delal, hogirê baş, me neqete, gelek zûye,  
Bahar hatiye, mak dimeşin, hûr balaka dane dûye.  
Ne me herda qewil dabû, em tev herin Kurdistanê,  
Axa welêt têt-têt maçkin, bireqisin nav dîlanê.  
Li pêş Xanî temennebin, jan-şêd xwe jê ra bêjin,  
Ser mexberê şêr gêrîla hêsrêd şewat tev birêjin.  
Gegar, Zagros bibin mêvan, Sîpan bikin firavînê,  
Welatê xwe têt bibînin, şev bimînin li Efrînê.  
Çîya, baniya rind bigerin, gul-sosina têkin baqe,  
Doza gelê xwe mêzekin, bizanibin kî neheqe.  
Baqe gulê terî-eze, bînim, bidim, Dîlbera xwe,  
Tu çend gula pêşkêş bidî, dayka lawa, Hemayla xwe.  
Mirazê min hasil nebû, xeyîdîme ji dewranê,  
Êşkê teme, me neqete, tev em herin Kurdistanê.

## DOTA LOXMAN

*Rewayî dota Qazax, loxmana xwe, Gulnare Qaîlbali  
qizîyê dikim.*

Xwezil, Xwedê min bihata hinek rehmê,  
Dilê te da boy min danya nişa hubê.  
Rind pêçyêd te ser singêm bigeriyana,  
Mil-çeplêd te bedena min bialiyana.  
Bedena ter çermê dê da min bidîta,  
Perda şermê ber çavêd xwe zû bavîta.  
Dergê xêrê pêş min vebuya, nûr bibariya,  
Hişk ter bibuya, reh bavîta dar û deviya.  
Kaniya bê av, av tê biza, têkira xuşîn,  
Bilbil gulê bibuya mêvan, mekira nalîn.  
Te mêla xwe biguhasta hinek ser min,  
Can-cesedê te nûhkira, kal ruhê min.  
Em bibuyana lawê Adem, him jî Hewê,  
Bilindkira qedir-navê bê çilk hubê.  
Me herda jî kîbûna xwe mekira bîre,  
Lenet bida rojêd reşe, qeyd-zincîra.  
Reş kezyêd te ser dêmê min bela bûna,  
Çav-lêvêd te biqirpiyana, bikeniyana.  
Vî emrî da mirazê xwe em şa bûna,  
Dayna Xwedê sed car, sed car, qaîl bûna.  
Kûr huba te bila bibuya dermanê min,  
Min xêynî te nehebanda qet yeke din.  
Me hevdu ra tim bigota, can û heyran,  
Nav hemêza teye paqîş min bida can.

## MIN XEWNÊ DA HECÎ MEHMEDEMÎNÊ BIRAYÎ XWE DÎTÎN

Ketibûm nav xeweke kûr,  
Xewna birbûm dinyake dûr.  
Ewan kesê wedê min da,  
Gelek najîn, çûne zû da.  
Ser kanîke zelal, kewser,  
Nav kulîlkên misk û enper.  
Şûn girtibûn wek kîrnên xwe,  
Dîqedandin mêj, zîkrêd xwe.  
Dora Hecî bûbûn rêze,  
Xwe kiribûn kincêd teze.  
Hecyê bira nava wan da,  
Dengekî zîz azan dida.  
Libasekî sipî lê bû,  
Ser qametê mêja xwe bû,  
Dikir rica, hîvî, minnet,  
Xaliq dixast îmdad, qewet.  
Ban dikire Rebbê jore,  
Digot, gelêm meke zore.  
Em jî feqîr bendê te ne,  
Kole, sêwî, dîlê te ne.  
Me xilazke gurê hare,  
Ser me bike sî, sitare.  
Welatê me bike aza,  
Gelêm dûrxe dewa, doza.  
Serokê me derxe hepsê,  
Kulîlk vede tew axa dê.  
Kan û xeznên me boy mebin,  
Kurd jî xweyê heqê xwebin.  
-Dayka mine tim dest qencî,  
Rûniştibû li cem Hecî.  
Libasekî terî lê bû,  
Ser mêj-taet, zîkrê xwe bû.  
Letîfa baş, evda pir rehm,

Maqûl Bala rûnişt bû cem.  
Şîrîn-şîrîn diaxivîn,  
Didan misiletê zêrîn.  
Balaxanim dayka pir rewş,  
Îbrahîmê tim eşqî-geş,  
«Quran» dixand awaz-awaz,  
Runiştibûn cîkî evraz.  
Xatûn Tewrat – rinda êlê,  
Xalo Mecîd axê êlê,  
Sekinîbûn destê jorê,  
Eşq û şabûn nolî berê.  
Bokê mêra – Evdilê rewş,  
Tîmar dikir simêla reş.  
Cem wî hebûn gelekê nas,  
Xêle xortên egîd, mêrxas.  
Mehmesidîq birê delal,  
Diaxivî aqil, kemal.  
Ji min pirsî Mecîdê çûk,  
Ewladên din, şoreta bûk.  
Filît şa-şa mêze kirim,  
Ez maç kirim, hemêz kirim.  
Vebişîrî nolî hercar,  
Şelbik dest da, av vedixar.  
Dîlbera min xemilî bû,  
Çave li rê, hîvya min bû.  
Pirs kir halê herdu lawa,  
Tem û lemê dê û bava.  
Keser kişand, ser keserê,  
Şermoke bû nolî berê.  
Hate cem min Telebanî,  
Zû-zû min ra kursî danî.  
Herdu destên min maç kirin,  
Hêsrên şewat berjêr kirin.  
Kûraya dil axîn kişand,  
Xast xeberde, xwe hêvişand.  
Nav komê da xwe ra girt cî,

Bîqedîne emrê Hecî.  
 Mîn vir dîtîn gelekên nas,  
 Elyê Sofî, Cîmşûtê xas.  
 Ezîzê şêx, Usvê Cebbêr,  
 Wana fikir duayên xêr.  
 Dayka Gulê, Fatma îtbar,  
 Sekinîbûn kubar, kubar.  
 Telya Xano, Mirda hakim,  
 Xanim Gozel, Meyra hukum.  
 Salhê Heso, Êsvê Feqî  
 Dinîvîsîn rastî, heqî.  
 Hecî Hesen evdê Xwedê,  
 Dikir zikir, mêja rojê.  
 Huseyn, Menaf, Xaltê kurmam,  
 Xêlê, xêlê, xort û domam.  
 Bê şik: - Ez ketibûm nav dinya heq,  
 Mîn dît, kê çi anye ji dinya neheq.  
 Gelek bê kêr dilikijîn,  
 Kasil, kasil dikelijîn.  
 Dûrî komê sekinîbûn,  
 Cil-kirasê xilmet lêbûn.  
 Ban dikirin rehm, îmdad,  
 Dibarandin hêsrên şewat.  
 Poşman bûbûn boy kirnêd xwe,  
 Dilûvandî wî halêd xwe.  
 Qebûl nedibû dîleka wan,  
 Agirê cehmê kar fikir wan.  
 Gelek-gelek kal û bava,  
 Lel-durr hîştine boy me lawa:  
 «Cinnet, cehnem, xêrê, şerê,  
 Qazanc dikî tu vê dinê».

## HER KESEK DÎÇE SER EMELÊD XWE

Nav baxçekî pir bedewî, kulîlkî, naz,  
Ser hewzekî rûniştibû Hecî Knyaz.  
Vedbişirî, ji dêmê wî nûr dibarî,  
Li cem wîya sekinîbûn gelek merî.  
Diniçirand borelana kavil teta,  
Nav û dengê Salih begê hewal dida.  
Diaxivî, şirîn-şirîn gelekî rind,  
Mala heq da wî girtibû cîkî bilind.  
Nelet danî li mirovên delk-qirêje,  
Bankir: “Rabin, em tevayî bikin mêje.”  
Ter sicada wî raxistin nava gula,  
Hecî rabû, mêja xwe kir tev hevala.  
Ser sicada amadebûn gelekê nas,  
Bok-beranê dinya neheq hatibûn xas.  
Gişka hevra guh didane birê mine,  
Dîqedandin mêj û taet, zîkrê xune.  
Li wir hebûn momin, salih, pir ewdê baş,  
Her yek bêjim milyaket bûn, ez nabim şaş.  
Li dinya heq, min awa dît Hecî Knyaz,  
Kilyameta Xwedê dixand awaz-awaz.  
Ji min pirsî xanim Amnê, dayka lawa,  
Got: “Selama min bighîne dosta tewa.”  
Beriya gotîye: “Ya dîl xwedê tenê-tenê xwedêzane,  
Dinya neheq, kê çi kiriye, xwedê wî jî dide wane.”

## AX DÏNYA, DÏNYA

*Rewayî ruhê xesîya xwe Letîfa Huseyn dikim.*

Hebûneke vike-vala, bê îtbarî,  
Tu bê sebrî, bê însafî, pir xedarî.  
Zû ji hevdu diqetînî dil-miraza,  
Emrê dirêj timê didî tu fêlbaza.  
Tu ter timê dişevitînî tevî hişka,  
Naz-bedewa dikî xurê mera, mişka.  
Dê û dota dihelînî, dizêrînî,  
Egît-şêra nav axê da dirizînî.  
Hineka ra dimis-rûnî, şîrîn-şerbet,  
Hineka ra qetil-xûnî, him jî hucet.  
Hineka ra dibî lêzim, pismam, hogir,  
Hineka ra mewt û jehrî, him jî agir.  
Hineka ra sî-sitarî, piştovanî,  
Hineka ra cellad, neyar, kêr, gûzanî.  
Hineka ra hevirmûşî, lel û durrî,  
Hineka ra merez, keser, êşa kûrî.  
Hineka ra hêlîn-warî, him dê û bav,  
Hineka jî wede zûtir dukuji xav.  
Bi emrê te neheq gir bûn, heq bûne hûr,  
Xwînrej şa bûn, zane ketin mitalê kûr.  
Bi emrê te şevên tarî dibin zelal,  
Pîra sed sal dibe keça horî, delal.  
Emrê şîrîn tu kin dikî, him jî dirêj,  
Hemêza te alîk rinde, alîk qirêj.  
Alîk qire, qute, pir hêsrên şevat,  
Alîk dewe, doze, mirin, tune îmdat.  
Alîk baxe, kulur-kulur gulên teze,  
Alîkî da diwerixin fêkî, reze.  
Kê hez dikî gelî, xişir, pêş dikî rast,  
Kê hez nakî ew nabîne ne nan, ne mast.  
Merûm dibe, nagêhije ew hevala,

Pêpez dibe, xilaz nabe cenga-qala.  
Bê ronayî çeva didî, dibê bijî,  
Hineka jî hebûnê da dikî tijî.  
Hineka tu hur-har dikî, didêyda rû,  
Hineka jî zirav dikî nolanî mû.  
Hinek hatin li resmê te mêze kirin,  
Hineka jî xal-xetê te teze kirin.  
Ez midheyre nenerîyê te me dinya,  
Ji sêra te tişt hîmnebûm, nizam çima?

## FELEK

*Rewayî ruhê Telebanîyê kur birayê xweyî welatparêzî û pir kedhez dikim, kîjan ku bi lêdaneke mêşeke hingiv 35-salêd wî hela tamam nebûyî, dinya xwe guhest. Çar sêwîyê bin bêjîng pey xwe hîşt.*

Bê îtbarî, bê însafî, her gav felek,  
Şahê xurta nava me da te dît gelek.  
Her çar zarok sêwî, sexîr, hîştin mal da,  
Te kir nava ax-kesera, kul û derda.

Daykê kasil hêsir kirin çem û kanî,  
Bav zû heland, bira, qewma, kir zêrînî,  
Mêşa jehrê bi destî xwe te şand, felek,  
Gunekarî, zulumkarî timê, felek.

## HUSEYN, BÎRÊ DELAL

*Her xelatê tê bîr kirin, unda dibe, Xelata min nayê bîrkirin, unda nabe.*

Bilind bibî wek teyrê baz,  
Sed sal bijî bavê Eylaz.  
Cem Xatûna esil eyan,  
Te bibînim timê wa can.

Êşik-ûşik ji te dûrbîn,  
Nevî, kur-keç dor te kombin.  
Dermala te tim şayî be,  
Dergê teyî vekirî be.

Dost bîn-herin, tev te şabin,  
Ewledê te şîr helalbin.  
Reh bavêjî mîna çînar,  
Pêş tu kesa tu nebî xar.

Rîyê pêş te gul-çîçekbin,  
Kêr-kirnên te rast û heqbin.  
Nav êlê da qedir pir bî,  
Şera, dewa timê dûr bî.  
Pêncî heyşt sal pir hindike,  
Xwedê heyşt jî lê zêdeke.

## **BÎRAYÊ MÎN, HESENÊ BALA**

Pir zaneyî, welathezî, rastî, helal,  
Bejin-bala te çînareke, birê delal.  
Pêş tu kesa tu mêlnabû tu car, tu wext,  
Rebbê jorîn te ra bide sehet û bext.  
Namûs-xîret, qedir-qîmet tacê teye,  
Boy dost-nasa zehmetê pir para teye.  
Reh bavêje, sîya te da bijîn hezar,  
Tim eşq-şa bî, ji emrên xwe nebî bêzar.  
Rojbûna te pîroz dikim, lawê Bala,  
Ji te dûrbîn xem û keder, qeda-bela.

## RAFÎKÊ KUR BÎRA, ŞİKÎR, ÎDÎ TU JÎ BUYÎ BAV

Şikir, şikir, hezar şikir,  
Xwedê dergek pêş te vekir.  
Nûr-rehma xwe ser te barand,  
Cote zerî te ra par şand.  
Yek Zînêye, Eyşeşane,  
Yek Xecêye, Gulistane.  
Bibin xûşkê hevt birane,  
Şemal bidin wek çirane.  
Rû nermike, rû perikbin,  
Şemşemoke, him rindikbin  
Wek spîndarê rast, taylanbin,  
Hemu bedew pêş wan rabin.  
Sosin, rihan, şerma wana,  
Mêvan meçîn deşt, zozana.  
Pir hez bikin herd ji heve,  
Sala qutkin herdu teve.  
Bin per-baskêd Rebbê jorîn,  
Bibin xweyê bextê zêrîn.  
Wanê herin dibistane,  
Mûşê bibin tim mêvane.  
Qet nebînin jan û derda,  
Bextewarbin axa dêda.  
Bilind bikin serê bavê,  
Unda mekin emekê dê.  
Dîlana wan hûn bibînin,  
Tevî Qadirê xweyî cindî,  
Du xelatê gelekî baş,  
Berî hemuya ez bişînim.

## HÛSEYNÊ XARZÎ

Rojbûna te pîroz dikim, baş xarzîyê minî delal,  
Ji bistanê dayka mêrxas te mêtiye şîrê helal.  
Şeref, torê tey bilinde, şikê nakim ez tu cara,  
Mêr hatîyî evê dinê, qet hilnede minnet-qara.  
“Beroxê çêyî, ber kozê da timê çêye” – got pêşîya,  
Rîya emir kaş-kerîşe, zû bernede pir şaşîya.  
“Mala Xwedê li ser sebrê bûye ava” – berê-berî da,  
Hemda fire zêr û zîve, Xaliq şandîye me ra jor da.  
Giran rabe, giran rûnê, miqamê xwe bihêvşîne,  
Eva dinya sêva sore, alîk tele, yek şîrîne.  
Tim xebera mezina bike, dû şuxulê bê kêr meçe,  
Bira, pismam per û baskin, bê wan jîne vala, pûçe.  
“Dayîk hero kura nayne”, bira-qewma bihebîne,  
“Sed car bipîve, carek qutke”, wana ji xwe meêşîne.  
Zû ne xape, kûr hînbibe, îtbar meke gelek yada,  
Roj têg da zû direvin, ked-karê te diçe ro da.  
Tev Tehmînê, her sê lawa, bextewar bî, dûr bî êşa,  
Cem hevala ser bilind bî, nav emir da bimînî şa.

## MÛRADÊ HESEN, ŞAYA WE PÎÇÛK PÎROZ BE

Mûradê min, sîya Xwedê her gav, her dem li ser te be,  
Bextewar bî, qet mezêrî, eşq û şayî para te be.  
Risq-ruzê te qet kêr nebe, nolî çema tim bê xare,  
Tengî, telî ji te dûrbîn, bibî xwedan ax û ware.  
Pêş gelê xwe ser bilind bî, feqîr nebî qet tu cara,  
Namûs, culet para te be, tu hilnedî minnet, qara.  
Wek çînara reh bavêjî, pir-pir bidî behrêd şîrîn,  
Kêr-kirinên te boy gel bibîn lel-cewahir, kana zêrîn.  
Êşkê te me, «Gîha ser rehê tim şîr dibe» – gotin pêşda,  
Bok-beranî, nişa xasî, qet mêl nebî, lawê Kurda.  
Mirazê me hasil bûye, pîroz dikim çûk şaya te,  
Mezîn bibe ser axa dê, em bibînin dîlana te.

## ANARÊ MÎN

Nav jîyan da tew pîrsara nebe qaîl,  
Pêş neyara nelerize, qet nebe dîl.  
Bifetile, rîya emir bike mêze,  
Boy gelên xwe te çi anî, ew bû teze.

Tim bibihe tu şîretê pîra, kala,  
Gav-rojên xwe derbaz meke bê kêr, vala.  
Rêça xwe da naxelife, bimeşe rast,  
Nava gel da qedir, qîmet, tu bîne dest.

Rîya ulim kevir, kuçik, gulistane,  
Nezan li wir tu car nagrin cî, miskane.  
Kesê zane zû dibihê dengê zemîn,  
Kirinên xwe da ew şaş nabe tu car, yeqîn.

Lawo, emê dinya ronik herin ese,  
Bavpîrên me weysêt kirine ferih, kese.  
Ronaya min, «Ga dimire çerm dimîne»,  
Loxmanê Kurd, «Mêr dimire nav dimîne».

## BÛKÊ CAN

*Rewayî bûka xweyî pir hezkirî û esil-kok Meryema şêx dikim.*

Lelî, durrî, bûkê can,  
Tacê zêrî, bûkê can,  
Pê-parê te pîrozbin,  
Em heft kura, keçekê,  
Te dixazin, bûkê can.

Nav, namûsî, bûka me,  
Bext-mirazî, bûka me,  
Oxira te bi xêr be,  
Qedir, qîmet, şerefê,  
Tew xwe bîne, bûka me.

Bext-miraze, bûkê baş,  
Sewt-awaze, bûkê baş,  
Bilind bike serê me,  
Bok-berana, mêrxasa,  
Me ra bînî, bûka baş.

Mal, dewlete, bûka jîr,  
Ruh-şuhrete, bûka jîr,  
Cêhêz îdî kes nayine,  
Aqil, kemal, hurmetê,  
Xwe ra tîne bûka jîr.

Misk-emperî, bûkê can,  
Gula terî, bûkê can,  
Ne çilmisî, meh, sala,  
Risq û ruza, eşq-şayê,  
Me ra bînî, bûkê can.

## MEXSÛDÊ PÎÇÛK

Rojbûna te pîroz dikim,  
Kurkê delal, Mexsûdê şêr.  
Her çavên te ez maç dikim,  
Mezin bibe, zû bibe mêr.

Sîya Xwedê tim ser te be,  
Aqil-kemal para te be.  
Nav emir da qet mezêrî,  
Tu nebînî rojên tarî.

Rîya te nebe kevir, sirîn,  
Timê rûnê hêla jorîn.  
Bextewar bî hemû sala,  
Ji te dûrbîn qeda-bela.

Tu ronaya dê û bavê,  
Nişa xasî, hatî dinê.  
Karê bide gel û welat,  
Tim bikene rûyê te heyat.

## MEDÎNA BAVO

*Rewayî yek salîya Medîna xweye bedew dikim.*

Pî bavêje, pî bavêje Medîna min,  
Xwezil ew rojê bidîta par dilê min.  
Ser axa dê biketyayî, rabûyayî,  
Dêmê rindik kevra keta, bigîryayî.  
Min te hilda hemêza xwe, ter maçkîra,  
Pozê piçûk gilêza te paqîşkîra.  
Bejin bavîta bêsew, aza, metirsîyayî,  
Tev hogîra ji dibistîn bihatayî.  
Tu helbestên kalo-bavo bixandana,  
Meclîsa da ferih, ezber, bigotana.  
Min destê xwe li hev xista, cî rabûyama.  
Emrê çûyî îdî poşman ez nebûyama.  
Dîlana te bi destî xwe min bikîra,  
Dost hogîrên xweye zindî gazîkîra.

**14.10.2005-salê.**

## ÇÎLÊ CAN

*Vê helbestê rewayî rojbûna Çîla Rûslanê Hetemşa dikim.*

Şirîn, şerbet, Çîlê can,  
Lel û durrî, Çîlê can,  
Hatina te em şabûn,  
Bextewar bî, Çîlê can.

Bibî xûşka hevt bira,  
Şemal bidî wek çira.  
Mezin bî ser axa dê,  
Ji te hezke tim Xwedê.

Bavo bikî nazîya,  
Dûr bî tim ji qezîya.  
Dibistan qismetê te,  
Wan-Amed meskenê te.  
Avkewserî, Çîlê can,  
Nûr-nederî, Çîlê can.

## EZÎZÊ BRA, ÇAVÊ WE RONÎK BE

We qelbê saf, dilê paqîş, pîroz dikim cem mêvana,  
Xwedê dubar Zîyok daye, we malbeta Bederxana.  
Ev mêrxasa mezin bibe, bin esmanê çîkî-zelal,  
Bextewar be, binge dayne li ser axa xweye helal.  
Dê-bavê xwe gelek hez ke, dost-hogira bihebîne,  
Firnaq nebe, bê sûç-gune, qet tu kesa meêşîne.  
Dergêd Xweda her gav, her dem, pêşiya wîye vekirîbin,  
Kuda here, koşk û sera boy wî timê çekirîbin.  
Heq-rastîyê biparêze, gavêd şaş-xar qet navêje,  
Pêş tu kesa nebe lolep, çi dîtîye, ewî bêje.  
Heta hebe, êşik-ûşka, dew û doza timê dûr be,  
Nav ulim da zane, maqûl, xezna tijî, behra kûr be.  
Kevir ber wî bibin lel-durr, melukume, qet mekeve,  
Êlê hez ke, ser bilind be, ji nav êlê dernekeve.  
Nefê bide gel û welêt, bigre reça bapîrêd xwe,  
Nolî weyî welathez be, nehêvşîne hebûna xwe.  
Gotina mezina rabe-rûnê, bigre cîkî herî bilind,  
Çûk û mezin bi wî şabin, bike şuxlêd kêrhate rind.  
Tim bin sîya mervekî da hezar meriv dikin sefa,  
Mezinê êlê aqilbend be, êl nakşîne tu car cefa.  
Hemda fire, kîrnêd hêca, bilind dikin serê merda,  
Dinya xezna bê ser-bine, kê kari bû, çi jê hilda.  
Duam eve, ez tevî wê, her sal bibim mêvanêd wî,  
Pîroz bikim, salvagerêd wîye eşqe, şaye, cindî.

## MEÊŞÏN DÏRANÊN MÏN, MEÊŞÏN

Ev şêst sale hogir, heval hûn tev minin,  
Hebûn, jîne, hûn ronaya çavêd minin.  
We hukmê min qedandîye, tev we jîme,  
Berê pirtir ezî îro hewcî we me.

Porên sipî, çavên şêlû mekin mêze,  
Însaf bikin, min nekin nav xemên teze.  
Nolî zemîn hûn jî nebin pir bê îtbar,  
Reca dikim, min navêjin, neçin tu car.

Tel û şîrîn berîm timê we tem kiriye,  
Lêvên yarê ewil-ewil we maç kiriye.  
Îdî li min miçiqîne avên çema,  
Min dûr diçin, min davêjin îro, lema?

Lez mekevin, sebir bikin, hindik maye,  
Rebbê jorîn her gav xweyê tim jaraye.  
Îcar werên axa welêt tev min maçkin,  
Wêya şûnda, ça dixazin, usa bikin.

## TEXTKÊ ÇOKAM, PİR MEÊŞE

Textkê çokam, însaf bike, min meêşîne,  
Ji vê dinê merûm meke meqetîne.  
Me sond xariye, axa daykê em tev maçkin,  
Êş, hesreta ji dil derxin, cîkî gavkin.  
Bilindbin ser çîya, baniyê welatê xwe,  
Mêze bikin deşt-zozana, tew axa xwe.  
Sîngê Sîpan gul, sosina hilqetînin,  
Ser merzelê şêr gêrîla zo-zo daynin.  
Mirazê me hasil bibe, em jî şabin,  
Pêş mêrxasa, him bitewin, him jî xarbin.  
Ewê demê hêdî-hêdî tu biêşe,  
Naz-gazina bihemdî xwe min ra bêje.  
Bi eşq û kêf spas-spas te ra bêjim,  
Hogirya te pîr qîmetkim, biêş, bêjim.

## XWEZİL, XWEZİL, TEW XASTİNÊM BÎQEDYANA

*Ez vê helbesta xwe rewayî rojbûna kur mam û hogirê xweyî pir  
hezkirî Elîyê Mehmedê Îbo dikim. Boynet wê yeke ku ew cî û mikanêd  
Ermenistanêye ez helbestê da navêd wana dikşînim emrê kal û bavêd  
me, zaroktîya û gençtîya min û Elî li wan cîyê nebîrkirî derbaz bûye.*

*Nika em herd jî wan cîya xewnêd şeva da dibînin.  
Piştî destpê bûna şerê Qerebaxa çîya (şer nava ermenîya û azerîya  
da destpê bû) ewan cîyana boynet hemû mirovêd musulman û usa jî  
boynet min û Elî bûne qedexe.*

### Elîyê bira:

Xwezil dîsa, em wan cîya bigeriyana,  
Tev nas-dosta pir şa bûna, bikeniyana.  
Biçûyana zîyareta tew delala,  
Ser tîrbêd wan me danîya baqêd gula.  
Xatîrê xwe me bixasta îdî ji wan,  
Fathe bida, tewafkîra serkêlka wan.  
Biçûyama “Axmîxan”ê, mala bavo,  
Dayka min bigota: “Tu xêr hatî, lawo”.  
Bida min da tasek dewê tîrşî meşkê,  
Min vexara, zû bîrkîra germa deştê.  
Çavêd xwe va têr bidîta nolî berê,  
Xanim dayka min dipêje nanê sêlê.  
Lawhez bavê hevrîşk çekîra tasa mîs da,  
Loqek hilda, yê din loq-loq bida min da.  
Dapîra min misîn daniya nava kuçîk,  
Ça cetîrîyê wê vêxara qurçîk-qurçîk.  
Kalêm Silo serê şa-şa hemêzkîra,  
Apo Rizgo berxek boy min şerjêkîra.  
Malê dosta yeko-yeko bigeriyama,  
Ber êvarê mala bavo vegeriyama.  
Baran bibûya, konê bavê dilopkîra,  
Çîlk-dilopa lihêva min tew şîlkîra.  
Têketama nava cîyê dê-bavê xwe,

Felqek cinnet min bidîta pêş çavêd xwe.  
 Biçûyama “Çil kanîya”, gundê “Zarê”,  
 Rêçê gelê xwe bidîta li wê derê.  
 Taştê, şîva xwe bixara kaniya “Zero”,  
 “Taştî golê” ser min danya tîrêjek ro.  
 “Warê Toto” mêzekira çîyayê “Sofi”,  
 Bidîtana zeryêd Kurde fîno, koffî.  
 Tew “Çeylaxê” buhust-buhust bigeriyama,  
 “Warê Balo”, rex belekyê veleziyama.  
 Bakî zirav tûncika min tevhevkira,  
 Bibûma zar, xêlê pincar beravkira.  
 Dayka min ew ser konê me zû raxista,  
 Kerb û hesret ji dilê min wê derxista.  
 Dilêkî têr “Axmîxan”ê biqetiyama,  
 Berg gêdûkê, “Qanî” golê bimeşiyama.  
 Êvira xwe biguhasta “Arxaşan”ê,  
 Ser ziyaretê binihêrya tew zozanê.  
 Têr bidîta “Neltene çûk”, him “Keftar dax”,  
 Ji dilê min derketana keser û ax.  
 “Qurû sûlav”, “Oyoxlî”yê hêsa bûma,  
 “Topê Mûsês”, çîyayê “Reş”ra bilind bûma.  
 Berjêr bûma “Çinçilê reş”, “Zomê gûz”ê,  
 Apo Mehmed min bidîta kaniya bûzê.  
 Sicada xwe dîsa daniye cîkî evraz,  
 Ayeta mêtê ev dibêje awaz-awaz.  
 “Gorgeç”êda kevir-kevir bizelqanda,  
 Tew xastinê dilê xwe da biqedanda.  
 Mij-dûmana serê çîya têr bidîta,  
 Çivte-çivta teyrik-tuya zîz bihata.  
 Li “Artîz”ê, fêza “Koxt”ê, “Gernîya” xaş,  
 Sivre daniya, pîr bixara nanê levaş.  
 Têr vexara ava kaniya “Şabilax”ê,  
 Rûniştama rex kevirê mêtê Axê.  
 Hêsrên şewat hêdî-hêdî têkran xare,  
 Pêş ruhê Hecî, bejna xwe bikra xare.  
 Knyêz dîsa ser hespê boz danîya zîn,

Papaxê kew nik bikira, têkra qalîn.  
 Biçûyama “Kanya tirş”, “Evdilser”ê,  
 Êla “Qerka” min bidîta li wê derê.  
 Fatha bida ruh-ceseda hemû çûya,  
 Bibihîsta kale-kala berxa, mîya.  
 Sîngê çîyê şivîn bilûr bilîlanda,  
 Bêrîvana berxvanê huç bilomanda.  
 Min bidîta kon-çadirê êla giran,  
 Ser kulava rûniştinê boke-beran.  
 Baş Îbrahîm malên lawa bida rêzê,  
 Balaxanim cîyê Bala daniya fêzê.  
 Derê malê dîsa mêvan biciviyana,  
 Tew tem û lem bibûyana çem, bikişiyana.  
 Gulpe qawa Fatma Hono min vexara,  
 Bigeriyama kaş-kerîşa tew rûbara.  
 Biro mîya reş bigirta, zû bigota,  
 Berfeşîra sar çêkira, bida min da.  
 Suyarê kaw kihêla xwe bibezanda,  
 Xortê çeleng hezkiriya xwe birevanda.  
 Xeyd têteta nava êlê, bava, dîya,  
 Rûsipîya êl li hevdu bianîya.  
 Dîlan, sazband, bigeriyana nava zomê,  
 Bilind bibûya dengê defê, sewta zurnê.  
 Bir, gasêtek bileyistana zilam hevra,  
 Zara hevdu bikutana, bidan çêra.  
 Dengê manga, kewtîna sa tev hev bibûya,  
 Têkra zingîn, zinge-zinga zengilê nêrya.  
 Pey baranê keskesorê penç bavîta,  
 Yalê deştê bakî hênîk nem bihata.  
 Pêçeka da dergûş birçî nehewiyana,  
 Şerm û etvê bûk nêzîk wan nebûyana.  
 Ser kanîya dota dilok bigotana,  
 Xortê şermok korta da xwe veşartana.  
 Çem û kanîya kilama xwe bigotana,  
 Gure-gura ewra guhêm kerkirana.  
 Dilekî şa mêzekira êla rengîn,

Dua bikra, xêr derbaz be ser wê havîn.  
Min demekê xwe sihkira nav êlê da,  
Xwedê bixasta, tu car nemrim xerîvyê da.

1. Axa – kulfeta Hecî Mehmedemînê birayî min, çawa qedir, Hecî ra timê Axa, Axê male, digot.
2. Kevirê mêja Axê – weda havînê malêd me diçûne zozana “Qizil zîyaret”ê, ova me ser kanîya “Şabûlax”ê dadanî. Biniya mala da tehtekî fireyî met hebû. Hecî timê mêja nîvro ser wî tehtî dikir. Merivê ovê wî tehtîra “kevra mêja Axê” digotin.
3. Silo, Rizgo û Mehmed – mamêd minin. Nava êla me da qedir û sîyaneta wana pir bû.
4. Îbrahîm û Balaxanim dê û bavê Knyazê Îbrêhîmin.
5. Bala – mam û xezûrê mine, birê Balaxanimêye. Rûsipîyê êlê, mirovekî pir qedir û qîymet bû.
6. Fatma Hono – xesûya Elîyê kur mamî mine. Nava êlame da tu kulfeta mînanî wê nikaribû kofêya (qawa) tem hazirke. Em her tim diçûn cem wî, kofê wedixar.
7. Biro – eslê xweva Kurdê-êzîdî bû, salêd dirêj şivanê ova me bû. Ewdekî baş bû. Berfeşîrê pir hezdikir.

# HEZKÎRÎN BER TEBÎETÊ

ŞA BÎBÎN, NEWROZ HATIYE

*(Poêma)*

Derê mala dadan agir,  
Hevdu şa bûn çûçîk û gir.  
Germayî ket nava axê,  
Kurê pîrê hat ji zaxê.  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Çîya, baniya, kirin gazî,  
Xewê rabûn darên tezî.  
Cew-şevla da mîlmîlî av,  
Şivîn hilda bilûr, kulav.  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Keça lêxist kil û kilçîk,  
Zara çêkir kolik, holçîk.  
Rinda xwe da pêş eywanê,  
Berxwan ban kir bêrîvanê,  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Bûk sekinîn ber neynûka,  
Gulav rêtin bisk, tuncika.  
Deyîl, hilcîk hildan jorê,  
Xwedê xastin oxra xêrê.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Dota xistin avê derzî,  
Xort piş derya telyan dizî.  
Pîra kirin dîlek, reca,  
Kala xwe da nava genca.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Daka petin kade, bişî,  
Berkavk hildan, ristin teşî.  
Kulor, kuncî kirine çeval,  
Zara kulik avîtin mal,  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Zerî meşyan, çûn qelokê,  
Xort ketine gasêtekê.  
Bav şuxulîn mîna hero,  
Daka hanî mast û firo.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Rind sekinîn ber derîya,  
Gûlî berdan ser penîya.  
Rebbê jorîn kirin reca,  
Bibin para başa, qenca.  
Kenian, gotin, Newroz hatiye.

Kewa maçkir zû-zû zinar,  
Hêlîn danîn bin kevrên xar.  
Bilbil leyîst, firî, danî,  
Awaz, awaz kir qalînî,  
Sa bû, got, Newroz hatiye.

Hirça xewar derket lanê,  
Gor loqîya ber zozanê.  
Ruvî leyîst, kir fêlbazî,  
Kewrîşk sîngê topra bezî.  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Mesî xwe da tîra avê,  
Kûsî xwe da berê tavê.  
Beqê banzda kire qurîn,  
Zewr rabûn dû hev revîn.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Werdek noq bûn binê avê,  
Bet reqisîn dora kulê.  
Qaza bilind kirine qîrîn,  
Dûvmeqeska anîn mizgîn.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Mer hişyar bûn xewa giran,  
Makemera qetkir meydan.  
Mele hol bû êwir-êwir,  
Dûpişk rûnişt li ser kêvir.  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Legleg hatin xar û beze,  
Ser hêlîna danîn leze.  
Pepêk, çivîk ketin rêzê,  
Bûmê korik xwe da fêzê  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Mange çûne banî, besta,  
Şhîn hat ji kihêl hespa.  
Ga, golika kirine mêze,  
Boryan, oryan lewzê teze  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Kêzik, kurmik kulûr-kulûr,  
Kişyan bikin xwe ra edûr.  
Perwan leyîst dora şamê,  
Xwe şevitand evê demê.  
Şa bû û got, Newroz hatiye.

Dîk derketin çiqîlê dara,  
Dîna xwe dan kulik, wara.  
Bask hevxistin kirine qîrîn,  
Mirîşk kom bûn kirine qingîn,  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Xezal rabûn ji nav kevta,  
Kalîna wan orman hilda.  
Kar leyîstin dora qefê,  
Ketin nava lêlav berfê,  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Teyrên Sîmir esmanê şîn,  
Bask hejandin, kirine qîrîn.  
Guling firîn, bûne ref-ref,  
Êwir-êwir ew bûne zef.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Kerî rêz bûn terazuna,  
Bû giştîna kar, bizina.  
Beran ji cî zû-zû pekya,  
Xwe da nava berx û mîya.  
Got, şa bibin, Newroz hatiye.

Pisîk derket ji bin sovê,  
Rast sekinî tîra malê.  
«Qafreş» hewşê kire ewtîn,  
Tûş nihêrî erşê ezmîn  
Şa bû, zû got, Newroz hatiye.

Berroj, berek hatin xanê,  
Dehra kirine canê-canê.  
Gelî, neval bûn tijî av,  
Ewra reşand baran, xunav.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Sûsê, ketê, pêqasikê,  
Tirşo, merwend, soy, sipingê,  
Kulîlkê al, sipî, zerîn,  
Kom bûn hevra anîn mizgîn.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Teltûzîka nav kanîya,  
Elegeza sîngê çîya.  
Kereng, pêçok, cetrîya bîn,  
Gezgezka ra şandin mizgîn.  
Gotin, şa bin, Newroz hatiye.

Mendik rabû, kire hewar,  
Sosin, rihan bûne kubar.  
Goştbertka nav zevîyê,  
Gazî kire dara bîyê.  
Got, şa bibe, Newroz hatiye.

Dar tewîyan li ser axê,  
Dilop livyan nav çiqîlê wê.  
Reha hevdu kire nazî,  
Rîçal rabûn kirine gazî.  
Gotin, şa bin, Newroz hatiye.

Ewir hejyan, kirin girmîn,  
Çem kişîyan, kirin xuşîn.  
Baran barî hemû dera,  
Keskesorê da ser çîya.  
Pir şa bû, got, Newroz hatiye.

Ber leqîyan, kirin şelpîn,  
Pêl ser pêlan dû hev revîn.  
Li kendala bûne mêvan,  
Ketin nava axa giran  
Lez-lez gotin, Newroz hatiye.

Çînar, merxa hev nihêrîn,  
Qeysî, hûrmê hev xurdilîn.  
Hejîr, hinar bûne tevgel,  
Boy xwe kirin kar û emel.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Sêv sekinîn kubar-kubar,  
Albixara kirin hewar.  
Baxwan zû-zû meqes tûjkir,  
Tirî monik-monik jêkir.  
Reqisî, got, Newroz hatiye.

Xezaloka kirin kar-bar,  
Berbi gula birin firar.  
Pîrevokê çêkir hêlîn,  
Mêşa, moza kirin vizîn.  
Şa bûn, gotin, Newroz hatiye.

Min mêzekir dinya fire,  
Xemilîye lel û durre.  
Yaram firq bû ji nav zerya,  
Min nihêrî kenya-kenya.  
Got, şa bibe, Newroz hatiye.

Rebbê jorîn min kir reca,  
Gelêm dûrxe keder-xema.  
Serokê me nolî berê,  
Pêş gêrîla here, warê.  
Bêje, şa bin, Newroz hatiye.

## BAHAR HATÎYE

Zû da-zû da hişyar bûne hemû bînber,  
Berf helyaye, xemilîne dîsa qulç-der.  
Gelî, gepor têr av bûne, dîkin cejne,  
Berfegulê quloz kirye garden-bejne.

Bilbila rewş kubar-kubar diqalîne,  
Kewa nexşîn zû çêdike germ, hêlîne.  
Xezal nava mêrg-ormana bûne rêze,  
Nûh baharê xwe ra aniye rewşa teze.

Sorgul, nergîz, sosin, rihan dîkin dîlan,  
Ewrên tarî dibarînin hûr-hûr baran.  
Keskesorê hemêz kiriye sîngê çîya,  
Terrazûna tê kalîna berx û mîya.

Karger dîkin dîsa karên keda helal,  
Dayîk, keça paqîşkirine kîler û mal.  
Dûvmeqeskê mizgîn aniye, bûye mêvan,  
Qaz û quling dubuhurin kavran-kavran.

Bahar hatiye, ruhdar bûye tebyeta kal,  
Ez şa nabim, dikewgire dil bê fesal.  
Serokê min bê sûç, gunê Îmralîyê,  
Şêr gêrîla boy azayê dijîn çîyê.

Heta serok, welatê min nebin aza,  
Ez şa nabim, dûr nakevim dewa, doza,  
Rusqeta xwe ez nestînim, hêsa nabim,  
Li pêş zulmê ez natewim, duqat nabim.

## BAHARA BÎ REŞ HATİYE

Şivan derket ser banîya,  
Hat kalîna berx û mîya,  
Wîrqîn kete kaw-cindîya,  
Bû xuşîna çem-kanîya,  
Bahara bi rewş hatiye.

Dumeqeskê mizgîn anî,  
Leglekê zû hêlîn danî,  
Quling qirîyan, erşê esmîn,  
Teva rabûn xewa şîrîn,  
Bahara bi rewş hatiye.

Bişkok girtin çiqîlê dara,  
Tavê danî ser beyara,  
Kulîlk vebûn sîngê çîya,  
Tebîyet şa bû, kenîya,  
Bahara bi rewş hatiye.

## BERFA SÎPÎ

Tu azayî, bextewarî, ça dixazî, usa dikî,  
Ser gemara dipeçinî, deşt, zozana bedew dikî.  
Rebbê jorîn ji xezna xwe, tenê rengêk daye teye,  
Dinya-alem sero-bin be, nay guhestin rengê teye.  
Tu kesîra hesav nadî, ji tu kesî fedî nakî,  
Te pêl dikin, diperçqînin, heta wede debar dikî.  
Tew rezîlya tu dibînî, geh hêrs dibî, geh nerm dibî,  
Tişt nabêjî, nişkêvajî tu dihelî, unda dibî.  
Xwezil Xwedê boy benda jî, nazilkira rû-rengêke,  
Bifikirya, boy wî rûyî veçêkira tek rengêke.  
Usa bibûya, tew mirovê, tev bijiyana nolî bira,  
Qetil nedibû, wan neyarî nedikirin tu car hevra.  
Finazîyê, fesadîyê hukum nedikir li vê dinê,  
Durûtîyê, bira-birê qet nedida tim kuştinê.  
Hezar yek reng nexulqanda, xelat neda bendê xune,  
Xwezil-xwezil, mêr bima mêr, jin jî bima tenê jine.  
Fisq-fesadî nebûyana, dil bimana bê kîn, qudret,  
Hev hezkirin bibûya mortal, çûk, mezina ra bikira hurmet.  
Her kesekî xwe naskira, bîr nekira kî bûna xwe,  
Qude-qude rûnenişta, tim naskira şûn-cîyê xwe.  
Dostanîyê, aşîtîyê per bavîta hemû qulça,  
Dinya nedibû behra xwînê, qenc û xirav, awqas perçe.  
Ezê bimam cîyê xwe da, boy gelê xwe bikira kare,  
Xerîvîyê da nedihelyam, dil-hinavêm nedibûn jare.  
Rica dikim, ziman veke, bêje benda tu yek care,  
Bila bijîn, rû-rengêkî, rûreş meçin qebra sare.

## SALA TEZE

Hat kalekî rûdan qerqaş,  
Libasê wî etles, qumaş.  
Got: - Navê min Zivistane,  
Ez mezinê çar bira me.  
Ku datînim, pê û pare,  
Tev xwe tînim emrê sare.  
Dîqersînîm çem û kaniya,  
Qerqaş dikim deşt û baniya.  
Min hez dikin bax û bostan,  
Vala dikim deşt û zozan.  
Min nas bikin, gelî zara,  
Kombin hemu werên vira.  
Got û meşya dora merxê,  
Zarok du wî ketin çerxê.  
- Tu baş hatî, kalkê delal,  
Bide me da aqil, kemal.  
Sulhê bîne, tamam dinê,  
Em nebînî keder, xwînê.  
Tew hudûda bide hildan,  
Piçûk hevdu bibin mêvan.  
Bila şa bin dayîk, mezin,  
Pîrik, kalik nekin gazin.  
Te anîye kakil, qendik,  
Mewîcêd zer, badam, findiq,  
Sêvê sorik, sincên sivik,  
Hêjîrên zer, hinar, tirşik,  
Xurmên bexda, kuncî, dendik,  
Noqutê şor, qaxê rindik...  
Her gav were, kalkê delal,  
Me ra bîne hewa zelal.  
Em nebînî tu mereze,  
Me pîrozbe sala teze...

## BAHAR TÊ

Selam, selam, geş tebîet,  
Emir, jîne, kullî heyat,  
Xemla dinê, tew cimaet,  
Şa bin, şa bin, ne, bahar tê.

Selam we ra, gul-gulistan,  
Deşt û zozan, çol-çolistan,  
Kevir, kuçik, qûm, qûmistan,  
Ji xew rabin, ne, bahar tê.

Selam te ra, xasbaxçê ter,  
Bişûşilin avêd kewser,  
Dîsa kombin, keçêd esmer,  
Şa bin, şa bin, ne, bahar tê.

Selam, selam, zer û zinar,  
Çem û kanî, best û beyar,  
Kew-bilbilêd kawê-kubar,  
Şa bin, şa bin, ne, bahar tê.

# ÇEND FIKRÊD MIN Û BEYTÊD MIN

## HÊY DÎNYA BÊ ÎTBAR

Çawan bû, wekî min ev helbesta nivîsî?

Rojekê hevalekî minî zarotîyên aqilbendî, pir hurmet, wedê dest tengîya xwe da derê min vekir û bû mêvanê min. Wî derheqa bê îtbarîya qewm û lêzimêd xweye nêzîk da min ra qal kir. Got: - Birayê minî delal, min qet nizani bû, wekî ev dinya û bendê wê dikarin ewqasî bibine bê îtbar. Min ser hîmê gazine wî ev helbesta nivîsî.

### **Delala min,**

Ev dinyaye bê îtbare,  
Amin nebe qet tu kesî.  
Cêva te da tune pere,  
Lazim nînî tu tu kesî.

Kî bûna te kes pirs nake,  
Ku hatî, tuyê herî ku.  
Kes derîyê te venake,

Gelo saxî, yan mirî tu.

Qewm-lêzimê te dûr herin,  
Te ra bêjin: “ne mir, ne jî!”  
Unda bibî, te nagerin,  
Tenê cêvê têkin tijî.

Tu li rûyê kê bikenî,  
Ewê ji te bisilike.  
Dikî sihkin tu ji wanî,  
Wê bên vir ew çi dike.

Tu salamê mede kesî,  
Kes venagere selama te.  
Wê medine te nanê tisî,  
Birçî bimore neferê te.

Meclîsa da meçe jorê,  
Wira şûnê wê medine te.  
Ji devê te zêr bê xare,  
Wê bikenin dîsa ser te.

Kasivayî – rusvatîye,  
Bê hurmetî, feqîrîye.  
Kes pirs nake, kasiv kîye,  
Ji çi eslî, çi cinsîye.

Cêva keda heye pere,  
Wî ra dibên ew xaş mêre.  
Ew aqile, ewe zane,  
Nabên kîye, ew ewane.

Ber deryê wî dibin tijî,  
Xwe seva wî dikin rijî.  
Deyl-pêşêd wî diqetînin,  
Xwe hişk pêva dizelqînin.

Pêş mêl dibin. Dibine çaw,  
Hemû dibin wî ra law.  
Paqîş dîkin cil-solêd wî,  
Feda dîkin xwe seva wî.

Ew dikene, tew şa dibin,  
Ew hêrs dibe, gî ker dibin.  
Çêra dike, mirî, saxa,  
Hemû dibên, belê, axa!

Diaxive gelekî nêr,  
Hesav nake ew kesî mêr.  
Geh tirş dibe, geh dike qal,  
Nişa wî da tune helal.

Ber emrê wî dibin hêzing,  
Bê wî navên, ne gav, ne nig.  
Tew gotnêd wî diqetînin,  
Spasekê jê bistînin.

Ew direve, jê dûr naçin,  
Wan der dike, lê tên, diçing.  
Destêd wîye qirêje, xar,  
Tewaf dîkin rojê sed car.

Birêm, dinya wa hatiye, wê wa here,  
Qenc hindikin, ji xirava tu dûr here.  
Cewa avê tê da kirye gure-gure,  
Zû û dereng avê tê da dîsa here.

## ÎNSAN

Nûr-zeyneta heq xwedêye,  
Xemil-rewşa tew dinêye.  
Eman, eman, dest medinê  
Bila bijî rû erdêye.

Bê wî dinya kaf û kûne  
Xanîkî bê dîwar sûne.  
Baxçekî bê fêkî-reze,  
Mêrgeke bê gulên teze.

Bê wî hîv, ro qet dernayên,  
Stêrk ezmana mêvan nayên.  
Asîmanê bikewgire,  
Tew germayê vepesire.

Bînber gişkê ginê barkin,  
Cîya-baniyê bejnê xarkin  
Cem û kanîyê bimiçiqin,  
Behrê bigrin, tarî xwekin.

Çi ku heye, wê unda be,  
Xenî haçûc kesê nebe.  
Axê cî-cî biqimile,  
Wê ban bike, bizewile.

Zerê daynin şîna giran,  
Kan-xezneyê bibîn wêran.  
Gepor, geliyê bizîvînin  
Koç-kevîrê hêsrâ bînin.

Axir gewrê gubar bêye,  
Kesê nebe rû erdêye.  
Decalê bê bide ferman,

Şeytanê bê sazke meydan.

Planêtê werqulibe  
Unda dike şiklê xune.  
Ew jî îdî nolî marsê  
Li tu cîya nabe asê.

Tew xwînxara dikim reca,  
Bihelînin hemû çeka.  
Lê vê dinya gul, zêrîne,  
Bila însan tim bimîne.

## XEM NEKÎN

Wedê ku ez boy nexaşiya çavêd xwe, nexaşxana komara Qazaxistanêye dewletêye nexaşiya çava da radizam.

Çawa dost û pismamêd nêzîk, usa jî rojekê Qasimê kur birayê min tevî Seyrana kulfeta xwe hatine cem min. Min derheqa nexaşiya çavê xwe wana ra qise kir:

-Doxtor dibêje ku, çavêd minî çepê sed selefî ronaya xwe unda kiriye. Çavê rastê jî çil selef ronaya wî maye. Wekî em ser çavêd teyî rastê emeliyat nekin, diqewime paşwextiyê tu ji ronaya çava merhûm bibî.

Herdû jî ketine nav mitala.

Seyranê got:

- Lê wekî Hûn îzna emeliyatkirinê nedin?!

Ez vebîşîrîm:

-Ewê jî tenê xwedê dizane, paşwextiyê wê çawa bibe...

Wedê çûnê, Seyranê gelekî ez mêze kirim û kesereke kûr kişand.

Piştî çûna wana, ez xêleke xurt ketime nav mitala. Êmrê minî buhurî mînanî şîrîta filmê hat, yeko-yeko, pêş çavêd min ra derbaz bû. Min qelem hilda û ev helbesta nivîsî:

Fikra meke, bûka mine mêvanheze, pir şafiltî,

Emrê xwe da min kirine, gelek şuxlêd başe, cindî.

Rebbê jorîn pir mezine, wê dîlekam qebûl bike,

Ezê dinê mêze bikim, dinyayê min mêze neke.

Meclîsa Qadir, Almastê, ezê vekim dilekî şa,

Sergovendê bikişînim, deng bidime we hemûya.

Dinya xeme, dinya deme, fikir dixun emrê meriya,

Homêrê Hûn, Evdalê Kurd, Nîkolayê başî Uris,

Ji ronaya herdu çava, ew jî mane bê par beysûs.

Lê kirinêd wane hêca, dijîn heyra dinê heye,

Bext-rozgara her bendekî tenê-tenê dest xudaye.

“Xwedê heye, xem tu nîne” berîya gotîye her gav, her dem,

Berê xwedê dayînê be, kevir pêş te tim dibin nerm.

## GAZİNNAME

Roşeke xwedêye ku bi şîrîna xweva ji rojê derbas bûn gelekî dihatê fîrîq bûnê. Camêrekî bejin-balî, pîr maqûl, nêzîkî min bû, bi merîfeteke bilind keyf û halê min pîrsîn. Min sipasîya xwe dayê da.

Me xêlekê hevdûra hewal da. Demekê şûnda ewî got:

-Apê Barî, min du pirtûkêd we xwendine, helbestêd we pîr xweşa min tên. Hîvî dikim, pirtûkêd xwe dinê jî didin, ez bixwînîm.

Ez vebîşîrîm:

-Bira hêca, çi heye, we ew jî xwendine.

Ewî ez mêze kirim û bi lehzeke xasva got:

-Apê Barî, ewekî usane, Hûn nivîsarêd xweye heyî çima nadine weşandinê? Ez kovara “Nûbar”da û rojnama “Jîyana Kurd”da timê helbestêd we dixwînîm, gelekî xas min tên. Hevale jî ser fikra minin.

Min bi zarekî şermoke wîra got:

-Tu rast dibêjî. Helbest û nivîsarêd mine cure-cureye pîrî. Lê halê aborîya girêdayî ez hela ku nikarim wana bidime weşandinê. Ewî gilî da, wekî çiqas nivîsarêd min hene, hemûya bi hêsavêd xwe bide weşandinê.

Min sipasîya xwe dayê ewî.

Ew ji min hîvî kir, wekî em rastî hevdu bîn. Em rastî hevdû hatin. Min hemû nivîsarêd xwe nîşanî wîya dan. Çend helbestêd xwe jê ra xwendin. Ew pîr şa bû. Gilî da, wekî em çê-çar roja şûnda rastî hevdu bîn, tevayî herine weşanxane, serkarîya weşanxanê ra razîbûnê dest bînin. Paşê dest bi şuxulêd xwe bikin.

Telebextra sê-çar roj bûne çend meh. Ewî nehat. Meh îdî nêzîkî salewextê dibin. Lê dîsa ew “mêrxasa” tunene. Nehat û nehat. Ew îdî xwe nîşanî min nade. A, boynet wê jî min bi halekî pîr hêrs ev helbesta bi sernivîsara “**Gazîname**” nivîsî:

**Wedê bostanî ku xange,  
Xweyî wîyî gelek merde.  
Kengê botsan digihîje,  
Xweyî dibe pîr çav tenge.**

Roj bûne meh, yeqîn mehê bê şert, şurût bibine sal,  
We caw nehat, bazirganê gelê minî “merdî”, delal.  
Mêrxas ewe, gilfîyê dan venekişe, xwe mede paş,  
Jiyana me rast û xare, bicedîne, qet nebe şaş.  
Eva dinya pêlekane, gah li jêre, gah li jore,  
Malê dinê pir şirîne, ji can diçe, dayîn zore.  
Mirov wedê dest û pîya dişimite, zû xwe digre,  
Dema ku dev dişimite, qet nikare xwe bigre.  
Dû şevê reş, timî têne gelek sibêd safî-delal,  
Tenê maqûl, esilzade, qîmet didin aqil, kemal.  
Raçevkirin, ew emreke, ji bîr naçe got bêrîya,  
Çilk hildanê, namiçiqe, ji bîr naçe, tu derîya.  
Ez bawer bûm, pirtûkêd min tuyê derxî ji taristanê,  
Ezê hildim, dilekî şa bimeşime Kurdistanê.  
Telebextra, şertê we bû, piçek bûza li ber tavê,  
Heliya, kişîya ewir-ewir, kete nava cevka avê.  
Mêrê xaşmêr, kesê ketî tengaîyê xilas dike,  
Rebê jorîn, li ser wîya sîya xwe tim zêde dike.  
Malê dinê bê îtbare, birê delal, ew namine,  
Berîya gotîye, “Pey xaşmêra, timê navê baş dimine”.

## ÇEND FIKRÊD MIN Û BEYTÊD MIN

Bedewya der xapxapoke, pê ne xape,  
Esil-kokê kûr hîn bibe, hê bê pake.  
Pêşiya gotîye, «Dengê defê dûrva baş tê»,  
Wedê gul ser koka xweye, jê bîna xwaş tê.

\*\*\*

Tew gotina bawer meke, pê nexape,  
Xwe pesinya rind nas bike, hê îtbar ke,  
Xayîna ra nebe hogir, wê te bixêrin,  
Roja teng da, wê bihelin, zû birevin.

\*\*\*

Em hemûyê bar kin, herin ji vê dinê,  
Dest emel be, heta gava ber mirinê.  
Boy zikê xwe nebe dîlê qet tu kesî,  
Bibe şêrê sivra xweye aza, tisî.

\*\*\*

Mitalê kûr zû qut dîkin timê emra,  
Xudan zanin zar-xeysetê lala, kera.  
Keda helal kuta nabe, nekî vira,  
Berê-ber da gel hez nake berzeq, qura.

\*\*\*

Dayîk – çîyakî pir bilind e, dest nagîjê,  
Şîrê helal qet hîlnade tu qirêjê.  
Ew kanîya ku tu veduxî tim avê jê,  
Bihebîne, kevîr, quçka qet navêjê.

\*\*\*

Bav – xezneke têr-tijîye, bêser-bine,  
Bilind bigre tu tim qedrê bavê xune.  
Piçûktî da, wekî hildî torê wîya,  
Sêfîl, hejar tu namînî serê rîya.

\*\*\*

Nav jîyan da bê dost, hogir tu car mejî,  
Durû nebe, pêş murufên têre-tijî.  
Namûs, xîret tacê zêre, bilind bigre,

Xwe nas bike, paşê xwe ra şûnê bigre.

\*\*\*

Cînarê baş lel û durre, nakeve dest,  
Rastî hez be, nebe durû, nekene qest.  
Fisq-fesadî emir nake, ser zû vedîbe,  
Çavê êlê terezûye, ha jê hebe.

\*\*\*

Bilbil çima pir hez dike timê gulê?  
Gul dikare bixemlîne tew bejna wê.  
Ewa kesê hev najbêre xêr-mafê xwe,  
Nav jiyan da tu car nagre şûn-cîyê xwe.

\*\*\*

«Teyrê goşt-xwar nukulgêre», got pêşiya,  
Ka ew kesa, wekî meke qet şaşiya.  
Şaşi hene biçûk, mezin, agir, alav,  
Şaşi hene mewt û jehrin, delk û dolav.

\*\*\*

Çem bê mene bilind nake qet dengê xwe,  
Jan-êşên xwe, elam dike bi zarê xwe.  
Ewa kesê hêşîn nabe ser koka xwe,  
Ew nikare bilind bike nav-dengê xwe.

\*\*\*

Ew weysêta kal û bava dijî heya evê gavê,  
Kurê qenc ra, yê xirav ra, çi pêwîste malê bavê.  
Kurê başê berav bike mal-dewleta bê hed, hesav,  
Heya dinê tewî bidêy, wê belake kurê xirav.

\*\*\*

Giran, sivik, hev birane, xuluqîne herdu rokê,  
Mitaleke, ji wan herda, yekî hilde tu carekê.  
Geh pey giran, geh pey sivik, qet mereve, nebe cewk-cewk,  
Giran rûnêy, nava gelda qedrê teyê bibe gelek.

\*\*\*

Dostaya rast, him şirîne, him jî giran,  
Pir bahaye, wek ronaya herdu çavan,  
Sêva tewe gerek wêya mekî ker-ker,  
Wedê sêra wêya didî, dibe heder.

\*\*\*

Nanê xarî pêpez meke, qet tu cara,  
Rehimdil be, bigre qedrê sêwî, jara.  
Pir giranî, pir paqîşî, merîfete,  
Axa daykê him hêlîne, him cinnete.

\*\*\*

Xêynî meriv hemû bînber dişkên tenê ji ziravî,  
Meriv timê boy kirên xwe, dişkê tenê ji qalimî.  
Dar çiqasî behir dide, berjêr dike ew serê xwe,  
Muruf wedê qalim dibe, unda dike rê-dirbên xwe.

\*\*\*

Xaliq wedê ji bînbera firq kir însan,  
Kir para wî, dinya ronik, hiş û ziman.  
Got: -Agire, xwe navêje, xwe qorî ke,  
Xêr-şer ra xwe, rast fem bike, hê qirar ke.

\*\*\*

Gotin, zane: - Bexteware, tim dizane,  
Gune halê ewî kesî tişt nizane.  
Wedê nezan xwe datîne dewsa zane,  
Derewekê ew digirê herd destane.  
Cî hatinê merûm dibe, qet nikare,  
Pareveke, ceh-alifa du hespane.

\*\*\*

«Kurmê darê ne ji darê be, dar pûç nabe»,  
Nişa helal, tu car, tu wext heram nabe.  
Bîc, minafiq tim darikê pilolêne,  
Tê dernaxî, neyarê kê, dostê kê ne.

\*\*\*

Esil da bed, tu car nabin esilzade,  
Nûra çavên xwe jî bidêy, diçe bade.  
Ji mêrên esil zîyan nayê, tim tev here,  
Roja teng da ewê tenê pişta te be.

\*\*\*

Lawo, libas him baş dibe, him jî xirav,  
Bixebite ruhê xwe va nebe tulab.

\*\*\*

Bax xezneye, av boy wîya qinyat reze,  
Zozan rinde, lê biçêre berx û peze.

\*\*\*

Ewledê baş – xezna tijî, per û baske, xemla dinê,  
Qîymetê wî lel û durre, ew bîrnake qet axa dê.

\*\*\*

Koşk rind dibe, tê da hebe şam û şamdan,  
Ro tune be, bê qîymete reş tarîstan.

\*\*\*

Bedewî – rewşa Rebbê jore, gerek bigrî qedrê wêya,  
Gule rinde, heta ewa neketîye binê pîya.

\*\*\*

Zû hêrs nebe, sebir bike, rûnê giran,  
Aqil heye, dest navêje tevir, kêran,  
Şaşyê piçûk mezin dibin paşwextîyê,  
Timê tînin pir telayî, bedbextîyê.

\*\*\*

«Hurmet, hurmetê tîne», got bavpîra,  
Mêrên mêrxas qet natirse qeyd-zincîra,  
Ewa kesê pêwîst nîne gelê xwe ra,  
Xaliq-alem dixulqîne ewî çira?

\*\*\*

Xwedê çi da, pê qaîlbe, nebê kême,  
Boy bendê xwe ew dişîne şayî-xeme.  
Heçî kesê deyax nake ber emrê wî,  
Xaliq tu car ser wî nake sitar û sî.

\*\*\*

Rê miraza hasil dike,  
Av qirêjê paqîş dike,  
Xebat emra dirêj dike,  
Xebat hez be, ronaya min.

\*\*\*

Berê bi pîv, paşê birêj,  
Mitaleke kin û dirêj,  
Hol ku hate ber kaşa te,

Lêxe, derê nav-dengê te.

\*\*\*

Êvarê da gelek diçin ardû-qirşa,  
Lê sibê zû hindik tînin werîs, terşa.  
Ewa kesê tim hez dike berad, pesna,  
Xêynî vira tişteke tune barê wî da.

\*\*\*

Çi hez nakî, jê dûrkeve, rûnê giran,  
Cî hatinê durr birêje, ez bi heyran.  
Helalyê ra zewal tune, nebe xûndar,  
Nayê veşartin dizî, qavî, him rîya xar.

\*\*\*

Xwedê nas be, nebe dîlê male dine,  
Pir maqûl be, qet hez meke pir xarinê.  
Rê derneyê, kufrê meke, bijî xwe ra,  
Pêşîya gotîye: “Heram dibe, helal xwe ra.”

\*\*\*

Nav emir da giran rûnê, bigre edil,  
Fitê mede pîrsa teda heve qetil,  
Merivhez bî gelê bide xwe dora te,  
Gel mexêre, kes nikare bixêre te.

\*\*\*

Ava zelal şêlû meke, bigre qedir,  
Berîya gotîye: “Tim girane cî da kevîr.”  
Welêt hez ke, boy zikê xwe mede derda,  
Xerîb digrîn, dişevîtin hale xwe da.

\*\*\*

Ew welatê hesin digre dewsa lele,  
Wira nejî, wira meke kar-emele.  
Qîmetê baş, esnaf didin bê fit, reca,  
Xirav nagrin tu car, tu wext başa, qenca.

\*\*\*

Xwe hîn meke binihêrî deva-doza,  
Bê culqeta kes danayne dewsa merya.  
Mêranîyê beyreq bigre her gav xwe ra,  
Tirseke dimrin, egît dijîn qurna-dewra.

\*\*\*

Xwedê te ra du çev dane, mêzeke rast,  
Pêşya qelsa nericife, melîze qest.  
Aqıl rûnê, xeber nede vala-vala,  
Nav êlê da vê te nazkin tim dev bela.

\*\*\*

Xwe hîm neke binêhêrî dev û çeva,  
Bê cûleta kes danayne devsa merya.  
Mêranîyê hurmet anye xwayê xwe ra,  
Tirseke diçin, egît dijîn dîroka da.

\*\*\*

Pir negere kar û xezna, nebe sivik,  
Ulim hîn be hevik-hevik, piçik-piçik,  
Çavbirçî bî, nagehîjî tu tu dera,  
Ulim zîyan nehatiye qet tu cara.

\*\*\*

Tim kedhez be, çav nekute risqê xelqê,  
Bende tune wekî megre qîmetê dê.  
Bihebîne, temene be şîrê sipî,  
Dê kutayî nabe xweyî koda tijî.

\*\*\*

Keda helal rû sipîtîye,  
Bextewarî, hetevîye,  
Lafên bê hiş, pîrbêjîye,  
Sêrî-binî qîrêjîye.

\*\*\*

Pey her şevên reşe, tarî,  
Tê sibeke safî, şeweq.  
Rastî çiqas pêpez bibe,  
Ew namîre, dimîne heq.

\*\*\*

Derew dibe, pî bigire,  
Lê, pê naçe, qet nameşe.  
Pesna xirav, qenc-baş nabe,  
Tore wîya hîm da şaşe.

\*\*\*

Gel ku meşîya, tu bimeşe,  
Aciz nebe, nemîne dûr.  
Gel hez bike, tev gel bijî,  
Hebûna gel qet meke tûr.

\*\*\*

Baş ne eve, şînê tîne,  
Wêran dike milk û wara.  
Baş eve ku, eşqê tîne,  
Şayê dike dilê jara.

\*\*\*

«Şîn û şayî herd birane»,  
Bavpîrên me gotîye zû da.  
Kesên bê ax sergerdane,  
Şûnê nagre ev tu erda.

\*\*\*

Sivikayî êş-mereze,  
Xwe xweyîke timê jê dûr.  
Wekî naynî tiştê teze,  
Bê cî meke qet qûre-qûr.

\*\*\*

Femkir, bêfem herd birane,  
Tev hatine ew vê dinê.  
Femkir xwera kir mal-dewlet,  
Bêfem xwe kir timê rovet.

\*\*\*

«Berxa mêjû nabe beran», got pêşiya,  
Xêr-qencîyê racev meke, dergên mîra.  
Qewm, lezim, heval, hogir, bira pirbin,  
Roja teng da, piştovanin kur û bira.

\*\*\*

Nebe Firqûn, qetlê meke, ey zulimkar,  
Bese, îdî, mal û milka bikî tar-mar.  
Sûra zulmê pêş heqîyê debar nake,  
Dest ji zulma xwe vekişîne, dila şake.

\*\*\*

Eslzade sêfîl dibe,

Lê eslê xwe unda nake.  
Bedesl wedê zor, zexm dibe,  
Rê-dirbên xwe zû şaş dike.

\*\*\*

Xîretkêşî mêranîye,  
Cî hatinê xwe nede paş.  
Boy xîretê têne kuştin,  
Bok û beran, tim mêrêd baş.

\*\*\*

Çemê gorav qet metirse,  
Tu bitirse ji çemê nerm,  
«Mêr mirinê nav dimîne,  
Ga mirinê dimîne çerm».

\*\*\*

Nav jiyar da bike edet,  
Rabe, rûnê, aqil, giran.  
Delalê min, qet bîr meke,  
Peşîya zimîn hene diran.

\*\*\*

Rebbê jorîn fikirîye,  
Bendê xwe ra sê tişt şandiye:  
Denge, aqil, bedewîye,  
Kesêd bê wan ne zindîye.

\*\*\*

Qenc û xirav tev tîn jor da,  
Zar bê tore nabin dê da.  
Wekî hoste emilî be,  
Behra wîyê naçe feda.

\*\*\*

«Karê çi ar», - gotin zû da,  
Ruza têye ji Xwedê da.  
Berê Xaliq dayînê be,  
Tûrik xuber tijî dibe.

\*\*\*

Bext hatinê, bêhiş dike zire-zire,  
Guhdar dibên, devê camêr zêr dibire.

Bext ku raza, zane dirêj lel û durre,  
Guhdar dibên, bese bikî vire-vire.

\*\*\*

Mêranîyê qet napîvin ritil, mêt ra,  
Culetê baş, girêdaye eslê xas ra.  
Wekî haveyn çê bû be ji nişa helal,  
Behrê bibe, safî, paqîş, him jî zelal.

\*\*\*

Cî hatinê tu metirse, xeberde rast,  
Pêş nepaka nebe duqat, nekene qest.  
Namûs bijî, bigre qedrê tim heqîyê,  
Def-dewete bimirî seba mêranîyê.

\*\*\*

Meclîsa da rabe, rûnê aqil, giran,  
Qet bîr meke pêşya zimîn hene diran.  
Bikêlime, durr birêje, ez bi heyran,  
Lêv çi bikin, wekî cî da nîne ziman.

\*\*\*

Ewlad bed bû, merûm nebe pêş hogira,  
Deng dernayê hev nakevin du dest hevra.  
Mezinê welêt wekî bibe bê hiş, sewda,  
Neyarê wî bixenqînin cî da, xew da.

\*\*\*

Xevathez be, gav û roja mede paşda,  
Bibe neynûk, qet hilnede tu car telpa,  
Hut cewka da naxuliqin, nabin peyda,  
Wan bigere, behrên mezin, avên kûr da.

\*\*\*

Qijik çiqas qale-qal ke, unda nabe eslê bilbil,  
Pîj çiqasî boyax bikî, tu car nabe ewa sorgul.  
Pîra rizî çava kilke, çiqas meke mêj û zikir,  
Îdî sala hukm daye, ewa nabe keça bikir.

\*\*\*

Berê-ber da weysêt kirine kal û bava,  
«Murvêd zane nakevin bin piîn, kulma».  
Cînar hur bû jê dûr keve, nebe hogir,

Jîne nabe, eger nebe av û agir.

\*\*\*

Roj ku qenc hat, kubar nebe, pir nebe hur,

Tim helal be, nebe dîlê tu lel û durr.

Timah gire, wî qenc nake tu car loxman,

Kirnên bedew unda nabin sal û zeman.

\*\*\*

Av nedîtî kinca mexe, hene avên kûre tenîsk,

Cem rojêd baş pirin rojêd reşe tofan, him bêbelîsk.

Qezîya ku hat, nebe lolep, mitale ke aqil, giran,

Qaf dizêre, wedê cî da nasekine bê tirs ziman.

\*\*\*

Bê bexta ra nebe hogir, bawer meke sondê wana,

Bibin çîya, ser kesî da danazile sîya wana.

Kurê bav baş bixalife, çiqas derê rêça xune,

Çilî şûnda, vedigere dîsa rîya bawê xune.

\*\*\*

Namûs-qîret tacê zêre,

Ziman şerbet, him jî jehre.

Aqil rabî, aqil rûnêy,

Tu car nabî êlê dere.

\*\*\*

Jiyan behra tenîsk nîne,

Rastî nav da gula bîne.

Derew wekî lel û durr be,

Kesek wîya nahebîne.

\*\*\*

Esil xasî şerte zû da,

Firsend ku hat, mede bade.

Pêşîya gotîye, «Rastî timê,

Xas birincê, dema xwe da».

\*\*\*

Dil şûşeye, wî ker meke,

Mêranîyê qet bîr meke.

Tirseker hers be, jê metirse,

Dewa wîya sewa zike.

\*\*\*

Gulekêva bahar nabe,  
Zivistanê îtbar nabe.  
Kaniya şorik şîrîn nabe,  
Çemê kûr bê delav nabe.

\*\*\*

Kaltî, pîrtî kubar-rewşe,  
Paqîşayî – nîgar, nexşe.  
Kasivayî etib nîne,  
Qelpî, qelsî, rîya şaşe.

\*\*\*

Wedê xirab hate dinê,  
Gel nizan bû navê zulmê,  
Paşê xirav xwe ediland,  
Mexlûqetî timê zêrand.

\*\*\*

Gurik buxwe şîrê mîya,  
Nabe berxê nav kerîya.  
Bibe perik bawer meke,  
Xuluqîye boy qezîya.

\*\*\*

Bedesila tîmar dikî,  
Emekê te diçe bade.  
Toxomê wî direşînî,  
Tenê mewtê, jehrê dide.

\*\*\*

Esilzade çiqasî jî,  
Bihecire, bibe hejar.  
Sifetê wî nûr dibare,  
Kilyameta zêr tîne zar.

\*\*\*

Xwîna kê da çi hebe,  
Zû û dereng dide dere.  
Çi libasî lê dikî, lêke,  
Ker dimîne, dîsa kere.

\*\*\*

Rewşa çîya gul û sosin,  
Çem û kanî, belekîne.  
Bendekîra Xwedê ku da,  
Kes nikare jê bistîne.

\*\*\*

Bedewîya heq pir pêvîste,  
Zikmakî da gerek hebe.  
Kil û kilçîk, reng lê danê,  
Ne rind tu car bedew nabe.

\*\*\*

Çem nakişin, nakin xuşîn,  
Ji kanîya hilnedin av.  
Mêranîyê, camêrtîyê,  
Tu car nakin kesê bê bav.

\*\*\*

Bextewarî gelek başe,  
Nabe para her kesîye.  
Xaliq-alem heta dawîyê,  
Ser tu kesî nake sîye.

\*\*\*

Beriya gotîye: “Êşa hubê,  
Tenê zane dilê bengî.”  
Xwezila min ewî kesî,  
Jê nedîtiye telî, tengî.

\*\*\*

Kilam xwaşe nava gel da,  
Wekî wêya dengbêj bêje.  
Zîyan, xeta tu car nayê,  
Ji dostaya bê qirêje.

\*\*\*

Dara bê reh, tim bê sîye,  
Ew hişk dibe gelekî zû.  
Diz nareve, qet nabeze,  
Wekî xweyî nekeve dû.

\*\*\*

Hişîyarî mêrxasîye,

Mal dewlete, xezna tijî.  
Ewa kesê firsenda xwe  
Dide fûte, dirêj najî.

\*\*\*

Dostaya gur tevî mîyê,  
Heta şivan razanêye,  
Hevaltîya qelp-xayîna,  
Heta firsend hatinêye.

\*\*\*

Êl wî çaxî tê hesavê,  
Qedir, qîmet, êla giran,  
Wekî wê da gihiştine  
Maqûl, zane, boke-beran.

\*\*\*

Hezkirina heq û helal,  
Emrê şîrîn, roja geşe.  
Kesê wêya maye bê par,  
Nav emir da pir roj reşe.

\*\*\*

Ax xezneye, wekî bigrî,  
Ezet, hurmet, qedrê wêya.  
Ked pir dibe, kuta nabe,  
Wekî ser be çave xweya.

\*\*\*

Daristana bê şêr, xezal,  
Ewa qet ne daristane.  
Deşt wê hînge pir bedewin,  
Ku lê hebin bax-bostane.

\*\*\*

Gulê bide ewî kesî,  
Wekî gulê ew hez dike.  
Hubê bide ewî kesî,  
Ewê hubê nizim meke.

\*\*\*

Nanê xwe bide ewî kesî,  
Piştî xarinê bişêkrîne,

Ruhê xwe bide ewî kesî,  
Wekî welêt dixemlîne.

\*\*\*

“Xwe” kiriya derman tune”,  
Berê-berî da got pêşiya.  
Qedir-qîmet tê hildanê,  
Wedê dost ji dost êşîya.

\*\*\*

Nav jiyan da merivhez be ,  
Bibe dostê rast, helala.  
Ewa kesî bê aqile,  
Dikeve nav du delala.

\*\*\*

Merhemetî, him esnafî,  
Boy her kesî gelek başe.  
Ewa kesa gelek najî,  
Ku girtîye rîya şaşê.

\*\*\*

Xeberdana bê cî, vala,  
Tu car nayne pir hurmetê.  
Ewa gelê zû unda be,  
Avîtîye erf-edetê.

\*\*\*

Delalê min, gel xezneye,  
Çi bixazî tê da heye.  
Ji hemêza gel derneyê,  
Ew xudanê sere teye.

\*\*\*

Malê xelqê ne yê teye, pê şa nebe,  
Hevalê xwe bicerbîne, hê amin be.  
Pêşiya gotîye: “Her saetê hukmek heye,  
Lêyî ku tê, gir-hûr timê diçin teve.

\*\*\*

Te çav reşê, dil xuş-xuşê,  
Zozan xaş bûn deşta Mûşê.  
Ezê terka çavên belek,

Buryên qeytan, dêmê gulî,  
Dev-diranê şêkir nadim,  
Heta guhê min da neyê,  
Lore-lora vê dergûşê. (gelirî)

\*\*\*

Heçî kesê gel ra tîne,  
Ezab, ezîyet, xiravîyê.  
Rebbê jorîn ji nava gel,  
Ewî hilde gelek zûyê.

\*\*\*

“Emrê rojêd pir xirav,  
Zû kurt dibin” – gor pêşiya.  
Ewa kesî cinnetîye,  
Wekî kes jê ne êşîya.

\*\*\*

Ew gilîyê zîyan jê tê,  
Bipeçine, ser veneke.  
Xaliq-alem stûyê neheq,  
Tim dide ber şûrê heqe.

\*\*\*

Dev-dikane, wekî bibî xweyî-xwedan,  
Kirnêd qirêj ber derê te dibin mêvan.  
Lêyî ku tê, ew holdike sivik, giran,  
Ji avka nerm tu bitirse, ez bi heyran.

\*\*\*

Mirin, şeref-şane, wekî bê wede da,  
Şîn û giryê tevî êlê eyde zû da.  
Lez mekeve, giliyê paşê nebê pêş da,  
Gulpe ku çû, ewa îdî nayê paş da.

\*\*\*

Qet bîr meke, tu şîretê tew bapîra,  
Gur berx be jî, wîra nebe tu car bira.  
Hesin milke, bikelînî nav êgir da,  
Xeyd tim heye nava ruhê jinabî da.

\*\*\*

Wekî avjen biçerçire,

Wê dur derxe binê berê.  
Eger gul zû neçilmise,  
Bilbil nake xem-kederê.

\*\*\*

Neyarê har em helandin,  
Ser pišta me aş gerandin,  
Dê û xûşkêd me zêrandin,  
Kes hale me ne şewitî.

\*\*\*

Teyrik û tû li me geryan,  
Kevir-kuçik boy me helyan,  
Hêsrê me bûn dehir, kişyan,  
Felek me ra xayîn derket.

\*\*\*

Avên zelal me miçiqîn,  
Dev-diranên me zeliqîn,  
Kur û keçê me feriqîn,  
Felek me ra xayîn derket.

\*\*\*

Bextê Kurda tim razaye,  
Elba destê wan rijyaye,  
Ew ne bûne bê qezyaye,  
Heta kengê ewê wa bin.

\*\*\*

Erş û kursî me teng kirin,  
Per û basked me jêkirin,  
Şêr-şenbazê me qutkirin,  
Em zelûl bûn, wan kêfkirin.

\*\*\*

Ceş û faşa em firotin,  
War-hêlîna em qetandin,  
Serê rîya em gerandin,  
Ew bûn mal-milk, em man bê ax.

\*\*\*

Xwedê ji me heznekiriye,  
Cefê me tim zêde kiriye,

Dûrva li me mêze kiriye,  
Em vê dinê kuda herin.

\*\*\*

Best-beyarê me şewitîn,  
Erf, edetê me lewitîn,  
Em ji emir ne qewitîn,  
Em bûn sêwî, neyar kêf kir.

\*\*\*

Xaliq boy me bû dêmarî,  
Rîya me bû sirîn-dirî.  
Neyar ziman li me birî,  
Em çilmisîn, wî per veda.

\*\*\*

Zevî me çand, me jê nexar,  
Axa xwe da em man bêpar.  
Nekenîya tev me bahar,  
Xwezil em qet nexulqiyana.

\*\*\*

Zer û zinar lihêfa me,  
Zindanê sar bûn para me,  
Neyar zevt kir tew axa me,  
Kesî negriya qey halê me.

\*\*\*

Cem me rûnişt, tev me nan xar,  
Em xevitîn, wî hilda kar.  
Mala me da bû gurê har,  
Em dizêrin, ewa dijî.

\*\*\*

Tew aza bûn, em mane qûl,  
Jan û êşa em kirin xûl.  
Welat li me kirin çar zûl,  
Heta kengê emê wa bin.

\*\*\*

Bila kûrbîn, bila berbîn, derya û çem,  
Bila dûrbîn, bila nebin keder û xem.  
Xwezil keç-xort qet nebînin dewa-doza,

Xwedê mezin timê bide risq û ruza.

\*\*\*

Rê-miraze, wekî têda rast bimeşî,  
Zozan xwaşin, herke hebin tevin-teşî.  
Çiqas buxe, qet têr nabe berxa mêjû,  
Wî wirnîtî nedîtîye çiçkê tijî.

\*\*\*

Tim karger be, bê kar, emel negere vala,  
Hîm be, hîm ke, derbaz bibe ji hevala.  
Senetkar bî, birçî nabî tu tu cara,  
Bî ra, rusqet tuye bijî hemû dera.

\*\*\*

Dev dikane, wekî bibî xwayî, xudan,  
Kirinê ne pak ber dergê te dibin mêvan.  
Dehrên gurav tim holdikin pelên giran,  
Ji ava nerm tu bitirse, ez bi heyran.

\*\*\*

Mer û mele hasil dikin herd jî jehrê,  
Mele kete bin kevira, ne hat xanê.  
Mer şûşilî, xwe avîte hemû dera,  
Lema îro wî ditirse tamam dinya.

\*\*\*

Ruvî jî tev terewila hate dinê,  
Boy zikê xwe şev û roja xwe kir finê,  
Ew nas kirin kana vira, delka, fêla,  
Lema îro ew dikşîne êşa dila.

\*\*\*

Hemû qezya şîv-şekirin bên wede da,  
Şîn û giriyê tevî êlê eyde zû da.  
Lez mekeve, giliyê paşê nebê pêşda,  
Gulle teqiya îdî nayê ewa paşda.

\*\*\*

Mezin mal da stûna zêre, bikin hurmet,  
Wan tewavkin, bikin van ra qedr-qîmet.  
Wana şakî, zelûl nabî tu wext, tu car,  
Wedê kal bî tuyê bibînî qedir-îtbar.

\*\*\*

Xirava ra nebe heval, wî dûr be zû,  
Nevsêd qirêj cî hatinê dibine mû.  
Wekî hildî tu şîretê pîra, kala,  
Tuyê bibî xweyî ewled, mal û hala.

\*\*\*

Nav emir da xwe nas bike, bibe giran,  
Pêş bedewa nebe lolep, nebe dêran.  
Bavpîrên me weysêt kirine hê qedîmî,  
«Rindî sêve – alîk başe, alîk kurmî».

\*\*\*

Zivistanê cî guhezkî nabe bahar,  
Jehr hasil be, jê dernayê gulav tu car.  
Bedesla ra hemêza xwe meke sitar,  
Kutasîyê jê nabînî bext û îtbar.

\*\*\*

Av gur dibe, him jî nermik,  
Dar şîn nabin, nebe dendik.  
Wekî dendik cîda xas be,  
Behir dibe şîrîn, rindik.

\*\*\*

Hemda fire gelek başe,  
Nav renga da gevez rewşe.  
Wî mênî ra mên dibêjin,  
Ji gotinêd xwe venakişe.

\*\*\*

Dilî, dil be, ew pir başe,  
Gustîl bê qaş, a bê rewşe.  
Karê zorê başî nayne,  
Dawî time roja reşe.

\*\*\*

Kurêm bibe hostê dila,  
Rabe, runê tev aqîla.  
Zane rewşa rû erdêne,  
Ji wan nayê tu car bela.

\*\*\*

Dûr û nêzîk mêze bike,  
Dinê hîn be, xwe mêzeke.  
Gotnê zemîn hilde hesêv,  
Te dest çî kir, wî xilazke.

\*\*\*

Çî dane te, nebê bese,  
Nav emir da bibe kese.  
Mêranî boy hemya nîne,  
Mêr ji mêra dibin ese.

\*\*\*

Tore rewşa tim însîne,  
Bê toreya, hare, dîne.  
Hîmê tore ku cîda baş be,  
Kes zîyanê jê nakşîne.

\*\*\*

Lawo, meke xwe derober,  
Dûr be karê vala heder.  
Eger gotina mezna bikî,  
Tuyê bilind bî, çendik, çend ser.

\*\*\*

Lawo, dila qet meşkêne,  
Dil şûşeye, tu meşkêne.  
Çûk-mezina tim hez bike,  
Qelbê kesê, tu meşkêne.

\*\*\*

Rê da here, bila dûr be,  
Têkev delav, bila kûr be.  
Gotina beriya tu bîr meke:  
“Qîzê bîne, bila pîr be”.

\*\*\*

Nav emir da nebe pir bêj,  
Tim ser xwe be, nebêjin gêj.  
Wekî tu xwe aqil bibî,  
Ser navê te nayê qirêj.

\*\*\*

Delalê min, qet sist nebe,

Bê sût-gune, tu sist nebe,  
Mêranîyê qet bîr meke,  
Pêş her kesî, tu sist nebe.

\*\*\*

Kuro, lawo, qet bîr meke,  
Rojên çûyî, tu bîr meke.  
Wedê Xwedê te ra ku da,  
Sewî, jara qet bîr meke.

\*\*\*

Ber sur, sermê de yax bike,  
Ber tel-nîça de yax bike,  
Gir ku kete destê te da,  
Ça dixwazî, usa bike.

\*\*\*

Torin, zorî, kurê min,  
Xemil, morî, kurê min,  
Hemû kura rindtirî,  
Rewş-nîgarî, kurê min,

\*\*\*

Delalê min, cuda nebe,  
Êlê, ovê, cuda nebe.  
Kê cuda dibî, tu dizanî,  
Ji axa xwe, cuda nebe,

\*\*\*

Delalê min, bege bike,  
Xwedê çi da, bege bike.  
Dixwazî gel te hez bike,  
Tim gelê xwe bege bike.

\*\*\*

Lawo, gul ser kokê başe,  
Qiztî, xortî, gulê geşe.  
Bavpîrêd me rast gotine:  
“Kaltî, pîrtî, roja reşe”.

\*\*\*

Xwediyê devê xwe be,  
Tevî şuxulê kesî nebe.

Kengê tişteke ji te pirsîn,  
Derheq xwe da xeber bide.

\*\*\*

Her gilîkî, menek heye,  
Her birînê, melhem heye,  
Dermanê xwe-xwekirîya,  
Vê dine da qet tune.

\*\*\*

Xwezila min wî kesîye,  
Ser axa xwe rûniştîye.  
Ax namûse, ax xîrete,  
Ew hemêza dayka wîye.

\*\*\*

Delalê min, pir ne beze,  
Tev her kesî, tu ne beze.  
Kîbûna xwe, qet bîr meke,  
Nakeve nav şîklê teze.

\*\*\*

Dêlalê min, tim maqûl be,  
Pêş rastîyê her gav dîl be.  
Rastî namire, ne jî dişkê,  
Ji qalimî meriv dişkê.

\*\*\*

Lawo, însaf nîvê dîne,  
Bê însafî qet baş nîne.  
Bê însaf, ji dîne dere,  
Hebûna wî mewt û jehre.

\*\*\*

Hişkî, hişke, ew nerm nabe,  
Birîn bê wext, qet der nabe.  
Eger Xwedê ji te hez ke,  
Mal-dewletê para te be.

\*\*\*

Delalê min, rûnenê,  
Bê kêr, betal rûnenê,  
Gav û sihet bişuxule,

Karê hilde, rûnenê.

\*\*\*

Delala min, Dihokê,  
Wer em herne Dihokê.

Li ser axa kal-bava,  
Em tev bijîn xêlekê.

\*\*\*

Delala min, van çîya,  
Tev bigerin van çîya.  
Gelekê nolî min, te,  
Rêkirine van çîya.

\*\*\*

Jin ku heye, parsîya xare,  
Jê venegerî, gura hare.  
Wekî weya bilind bigrî,  
Te mêl nake, ew tu care.

\*\*\*

Mêvan rewşa malêye,  
Ruzê wî ji Xwedêye.  
Mala mêvan nayênê,  
Kelefeke li serê rêye.

\*\*\*

Kurê, gosraq û jîr be,  
Dest emelî, tevdîr be.  
Lawo, senet baznê zêre,  
Senetekî xwe ra hîn be.

\*\*\*

Şuxul kirinê, lez mekeve,  
Firsend ku çû, pey mekeve.  
Qelpî şênê mêra nîne,  
Ji nav êlê dernekeve.

\*\*\*

Kanîyê meye sarincin,  
Xortêd meye pir qencin.  
Pêş neyara natewin,  
Dil paqîşe, bê wecin.

\*\*\*

Dîroka min qedîme,  
Boy axa xwe ez tîme.  
Axa ketiye dest seka,  
Nadin min destûr, heqa.

\*\*\*

Tofana merya metirse,  
Ava gefe-gur metirse.  
Tofana Xwedê ku rabû,  
Tenê ji wê tu bitirse.

\*\*\*

Lawo, cînarê baş biraye,  
Ruza dayî tek Xwedaye.  
Wekî cêva te tijî be,  
Dinya, alem birê teye.

\*\*\*

Firsenda xwe mede kesî,  
Merhemet be, meke pîsî.  
Kesê ruzê te dibire,  
Xwedê wîra bike pîsî.

\*\*\*

Lawo, bê kêr megere,  
Tev xirava megere.  
Dayîna Xwedê qaîl be,  
Çîl, bedewa megere.

\*\*\*

Gul bedewe, wê bîn hebe,  
Zozan xaşê, lê berf hebe.  
Mirovê xirab boy gel bare,  
Xwezil ewa qet tunebe.

\*\*\*

Çîyayê bilind berf zû tê ser,  
Mêr welatê xwe naçe der.  
Bê fem bibe zêrê zer jî,  
Gel nas dike ewî heder.

\*\*\*

Lawo, derga girê mede,  
Firsend ku hat, xwe paş mede,  
Dayna Xwedê carek dibe,  
Çi şandîye, ewî hilde.

\*\*\*

Kurê m, timê ava bike,  
Ava tu car xirav meke,  
Wekî dû xwe rêç bihêlî,  
Gelê te tim bilind bike.

\*\*\*

Her kenayî tu mexape,  
Her kesî ra nebê pake.  
Ewil hogirê xwe hulkute,  
Paşê wîra bêje pake.

\*\*\*

Tu dixwazî timê bijî,  
Xwe boy welêt bike rijî.  
Li kodika vala mexe,  
Tu kodika xweye tijî.

\*\*\*

Delav nabin bê amine,  
Êla mirî, serkar tune.  
Serkar rênîş, hiş, mejûye,  
Ew keffîlê her kesîye.

\*\*\*

Her kesî ra nebe heval,  
Nav şuxul da wî meke qal.  
Berê hîn be eslê wîya,  
Paşê ewî banke tu mal.

\*\*\*

Lawo, xayîn gurê hare,  
Ew bê bexte, bê îtbare.  
Firsend kete destê wîya,  
Wê bihêle te bê ware.

\*\*\*

Rojê fire hogir pirin,

Gur xenêqe, gef û gurin.  
Wedê ku tê gava giran,  
Gotinêd wana hemû virin.

\*\*\*

Bira, pismam piştovanin,  
Li vê dinê tew mêvanin.  
Pariyê dawî bide wana,  
Xweyê roja te giranin.

\*\*\*

Keça delal diçû rê da,  
Min gul çinîn kir pêşê da.  
Qelp-xayîna îmkan neda,  
Dest bavêjim ez dawê da.

\*\*\*

Delalê min, bigere,  
Nav êlê da bigere,  
Êlê ra xizmet bikî,  
Êlê te tim bigere.

\*\*\*

Lawê, time tu şêr be,  
Dest emelî, bi kêr be.  
Şêr dimînin timê şêre,  
Beyto tu car nabin mêre.

\*\*\*

Delalê min, megirî,  
Boy her tiştî megirî.  
Şuxulê xwe mehkem bigre,  
Dawîyê pey megirî.

\*\*\*

Lawo, mêranîyê venekişe,  
Xirav bavêj, qenc venekişe.  
Wekî êla xwe, tu bihebînî,  
Êl bêje, lawekî çiqas başe.

\*\*\*

Delalê min, pîrozbin,  
Cek-cilên te pîrozbin.

Wekî karê medî gel,  
Gel navêje, pîrozbin.

\*\*\*

Rîya Xwedê rast heqîye,  
Mezhebê baş şafîqîye.  
Bê hezhebî dîna dere,  
Berê-berî da xwelî sere.

\*\*\*

Lawo, ku çû, mede dû,  
Bext ku raza, mede dû,  
Tu Xwedê xwe bîr meke,  
Wê bê rehmê dereng, zû.

\*\*\*

Delalê min, genî man,  
Avê gola genî man,  
Egîta şuxul kirin,  
Dûmeka da genî man.

\*\*\*

Delalê min, gul hebin,  
Hezar, hezar gul hebin,  
Ji gulê welêt bîntir,  
Bawer nakim, gul hebin.

\*\*\*

Delalê min, dûr meçe,  
Ji gelê xwe dûr meçe.  
Eger gel te bilindke,  
Hezar neyar jî hêçe.

\*\*\*

Lawo, neyar nabin dost,  
Her kesî ra nebe dost.  
Dostî giran û zore,  
Dinya time bi dore.

\*\*\*

Delalê min, gund rinde,  
Qenc, xirav gund rinde.  
Wekî tux we rê nebî,

Wê te derxin ji gunde.

\*\*\*

Lawo, qinyat şîrê dêye,

Qels, mêrxasî şîrê dêye.

Kî dikeve rîya xirav,

Nelet tînin şîrê dêye.

\*\*\*

Lawo, time tu qenc be,

Merhemet be, dil qenc be.

Dinê tewî bidine te,

Fexir meke tu qenc be.

\*\*\*

Delalê min, pêşmerge be,

Welat hez ke, pêşmerge be,

Hebs-zindana bihewmîne,

Bi çek, sîlah, pêşmerge be.

\*\*\*

Lawo, şaşî ne başe,

Kîna qirêj ne başe.

Tu ku dîlê êlê bî,

Êlê bêje çi başe.

\*\*\*

Lawo, sêwîyî tim xofgire,

Pir nedîtiye, dibin xore.

Beriya gotîye: “Minafiqî,

Ji rastîyê gelek dûre.”

\*\*\*

Kurêm, aqil – lel û durre,

Zîyan tê ji hêrsa pire.

Pêşiya gotîye: “Sed bipîve,

Hilde, dayne, hê bibire”.

\*\*\*

Derdê hubê pir girane,

Ew derdekî bê dermane.

Kesê ketiye wê merezê,

Him merûme, him dêrane.

\*\*\*

Delalê min, her gav hîm be,  
Ji mezina timê hîn be.  
Qîztî, xortî cewahire,  
Bila ew bê qîmet nebe.

\*\*\*

Delalê min, ka warê me,  
Kanî şênî, ka kanêd me.  
Neyar kirî, neyar firot,  
Tiştêk nehîşt ewî boy me.

\*\*\*

Cellad pî xist nav axa me,  
Qetl kir wî kur-keçêd me.  
Heta nika bidî dine,  
Dihelîne hebûna me.

\*\*\*

Delalê min, gelo çima?  
Hatî diçin, gelo çima?  
Azabûna welatê me,  
Li ser milê lawê çê ma.

\*\*\*

Delalê min, me tişt nedît,  
Hatin dinê, me tişt nedît.  
Dinê tijî, him vala bû.  
Xêynî doze, me tişt nedît.

\*\*\*

Delalê min, dinya kane,  
Geh ahile, geh jî cane.  
Şereze be, lê bigre cî,  
Bê par nabe tu car zane.

\*\*\*

Şirîn, şerbet, welate,  
Hêlîn, qinyat, welate.  
Kesê ku jê bê pare,  
Bê şûnî, bê qewete.

\*\*\*

Delalê min, berf helîya,  
Deşt, zozana berf helîya.  
Ber tel-niça deyax bike,  
Bila nebên ew helîya.

\*\*\*

Lawo, kesî meêşîne,  
Cî ku hat, xwe nehêvşîne.  
Mirovê ku te venagere,  
Wî bispêre gola şîne.

\*\*\*

Delalê min, merekê,  
Ruza tê ji merekê.  
Mirovê bê hiş, sewda,  
Şûn nagirin derekê.

\*\*\*

Delalê min, bazirgan be,  
Bi qinyatî, bi îmkan be.  
Gel ku kete tengasîyê,  
Bila ew te bi guman be.

\*\*\*

Delalê min, ew şûre,  
Dest navêje, ew şûre.  
Dest bavêje qelemê,  
Buhuriye wedê şûre.

\*\*\*

Delalê min, hêdî-hêdî,  
Bulukume, hêdî-hêdî.  
Firsend ku hat, lez mekeve,  
Cîyê xwe bigre hêdî-hêdî.

\*\*\*

Em herine Amedê,  
Gul bivine Amedê.  
Çek û sîlaha hildin,  
Aza bikin Amedê.

\*\*\*

Delalê min, ev doze,  
Jê vegere ev doze.  
Meriyê aqil û kemal,  
Tu car nakin dew-doze.

\*\*\*

Kuro, lawo, hol meke,  
Barê giran hol meke.  
Wekî aqil, kemal bî,  
Welleh, kes te hol nake.

\*\*\*

Delalê min, vî alî,  
Derbaz bibe vî alî.  
Boy keçikê gundê we,  
Heliyan xortê vî alî.

\*\*\*

Sêfîl û hejarim ez,  
Bê zimanîm, lalim ez.  
Welatê min bûye çar ker,  
Bê pişt û bê sitarim ez.

\*\*\*

Kaka, fîka, tu mexape,  
Zarê şîrîn qet mexape.  
Serwextîyê dest bernede,  
Dewleta pîr tu mexape.

\*\*\*

Hemû gotina bawer meke,  
Giran rune, xwe sivik meke.  
Mena gilîya kûr hîn bibe,  
Paşê qîrar qebûl bike.

\*\*\*

Xwedê ev çi hale, te em kirinê,  
Bîr kûr veda te, em avîtinê.  
Gelê dine hemû kirin aza,  
Me jî derxe ji wan dewa, doza.

\*\*\*

Mivtexarî tim vedreşe,

Rîya xirav timê şaşê.  
Malê xelqê zorê xarî,  
Dawîyê da zexm diqoşe.

\*\*\*

Zulum erdê qet namîne,  
Qencî namre, tim dimîne.  
Ew kesa qencîyê dike,  
Dû wî navê baş dimîne.

\*\*\*

Dest navêje her hêlînê,  
Her hêlînê xudan heye.  
Îtbar meke malê dinê,  
Kasivayî timê heye.

\*\*\*

Xayîna ra nabe hogir,  
Rû medê da meke gir.  
Firsend kete destê wîya,  
Wê bavêje te nav agir.

\*\*\*

Delalê min, evraz hene,  
Dû evraza, berjêr hene.  
Bixebite berjêr nebe,  
Berjêr bûya hurmet tune.

\*\*\*

Kuro, lawo, binihêre,  
Bin pîyê xwe binihêre,  
Ev dinyaye ne xalîye,  
Qenc û xirav hev bijbêre.

\*\*\*

Nav emir da nebê ezim,  
Wedê karê nebê ezim,  
Tim destê ser desta hene,  
Altke, paşê bêje ezim.

\*\*\*

Neyar kir em vî halî da,  
Dizêrin em vî halî da,

Rebbê jorîn rica dikim,  
Me nehêle vî halî da.

\*\*\*

Lawo, timê bibe zindî,  
Her gav bike şuxlê cindî.  
Karê baş tê xaşa hemûya,  
Ser başayê çê bûye dinya.

\*\*\*

Çiqas jor bî, jêr mêzeke,  
Jêr ketinê qet bîr meke.  
Timê pêş gel temenne be,  
Gelê tu car te bîr meke.

\*\*\*

Her kesîra nebe hişke,  
Boçika da mexîşike.  
Kesê başka dihesire,  
Qedrê wîya weke mişke.

\*\*\*

Hêrs belaye, tim jê dûr be.  
Hevsûdîyê her gav dûr be.  
Tu dixazî rihet bijî,  
Kesên xirab timê dûr be.

\*\*\*

Neyar tu car nabin doste,  
Rê kin nabin, wek buhiste.  
Tu ji xwe ra cî bibîne,  
Bila nebên, ewa poste.

\*\*\*

Berê buxê, paşê birêj,  
Nanek zêde bide nanpêj.  
Tu dixwazî bê leke bî,  
Nekeve nav şuxlê qirêj.

\*\*\*

Lawo, xirav tu dûr here,  
Qirarê xwe neguhere.

Helal rabe, helal rûnê,  
Helalî tim gula pere.

\*\*\*

Heyran bêjî, poşman nabî,  
Heqyê hezkî, poşman nabî.  
Maqûl rabî, maqûl rûnî,  
Nav emir da poşman nabî.

\*\*\*

Dewrê çi got, ewî bike,  
Pîyê zulmê timê jêke.  
Emrê zulmê dirêj nîne,  
Heta te tê, wê zû rêke.

\*\*\*

Kurêm, metirs, delave,  
Nêzîk were, delave.  
Hemû bendê Xwedêne,  
Xeysetê pîs xirave.

\*\*\*

Derî, derîyê şêrane,  
Gotin, gotina mêrane.  
Serkar, wekî ser xwe be,  
Êlê nakin wêrane.

\*\*\*

Delalê min, şîrîne,  
Tel qet nabe şîrîne,  
Wekî hezkirin hebe,  
Tel jî dibe şîrîne.

\*\*\*

Kurêm, were bêrîyê,  
Mêze bike bêrîyê,  
Xêr-bereket top bûne,  
Nav kevirê bêrîyê.

\*\*\*

Delalê min, ez çemim,  
Kûr tenîskim, ez çemim.  
Wedê ku te nabînim,

Kulî, derdî, pir xemim.

\*\*\*

Cuda neji tu ji êlê,  
Xizmetkar be tu boy êlê.  
Neyar bila zef û zefbin,  
Pişt bikute tu bi êlê.

\*\*\*

Delalê min, roje tenge,  
Hal girane, roje tenge.  
Wedê şa da tu dizanî,  
Piştam bigre roja tenge.

\*\*\*

Beriya gotîye: “Gul başe,  
Sosin başe, gul başe.  
Çavbirçîbûn mereze,  
Însaf, murvet tim başe.”

\*\*\*

Delalê min, hîv ker bû,  
Ber kelîya, hîv ker bû.  
Gelek millet ker-ker bûn,  
Milletê min ker ne bû.

\*\*\*

Delala min, were mal,  
Mexeyîde, were mal.  
Hevhezkirin ku hebe,  
Mal da nabin dew û qal.

\*\*\*

Keçê delal, baharê,  
Gula baqke baharê.  
Bavpîrêd me rast gotîye:  
Xew şîrîne baharê.

Delala min, payîzê,  
Behrê hilde payîzê.  
Dê û bavê rind naske,  
Paşê bistîne qîzê.

\*\*\*

Delala min, tu cara,  
Melûl nebe, tu cara.  
Wekî yar te hez bike,  
Te navêje tu cara.

\*\*\*

Çîya pişta çîyane,  
Çem dergûşêd kanyane.  
Kesê xirav, yanî qenc,  
Nas dikin bi eslê wane.

\*\*\*

Lawo, dosta gazîke,  
Egît, şêra gazîke.  
Wedê şuxul kirinê,  
Berê êlê razîke.

\*\*\*

Delala min, dûman hat,  
Baran barî, dûman hat.  
Kevin dernexe ji holê  
Nûh bişîne tim xelat.

\*\*\*

Kurkê delal, namûs be,  
Mêrxas, xîret, namûs be.  
Kes vê dinê namîne,  
Nav emir da namûs be.

\*\*\*

Delalê min, metirse,  
Neyar lok be, metirse.  
Mitaleke kûr û dûr,  
Kesên xirav bitirse.

\*\*\*

Delalê min, vî erdî,  
Bihebîne, vî erdî.  
Gelek hatine, çûne,  
Xêr dîtine vî erdî.

\*\*\*

Delalê min, bijbêre,  
Qenc, xirav hev bijbêre.  
Ev dinya bê îtbare,  
Xwe ra rêkê bijbêre.

\*\*\*

Keçka delal, li çîya,  
Were, bijî, li çîya.  
Berf, baranê metirse,  
Hub şirîne li çîya.

\*\*\*

Kurêm, çîya mêzeke,  
Deşta, çîya mêzeke.  
Wedê Xwedê destîne,  
Mêranî dû mêzeke.

\*\*\*

Kurêm, timê mêrxas be,  
Bê tirs, bê xof, mêrxas be.  
Kîbûna xwe bîr meke,  
Neyar qutke, mêrxas be.

\*\*\*

Qîzka delal, tu dûrî,  
Gîlî, gotina, tu dûrî.  
Çiqasî min birevî,  
Dilê min da tu nûrî.

\*\*\*

Delala min, tu berfî,  
Ne baranî, tu berfî.  
Çi rengî dibî, bibe,  
Dilê min da, tu berfî.

\*\*\*

Delalê min, dilopim,  
Nav behrê da dilopim.  
Neyar pêş min taw nakin,  
Ez çi bikim, dilopim.

\*\*\*\*\*

Delalê min, bigere,

Ku dixazî bigere,  
Boy welatê xweyî dê,  
Tim lel û durr bigere.

\*\*\*

Delala min, usa na,  
Biska şeke, usa na.  
Çav û burya xwe kilke,  
Hîvî dikim, usa na.

\*\*\*

Delala min, serê rê,  
Rastîm were, serê rê,  
Eger tu min hez dikî,  
Rica dikim, were rê.

\*\*\*

Delala min, nav gelî,  
Gul bedewin, nav gelî,  
Xûşkê didim birê te,  
Pê ra bibe bendêlî.

\*\*\*

Keçika delal, kanîyê,  
Avê hilde kanîyê,  
Çavê min rê qerimîn,  
Bese bikî menîyê.

\*\*\*

Delalê min, welêt da,  
Şayî başin welêt da,  
Ku dixazî bigere,  
Mirin başe welêt da.

\*\*\*

Qîzka delal, li rastê,  
Gul bedewin li rastê,  
Hebûna xwe didim te,  
Hûrkê min ra bibe dê.

\*\*\*

Delala min, rast were,  
Rê bibire, rast were,

Tu guh mede xedara,  
Ber huba min rast were.

\*\*\*

Delala min, kanîyê da,  
Av zelale kanîyê da,  
Paqîşayî pir başe,  
Bişoy, veşoy, wedê da.

\*\*\*

Neyar hatin, rûniştin,  
Hebûn birin, nehîştin,  
Zulum gihîşt asîman,  
Keç-xortêd me tew kuştin.

\*\*\*

Delalê min, erdê da,  
Av dikişe erdê da.  
Tu şuxulê xwe bike,  
Guhê xwe mede xelqe da.

\*\*\*

Nav şênya da gund rindin,  
Deşt-banîya, gund rindin,  
Dîlan-govend ku hebin,  
Gund cinnetin, gund rindin.

\*\*\*

Horiya delal, te nabînim,  
Dîlan, geşta, te nabînim,  
Carek derê min tu weke,  
Sebra xwe ez te bînim.

\*\*\*

Çandinîya bax rinde,  
Bostan rinde, bax rinde,  
Eger hube bê çilk be,  
Emir, şîrîn, roj rinde.

\*\*\*

Delalê min, hatî çûn,  
Hemu hatî neman, çûn,  
Neyar hatin rûniştin,

Ser axa me ew neçûn.

\*\*\*

Kurê delal, bîr meke,  
Ku dimînî, bîr meke,  
Namûs tacê zêrîne,  
Qîmetê wê bîr meke.

\*\*\*

Delalê min, êl rabû,  
Dinya hevket, êl rabû,  
Hemû millet aza bûn,  
Zulum ser me rane bû.

\*\*\*

Delalê min, hindike,  
Çi jî bikî, hindike.  
Boynet axa xweye dê,  
Ruh jî bidî, hindike.

\*\*\*

Delalê min, koşk başe,  
Xanî başe, koşk başe.  
Kesê welêt bavêje,  
Nav emir da rûreşe.

\*\*\*

Delalê min, gul rinde,  
Bilbîl rinde, gul rinde.  
Temam dinê bidine te,  
Dîsa welatê te rinde.

\*\*\*

Zozan xase, wede da,  
Gotin başe, wede da.  
Tu dixazî rind bijî,  
Kedê bike wede da.

\*\*\*

Delalê min, tu rezî,  
Him feqîyî, him rezî.  
Dilê bê te dernayê,

Boy min timê tu ezî.

\*\*\*

Delalê min, merez hat,

Ji Xwedê da merez hat.

Wedê sertî, giran da,

Ça piştovan-bira hat.

\*\*\*

Kîna qirêj xiravîye,

Rewşa êla avayîye.

Lawo, qencî unda nabe,

Axir, oxir, ev xwelîye.

\*\*\*

Şebûk ku hat, qet mêl nebe,

Pêş tu kesî duqat nebe.

Mêr dimîne timê mere,

Mêranîyê tu dûr nebe.

\*\*\*

Delalê min, ev çîya,

Bedew, rindin, ev çîya,

Vira min yar unda kir,

Gunêm stûyê van çîya.

\*\*\*

Delalê min, vê bazarê,

Êl kişyaye, vê bazarê.

Te aqlê xwe ku unda kir,

Kar hilnadî vê bazarê.

\*\*\*

Delalê min, van çeva,

Mêze dikim, van çeva.

Ez kirime kolê xwe,

Dûr naçim ji van çeva.

\*\*\*

Cînarê baş bernede,

Oxira baş bernede.

Dostê baş ket destê te,

Heta dawîyê bernede.

\*\*\*

Zimanhezî pir başe,  
Zar boy gelê xwe başe.  
Wedê şuxlê qenc dikî,  
Êl şa dibe, ew başe.

\*\*\*

Cem zaneya, hebûn hêçe,  
Hebûn him tê, him jî diçe.  
Kîbûna xwe unda kirî,  
Dirêj najî, xirav diçe.

\*\*\*

Ziman kubra xudane,  
Him derde, him dermane.  
Ziman gerek bizan be,  
Pêş wî hene dirane.

\*\*\*

Parek dinê Îslame,  
Em jî bûne Îslame.  
Hineka ra ew dimis-rûn,  
Cellatê me Îslame.

\*\*\*

Delala min, bikene,  
Eşq be, şa be, bikene.  
Ewqas nebe bê îtbar,  
Carek rûyê bikene.

\*\*\*

Delalê min, vî derî,  
Were, veke vî derî.  
Neyar hemû hilda bir,  
Em kirin kerî-kerî.

\*\*\*

Reş hat, reş hat, bextê me,  
Xwedê ew kir para me.  
Hemû millet bûn aza,

Zulma giran wî da me.

\*\*\*

Delalê min, gul êşya,

Gul xeyîdî, gul êşya.

Xizmetkarê êlê be,

Nebên êl ji te êşya.

\*\*\*

Rastîhez be, lawê min,

Bilind bike serê min.

Rastî pişt û loxmane,

Ça rê hilde wê boy xun.

\*\*\*

Lawo, rastbêj mêl nabe,

Bin pîya da xinc nabe.

Rastî kelma Xwedêye,

Ew zirav dibe, qut nabe.

\*\*\*

Delalê min, bahar hat,

Tavî, teyrok, baran hat.

Mirin emrê Xwedêye,

Ev mereza ji ku hat.

\*\*\*

Delalê min, vê zeryê,

Hîn be eslê vê zeryê,

Cindî, bedew gelekî,

Bibe dîlê vê zeryê.

\*\*\*

Beriya gotîye: “Zar başe,

Him keç, him jî law başe.

Zar ku dîl rihet dike,

Bav şa dibe, ew başe”.

\*\*\*

Delalê min, cindîye,

Rind mêzeke, cindîye.

Bedewîya wê nexape,

Hîn be, eslê wê kêye.

\*\*\*

Kurkê delal, agire,  
Pî neke nav, agire.  
Agir xezna Xwedêye,  
Jîn nabe, bê agire.

\*\*\*

Delalê min, hişk şewitî,  
Ter jî tew hişk şewitî.  
Wedê Xwedê da bela tê,  
Ew najbêre qenc, kotî.

\*\*\*

Delalê min, bikele,  
Tevî êlê bikele.  
Êlê ku te heznekir,  
Ji nav derê, bihele.

\*\*\*

Delalê min, mêrgê da,  
Gul bedewin mêrgê da.  
Çi pêvîste wî bike,  
Tu guh mede xelqê da.

\*\*\*

Tu ji kêra bîrê vedî,  
Yanî tenîsk, yan bê bine.  
Axir-oxir tuyê wir da,  
Tek bimînî nevsaxune.

\*\*\*

Çevbirçî ra dinê bidî,  
Ew têr naxe, nabê bese.  
Dinya-alem serûbin be,  
Xirab nabe nişaxase.

\*\*\*

Delala min, bax rinde,  
Boy kêf-sefê bax rinde.  
Wekî dilî bî dil be,  
Emir şîrîn, roj rinde.

\*\*\*

Ewledê çê bava radike,  
Koşk-kombeza ser çê dike.  
Lawo, tu car vîra meke,  
Vir dawîyê rû sor dike.

\*\*\*

Delalê min, hovîya,  
Baş mêzeke hovîya.  
Eger tu rind fikirkî,  
Nakevî dest hovîya.

\*\*\*

Bêje, kurêm, dubar bêje,  
Mitaleke, paşê bêje.  
Dinya milkê Silêmîne,  
Parê hilde, paşê bêje.

\*\*\*

Wî welatî mên hene,  
Egît hene, hut hene.  
Dayka mêrxas ku heye,  
Gel namire, şêr hene.

\*\*\*

Baharê êl diçin çîya,  
Xuşîn dikeve çem-kanîya.  
Belekî nexşê Xwedêne,  
Bê belekî kêra çîya.

\*\*\*

Keçka delal, bistirê,  
Pir kilama bistirê,  
Nalînê te agirin,  
Hinek hêdî bistirê.

\*\*\*

Axa daykê berekete,  
Qedir, qîmet, him hutmete.  
Kê namêtye şîrê helal,  
Gel ra tine kîn-qudrete.

\*\*\*

Bireqise, bedewa min, bireqise,

Ber miqama huba min-te bireqise,  
Çav-buriyêd te dil-hinava dişevtînin,  
Rica dikim, usa kel-bîn mereqise.

\*\*\*

Keçka delal, tu xwe were,  
Rîyê bigre, tu xwe were.  
Min baxçê da gul çandine,  
Gul pêwîst bû, tu xwe were.

\*\*\*

Mezinê male lele, durre,  
Bîn-bereket, bazê pere.  
Destê xwe da qaîm megrî,  
Wê ji destê te bifire.

\*\*\*

Dinya fire timê heye,  
Xêr û şere tim pêşyêye.  
Ewa gelî bexteware,  
Mezinê wîyî aqil heye.

\*\*\*

Delalê min, leke ma,  
Ser dilê me leke ma.  
Hemu welat bûn aza,  
Welatê me kêra ma?

\*\*\*

Xwedê mestir kes tunene,  
Xeybê hatî qet tunene.  
Berîya gotîye: “Rûyê erdê,  
Padşê mestir kes tunene”.

\*\*\*

Ziman hebûn, ruh kemale,  
Şîrîn, şerbet, doz û qale.  
Gelê ku ma bê zimanê,  
Tim dimîne bê mal-hale.

\*\*\*

Mezin mal da lel û durre,  
Xêr bereket, xezna zêre.

Destê xwe da qaîm megrî,  
Ji destê te wê bifire.

\*\*\*

Eva dinya timê heye,  
Xêr û şere, dest xudaye.  
Ewa gelî bextewere,  
Mezinê wî aqil heye.

\*\*\*

Ziman hebûn, rûh-kemale,  
Şîrîn şerbet, doz û qale.  
Gelê ku ma bê zimanê  
Ew dîlekî bê pergale.

\*\*\*

Delalê min, eva behre,  
Nekeve nav, jê dûr here.  
Kî dikeve hulfa wêye,  
Paşda tu car venagere.

\*\*\*

Zulum, timê zulmê tîne,  
Kevir, kuçka dihelîne.  
Cîyê zulum lê tu nîne,  
Gulustana hergav bîne.

\*\*\*

Xwîna qirêj paqîş nabe  
Her qewmandin bê pêc nabe.  
Dergê xwedê pêş te vebû,  
Bila hezar neyar hebe.

\*\*\*

Ziman tele, him jî jehre,  
Pîr şîrîne, av kewkere.  
Kesê ji wî dûr direve,  
Cêwî, sexîr, xwelî sere.

\*\*\*

Mal bê xweyî tu car nabe,  
Welat bê bok-beran nabe.  
Ew welatê bok lê najîn,

Tofanê lê ese rabe.

\*\*\*

Lawo, dayîk pir şîrîne,  
Wek wê şîrîn tişt tu nîne.  
Qedir bigre tu wede da  
Xwe ber pîya nehevşîne.

\*\*\*

Werin, werin, hafadêd min,  
Egid, mêrxas, lehengêd min  
Xwezil bahar bê qezîya,  
Îsal bêye welatê min.

\*\*\*

Lawo, gilîya dirêj meke,  
Bicedîne xwe xweyîke.  
Ji hebûnê zîyan nayê,  
Kasivayî hevek kêmkê.

\*\*\*

Neyara xast, bêje tune,  
Dosta ku xast, nebê tune.  
Hemû teme pir şîrînîn,  
Weke welêt şîrîn tune.

\*\*\*

Dest hogirê deştanîn,  
Berf qapûtê çîyanîn.  
Welatê bê zozanîn,  
A bedîdem, bê seyranîn.

\*\*\*

Were, were, rû kena min,  
Hebûn, jîne, ruh-canê min.  
Em mêvanîn li vê dinê,  
Hinek boy min bibe finê.

\*\*\*

Dev dikane, lê tem pirin,  
Gilîyê bê cî agirê gurin.  
Li devê xwe nebî xudan,  
Malê li te bibe wêran.

\*\*\*

Wedê bostanî ku xange,  
Xweyê wîyî pirî merde.  
Kengê bostan digihîje,  
Xweyî dibe zehf çavmenge.

\*\*\*

Hurtî şêne mêra nîne,  
Boy nava qenc bilezîne.  
Aqil rabe, aqil rûnê,  
Bila nebên ewî dîne.

\*\*\*

Dîya heqqa xwe şaş meke,  
Pêş sexîra derya veke.  
Kesê lafêk pira gule  
Bicerbîne hê bawerke.

\*\*\*

Lawo maca cot bigre,  
Rîya xirab qet megre.  
Rastî çiqas zirav bibe,  
Dihecîqê, lê namire.

\*\*\*

Cîya bê hev ne çîyane,  
Cem û kanî xuşk birane.  
Zozan çiqas xweş û rind be,  
Bê mij, baran, ne zozane.

\*\*\*

Kurêm, gelekî doş nebe,  
Sebir bike, zû hers nebe.  
Firsend carek teye deste,  
Hucet rîya qet ne raste.

\*\*\*

Lawo, destê ketîya bigre,  
Kesê ketî nebihure.  
Destgirtin Elîda maye  
Heya xwe va nebe hure.

# SATÎRA

## MÎŞKÊ PÎR XWE RAZÎ

Rokê mişkê pir xwe razî,  
Geriya koşka, bestê tezî.  
Pozê xwe kir hemû qulça,  
Leqiya, loqiya nolî «hirça».  
Hêrs bû, rik bû, tebîyetê.  
- Ne xulqandim nûr-qudretê.  
Çira lazim ewqas bînber?  
Çima çêkir bende, beşer?  
Minê dinê bineqşanda,  
Berê çema bizviranda.  
Lel-durr hilda binê behra,  
Xemil bida hemû dera.  
Telmaş meşiya ber zozana,  
Tinaz kir li mêrg-çîmana.  
Kire nirîn wek «fîl-deva»,  
Şêr û şepal kîne vira!..  
Fikir ne da qaz-werdeka,  
Qîrya, qûrya ser leglega.  
Wî pir hûrki gir û giran,  
Kire şingîn çawa beran.  
- Piling gerek pêş min dîlbin,  
Gur û ruvî ziman lalbin.  
Dest mindaye çerxa zemîn,  
Ezim xayê erş û ezmîn.  
Erd hindik bû bin pîyêd wî da,

Cî nedibû çermê xwe da.  
Xast hilkîşe zer û zanga,  
Wir biqîre ter qulinga.  
Pişo hêdî kire mewîn,  
Hafad hejiya kire çivîn.  
Revî, revî nolî gullê,  
Xwe avîte pişta millê.  
Îdî wira nehat xanê,  
Ne guherî rizma dinê.

### ROKÊ

Qaz ser pîkî rex çemê kûr,  
Difikirî giran û dûr.  
Timtêş dikir hêlîn û war,  
«Duguherî» wê dinya xar.  
Xwe da bûbû piling û şêr,  
Digot: -Ezim hafat û mêr.  
Fitla dinê destî mine,  
Erş û kursî qevza mine.  
Ez ku berdim gema zemîn,  
Avê dinê hilde yeqîn.  
Nav bînbera ez serbaşim,  
Pir mezinim, merem xwaşim.  
Hukmê bidim, efû tune,  
Xeza, ava, destî mine.  
Bilind qîriya, xwe firfitand,  
Ser tehtê ber xwe ediland.  
Çavê «Belek» wê qirpandin,  
Deşt û zozan hev alandin.  
Him hênijî, him bênijî,  
Mal xiravê zû pelijî.  
Ruvî dûrva ew mêzekir,  
Leyîst, leyîst, rêç tezekir.  
Tele, tele hate nêzîng,

Pêş «Aqilbend» ne bû hêzing.  
Kenya, kenya ew ser qazê,  
Got: - Rehme te be, şîrîn razê.  
Wî hilqetand qotê vala,  
Şa bû, kete cew, newala.  
Evdê ji xwe timê razî,  
Tu car nabin teyrê bazî.  
Nav emir da ew dizêrin,  
Qenc, xirava nanihêrin.

### QIJİK BÛ MÊRXAS

Sibê zû bû, siba rengîn,  
Teyir-tûya dikir wîtîn.  
Xew rabûbûn hemû kûvî,  
Ser sorgula hebû avî.  
Çem-kanîya diqalandin,  
Dar-devîya dilîlandin.  
Mijê dabû qotê çîya,  
Rêwî hebûn serê rîya.  
Kelba yek-yek dikir ewtîn,  
Gurê xedar çûbû têtîn.  
Hirça giran ketîbû lanê,  
Ruvî çûbû ser tolanê.  
Resik, sîrik zû ba dibûn,  
Gezgez, kereng tev şa dibûn.  
Şivîn dikir hekîn, hokîn,  
Berxvan nava xewa şîrîn.  
Vî heyamê geşî, rindik,  
Hate xanê mêrxas qijik.  
Fîrî, danî banê bilind,  
Got: - Dinê da tek ezim rind.  
Çi karene legleg, quling,  
Qazê pintî, kewê xar ling.  
Bilbilê vir, teyrê sîmir,

Xezalê dîn, kevotkê hur.  
 Çem û kanî tew yên minin,  
 Koşk û sehra milkên minin.  
 Pêş min bibin hûn temene,  
 Bona minin kan û xezne.  
 Fitla dinê destî mine,  
 Fermana min, efû tune.  
 Bi hêrs geriya kin û dirêj,  
 Mirûzî tel, dilda qirêj.  
 Ne fikirî, nekir texbîr,  
 Esil, îsas derxist ji bîr.  
 Çek zû hilda meşîya cerdê,  
 Gemar hilda tenê ji erdê.  
 Teşk lerizîn, nukul xar bû,  
 Bask rûçikîn, dev lê sar bû.  
 Doçik weşîya, çav binisîn,  
 Dil û hinav lê qerisîn.  
 Wê nas nekir piçûk, mezin,  
 Pûrtevebû, nav agrên xun...

## ÎDARA ME DA

Pismamê qenc, her roj cem me tim civate,  
 Xema meke, ev hal boy me tim edete.  
 Dihurmijin gelek dibin piling û şêr,  
 Dihedimin, teze dibin, kevin û ter.  
 Elam dibin, zev pilanên piçûk, mezin,  
 Gişk xebathez, çetinaya nakin gazin.  
 Zû hel dibin hemû pirsê sivik, giran,  
 Karnekirî bê şerm, bê xof dibin beran.  
 «Fem-feraset» derbaz dibe dîsa civat,  
 Ser kaxeta tê kivşkirin hemû xebat.  
 Ew şa dibin, firnaq dibin, ewê demê,  
 Dilî pir şa, berbi malê dikevîne rê.  
 Sibê dîsa tê wekilandin eva qayde,

Teze tûne, kevin îdî nade feyde.  
Ji kevira derdikeve tim nanê me,  
Van civata, kê xilazke ruh-canê me?

**XEZALA BÎRÎNDAR**  
(*Ser hîmê folklore gelê Kurd*)

Rex çemekî kirt ketibû xezaleke kûr birîndar,  
Nav xwînê da diperpitî, dinalîya, fikir hewar.  
Beqê dûrva ew mêzekir, bilind banzda, gihîşte bal,  
Got: “Ev çi hale, çi qewimye, xûşka delal?”  
Xezal naliya, weca êşê hêsir rêtin, kire zêrîn,  
Beqê herd gep tijî kirin, kubar-kubar kire qorîn.  
Got: “Xwezila birêjîya herdu çavêd wî nêçîrvan,  
Çi dixwaze min xezalê, me xezala nava mêrgan.”  
Xezalê dît ev ecêva, ber çavêd wê bû tarîstan,  
Kire intîn, dilê xwe da nîfir kirin dû nêçîrvan.  
Hejiya, naliya, gelekî sert, tûj nihêrî çavê beqê,  
Got: “Van gulla ez nedimirim, te ez kuştim kelîmekê.”  
Go lê şikestin, çav binisîn, ruhê xwe da ewê demê,  
Beqê banzda, kire qurîn, xwe avîte nav hezekê.

**KEÇKA BÊ KÊRELAFEK**

*Rewayî wan keça dikim, yêd ku ji şuxul karîyê û paqîşiyêye gelekî  
dûrin. Xwe timê lafek û sivik didine kivşê. Boy kirinêd xwe naxazin  
pêş tu kesî bersîvê bidin.*

Keçê hatiye ji nav mala,  
Qirêj girtiye deîl-dawa.  
Tolîkbavê neşûştîye,  
Hevt sawûna, ne hevt ava.  
Genî dikera êlêye,  
Rûniştîye ber sêlêye.  
Dû ketîye herdu çava,

Paxcê daye dev û lêva.

Bêkêr nake tu şuxula,  
Tew rojêd wê diçin vala.  
Bişkiwtîne cil, xew tîne  
Rojê duxe şeşe nane.

Doxuldidere nava hewşê,  
Sol û gora qet nake pê.  
Şenekirne por, guliye,  
Sekinîye hîvya dêye.

Şel xwe kirîye xwe badike,  
Çi dixaze, ewî dike.  
Xwe rêdibe, nolî hara  
Şerm nake ji der-cînara.

Hesav nake dê-bavêd xwe,  
Nabihîze xûşk-birêd xwe.  
Paqîş nake dest û pîya,  
Qirêj lode ser tilîya.

Kê dibîne jê direve,  
Feka mezin nade heve.  
Bîna hênî jê dibare  
Nake şerme, nake are.

Gund hevdixe sero-bine,  
Rind dibîne tenê xune.  
Vir û viza ew ter nabe  
Qet naxaze kesek şa be.

Neynik kirine kêr û niştir,  
Hez nake kesî ji xwe pêştir.  
Şîlaq ketîye herd çavane,  
Ûd nake ji keç zerîane.

Boy kirinêd xwe qet natirse,  
Na betile, na teyîse.  
Kuda diçî rastî te tê  
Nakeve mal, temam hevtê.

Keçê wekî xwe rast meke,  
Rîya emir safî meke.  
Wê bimîne pîre keçe  
Emrê wêyî bibe pûçe.

# HELBESTÊN

## ZAROKA

### KURÊ MINÎ RÎNDIKE ...

Gula mine sorike,  
Pir belge, pir monike,  
Ezê gulê hilînim,  
Li berîka xwe xînim.

\*\*\*

Nergîz, nergîz, nergîzok,  
Baxê me bû tijî nok.  
Ezê noka beravkim,  
Ber tavikê wan zûwakim.

\*\*\*

Kurê minî rindike,  
Çavbelekî, çûçike.  
Derê malê digere  
Dû perokê direve.

\*\*\*

Perok, perok, mefire,  
Bese bikî dew-şere.  
Kurê minî delalê,  
Pir aqilî, kemale.

\*\*\*

Xezaloka ser gulê,  
Hol bû, kete nav kolê.  
Tîtal ew da destê xwe,  
Hilda kir paşila xwe.

\*\*\*

Karka xezal mikîya,  
Pir ricifî, hejîya.  
Nêçîrvan dît halê wê,  
Îdî nekuşt maka wê.

\*\*\*

Ruvî weqîya dor mala,  
Mirîşk revîyan bin kola.  
Dîko bilind kir qîrîn,  
Got, ezim, bokê zemîn.

\*\*\*

Baxçê me bû hêşîne,  
Lê pir bûn gulên bîne.  
Hemû gule rindikin,  
Xwezil, xwezil, zû vekin.

\*\*\*

Bilbiloke, beleke,  
Pir bedewe, geroke.  
Ez wê nadim tu kesa,  
Qorî bikim ji nesa.

\*\*\*

Legleg xemla baharê,  
Tim datîne ser darê.  
Dar boy wêya welate,  
Him rewşe, him qinyate.

\*\*\*

Şîrê daykê şîrîne,  
Wek wî tişteke tu nîne.  
Dayîk nûra çevane,  
Tema dev û lêvane.

\*\*\*

Berxka mine xal-xale,  
Dû min timê dikale.  
Wedê makê dibîne,  
Îdî nake kalîne.

\*\*\*

Tavê, tavê, tavê can,  
Were bibe me mêvan.  
Werne xanê deşt, zozan,  
Bila şabin mêrg-çîman.

\*\*\*

Minminîke beleke,  
Barê wêya geleke.  
Ezê bibim hogirê wê,  
Sivik bikim barê wê.

\*\*\*

Çivtê, çivtê, çivtokê,  
Birev têkev merêkê.  
Merek tijî ka-genim,  
Ez te nagrim, narevim.

\*\*\*

Pişo derket nêçîrê,  
«Tifing» çûbû ji bîrê.  
Mişka sihkîr halê wê,  
Birîn rê û dirbêd wê.

\*\*\*

Qazka mine beleke,  
Pir nazike, çelenge.  
Rûnanê ser hêlînê,  
Ezê bibime kadînê.

\*\*\*

Kurik çûye bazarê,  
Şaş kirîye dîsa rê.  
Keça pêşiya wî girtin,  
Perê wîya jê stendin.

\*\*\*

Ruvî kete govendê,  
Bazin avîte zendê.  
Wedê Bello hat xanê,  
Xwe unda kir, bû finê.

\*\*\*

Hespokê min reveke,

Bê zînî, bê gemike.  
Mêrg-çîmana diçêre,  
Min dibîne, nareve.

\*\*\*

Hîv royê ra ket lecê,  
Got: - Ez bedewim, ezim çê.  
Royê serê xwe bakir,  
Hîvê şemal unda kir.

\*\*\*

Berxvan berxik kirin kozê,  
Bello ewtya xwe da fêzê.  
Gurik hêrs bû, kir gazin,  
Got: Ew bir ruzayê min.

\*\*\*

Pişoya min rindike,  
Pûrta wêya nermike.  
Tim radizê bin sovê,  
Qet dernayê ber tavê.

\*\*\*

Kulîlk vebûn cot bi cot,  
Bilbil şa bû kilam got.  
Kew meşîya rast û xar,  
Hêlîn danî bin zinar.

\*\*\*

Baran barî deşt û çîya,  
Lêyî kete nav kanîya.  
Kestek lez-bez derket devra,  
Girîya halê tew kevira.

\*\*\*

Fîlo, fîlo, fîliko,  
Gilovero, rindiko.  
Îdî bese bikî xew,  
Were, bibin dostêd hev.

\*\*\*

Kurê minî zêrîne,  
Wek wî bedew tu nîne.

Pirtûka xwe dixwîne,  
Qîmetê rind distîne.

\*\*\*

Pepûk rûnişt li ser darê,  
Mizgîn anî ji baharê.  
Ewrên reşik xwe hejandin,  
Tavî-teyrok berjêr şandin.

\*\*\*

Gurik pir mêt şîrê mîyê,  
Heta derket sêwîtîyê.  
Wede nas kir eslê xweye,  
Ewil bû neyarê mîye.

\*\*\*

Kurik çûbû dendika,  
Qetand bendê solika.  
Bavo hêrs bû, ew eçkir,  
Dayê hilda ew maçkir.

\*\*\*

Bedew, bedew, çiraka me,  
Ronik bide tu mala me.  
Boy me bîne pir şemale,  
Me ra bibe dost, hevale.

\*\*\*

Avê, avê, avka me,  
Tijî bibe hewşa me.  
Bila gulêd min vebin,  
Kesk û sor û sipî bin.

\*\*\*

Qijikê kir qirîne,  
Got, kilama «zêrîne».  
Bilbilê ew mêze kir,  
Awaza xwe teze kir.

\*\*\*

Berfê, berfê, berfokê,  
Lêke bibe kudûkê.  
Bila zarok te şa bin,

Him bikevin, him rabin.

\*\*\*

Te bikine guloke,  
Hevxin, bikin heneke.  
Lez birevin nêzîk, dûr,  
Têkevin nav kudkê kûr.

\*\*\*

Zeviya meye mezine,  
Him cehe, him genime.  
Bavê minê biçine,  
Pirtûka min bistîne.

\*\*\*

Delîl, Delal birane,  
Ronaya dê, bavane,  
Bazê serê çîyane,  
Yek boke, yek berane.

\*\*\*

Hevra bûne hevale,  
Dernakevin ji male.  
Hespên xwe sîyar dibin,  
Direvin tev, şa dibin.

\*\*\*

Rû nermin, rû perikin,  
Şuxul karin, heyfîkin,  
Çavreşin, çavbelekîn,  
Şîrînin, şemelokîn.

\*\*\*

Dê da bûne gerîla,  
Wê bikevin dew-doza,  
Wê azakin axa dê,  
Koşka neyar bidin bê.

# POÊMA

## GELÊ QAZAX

**Zor-zor spas, hurmet te ra,  
Nan, av, hewa, te da me ra.  
Destê xwe kir, te ser me sî,  
Dilê xwe da te da me cî.**

Hezar nehsid bîst şeşê salê,  
Em qetîyan ji axa dê.  
Kafkaz me kir xwe ra war, cî,  
Dît xiravî, him jî qencî.  
Sal pey sala welgerîyan,  
Hinek şa bûn, hinek giryan.  
Hinek bûne pir mal-dewlet,  
Hinek bûne xweyî ewled.  
Derge vebûn li pêş Kurda,  
Şer tunebûn li wan erda.  
Gul vedida dîrok, cejna,  
Çilmisî bûn rehêd zulma.  
Tew gel bûbûn hevra bira,  
Kar dikirin kesa xwe ra.  
Despêka sî pêncê salê,  
Tofan kete pakî dinê.  
«Bavê millet» tevî Bêrya,  
Dîtin xewnek, xewna şeva.  
Qelp Mîkoyan kirin gazî,

Emir, şîret, kirin razî.  
 Gotin: - Here welatê xwe,  
 Wira veke herd çavêd xwe.  
 Binihêre derî, qunca,  
 Binçav bike hemû qulça.  
 Xayîn gihîşt Filistanê,  
 Xêlekê ma wê wêranê.  
 Wî heznekir emrê teze,  
 Kete rêke pir qereze.  
 Rastî veşart, nivîsî xar,  
 Çû huzûra wî gurê har.  
 Çend nebende li hev anî,  
 Beratê vir ber wî danî.  
 Cellad hêrs bu, çav bûne tas,  
 Nexand dîrok, pê nebû nas.  
 Dêm-murûzê wî barî jehr,  
 Got: - Kurda zû wir bikin der.  
 Pî danî sî hevtê salê,  
 Qîrîn, qujîn derket holê.  
 Payîz diçû zivistanê,  
 Sura şewat dihat xanê.  
 Emir boy me bû mewt, merez,  
 Neffîkirin em bi qerez.  
 Erd lerizî, rabû tofan,  
 Reş xitimî erd û ezman.  
 Dehra nekir guşe-guşe,  
 Behra nekir xuşe-xuşe.  
 Kew melisîn ser hêlîna,  
 Payîz giriya tev havîna.  
 Ewra barand hêsrêd çava,  
 Ro xeydî, neçû ava.  
 Hîvê, stêrka kire hewar,  
 Êwir-êwir ew neçû xar.  
 Xalik giriya halê Kurda,  
 Kurd ketibûn behra derda.  
 Birçî, tezî, ber sur-serma,

Dihat qut û xeza Kurda.  
Gelek mirin serê rîya,  
Bûne xurê teyran, tûya.  
Bi şîn, kefen defin nebûn,  
Emrê şîrîn îdî dûrbûn.  
Bin sur-serma, alava da,  
Em gîhîştin rokê vira.  
Welatê te em bûn mêvan,  
Te cî da me, bi ruh û can.  
Parî nexar, nîvî da me,  
Lihêfa xwe avît ser me.  
Daka me ra te tim got dê,  
Sol, mehsên te me kirin pê.  
Avdew vexar, qimiz da me,  
Bilûr hilda, dombra da me.  
Te avsîra dayka me xar,  
Bêşbarmaxa te, tim me xar.  
Bê par, bê war em nehîştin,  
Dor sivra te em rûniştin.  
Bê me nekir mêvandarî,  
Ji me dûrxist te hejarî.  
Em tev çûne dibistana,  
Bahar, payîz, zivistana.  
Em tev hînbûn, Abay, Cambûl,  
Te got, tu car Kurd nabin qûl.  
Tu bû sebeb, em nehelyan,  
Ne kewgirîn, ne jî zêryan.  
Buhurîn roj, salên giran,  
Me bîr nekir zar û ziman.  
Ser axa te, vî miskanî,  
Em dixwînin Feqî, Xanî.  
Ji ulmê te me par hilda,  
Dûr ketin ji xema, derda.  
Bûne zane, him helbestvan,  
Dersdar, dengbêj, him jî loxman.  
Kê xwîdan rêt, bû pir dewlet,

Kê kar nekir, ev bû rovet.  
Tew gela ra te da war, cî,  
Nehîşt tu kes bibe birçî.

### Para Duda

«Bavê millet» pir kîn û rik,  
Diçû ser xalîçê perik.  
Bin pîyêd wî dikir çirqîn,  
Bîr kiribû hukmê zemîn.  
Kin û dirêj gelek çû-hat,  
Dihat xanê ew bê tawet.  
Hêrs bû, tirş bû, kir hurme-hurm,  
Îstolê xist wî kulma xun.  
Revîn cem wî, gelek durû,  
Nav xofê da dikenyan rû.  
Ker-lal bûbûn pêş wî gurî,  
Unda kiribûn rîya dêrî.  
Duqat bûbûn pêş emrêd wî,  
Şaş mabûn ser van kirinêd wî.  
Dipokinîn bê deng, bê hes,  
Wan çikyabûn bîn û nefes.  
Pir nekişand evî halî,  
Wî mêzekir, hemû alî.  
Ji cî rabû nolî hovya,  
Hêrs nihêrî li wan hemya.  
Dengê wî ket sera kûre,  
Tûş nihêrî gelek dûre.  
Lêva barî ava mewtê,  
Ji wî dihat bîna qetlê.  
Tilî hejand, kire qîrîn,  
Got, sih bikin, îdî yeqîn.  
Hînbîn çiqas gelên piçûk,  
Jîyan dîkin Kafkaza çûk.  
Nav wedekî kinî, kurt da.  
Navnîşa wan bînin min ra.  
Ber çavêd min biteyîsin,

Bîr mekin, hûn ne tu kesin.  
Revyan mîna mûristanka,  
Holbûn nolî kurm, kêzika.  
Pir nekişand, wan durûya,  
Anîn navêd gel hemûya.  
Kaxet danî ewî pêş xwe,  
Qelem hilda nav pêcyêd xwe.  
Kurt nihêrî wî li kaxet,  
Bin gela ra kişand sor xet.  
Zexm nihêrî wî li Bêrya,  
Got, nefîkin van hemûya.  
Bêrya kaxet hewa hilda,  
Got: - Emrê te li ser çava.  
Wedekî kin bide min ra,  
Nahêlim ew bijîn wira.  
Dîsa kaxet da destêd xwe,  
Da xebatê gelema xwe.  
«Bavê millet» cara duda,  
Ferman mor kir, emrê xwe da.  
Gel nivîsîn dane rêzê,  
Navê Kurda kifş kir fêzê,  
Got, van gela werên xezê,  
Neffî bikin ji Kafkazê.  
Giran hat çil çarê salê,  
Caweke reş gihîşt êlê.  
Gav, roj bûne mewt û keser,  
Agir hilda her qulç û der.  
Tevî Kurda bûne dêran,  
Çêçên, Îngûş, gelên Tûran.  
Meznê mala çûbûne şêr,  
Nav êlê da nemabûn mêr.  
Eydo, Zîyo, Topo, Osman,  
Lawê Dursun, şêr Alîşan,  
Daştan, Qedîm, him Bedirxan,  
Qenc Aydemir, xort Ezelxan,  
Gelek, gelek, boke, beran,

Egîd, mêrxas, him qehreman,  
 Zavê hene li ser destan,  
 Hemû çûbûn şerê Gêrman.  
 Hermet mabûn dewsa mêra,  
 Dixebitîn nolî şêra.  
 Mala nedgirt sêwî, sexîr,  
 Nan, germayî çûbûn ji bîr.  
 «Bavê millet» nedibû nerme,  
 Boy kirinên xwe nedkir şerme.  
 Kurdê mabûn Qurcistanê,  
 Berê wan dan Qazaxistanê.  
 Hêsîr kirin vagonêd sar,  
 Dayka hêsir anîne xar.  
 Zêwîn kete sêwî, jara,  
 Pîr, kal mane ber dîwara.  
 Qîrîn, qûjîn çû asîman,  
 Gelek mirin, hindik jê man.  
 Hêlînê germ bûne wêran,  
 Kurda rabû axir dewran.  
 Ew qutkirin, hemû heqa,  
 Birçî, tezî kirin zîqa.  
 Gavên şewat neburîn,  
 Li ser dila çêbûn birîn.  
 Nava zulmê, zelûlyê da,  
 Sêfil, sêwî, sexîryê da.  
 Hinek dayîk tevî zara,  
 Rojek reş da hatin vira.  
 Te mêranê nolî berê,  
 Pêş wan vekir dergê xêrê.  
 Tu kes nehîşt ber sur, serma,  
 Qebûl kirin nolî bira.  
 Boy me bûyî tebîb, loxman,  
 Birînêd me kirin derman.  
 Her yekî ra te got, heyran,  
 Ketî rêza bajar, gundan.  
 Boy me te dît hêlîna germ,

Te got, mekin etiv û şerm.  
Welatê min pir fireye,  
Parekî wî boynet weye.  
Ser axa min em birane,  
Bê welatî pir girane.  
Qurne, qurne bijîn vira,  
Mal û milka çêkin xwe ra.  
Rast nîşan da rîya emir,  
Em nehîştin bêkêr, şemir.  
Em hebandin bi dil û can,  
Bilind girtin wek asîman.  
Te da me da sebr, taqet,  
Emrê şirîn, rojêd rehet.  
Hêlîna germ, ruzê sala,  
Xilazkirin derd û bela.  
Me nedîtin keder û xem,  
Bûne bira, bûne hemdem.  
Edûyê me ra bûyî neyar,  
Tev dostêd me te nan, av xar.  
Hehişt kes me biêşîne,  
Ted me te kir şan û şîne.  
Barê giran ser me hilda  
Rusqet, culet te me ra da.  
Zor-zor sipas, hurmet te ra,  
Piştovanî timê me ra.  
Bin esmanê xweyî sayî,  
Me ra bûyî pisman, xayî.  
Nika aza, bextewarin,  
Em ne dîlin, ne hejarin.  
Te xwayî kir hebûna me,  
Erf û edet, dîroka me.  
